T.C. KÜLTÜR VE TURİZM
BAKANLIĞI
KÜTÜPHANELER VE YAYIMLAR GENEL MÜDÜRLÜĞÜ

Şeyh-i Meczûb

Dîvân - Dîwan

Şêxê Meczûb



Transkribe Eden ve Notlandıran / Amadekar
Mesut Arslan

T.C. KÜLTÜR VE TURİZM BAKANLIĞI

© KÜTÜPHANELER VE YAYIMLAR GENEL MÜDÜRLÜĞÜ
3756

KÜLTÜR ESERLERİ DİZİSİ
661

ISBN: 978-975-17-5725-8

Genel ağ: www.ktb.gov.tr
e-posta: yaphaz@ktb.gov.tr

Transkribe Eden ve Notlandıran
Mesut Arslan

Editör
M. Xalid Sadini

Koordinatör ve Redaktör
Ali Karadeniz

Yapım
Ajans Düş Pınarı
Birlik Mah. 465. Cad. No: 1/5 Çankaya/Ankara
bilgi@duspinari.com
www.duspinari.com
Grafik Tasarım: Pınar Coşgun

Baskı
Matus Basımevi Reklam Yayıncılık Tic. Ltd. Şti
Matbaacılar Sanayi Sitesi 1514 Cad. No:2
İvedik Organize Sanayi Yenimahalle / ANKARA
Setifika No: 49558

Baskı Adedi: 1.000

Baskı Yeri ve Tarihi: Ankara, 2023

Şêxê Meczûb

Dîwan / Şêxê Meczûb; Transkripsiyon: Mesut Arslan— Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı, 2023.

440 s.; 24 cm.— (Kültür ve Turizm Bakanlığı yayınları; 3756, Kültür Eserleri dizisi; 661)

ISBN: 978-975-17-5725-8

1. Diğer Çağdaş İran Edebiyatı, Kürt. I. Şêxê Meczûb. I. Dîwan. II. Şêxê Meczûb. III. Arslan Mesut. IV. Seriler

891.59





ÖN SÖZ

Üzerinde yaşadığımız coğrafya insan hayatına ilk kez giren pek çok şey gibi ilk kültürel ve sanatsal faaliyetlerin ortaya konulduğu yer olma özelliğine de sahip. İnsanın zihinsel faaliyetlerinin ürünü olan bu sanatlar içerisinde edebî eserlerin yeri anlama ve kavrama kıvraklığını kazandırmadaki gücü ve etkisi nedeniyle başta geliyor.

Bu zengin topraklar üzerinde yükselen medeniyetimiz tarih boyunca çok sayıda edebî eser bırakan edipler ve şairler yetiştirmiştir. Bu sanatkârlar vücuda getirdikleri eserlerle, milletimizin idrak gücünü geliştirmişler, insanlarımızda ilahî aşkı, insan ve doğa sevgisini, bütün varlığa merhamet ve şefkatle yaklaşma duygusunu uyandırmaya çalışmışlardır.

Geniş coğrafyasında farklı kültürler, diller ve lehçeler barındıran medeniyetimiz, İslami düşünce ekseninde bir yapı oluşturmuş ve bu düşünceden beslenen sanatkârlarımız farklı dillerde ama aynı amaca hizmet eden ve aynı düşünceyi dile getiren eserler ortaya koymuşlardır. Bu eserlerin yazıldığı dil Türkçe olmuş, Arapça olmuş, Kürtçe olmuştur, ancak aynı evrensel mesajı vermeye çalışmış; hikmetin ve ilmin bütün insanların yitik malı olduğu ve herkesin kendi diliyle bu yitiğin peşinde olduğunu ifade etmişlerdir.

Kültür ve Turizm Bakanlığı olarak, geçmişten günümüze kadar Anadolu'nun renkleri olan dillerde verilmiş eserleri ortaya çıkarmaya ve bu kültür varlıklarımızı insanlarımızla buluşturmaya büyük değer veriyoruz. Türkiye'nin yaşadığı zihni dönüşümü siyasî, ekonomik ve diplomatik alanda olduğu gibi kültürel, sanatsal ve edebî eserlerle de ortaya koymayı önemli buluyoruz. Bu bağlamda ortak geçmişimizin mirası olan Kürtçe klasik eserleri günümüzle buluşturmayı ve gelecek nesillere aktarmayı çalışmalarımızın bir parçası olarak görüyoruz.

Yüzyıllardır bu topraklara ruh veren düşünceden ilham alınarak yazılmış olan Kürtçe klasikleri Türkçe çevirileriyle birlikte edebiyatseverlere sunarken, kültürel varlıklarımızın zenginliğini gösteren bu eserlerin ortaya

koyduğu ortak düşünce ve duyguların beraberliğimizin ve kardeşliğimizin pekişmesine hizmet etmesini diliyoruz.

Kısa ömrüne rağmen ardında zengin ve hacimli bir dîvân bırakan ancak edebiyat tarihinde hak ettiği yeri bulamayan, Osmanlı Dönemi'nde yetişmiş Kürt şair ve mutasavvıflarından Şeyh-i Meczub'un Dîvânı'nın Kürtçe olarak ilk defa transkipsiyonu yapılarak yayımını gerçekleştirmek Bakanlığımız adına büyük bir gurur vesilesidir. Eserin yayımında emeği geçenlere teşekkür ediyorum.

Mehmet Nuri Ersoy
Türkiye Cumhuriyeti
Kültür ve Turizm Bakanı

TAKDİM

Said-i Cizîrî ya da halk arasındaki bilinen namıyla Şeyh-i Meczûb, Osmanlı döneminde yetişmiş Kürt şair ve mutasavvıflarındandır. Said-i Cizîrî kısa ömrüne rağmen ardında zengin ve hacimli bir divan bıraktığı halde edebiyat tarihinde hak ettiği yeri bulamamıştır. Bunun en büyük sebebi divanının uzun yıllar elyazması olarak kalması ve şimdiye kadar Latin harfleriyle hiç basılmamış olmasıdır. Elinizdeki kitap bu eksiği gidermek için hazırlanmıştır. Said-i Cizîrî'nin Kürtçe divanı ilk kez Latin harfleriyle kitap olarak basılıyor.

Said-i Cizîrî, 1873 yılında Cizre'de dünyaya gelmiştir. Tam adı Muhammed Sa'îd, lakabı Seyfüddin'dir. Şah Ali Hüsameddin et-Tavilî'nin (ö. 1939) halifesi olduğundan şeyh ünvanı almıştır. Allah aşkı ile cezbeye tutulup Cizre sokaklarında kasideler okuyarak dolaştığı ve vaktinin çoğunu itikâf ve halvette geçirdiği için halk arasında Şeyh-i Meczûb, vefatından sonra da Şeyh Said-i Merhum diye anılmıştır. Babası Hüseyin Mazlum Efendi, annesi Halime hanımdır ve seyyid ailesindendir. Babası Hüseyin Mazlum Efendi bir süre belediye reisliği yapmıştır. Dedesi Hacı Ali ise Bağdat, Musul, Halep ve İstanbul arasında iş yapan büyük bir tüccar idi. Amcası Muhammed Beşir de Cizre'de meşhur bir âlimdi ve Said-i Cizîrî'yi o yetiştirmiştir. Said-i Cizîrî, döneminin büyük âlim, imam ve hatibi olan amcası Muhammed Beşir'in yanında iyi bir dinî ve edebî eğitim almıştır. Kürtçe'den başka Arapça ve Farsça da şiirler yazmış olması, şiirlerindeki ve sohbetlerindeki derinliği bunu ispatlar niteliktedir.

Said-i Cizîrî, tasavvuf ehlidir. Nakşibendî-Hâlidî şeyhi Şah Ali Hüsameddin'e intisap etmek için en az iki defa Halepçe'ye bağlı Tavîle köyündeki tekkesini ziyaret etmiştir. Mürşidinden manevi ilimleri tahsil ettikten sonra kendisinden halifelik alarak Cizre'ye dönmüş ve ömrünün sonuna kadar burada irşada devam etmiştir.

Said-i Cizîrî, 1915 yılında Cizre'de vefat etmiştir. Mezarı Cizre'nin tarihî Dağ Kapı Mahallesinde Bayırağa Sokak numara 7'de kendi adıyla anılan Şeyh Said-i Merhum Camii'ndeki hücrede yüksek bir sandukada yer almaktadır.

Said-i Cizîrî'nin günümüze ulaşan iki eseri vardır. Bunlardan biri çoğunluğu Kürtçe olan Arapça ve Farsça şiirlerini de içeren divanı diğeri ise sohbetlerinden oluşan Arapça *Muhtasarü's-Sülûk* adlı eseridir.

Şeyh-i Meczûb Divanı'nın iki yazma nüshası günümüze ulaşmıştır. Divan, 2014 yılında Duhok'ta Arap harfleri ile basılmış, 2021 yılında ise Dr. Mesut Arslan tarafından Latin harflerine aktarılarak edisyon-kritiği yapılmıştır. *Şeyh-i Meczûb Divanı,* Osmanlı dönemi Kürtçe divanları arasında 246 şiir, 3060 beyit, 73 bend ve bir mısrâ-i âzâde ile en hacimli olanıdır. Buna dayanarak Said-i Cizîrî'nin klasik Kürt edebiyatının en üretken şairlerinden biri olduğunu söyleyebiliriz.

Şeyh-i Meczûb Divanı'nın merkezinde mürşidi Şah Ali Hüsameddin vardır. Divanda övülen, hasreti çekilen, mahbûb olarak tasavvur edilen hep odur. Örneğin şair, bir beytinde iki yıldır şeyhinden uzak olduğunu, onu çok özlediğini belirtir ancak yüzü kararasıca hane yüzünden ya da ailesine karşı olan sorumluluklarından dolayı gidemediğinden şikâyet eder:

Sur'et li min bûne du sal vê hicretê dil bûye mal
Rûreş bibin xane w di mal dîsa ketim hicra Husam

Said-i Cizîrî'nin edebî olarak en çok etkilendiği şair hemşehrisi Melayê Cizîrî'dir. İşlediği konular ve üslubu da büyük ölçüde Melayê Cizîrî ile parelellik gösterir. İkisinin de divanında en çok gazel yer tutar ki gazel aşkın şiirdir. Her iki şairin de en çok kullandığı tema ilahî aşktır. Said-i Cizîrî'nin etkilendiği diğer şairler arasında Feqiyê Teyran, Mevlâna Celaleddin, Hâfiz-i Şirazî ve İbnü'l-Fârız'ı sayabiliriz. Şeyh-i Meczûb'un etkilediği en büyük şair ise aynı zamanda manevi talebesi olan Seyid Qedrî Haşimî'dir.

Said-i Cizîrî'nin diğer eseri ise *Muhtasarü's-Sülûk ve'l-İhsân fî Beyâni'l-Vusûl ilâ Meliki'l-Mülûk ve Tarikati'l-Hâcegân*'dır. Mukaddime ve 18 fasıldan oluşan Arapça bir eserdir. Şeyh-i Meczûb bu eseri mürşidi Şah Ali Hüsameddin'in "tarikâtımızda ne acayip incilerin ve en yüksek kazancın mevcut olduğunu mürid ve muhiplere yumuşak bir lisânla bildir" emrine binaen r. 1328/m. 1912 yılında telif etmiştir. Eser, Şeyh-i Meczûb'un tasavvufun incelikleri, mürid-mürşid ilişkisi, zikir adabı ve tarikat ululari hakkındaki sohbetlerini içerir.

Dr. Mesut Arslan'ın doktora çalışmasının edisyon-kritiğinden koparılarak oluşturulan bu divanın hayırlara vesile olmasını diliyorum. Bu vesile ile Dr. Mesut Arslan'a yıllar yılı süren çabası ve emeklerinden dolayı müteşekkiriz. Ayrıca bu divanın yayınlanmasını onaylayan Kültür ve Turizm Bakanı sayın Mehmet Nuri Ersoy ve emeği geçen bütün Bakanlık personeline teşekkür ederim.

Çaba bizden başarı Allah'tandır.

M. Xalid Sadînî
10 Eylül 2023
Van



PÊŞGOTIN

Gellek kurdolog pesnê dewlemendiya folklora Kurdan didin lê gelek ji wan ji bîr dikin ku Kurd, xwedî edebiyateke dewlemend a nivîskî ne jî. Ji serdema klasîk heta îro sedansalan e ku bi zimanê Kurdî dîwan, mesnewî, mewlûd, ferheng, eqîdename û gelek berhemên din hatine nivîsîn û ew di nav destxetan de veşartî mane. Ne tenê lêkolîner, piraniya xelkê jî ji berhem û zanayên xwe bê xeber in. Sedemên vê yên dîrokî hene. Îro jî hê gelek berhemên Kurdî ronahî nedîne, gelek helbestvanên me jî nenas in. Yek ji wan helbestvanên Kurdî jî Şêx Se'îdê Cizîrî ye ango Şêxê Meczûb.

Ev xebata me, ku armanca wê weşandina *Dîwan*a Kurdî ya Şêxê Meczûb e, di sala 2021ê de di bin banê Zanîngeha Dicleyê de di çarçoveya teza doktorayê de hatibû amadekirin. *Dîwan*a Şêxê Meczûb, berê carekê bi herfên Erebî hatibe weşandin jî heta wê gavê bi tîpên Latînî qet çap nebûbû. Loma xwendevanên ku elîfbaya Erebî nizanin nikarîbûn vê berhema hêja bixwînin û sûd jê wergirin. Îro bi amadekirina vê kitêbê em hêvî dikin ku ev dîwan wê baştir belav bibe û xwendevanên Kurdî wê vî helbestvanê gewre baştir nas bikin. Herwiha em hêvî dikin êdî cihê ku Şêx Se'îdê Cizîrî û berhema wî heq dikin, wê di dîroka edebiyata Kurdî de bigirin.

Di vê xebatê de metnê *Dîwan*a Şêxê Meczûb ji bo xwendevanên gîştî hatiye amadekirin. Loma me tîpên transkrîpsiyonê bi kar neanî[1] û cudahiyên nusxeyên destxetên dîwanê (edîsyon-krîtîk) jî nîşan neda. Lêkolînerên Kurdî ji bo van taybetiyan, herwiha ji bo hûrgiliyên naverok û rûxsara dîwanê dikarin li teza me ya doktorayê binêrin.[2]

Dr. Mesut ARSLAN



İçindekiler

5 | Ön Söz

7 | Takdim

9 | Pêşgotin

15 | Şêx Se'îdê Meczûb û Dîwana Wî

19 | Haza Dîwan Eş-Şeyx Muhemmed Se'îd El-Cezeriyy El-Muleqqeb Bi Seyfuddîn Quddise Sirruh

418 | Paşbend



ŞÊX SE‘ÎDÊ MECZÛB Û DÎWANA WÎ

Kurtejiyana Şêx Se‘îdê Cizîrî

Navê helbestvanê me di çavkaniyan de bi gelek avayan tê nivîsîn, wekî Şêx Se‘îdê Cizîrî, Se‘îdê Merhûm, Muhemmed Se‘îd Seyfuddîn. Herwiha ji ber coş û eşqa wî ya îlahî di nav gel de jê re Şêxê Meczûb jî hatiye gotin. Ev nav bûye navê wî yê edebî û wî bi xwe jî di çend helbestên xwe de ji xwe re “meczûb” gotiye. Loma me navê berhemê *Dîwan*a Şêxê Meczûb danî ku Tehsîn Îbrahîm Doskî jî di xebata xwe de ev nav hilbijartiye. Hewce ye bê zanîn ku pênaseyên wekî meczûb, mecnûn, cunûn di nav ehlê tesewifê de ne heqaret in, berevajî tê yeqînkirin ku ew nêzîktirî Xwedê ne. Di nav ekola Neqşibendî de, ku helbestvanê me jî yek ji peyrevên vê terîqetê ye, gelek kesên bi vî leqebî hene.

Se‘îdê Cizîrî, di sala 1873an de ji diya xwe bûye. Ew ji malbateke eşrafê Cizîrê ye. Bavê wî Huseyin Mezlûm, wextekî şaredarê Cizîrê bû. Bapîrê wî Hecî Elî, bazirganekî mezin bû. Dayika wî Helîme Xanim jî seyîd bû ango nesla Pêxember bû. Se‘îdê Cizîrî, bi Meryem Xanimê re zewiciye. Ji vê zewacê du keç û kurek çêbûye. Kurê wî Muhemmed Osman hê heft salî miriye. Lê keçên wî (Rizqiya û Ummîxan) ‘emir kirine û neviyên wî çêbûne. Se‘îdê Cizîrî 1915an de li Cizîrê rehmet kiriye. Tirba wî li Cizîrê di nav mizgefta bi navê wî de ye (Şeyh Said-i Merhum Camii). Xanima wî Meryemê piştî avabûna Komarê paşnavê Tüzün wergirtiye. Îro neviyên Se‘îdê Cizîrî li Cizîrê dijîn.

Se‘îdê Cizîrî, perwerdeya xwe ya ilmî ji mamê xwe wergirtiye. Mamê wî Muhemmed Beşîr alimekî heyama xwe bû ku di belgeyeke arşîva Osmanî de jî navê wî derbas dibe (bnr. BOA, DH.TMIK.M.. 42-35) û jê re “ulema-yi Cizre” tê gotin. Se‘îdê Cizîrî ji mamê xwe perwerdeyeke baş standiye; Erebî û Farsî hîn bûye ku di dîwana wî de bi van zimanan jî helbest hene. Dîsa dîwana wî ji aliyê naverokê ve pir dewlemend e; ayet û hedîs, dîroka pêxemberan, tesewif, kesên navdar hwd. Ev hemû zanîna wî û perwerdeya wî ya baş nîşan didin.

Se‘îdê Cizîrî, ehlê tesewifê ye. Ew, peyrevê terîqeta Neqşî-Xalidî ye. Ew li ser xewna xwe çûye heta Hewremanê, gundê Tewîle, û li wir bûye murîdê

Şah Elî Husameddîn (m. 1939). Piştî ku îcazet û xelîfetî jê wergirtiye bi xwe jî li Cizîrê sohbet kirine, xelk îrşad kiriye. Sohbetên xwe jî di kitêba *Muxtesaru's-Sulûk* de kom kirine.

Dîwana Wî

Se'îdê Cizîrî, li pey xwe dîwaneke muretteb, rengîn û bihecm hiştiye. Îro di destê me de du destxetên vê dîwanê hene. Di nusxeya Ayê de, ku destxeta kevin û tekkûz e, 237 Kurmancî, 5 Erebî, 3 Farsî helbest hene. Di nusxeya Byê de jî, destxeta nû û kêm e, 78 Kurmancî, 4 Erebî helbest hene. Li gorî edîsyon-krîtîka ku me di teza xwe de kiribû *Dîwan*a Şêxê Meczûb ji 246 helbestên Kurdî (3060 beyit, 73 bend ve yek mısraê azade) pêk tê. Li gorî vê *Dîwan*a Şêxê Meczûb, di nav dîwanên Kurdî yên di serdema Osmanî de ya herî bihecm e.

Di navenda *Dîwan*a Şêxê Meczûb de murşidê wî Şah Elî Husameddîn heye. Şah Husam, Şahê Hewrem, Hewremî ango navê murşîdê wî dehan caran di helbestan de derbas dibe. Di helbestan de yar, dilber, mehbûb her ew e. Şair, murşîdê xwe wekî xoşevîst qebûl kiriye û her pesnê wî daye, kerba dilê xwe beyan kiriye. Bo nimûne di beyta jêr de gazin dike ku ev du sal e wî murşîdê xwe nedîtiye:

Sur'et li min bûne du sal vê hicretê dil bûye mal
Rûreş bibin xane w di mal dîsa ketim hicra Husam

Di *Dîwan*a Şêxê Meczûb de herî zêde xezel hene. Wekî tê zanîn xezel helbesta eşqê ye. Mijara sereke ya helbestên Şêxê Meczûb jî eşq e, bi taybetî eşqa îlahî ye:

Canê **Se'îd** *neqda te bit rûhê 'ezîz nextê te bit*
Sed Xusrew û Şîrîn bibit sedqa serê zulfa zerîn

Dîsa bi teşeyên tercî'bend, qesîde û mesnewiyên kurt jî helbest hene. Herwiha wî ruba'iyek û misraê azadeyek jî nivîsiye. Em dikarin bibêjin ku *Dîwan*a Şêxê Meczûb hem ji aliyê hecm û ruxsarê ve hem ji aliyê naverokê ve pir dewlemend û hêjayî lêkolînê ye.

Helbestvaniya Wî

Se'îdê Cizîrî, di helbestê de peyrevê Melayê Cizîrî ye. Bandora Melayî di her helbesta wî de xuya dike. Wî ji gelek helbestên Melayî re nezîre jî nivîsîne: *Dîwan*a Mela bi beyta "Newaya mutribê çengê fîxan avête xerçengê/Were saqî heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê" dest pê dike. Ya Şêxê Meczûb jî bi "Newaya mutribê 'işqê li min xwende def û nayê/Ji fezla xwe were saqî bişurbê mey subihgahê". Mela, di helbesta xwe de behsa Şêxê Sen'anî dike û dibêje tiştên ku wî di riya eşqê de kirine ne xelet bûn. Şêxê Meczûb jî xwe dike şûna Şêxê Sen'anî de û dibêje "Mey nexwarî Se'dê Bohtanî ġelet/Em neçûyîn bo Tewîlanê ġelet". Tewîle, wekî me li jor got gundê murşîdê wî ye. Li gorî vê ew ji riya xwe ya tesewifê şaş nebûye û guh nedaye şermezariyên xelkê. Di navbeyna *Dîwan*a Mela û *Dîwan*a Şêxê Meczûb de hevparî û şibandinên wiha pir in. Loma em dikarin bibêjin ku xwendevanên Kurdî wê ji xwendina *Dîwan*a Şêxê Meczûb zewqeke edebî û te'ma *Dîwana* Melayî hilînin.



HAZA DÎWAN EŞ-ŞEYX MUHEMMED SE‘ÎD EL-CEZERIYY EL-MULEQQEB BI SEYFUDDÎN QUDDISE SIRRUH

Bismillahirrahmanirrahim

Newaya Mutribê ‘Işqê

Newaya mutribê ‘işqê li min xwende def û nayê
Ji fezla xwe were saqî bişurbê mey subihgahê
Heyat yara ji vî dil ra meya baqî ji dildara
Li min zêde evê ‘ezrê bidit badê ji rû w zulfê
Heyata min ruyê yarê binoşim mey ji ruxsarê
Ela ya eyyuhe’s-saqî edir ke’sen we nawilha

Ji ber ‘işqê bi çolanim di xûnê da pirî bînim
Ji qutbê Hewremî zanim ezê mecnûn li bo yaran
Bi vî rengî ġezelxwan î meger j’cama cihanbîn î
Ji Tirka Hewremî girtim seher Sîna çû sehharan
... ... mestim seher badexurê cam im
Ke ‘işq asan nimûd ewwel welî uftade muşkilha

J’teref tacê li min hate cihanbînek ji dildarî
Sehergahan dinoşim mey ji ruxsarê perî rûyan
Ji terka perde zer bîme şebîhê ‘aşiqê Mecnûn
Ew e Leyla li ba rindî bi bednamî şefeq **Se‘dî**
Ji husna esmerê dîn im muselsel xet di wê ...
Zi tabê ce‘dê muşkîneş çi xûn uftade der dilha

Ji vê mezre‘ çi iqrar e bi dengê ney sirr û raz e
Şikeste lengerê gerdûn niye binyad li der mezre‘
Ji efyûnî meger perwaz li rê peyda nihan amed
Çi efyûn bî li min peyda nema iqrar di ‘işqê da
Evîn û ‘işqê dildaran nebî mexfî şeb û rûzan
Ceres feryadi mîdared ke berbendîdi mehmilha

... ... me kir riswa ji teqdîr ... ...
Bi bednamî me kir bala ji ‘işqa Tirk û dildaran
Li der teqdîr ev e inşa di defter da nebî teġyîr
Di işqê de niye perwa ji riswayî li cem yaran
Bi deng û mudbirê perwaz ji fezlê Şahê Hewramî
Nihan key maned an razî k’ez û sazendi mehfilha

Ji payê xwe meke lengî ji destê xwe meke kotah
Bigîr yara ji şîr xûden ki dildarî ew e pîşah
Ji gerdûnê meke Behram bigîr camê ji Cemşîdî
Ji dildara bibî serma şikeste mulki Xusrew ah
Ji Leylayê dinoşim mey ji Şîrînê dixwûnim ey
Meta ma telqe men tehwa de‘i’d-dunya we ehmilha

Şukurdar im Ji Yari Xwe

Şukurdar im ji yari xwe kirim zabit di ‘işqê da
Di yumna da heye ‘ezrû di Hewrem ... da

Ji ‘işqa nazika Hewrem dixwim badê di tasê da
Ji zulfa ‘ezruwê’d şêrîn ketim çahek di ‘işqê da

Ji terka ‘ezruwê xwandim eya êsîr di badê da
Şukurdar im ji yari xwe kirim êsîr di ‘işqê da

Ji zulfê ‘enberê weş ke di nav cama me serxoşî
Te‘alellah ji van yaran letîf û nazik û rinda

J’terefê keç kulah rêke şirîna Tirkê Xurmalî
Suraha ‘enber û ezfer ez im îro di hicrê da

Were banî eya cana ji ‘eyn û rewzen û burca
Sehergahan di hev wer têm ji hicra nazika rinda

-Seher xwazim ji lutfê to bibim hemrah ji boyî to
Li min mesned tu yî îro tu yî îro di dewrê da

Ji mehda hilm û e‘zarê vekir rûyim di riswê da
Li min riswa de xweş anî ketim hubba şirîn bend[a]

Şirîna Farisî kirme di dama esmer û ġunça
We se‘yê min di deh sala ji hev rakir di şerqê da

Ji nazik esmera ġunçe me kir riswa cihanê da
Ez im riswa ji ehbaban li bo rûyê şirîn xenda

Di defter da ev e qismet bi bednamî bixûnin min
Ji zuhd û xodperest rest im şukurdar im di vê rê da

Ke xod xwanî niye pêşim cihangîr im di ‘işqê da
Ji ġemzê ‘ezruw û Hewrem dixwim badê di camê da

Li min mezre‘ niye derde ji ġeyrî şewq û dildara
Niye hîşim ji cergê xwe dixwim xûnê di ‘işqê da

Hebîba esmera Hewrem ‘ezîz girtim di camê da
Çi dildana ‘ezîz girtim ji lutf û surperî xenda

Sehergahan bi dem anî me kir muhbet li ber yaran
Te‘alellah çi durrdan in bi perwaz in di eslî da

Ji neqrê xod me suhbet kir di bezma ‘ezruw û Hewrem
Li der suhbet dixwim bade ji lutfê şahê şewqê da

Kemenda ‘ezruwê dîsa li dil da nûr e pur îsa
Ve Hewrem şahê Belqîsa kişandî dil di ‘işqê da

Du ker bûne dil û sîne were dîsa bitîbîne
Bi van xalan biîsîne ceger hûr bû di derbê da

Hicab û perdeya bavê nesîm lêda di wê gavê
Li xalên ‘enberî bavê ‘ebîr û ‘enberan rê da

Lebê le‘lî bi min xende rijandin jê şeker qende
Se‘îdê min biye rind e di nava şehr û şehrê da

Çi Meynoş im Di Weqtê Xwe

Çi meynoş im di weqtê xwe şukurdar im ku yarê da
Şukurxwaz im şeb û rûzan ez im medhûş di ‘işqê da

Ji bêhoşî nema xorde ji mexmûrî nema çalak
Li meyxanê çi meynoş im ji nav rindan me awaz da

Ji meyxanê çi xweş girtim kenar û koş û rewzanek
Subihgahan ji hoş çûme ji ber şurba di camê da

Şeraba sorxi pir noşim ji bapîrê meyê xorde
Subih hatin qemer-beççe peder got me *biya rinda*[3]

Qemer-beççe kezî sor in kulah şah in ela yara
Çi pîrek meyfiroş dîtim meya safî bi **Se‘dî** da

Te‘alellah çi bi çan in meyê noş in bi noşa noş
Meyê noşîn bi awazan qemer-beççan nihan goş da

Bi awazê ney û çengê meyê noşîn ji pir xoşî
Reqis da min evê ‘er‘er ji ‘işqa wê me sêgah da

Ji ‘işqa nazika ‘ezrê direqsînim sureyyana[n]
Kete reqsê zuhadê xişk ji awazê di **Se‘dî** da

Ji pîrê meyfiroş xwandim me ku esrarê meyxwaran
Çi pîrê wî de te‘lîm da ji wê dersê nihan pur da

Li kû ya meyfiroş dîtim hiyadê şurbê her gahan
Ji sermestan e’bûm riswa ji riswa’î me awaz da

Dilo Çendî Tu Bêrehm î

Dilo çendî tu bêrehm î te kuşt **Se'dî** di 'işqê da
Evînê rûyê mehbûban ceger sohtin di 'işqê da

Evînê zulfê dildaran biye ateş di cergê da
Mirinxwaz im ecel nîne hebîbxwaz im niye peyda

Hebîba şox û şengolê kebed kun kir di hicrê da
Eya hicrê bibî rû-reş te ez kirme di qeydê da

Evê qeydê dida ateş ser û payim disotînî
Heya dildar bike rehmê yekî carek di weslê da

Biye dozex evînê to biye ateş hecîrê to
Eger bînim cemalê to çi ye şaha di eslê da

Esîl esl î tu ey şoxê çi ye ikram li balê to
'Ereb ikram tu yî naz î keremdar î di eslê da

Kerîm î şeng û şengol î li ser textê bi ikram î
Kerem an est bidî weslê bikuj hicrê di çahê da

Di 'işqê da çu Mecnûn im di nezmê da nezimgîr im
Di halê da perîgîr im şebîhê to di ġerbê de

Di benda zulfê Perwîz im di behrê da ġezelxwan im
Ez im 'ebdal di bendê da esîr bûme di qeydê de

Esîrê zulfê Leyla me di benda rûyê şoxê me
Esîr bûme di ġerbê da şebîhê teyrê damê da

Ketim dama şirîn ġunçan xelas nînim muhal e ew
Çu ġunçê bû me bişkome ji 'işqê nazika rinda

Ji 'işqê nazika bîme wekî tûtî şekerxwarî
Ezel da min evî halet şukurxwaz im ku Barî da

Minnet Bi Min Da Saqiya

Minnet bi min da saqiya camek ji safa nabi da
Meylî ileyha ya Se'îd *min qebli xelqî yari da*

Yara şepala 'er'erî tillî ji mawerd û 'eqîq
Camek ji ba xod bo me da ew jî ji xemra safi da

Xemra zelal da min şirîn tîzeh şebîhê dozexîn
Dozex li nav û cergê da minnet dixwim lew yari da

Yara ji 'eynê kewkeban xemrê li ser dêmê geran
Her tayekî tabek dida mexmûr bûyin ku cur'e da

Cur'ek me xwar ez destê yar sergeşte în îro delal
Sergeşte în hetta ebed ez bûyi zulf û çeşmê da

Kakil kirin bendê belav 'aşiq ketin wê damê da
Dama ji rengê sosinê dem dem kirim vê ġerbê da

Hey hey dinoşim vê meyê weqtê bigîrin zulfê yar
Dem dem dixwim safa zelal weqtê dibînî camê da

Zulfa ji 'enber reşhe da şebhê bi şebh rewneq dida
Reşhe xuyan her cami da hey hey digîrin camê da

Hey hey dixûnî bejnê yar hetta bibînî cami da
Cama sedef ew yari da weqtê Elest berqê dida

Weqtê sehergaha ezel yek cam ji noşiş bo me da
Yara letîfa bê misal serxweş kirim b'yek cami da

Derket ji burca muşterî teşbîhê tayê ‘er‘erê
Noşî ji rûyê surperî wesfê ‘eqîq der cami da

Ew bî li burca muşterî qed ‘er‘erî dêm zuherî
Dîtim li wê pur muşterî min can ji ‘işqê tabi da

Yara ji balayê xeram teşbîhê tayê ‘er‘eran
Teşbîhê ba xerram dibî der nûr û şewqê cami da

Baġê di wî lê çîçek in her çîçekê nûrek didan
Nûra ji bejnê çîçekan şubhê meyê ez camê da

Serxoş kirîn zulfê di yar bend daye dil zulfê di yar
Benda di zulfan bû bihar wek çîçekê bişko dida

Ruxsar gul î bû ‘enber î bisk û girê zulfa şeh î
Ker kir kebed selwa seh î weqtê ketîn vê bendê da

Der suhbetê da şerbetê kişam zemîna sukretê
Dîtim sifatê qudretê j’vê şerbeta pur tabi da

Subha Elest ez kirme mest j’wê cameya dostê di dest
Da dest **Se‘îd**ê min di mest ew jî ji ‘işqa tabi da

Lew mestime narê ji min beyhoş kirim naçê ji min
‘Işqa ġedar tavête min terka şeraba nabi da

Bayê Nesîm Ji Yara

Bayê nesîm ji yara rakir niqab û bû da
Hewrem birîn sema'ê hişyar û mest û rinda

Ellah ji tayê 'er'er da min qedeh ji 'ezrû
'Ezrû li min diyar e saqî kirîn çu rinda

Saqî biya ji burcan pur kin qedeh ji yaran
Serxoş biçîn sema'ê Hewrem kirim çu rinda

Sed perridîn[4] ji badê bade me noş ji yarê
Saqî li min heyat e şîrîn kirîn çu rinda

Şîrîn tu yî me Ferhad Leyla ew e me Mecnûn
Hewrem li min çi şah e serxoş kirîn li qenda

Îro li min dereng e saqî were çu Hewrem
Sebrê Eyyûb me nîne şîrîn bide me rinda

Gerçî sebir şirîn e pê ra heye çi te'cîl
'Umrê *diraz*[5] me nîne bade bide me rinda

Zahid ji min here paş serxoş ez im ji yara
Cama Cemî me girte Behram niye **Se'îda**

Mezre' li min hesad e das hate nav ji yara
Xurma li ber nexîl e payim çu leng di xenda

Mezre‘ hesad e das e ‘umrê diraz fena ye
Badexur im ji mezre‘ das nagirit ji rinda

Tirka ji rûyi mezre‘ mey daye min ji enzel
Qismet li min surah e saqî kirîn reqis da

Hewrem şebîhi nergîz saġer dihe ji sosin
Sosin dihate baġan şîrîn neket di dam da

Damek me girt li ‘enqa dam hate çîn ji ‘enqa
Dama şebîhi zerkeş girte j’murad û seyda

Seyyad li baġê nêrgiz em jî li baġê nêrgiz
Nêrgiz kulah e ihram lewra ketin di dam da

Seyyadê baġê şîrîn ez dam di dama şîrîn
Şîrîn kirivte damê nêrgiz şirîn e qenda

Gewherê ‘Işq Çun Zîbeq e

Gewherê ‘işq çun zîbeq e yara çendî me di xef kir fir daye sema da
Fir da ji me yara çendî me di xef kir şehde ji me yara awazi me rinda

Çendî me nihan kir ‘işq û evînim xweş ji me yara awazê newa da
Awaz me nihan kir dil hate bi awaz ev sûreti ‘işq ewwel ku şefeq da

‘Işqa we şirînan hem abi ‘uyûnan hatin ji me yara b’enwa‘ û bi etwar
Enwa‘ ji hewayî çun çîçekê enwa‘ bergîre bi enwa‘ û b’anan û bi enda

Anayi hewayê zêde li me xoş bî dem dem me nihan kir rakir ji me awaz
Awazi evînê etwarê ġerîb in xef hate ji çengê perde di newa da

Çenga me şepalê mûyek di zirav bî saqî li me hat disûst çenga hate fiġanan
Dem dem me guhorî awazê ‘iraqî vê şoxa ‘iraqî mey daye **Se‘îda**

Ev şox û şepala di ‘iraqî leb surxî şerabî ji hewayî
Perwazi evînê fir daye bi etwar etwar ji me hatin çi neqda

Axir li me hatî itmami newaya riswa di evînê der hikmeti yara
Hey hey tu dibûsî ruxsarê şepalan û kes serxoş e çun tu lew hate di kes da

Ji Çehrê Duxtera Zerpoş

Ji çehrê duxtera zerpoş ez im mexmûr di ‘işqê da
Ji xemra rû **Se‘îd** mest e me dil ker bû di ‘işqê da

Du zulfê şirîna duxter me dî ‘enber weşand îro
Ji bûya wê me cam mest e me dil xan e di ‘işqê da

Di benda zulfê çewganî me cewlan kir di meyxanê
Li dor zulfê perî mest in belê şad im di ‘işqê da

Me dil mexmûrê cananê were saqî ji meyxanê
Were saqî ji butxanê me dil hinda di ‘işqê da

Ji derbê ‘işqê mestan im wekû Ferhad bi çolan im
Ku mutrib ku bidit sazê bibim reqqas di ‘işqê da

Bi fetwayê dixwim badê me fetwa da Şehê Xurmal
Ku fetwa da ji çim Şafi‘ me dil rind e di ‘işqê da

Bi fetwayê ney û çengê dibêm îro li meyxanê
Li ser qewlê Şehê mestan dibim secde di ‘işqê da

Bi dengê nay û vê çengê me dil avête vê çengê
Nexware min mey û bengê direqsim ez di ‘işqê da

Seher ‘arif di meyxanê dibir secde ji xalê ra
Kesê bêjî nebe secde niye mezheb di ‘işqê da

Seher ‘arif wedû beste bi bada rû we bir secde
Be eşkî xod nemaz kerde me dil tûr e di ‘işqê da

Ji zulfê ra tewaf kerdem nedim yarê bi Firdewsê
Kesê Yûsif *firûxt*[6] yara ew e kafir di ‘işqê da

Şukurdar im ji vê yarê nihan daye mey û nayê
Şeker barî ji le‘lê wê me can sûze di ‘işqê da

Li Min Murşid Di ‘Işqê Da

Li min murşid di ‘işqê da hewalet kir di badê da
Se‘îdî yarê Leylayê nihan xef bû di şewqê da

Ji ‘eksa rûyê Cemşîdî me dî Leyla di keşfê da
Qeran kû bûn du zulfê ew wiha zar im di bendê da

Di benda zulfê çewgan im sebahu’l-xeyri ya xanim[7]
Sebahu’l-xeyri Leyla min ez im medhûş di ‘işqê da

Ji ‘eksa zulfê Cemşîdî me dî saqî şerab anî
Qedeh pur bî ji vê badê kirim serxoş di ‘işqê da

Heyîva rûyê Cemşîdî li min xef bû di camê da
Li ‘eksa rû ez im ‘aşiq ceger sohtim di hicrê da

Dihî kevte nihan yarê bixo badê [ji] vê zulfê
Heya zahid biçî dîde li nava qehr û zecrê da

Me tali‘ bû ji vî bextî ez im Asif li vî textî
Dirextê Tûr me bî rextî me dî Belqîs di keşfê da

Di keşfê da ‘eyan bînim ruwê Belqîs bi Hudhud ve
Xeberdar e ji Belqîsê di nava nûr û şewqê da

Gelo carek bibînim ez çiraġê wesletê rabit
Firaqê rû nebin rewşen bisûzim ez di şem‘ê da

Firaqê rû bibin rûreş kirim êsîr di hicrê da
Li min winda şehê xûban disûzim ez di hicrê da

Gelo saqî bi xêr bêtin binoşim mey ji destê wî
Li min rewşen nebin dîde di nava şem'ê weslê da

Merîxa dûn ji min kîn e kirim mexfî ji mehbûbê
Wekî meslûbiyan kirme di nava bend û hebsê da

Zemîna dûn bi kîn hate ji mehbûb dûr kirim îro
Wekî findê disûzim ez di nava hicr û bu'dê da

Direqsim ez ji serxoşî revand 'eqlî ewî hoşî
Ev e bedra neqaposî çi xoş govend di reqsê da

Heyîv û şems e ew dîsa dil û ceger ji wê îsa
Ne vî rengî ku Belqîsa me xûn xware di 'işqê da

Me dil heyy bî ji wê horî **Ġeramî** dil te wek tûrê
Se'îd tûr î eger nûr î tu riswa yî di 'işqê da

Saqî Ji Rengê Mahê Nû

Saqî ji rengê mahê nû hey hey didî hubba şeha
Hubba ji biska surperî rihtin dilî ji destê şeha

Hubba di Leylê er xorîn ger tê biçît canê Şirîn
Teşbîhê Ferhad her em în ġemzê di wan tîrê şeha

Bilbil li wî baġî dixwend medhê şepala leb ji qend
Dem dem dikîn medhê bi xend mexmûr e dil j'nûra şeha

Tirka ji dil xûnrîz kirim medhûşê 'işqa enwer im
Ger bê ceger ba sîne dil medhê dikeyn ber şehnişa

Pêşim ji dil er butperest mehbûb li min ṣa nebit
Şehbazi şahê tûtiyan mey rihte dil j'va 'er'era

Her şeb dikim feryadires Hewrem tenê destê me purs
Destgîr li min ev ṣahibaz lewma me girt rû esmera

Ey bavike er gîsuwan teşbîhê çengê tawusan
Da yar bibî wek ṣahibaz rabe were ya Hewrema

Saqî were der suhbetê weqtê şehî têtin sema
Vêra ez im der butgedê mutrib bide sêgah weha

Pîrê 'ezîz mey daye dil j'weqtê ezel hetta ecel
Hey hey em în mexmûrê dil hetta rûhem derkev bila

Minnet me dî Leyla me dî rû bî qemer ebrû keman
Husna di wê dagirte cam saqî *biyar*[8] le'la meya

Minnet me dî yara mecerr xerram dibî weqtê seher
Lê ket nisab weqtê seher minnet ez im nûra şeha

Min yar heye beyza ye yed tûrek me dî hetta ebed
Imkan niye ixbar meded ew surperî ʻÎsa beha

Ehya dikit van murdeyan can û cesed b'yek ġemzeyan
Ger murdeyê sedsaleyan dê heyy bikit b'yek camê ra

Ehya dikê qelbê medî ew jî heyata sermedî
Min dî ji wê yek sermedî ser bî ji bada camê ra

Şuʻlek ji rux bo min meşam ʻeksek ji wê kevte di cam
Zerkeş dibî qelb û mudam biska diraz teyrê Huma

Zulfa diraz kirye belav toq ġebġebê girtî xunav
Innî ġerîbun ya Husam isnaʻ bina ma metleba

Ber gerdenê bûbû belav xal û xetê şebnem li nav
Aba heyat xef çû me nav Leyla hebî mexmûr hema

Îro **Seʻîd** çû suhbetê şemsa di nîva hezretê
Selva cuwan dam xelwetê em ʻaşiqê wesla şeha

Meryem perî ġa'ib ji dil yek ġemzeyek daye di dil
Birhên keman wê dane mil dil daye min ber pence ra

Pence kişandin dil **Seʻîd** dûrederaz û pur beʻîd
Bînî ji dil weslek cedîd em ma şerab û camê ra

Camek ji nûra sermedî da dest **Ġeramî** x[we] didî
Îro **Seʻîd** çendî didî remza rijandî camê ra

Îro Ji Dil Ateş Rija

Îro ji dil ateş rija van dilbera firqet kira
Firqet dihat teşbîhê av ateş li dil ey dêm dura

Ev lewliyên şengol û şeng eswed pur in ‘ezra rux in
Ruxsar şebîhê kewkeb in gerden pur in ev dilbera

Gerden dirêj in dêm dur in wek tawusan b’zulf û per in
Wek tûtiyan şekkerxur in hudhud zeban û dêm dura

Ey ba yemîn benda hilîn poşa revîn j’dêmê zerîn
Poşî didin çîçek zerîn damê li va tayê durra

Yara ji rengê sorgulê maye di burca sunbulê
Benda rûya cama Cemî saqî tu yî sîm û zera

Lutfê bike ya Hewremî bendê bibe j’rûyê zerî
Biska belav ke l’ber ruxî zulfa herîr nû enwera

Şu‘lek ji ruxsarê ewî bêxe di camê ey şehî
Cam sade ye j’hicra di wî bilbil tu yî l’baġ û dera

Xumma Felatûn bîne ba yek şemme’ê bîne bi ma
Perwane im bo yari ma perwaz ji min ew bayê ma

Ev dilber în rengîn û zer poşî zer in ‘enber kemer
Bilbil li wan bayê seba ey ba biyar weqtê xuya

Weqtê ketin reqs û sema şemmek ji wan bîne w biya
Lew sohtime j'hicra ewa ey ba biya çengî bi ma

Tirka şirîn û pur nigar şubhê Şirîn b'neqş û nigar
Xal û xetên Tirka nigar pur kir belav b'subh û sema

Mader sedef bû ew şirîn perda rûya Cibrîl hilan
Avête dil miskê gulan hewza ji Kewser bo me ma

Turra Suleyman hew te da husna Şirîn şemmek te da
Turra zera ber rûyi da şubhê herîr çû bî sema

Ez bûyi turra çîne çîn ey ba seba hilne werîn
Rake ji wî miska reşîn biska girah bîne bi ma

Ketme di dama zulfikan ledġexur im ez ebruwan
Rake nesîm benda perran Bohta 'eceb negrin ji ma

Ez bûya ce'da çîn **Se'îd** dûr û diraz û pur be'îd
Yaqûtuha sor û cedîd hicretkeş im ey şahê ma

Saqî Weşîn Der Cami Ma

Saqî weşîn der cami ma biska mu'enber yari ma
Derkev ji baġê çîçekan dêmê mehî bîne bi ma

'Eksa ruxê mehweş perî bîne muqabil wek şehî
Zulfa mu'enber pur girê weş ke ji wê miskî bi ma

Zendê sipî sor sor tilî pur kî li vî bîne belî
Zeqna ji sihrê pur weşî sehhar bibî wek canê ma

Cihanek mey wê daye min destê me girt û birye min
Hişyar di mest diçûne min xoş raher e ev cani ma

Cama meyê pur kin ji rux sed merhelan pê seyr bikîn
Seyrek biçîn ber asiman rehber j'me re er şahê ma

Vî rehberî sihrek heye çun 'Îseyî pervaz heye
Min beççe im bû w sî[9] heye sihrek me girt ez babê ma

Lew mawer e le'l û leb e derdê **Se'îd** ew ġebġeb e
Min dî **Ġeramî** leb leb e ġunçe diha yî canê ma

Wê dilberê herdem dixwand sebrê bikin canê peder
Çend şefqet e weqtê dixwand guft û digot ey canê ma

Çendî dikim te'dîl li wî behr û beran her bihtir e
Illa Xuda daned **Se'îd** lutfa şehî ber canê ma

Teşbîhê tûtî her digot *is'ad me'î*[10] ber asiman
Hafiz Xuda bî ey cuwan rûhê min û ew canê ma

Rûhê min û nûra min [û] her bî feda canê min û
Dê kîn feda rûhê min û her bo ji xalê yarê ma

Nûra di ‘alem da j’te ye canê min û canê te ye
Cama meyê j’cama te ye ev remzeyek kevte bi ma

Rûz î ji bo xelqan tu dî ev nukteya mesrûr me dî
Min dî ji wî sirr-weş me dî destê min û destê Xuda

Her çî me gotî her we ye nûnek muxalif tê neye
Haza’n-nutiq[11] nîne j'hewa munkir bir û ez yarê ma

Der mentiqim nîne xilaf her çî me gotî bê xilaf
Der defterim cuz mey ne xam medhê dikîn ber yarê ma

Leb ġunçeyan jêkve fişan sed merheba şahê butan
Şeyda li te ev **Se‘diyan** ‘eksa rûya bîne bi ma

Defter biye alûde mey wek sahibiş mexmûrê mey
Minnet ji yarê ya **Se‘îd** alûde’ê bada şuma

Dîsa Ji Derba Firqetê

Dîsa ji derba firqetê dil bû birîn j'zulfê şuma
Şeşber ji nû ateş didan dil bû hezîn j'hicra şuma

Dil reft û çû ey surşirîn kengî bidî remza evîn
Xatir dibî ey hori'în can ber leb e j'işqa şuma

Rux tiste'ê baġê gulê me j'hicretê dil pir ji tê
Co co rewan xûn û rewan *maza teqûl*[12] şahê şuma

Ka saqiyê gerden ji 'ac da gêrr bikî cama zucac
Da bête dil dîsa mîzac rûh ber leb e ey canê ma

Rûh û rewan wî hate der ji hicreta biskên di qer
Hem bedr e rû zulfên di zer ez kuştiyê vê yari ma

Kuştîne em lê her seher wê dane dil tîr û teber
Bisk mawer e dê bête der dil bû kebab ey yari ma

Wer muġbeçe kasê bide em 'aşiqê rûyê te ne
Me'dvê[13] perî ya surperî suhbet bi çay û rû şuma

Îro ji nû vî şahidî mey rêhte [wê] kasa rûhî
Hoş çû ji remza surperî têm suhbeta şahê şuma

Suhbet bi çay û mey divêt remza evîn her min divêt
Suhbet bi çay û cam divêt ez perwerê şahê şuma

Rûh û rewanê min cuwan ez kuştiyê wesla cuwan
Ya ser bidîn ya weslê can Ferhad ez im Şîrîn şuma

Suhbet bi zulf û xal divêt cama muresse' min divêt
Şahid bi mestî ma divêt ez sohtiyê husna şuma

Suhbet bi yar û mey divê saqî bi çeng û ney divê
‘Aşiq ji xala ew divê îro **Se‘îd** tûlê şuma

‘Eynî turî min fedlekum[14] cama meyê *min hebbekum*[15]
Weslet divê *fî ‘işqekum*[16] subhan ji husna bo şuma

Etwari ‘işqa dilberan rindê şerab û esmeran
Nakit wefa halim ‘eyan canê min û canê şuma

Etwar û halê meyperest dê kî bikit îro durust
Pur dûru bû rû lê dibest mihnet keşînim yari ma

Rencîde kir miskîn feqîr Teymûr û dêwê pur heqîr
Dêwê minafiq pur xebîs rencîde kir weldê şuma

Nûra cemala lemyezel kevte dilî j’weqtê ezel
Reşk û hesed zahid xelel em ‘aşiqê şahê şuma

Îro Ji Nû Pur Ateş im

Îro ji nû pur ateş im ez sohtiyê şewqa şuma
Şîşê firaq û sohtinê dê em xorîn j'işqa şuma

Se'dî li şahî 'aşiq e Ferhad di 'işqa muġbeçe
Bûya ji zulfa muġbeçe tîr dane ma j'hicra şuma

Îro ji dengê hatifan sirr hatine nava dilan
Der mezhebê van serxweşan secde fereh bû bo şuma

Dîsa dikim teb'î cuwan wesla hebîb û Yûsifan
Pîrahenê Yûsif nihan anî j'me re şahê şuma

Noşîn meyê b'remza qudis hellal dikîn şurba meyê
Der şer' û dîn û mezhebê bade xuş e j'rûyê şuma

Îro seher 'arif girift tewbe bi ma' û bade'ê
Dîsa tehûr û tahir e der mezhebê pîrê şuma

Wer meyfiroş camê bide meyze ev e qelbê me ye
Qewlê qedîm da fetwe ye der neġmeya çenga şuma

Bo çî dikîn şurba meye hurmet xebîs û pur neye
Esfatir e j'nanê weqif muftî bi ma şahê şuma

Ger fehm dikî qewlê neyê bo çî dikîn hurmet meyê
Der çar mezheba fetwe ye suhbet bi bada rû şuma

Ya rebb 'eceb j'maha felek zulfê di xwe kirne helek
Mehpare bû şemsa felek canê min û canê şuma

Carek nihan got û şirîn medhê bikin der nêrgizîn
Hikmet ji cama zerkeşîn destê min û destê şuma

Ya rebb ji husna ‘ezruwî mey hatiye rûh û serî
Murşid di ‘işqê ew perî rûh ber leb e ji hicra şuma

Rinda emîr û begleran eslan ew e beyz û seran
Zulf esmer in xalê siyah subhan ji Xellaqê şuma

Ger rind û mîr û begler im eslanê baġê ‘enber im
Her sohtiyê vê dilber im subhan ji qedda yari ma

Rastî ji zahid ra şepal dê em xurîn xemra helal
Ey ba seba hilne w vemal zulfa ji ser dêmê şuma

Rastî **Ġeramî** ‘aşiq e wek min **Se‘îd**î Wamiq e
Remza dibî we natiq e lew mest e ew j’vê yari ma

Qamet bi mislî ‘er‘erê mest im ji husna dêm durê
Mest im ji leb xendê şehî em ‘aşiqê bejna şuma

Şah daye min camek durust lewma ji hoşî ney durust
Lê qetreyek j’bada Elest tê wer kir û vê yari ma

Şebnem ji xalan bûne rav ‘enber li zulfan bûne av
Îro **Se‘îd** j‘işqa şepal hat û digot canê şuma

Bayê Muxalif Bê Perr in

Bayê muxalif bê perr in da'im emanet salika
Bê murşid û bê nûrê 'eyn rahê nezan ey salika

Murşid di 'işqê ez kirim hewwal di bada xum 'eqîq
Saqî bi nûra bade'ê serxoş kirîn em salika

Ger badexûr pirsin ji min ez bê xeber teqdîr çi kim
Sed kilk û nûkim ey 'ezîz şemmek nebê ey salika

Salik di 'işqê ez dibêm hewce niye der 'işqê yar
Cama meyê der destê ma ser da'ima çim salika

Ber subhê Lest ez bûme mest min dî di mest cama di dest
Çerxa felek nuhte durist em jî di 'işqa salika

Salik di 'işqê bê perr in lê ez tenê j'weqtê ezel
Meynoş kirim şahê di mest murşid ez im ey salika

Lami' ji 'işqim her hebû j'weqtê ezel baqî hebû
Hubb û evîn min pur hebû şêxê cuwan em salika

Lami' ji 'işqim pur hebû weqtê felek me'dûm dibû
Em salikê rahê heqîq sirr ma mecaz ez salika

Îro mecaz ew qenter e narê kelîm l'nava dil e
Dil bû pelek j'remza me ye der muhbetê em salika

Seyr û sulûka wesletê qet kes diye bê muhbetê
Keşfa sifata wê butê bê hubb nebî ey salika

Salik binoş cama meyê em 'aşiqê nûra meyê
Dîtim mesa'ib j'vê meyê şubhê şebê zab salika

Sa'et ji 'işqê yek meh in tîrê evîn dil da nehin
Murşid di 'işqê în **Se'îd** der muhbetê ew salika

Ne Tenê Sîne Bi Ker Hat

Ne tenê sîne bi ker hat me ji ber derb û cefa
Tîr xweş bar û rewan in dibihin xûnê lefa

Me meded bo me ji Rûhu'l-qudus în
Hem heqîqet meded û nûr û lefa

Teberan têne ceger me ji zulifê di şirîn
Me hedef kirye ceger em bi ġerîbî bi cefa

Me ji zulfê di siyeh reştir e tali' me şirîn
Ku sehergeh bi meşî bêt û biret remzi lefa

Me ji zulfê di siyeh hem dibihim remz û siran
Nameya derd û ġem bo me nesîb hem bi cefa

Perdeya dêmê şirînê tu hilîn badi seba
Da li min xef bibitin şefeqa mihr û meha

Tu biro badê seba ġulġuleyê dil tu medar
Da reqîban negirin toz û ġubarê di lefa

Saqî saqî beraqî dirijand bade beraq
Me ji nû serxweş e dildar û dihî tîri lefa

Xûbî[17] û naz û husn bi te hatin çi 'ecîb
Şefeqa roj û mehê bûye siyah û nema

Ê tivê[18] bade binoş were hemrah bi me ra be
Şerbeta dêmê gulê bo te şife leyl û şeva

Me seher bûye helal cama Cemî da me Şirîn
Hemdê bêhedd dibihim bo te Şirîn roj û şeva

Seherê tête Xizir em dibirin çeşmê heyat
Xizrê meynoşê seʻadet em didî roj û şeva

Şahê şirîn dihenan û ez kirim bo ʻişqê esîr
Lew seher bo me celab û hem beyaz û bi newa

Em ji ʻunsur gerihan rindê şerab û bi fiġan
Lew duʻalî me **Seʻîda** me rewan bûye cefa

Dîsa Li Min Ateş Rija

Dîsa li min ateş rija her bo ji hicra va dila
Va dilbera mey rihte dil ateş didana nav dila

Ateş didan j'hicr û newa teşbîhê xarê ġunçeya
Ġunçe leban rûne xunav surx bazû in j'xûna dila

Riştin ji min bazû ji 'ac b'xûna dilî nadin mizac
Ġemzê di wan keyber-weş in hicr û newa dane dila

Vê hicretê xeyme vedan ber qelb û cergê serxweşan
Serxweş ketîn xumxaneyan ateş giha nava dila

Vê hicretê ez puxtime yekser ji dil xûn riştime
Bê qelb û dil pur hiştime din ġemzeyan nava dila

Mujgîn pur in çav cadû in 'işqê didin b'ġemz û sirr in
Sihrê dikin tîr ebrû in şubhê Felatûn bo dila

Her yek ji wan sihrê dikin b'goş ebrû û bendê lefan
Yekser kirîn van lûleyan bê 'eql û hoşê bê dila

Perde zer in helqe reş in dam tê hene çendî reş in
Zulfê di xwe çîn çîn kirin tavin[19] dila nûra dila

Goya felek gerdan ewan teşbîhê goya kodekan
Sergeşte în j'işqa ewan remz hatiye nava dila

Çeşm ahû in re'na muj in 'aşiq-kuj in b'şîr û perr in
B'zulf û lefa xûn rîz kirin ateş kete nava dila

Mest în ji bada zulfikan hem çu **Se'îd** mestî nedan
Çendî dikin sihrê bi wan 'erş û sema hatin dila

Dêm esmera reş 'enbera kirne niqab û exzera
Bayê seba rake j'me ra perda li rû wê esmera

Hilne seher van çenbera da bête jê misk ezfera
Sebrek nema j'hicra pera tîr dane dil van esmera

Ahên **Se'îd** kirne gelek wî teyy dikin her neh felek
Lewma **Ġeramî** bû helek j'van ġemze û remz esmera

Ez Kû Me Rind û Meyxur im

Ez kû me rind û meyxur im derdîkeş em der camê ra
Kî dê hesêb kim ‘alemê der menzerê min çeşmê ra

Yek cam bû me kêşa der ezel mest im ji wê ta heşrê ra
Dilber ku bînim carekê dê jê bixwazim camê ra

Min j[ê] bixwazim ev murad ew b[ê] hicab min ev murad
Min ser li rê da daniye yan dê biçit yan weslê ra

Min rê ji ‘işqê xoş bire lew meyxur im min camê ra
Riswa kirîne ‘alem e her wek **Ġeramî Se‘di** ra

Min dil kire der ‘işqê yar lew rinde ye ev qelbê min
Her çî bivêtin zendegî *la-budd*[20] binoşit camê ra

Ev dil me murde heyy kire ew jî ji ‘işqa şehper e
Min şuhreta sofî nevê cezba derew d’rengê w[î] ra

Zahid kî şuhret da qebûl ‘Îsa me rindan mîkuned
Bû karesaz û hîlesaz îjmare subhe dani ra

Salûs û pur mek[k]ar e ew van baz û le‘ban mîkuned
Min bû suruşt ev bade ‘işq lew min ġezel kir karî ra

Der menzerê xode bînyan karem nekare erçimend
Herkes ji xakê bî suruşt min bade bî wan zuhdi ra

Sed Merheba Ya Mustefa

Sed merheba ya Mustefa gorî bibim xal û xeta
Canim fida zulfa du ta bavêj niqab j'xal û xeta

Mehpareê bavêj hicab dil mecmera zulfa gulab
Wê çenberê kirme kebab em kuştiyê zulfên du ta

Vê şahidê dil kir kebab îro seba bo min hinar
Bûya gula mec'ûd gulab sed merheba ber tu feta

Îro feta hat û xeram subhan ji bejna pur temam
Le'lê di wî da qendi Şam çîçek kirin ber qameta

Şox qametê rû hametê kengî bidî xal û xetê
Sûnd bo te ye şîrîn butê mexzê bikim şewqa buta

Raza evîn û 'işqehê nakit wefa kilka meyê
Şukrê Xudê em meyxurê em dîn bibîn l'rûyê buta

Bo min were baġê gulan da ez bidim zulfa w ruxan
Jê rîz bikim dama dilan pîşê **Se'îd** 'işqa buta

Sûndê dixwim bo zahidî ez 'abidê rûyê zerî
Ma ez tenê riswa heme riswa li van xal û xeta

Rabe were horî weşê xalê di qer miskê weşê
Hel min mezîd min şewqihum subhan ji husna qameta

Mexmûr qeba yara şepal dîtim li tu yek dal û xat
Co co rijan alam û hal xwezya ji burcê derketa

Hat der ji burca sinbilê mizraq rijan ber vî dilî
Ey dil bigo halê dilî belkî werê şox qameta

Vê qametê buryand kebed husna ruxa nûra semed
Pençe birin hetta ebed tîrê şeha şox qameta

Qewsê hilal dil jê revand vê dilberê ‘aşiq teband
Derba li nêva dil pijand xwezya ji perdê derketa

Ma xef dibî remza meyê wek zîbeq e nûra meyê
Çend xef bikim fewrek ku tê ma xef dibî şewqa buta

Billah bibî ew ya feta ev tu derî ya enwerî
Rûhu’l-qudus ev surperî qurban bibim biska du ta

Sed merheba ya Mustefa derdê **Ġeramî** kî wefa
Rakî niqab j’biska du ta sohtî dilîn j’xal û xeta

Mestan Binoşan Rindê Ma

Mestan binoşan rindê ma serxoş li zulfan canê ma
Yehkî ‘uqûda kewkeba ev ġebġeba dildarê ma

Xwezya li toqa ġebġebê bo min bida roj û şebê
Kakul reşa şubhê şebê rûh l’ber leb e ey cani ma

Ev horiya ġebġeb perî derket ji burca ‘eqrebê
Husna ruxa bû leb lebî *maza teqûlî yari ma*[21]

Vê name’ê dê bidme dest belkî bibê ey butperest
Hel bi’l-hewa[22] ey rindê mest rûh bî fida ey canê ma

Dil mecmerê zulfa gulê em ‘aşiqê bûya gulê
Ya rebb çi ye bejna gulê can bû ‘elîl der ‘işqê ma

Wê kakilê zîber weşand vê ġebġebê ‘enber weşand
Meş kewkebê remzek rijand *fî hubbikum*[23] riswa bi ma

Wer meyxur î îro **Se‘îd** cewrê bixwe reştir hedîd
Lewla’l-hewa ya Seyfidîn ma ecre’d-dumû‘e ‘eyni ma[24]

Lewla’l-hewa ya mutlifî ma kane ‘aşiq muslifî[25]
Cana bi kû *ya munsifî* insaf ji sûza qelbi ma

Suhbet me girt b’Leyla cuwan wan saqiyan saġer geran
Suhbet bi Leylê min heban ez kuştiyê Leyla xwe ma

Lewla’l-hewa ya Mustefa hel kane ‘aşiq Mustefa
‘Eyne’l-tera ‘eyne’s-sefa hel min mezîd min şewqima[26]

Îro **Se‘îd** xweş ‘aşiq e her wek **Ġeramî** Wamiq e
Der ‘işqê yar çend natiq e ahên me çûne ber sema

Eger De‘way Ebûbekrî

Eger de‘way Ebûbekrî bikim sa’iğ di şewqê da
Se‘îd da’im tecella ye di nav wê nûr û şewqê da

Bide saqî meyê baqî li ‘işqê ma tu tiryaq î
Bi van zulfê te badayî esîr bûme di şewqê da

Esîrê rûyê şoxê me wekû Ferhad di çolê me
Çu Mecnûnî di kerbê me di benda rûyê Leylê da

Sebahu’l-xeyri Leyla min şeb û rojan bi efğan im
Were canim bi awaz im di nava hicr û firqê da

Gelo îro çi siltan im di ‘işqa van perî rûyan
Di hev wer tim çu perwanê ji ber narê di ‘işqê da

Di ‘işqê da çi çawûş im şebîhê rindê ‘Usman î
Yeqîn ez Asif im îro ji ber şewqa di weslê da

Disozim ez ji hicranê şebîhê find û perwanê
Bike rehmê tu Hewramî bike rehmê di hicrê da

Ez im perwan li van yaran disûzem ez ji ‘inwanê
Ji dengê saz û tenbûran direqsim ez di vê rê da

Were Leyla ji wê burcê disûzim ez di vê rê da
Bi van zulfê te hûnayî ez im meczûb di weqtê da

Ji lewmê saqiya bûme çi riswayî di ‘işqê da
Ne tenha ez hewadar im li rûyê şengê şewqê da

Di benda rûyi re‘nayî geram îro bi riswayî
‘Elamet bûme erzanî di nava ‘işq û şewqê da

Ji firqa Şahê Hewramî dixûnin min bi bednamî
Bi bednamî şehir bûme ‘Elî darim di vê rê da

Qafiya B - ب

Saqî Hilîn Perda Rûya

Saqî hilîn perda rûya perda reşa zerrîn qeseb
Şu'la rûya da em bibîn carek hilîn perda qeseb

Perda semîn er goşe zer ruxsar ji wê ew bû qemer
Derda diçînim her şerer saqî bibe perda qeseb

Perda qeseb helqe sih in benda rûya sed sosin in
Ew bejn û bala sosin in zulfê siyah bû rûz û şeb

Rûz û şeban nakîn qerar ey ba hilîn benda qemer
Benda li me her hicret e saqî hilîn benda qeseb

Nar û şuhub ker kir kebed îro şuhub nûra semed
Mihnet berîn *eyne'l-meded* yara hilîn benda qeseb

Benda qeseb b'zulf û per e lef jî ji rengê 'enber e
'Enber reş e xemrî ker e derdê li min benda qeseb

Derdê ji rûyê esmeran her tê ji destê enweran
Ey ba hilîn zulf û lefan benda li ser rûyê qeseb

Lef jî ji tayê 'er'erî bala dibî wek nêrgizî
Xerram dibî j'nûr û sirê xurrem j'me re her rûz û şeb

Rûz û şeban mexmûr û mest ka nêrgiza şehla û mest
Şehla perî gîso girê ker ke lefan her rûz û şeb

Ker ke şepalê nazikê benda li ruxsarê mehê
Ruxsar perî gerden durrê weş ke 'ebîrê rûz û şeb

Şev tariyan çîn ke lefan eslan û cotê zulfikan
Eslan û cotê şehiyan şe[h] ke ewan her rûz û şeb

Şeh ke du tayê ‘enberî misk û gulabê lê weşî
Reşîn li ser dêmê perî bavêj niqab her rûz û şeb

Bûya gulab û mawerê têtin ji nêv biska ewê
Zeqna xunav lê hate rav şubhê gulê her rûz û şeb

Roj û şebê xordem bela şoxê bibe dûd û bela
Dûdê ji narê pur bela zehmet dihe her rûz û şeb

Şoxa şebîhê nêrgizê kuştim bi zulf û enwerê
Çîn ke ji wê wer mawerê miskê weşîn her rûz û şeb

Çîn çîn kirin zulfê wêran avête dil hem xenceran
Xencer di dest xummar û mest tavê dilî her rûz û şeb

Xencer kişand vê esmerê ker kir kebed vê dilberê
Keyber pur in le‘l û durrê hêjî diçin her rûz û şeb

Hey hey didit min xenceran şubhê belayê asiman
Êşa ewan keftin dilan neşter xurê her rûz û şeb

Ġemzek rijand ba neşteran neşter birin ba keyberan
Êşa di wan bûne ‘eyan mehcûr ez im her rûz û şeb

Da’im ez im hicretkeş im lew da’ima mihnetkeş im
‘Işqa ġedar pur pê xweş im firqetkeş im her rûz û şeb

‘Işq û evîna dilberan narê kelîm û dojehan
Narê firaqa dêm duran sohtin kebed her rûz û şeb

Îro **Se‘îd** j’hicra cedîd rûz û şebê da’im wehîd
Nûra cemala ew mecîd kevte dilî her rûz û şeb

Sa‘et li min têk bûne sal dil bendê yara pur şepal
Mihnetkeş în bê qîl û qal e*yne’l-meded* Şahê ‘Ereb

Kuştîne em vê dilberê dîsa seba da çenberê
‘Enber weşandî turre rê daye dilî Şahê ‘Ereb

Rimbaz e şahê dilberan dîsa werîn ser defteran
Xûn dilbirî çendî keran dil birye min Şahê ‘Ereb

Kengî Bibarî Ey Nesîm

Kengî bibarî ey nesîm rakî niqaba min hebîb
Weş kî ji rûyê esmeran reyhan û miskê min hebîb

Ta key bibîn xûnxwari can dil jî dixut narê er in
Dil bû kerî ji hicra mehan ey ba hilîn benda hebîb

Benda li ser rûyê perî sor û zer e wek xawerî
J'weqtê ezel em ‘aşiq în rûh û rewanê min hebîb

Saqî li min xwande ecel ‘aşiq tu yî j'weqtê ezel
Hetta ebed mexmûr tu bel zabit li ‘işqa min hebîb

Weqtê sehergaha ezel tu bî muhibb em bûn hebîb
Hey hey binoş bada hebîb meczûb em în j'nûra hebîb

Şeyda û mecnûn dê hebî bi coş û surûr dê tu hebî
Rencûr mebe hicret hebî em bo te ne ‘aşiq hebîb

Subhan ji Xellaqê şepal çend rehmet e ba ‘aşiqî
Guft û digot ya ‘aşiqî şi‘rê bigo bo min hebîb

Medhê bixûn hetta ebed der muhbeta yara semed
Remzek nihan got û meded saqî biye rûh û hebîb

Hey hey bixûn wer mey bixor ey ‘aşiqê nûr û bixûr
Dîsa j'me re reyhan bipor subhan ji husna vî hebîb

Der xelwetê bo min heye nezdîktir e j'canê min e
Cab[27] da j'me re j'le'lê durr e sebrê bike rûh û hebîb

Dara sebûrê pur ber e ustad xeber daye j'me re
Gerçî **Se'îd** hicret reş e lêkin dihe wesla hebîb

Kî jê didêrim vê surrê min seh kirî b'qelb û sirrê
Zanim ji wê çendan surê mestim ji remza min hebîb

Mestim ji wê guvt û sirrê mey rêhte wê kasa sirrê
Can bî fidayê çenberê ez suhtiyê nûra hebîb

Sohtim ji leb xend şekkerê dêm enwerê selwa sehê
Xecl î ji ber mehr û mehê kî kî tebîb û kî hebîb

Weqtê Xerîf Se‘d Hat Evîn

Weqtê xerîf se‘d hat evîn tûtî dixûnit ya hebîb
Er rêz bike j’zulfa ‘ebîr cana tu yî rûh û hebîb

Rûh û rewanê min cuwan ez qalib im rûhim cuwan
Tenha ne ez qalib cesed ev nûcuwan rûh û hebîb

Weqtê xerîf gul da evîn er ez xurim ‘işqa şirîn
Da’im dixwim ‘işq û evîn yara cuwan rûh û hebîb

Saqî cuwan yarim cuwan j’ğeyrî me jî nîne cuwan
Subhan ji Xellaqê gulan da’im xurîn wesla hebîb

Badexur în ey saqiyan pur kin qedeh j’gulgûne saf
Da cam bibî camê zucac derdê li min wesla hebîb

Hubba şehî çun zîbeq e zulfên şirîn neqd û durr e
Leyla **Se‘îd** dêm gewher e ez talibê wesla hebîb

Mey hate dil j’roja ezel Leyla hebî mehbûbi min
Cam Cem di dest weqtê Elest yek kas xurim j’husna hebîb

Kerbê ceger Leyla şepal saqî bide bada zelal
Serxoş bike ‘aşiq melal ew kuştiyê wesla hebîb

Bada ji ‘işqa lûleyan nabî xefî rûz û şeban
Çûn zîbeq e ‘işqa ewan saqî werîn bada hebîb

Leyla ve Hewrem dane mey Azer ez im ew bûn senem
Pîşê me bî ‘işqa butan em kuştiyê cewra reqîb

J'fezla cuwan dêw tûle ye destgîr li min ev Hewrem e
Şubhê segan dêw tûle ye mehcûr em în j'wesla hebîb

Hicretkeş im j'yara şepal çend hicret e lêk weslet e
Hicra hebîb xweş weslet e xûn bû ceger j'hicra hebîb

Xûn daye dil der cergê min her bû ji hicra yari min
Leyla ji rû pur daye min ey ba biyar bada hebîb

Ey nûcuwan rabe were xûn hate dil der hicrete
Hicretkeş im der ġurbete firqet li min wesla hebîb

Şêrîn nebî ew gewher e bê cism e nûr û 'enber e
Lew dil ji me kir sed ker e xwezya li min wesla hebîb

Wesla dî rûh û neqdê wî can û cesed ew textê wî
Textê Suleyman textê wî mehpeyker e ew min hebîb

Nayit qerar min rûz û şeb der muhbeta wê le'lê leb
Xende ji van ġunce du leb derdê dilê min ew hebîb

Îro **Ġeramî** serxweş e der bezmê yarê bêhuş e
Destar û destan pur weş e ew jî ji 'işqa min hebîb

Îro Şehî Sirr Dane Dil

Îro şehî sirr dane dil qelb û ceger hatif ji ġeyb
Perwaz j'me bir neh felek kevtin di dil esrar ji ġeyb

Ev saqiyê nûrîn beden sirr dane dil j'le'lê di qend
Mey hate dil j'cama şehî remza *Enellah* hat ji ġeyb

Remza *Enellah* hate dil subhan ji zulfê ser du mil
Leyla ve Hewrem bûne dil bangê huwiyyat da ji ġeyb

Leyla ve Hewrem bûne sef mey rihtine j'cama sedef
Ayna Sikender ev sedef îro em în hatif ji ġeyb

'Er'er dihat xerram û saf da min meya gulgûne saf
Zulfê şepal mû mû bi saf esrar dihat ez sirri ġeyb

Esrar ji cama zerkeşî hatin ji destê vî şehî
Subhan ji xellaqê perî ihsan kire camek ji ġeyb

Îro cuwan bûye şepal derdê li min xemra helal
Teşbîhê bilbil pel bi pel mihnetkeş im ez şahê ġeyb

Ev şahidê gerden bilûr çûn sunbulê ebrû di cûr
Weşhand ji le'lan bû û nûr ez perwerê sultanê ġeyb

Sultanê ġeybim kir hedef her bû ji le'lê wek sedef
Qelb û ceger cama sedef der camê ma nuqtek ji ġeyb

Ellah di ber Qalûbela mey rihtiye tasa sirrê
Hetta ebed sekran e dil îro **Se'îd** hatif ji ġeyb

Ellah di ber qebza ezel daye dilî 'işqa ecel
Leyla hebîb xweş bû emel cenga me da ev şahê ġeyb

Sekranê Leyla Hewrem im mexmûr kirim ber subh û dem
Noş noş dixwim j'bejna xurem weqtê Bela hate ji ġeyb

Vî hatifê ridwanê ġeyb dil beġçeya esrarê ġeyb
Cama Cemî enwar ji ġeyb lew min **Ġeramî** çûye ġeyb

Îro Ji 'Işqa Sorgulê

Îro ji ‘işqa sorgulê her bûye min sîne kebab
Bawer nehin yara gulab derdê li min can kir kebab

Hubba cuwan ez kuştime yekser ji dil xûn riştime
Sîne li min pur kuştime can bî fida zulfa gulab

Sîne li ber derban hedef ey hudhudê minqar sedef
Kengî tu bî cama sedef bo min bidî bûya gulab

Vê dilberê xûn daye dil şehzadeê sirr rihte dil
Kengî tu yî nava di dil bo min bidî şoxa gulab

Vê nazikê kir sîne ker ez bûm nexoş j’hicra di qer
Ya rebb ez im meqtûlê ‘işq xûnim biye zulfa gulab

Şox û şepala leb ji xend ez qeyd kirim zulfa ji qend
Dil birye wê b’le‘lê di xend ez kuştime dil bû kebab

Wer meyze ke ya ‘ezruwî amanc li ber tîrê perî
Xûn daye kef j’hicra zerî dil bû kerî sîne kebab

Co co rewan xûna ‘eqîq derdê li min yara heqîq
Dêm xawer e cebhet ‘eqîq şehbaz û yar rihtin gulab

Hey hey dinoşim leb bi leb cama meyê j’le‘l û du leb
Em badexûr her teşne leb vî enwerî dil kir kebab

Der subhê Lest ez bûme mest *tekbîr zedem ber çîzi hest*
Mecnûn sifet **Se‘dî** di mest can û kebed têkda kebab

Di Riya Dostê Ġeramî

Di riya dostî **Ġeramî** me vexwar camê şerab
Lew seher mest û xirab în me ji dil bûye kebab

Mest û hişyar me rindan kulaha lew bûne belav
Lê ji sûz û eleman bûne nikar û çi kebab

Şerbeta le'l û leban çendî şefa û çi heyat
Lew bi min abi heyat û we ji dil husn û me'ab

Bide îro xetê xalan we ji 'enber bike xoş
Bide ber rindeşê badî tu du zulfê ji gulab

Dil ji ber hicr û firaqê diderit çeng û newayê
Her dema bêt û cuwan e ku ji ber perde hicab

Dil di deryayê şerabê diderit mewc û 'ucac
Lê ne wek hicr û firaqê diderit xar û kulab

Heceru'l-eswed e xalê ku seher tê me tewaf[ê]
Her bi zemzem didinê 'enber û ezfer e gulab

Dîsa Ji Dil Nû Bû Evîn

Dîsa ji dil nû bû evîn wê hat xiyalê rûz û şeb
Hubb û evîna dilberê avêt xiyalê rûz û şeb

Rûz û şeban mihnetkeş im sotî dilê hicrankeş im
Hicra hebîbê pur xweş im lew min xiyalê rûz û şeb

Dînê xiyalê kir qerar nayêt ‘eyan min jê xumar
Ew dilbera çeşmên xumar ew min xiyalê rûz û şeb

Şox û şepala neyşeker kêşan kemanê birhê qer
Avête dil tîr û teber şox û xiyalê rûz û şeb

Çîn çîn kirin zulfên siyah ‘alem li min kirbû siyah
Da j’dil biçê jeng û siyah ev min xiyalê rûz û şeb

Ev dilbera xummar û mest wê hat xeram badepurest
Da destê min hoş çû ji mest nayêm xiyalê rûz û şeb

Kêşaye dil yek xencere rûh hate der ber xencere
Lew dil ji min sed pencere fikra xiyalê rûz û şeb

Îro **Se‘îd** j’hicra hebîb destê xo da destê tebîb
Got û ġeram î tu hebîb da’im xiyalê rûz û şeb

Ev ‘illet e j’hicra hebîb ney ‘illeta zecr û tebîb
Bêçare jî her çi tebîb yar e xiyalê rûz û şeb

Çare ji vî derdî **Se‘îd** ev wehdeta mutleq wehîd
Lew pur kesan j[ê] pur be‘îd mayî xiyalê rûz û şeb

Qafiya T - ت

Minnet Ji Bext û Her Ji Text

Minnet ji bext û her ji text dîsa me dî ew nîki bext
Durrdane bî meş'el sifet bejna perî rabî ji text

Textê di şahî pur xelek şems û felek ew rû melek
Hat esmera gerden melek guft û digot ey nîki bext

Rû esmeran hatin sema çun kahinan çûne sema
Vê 'ezruwê birme sema bê 'eql û hoş û bê dirext

Ev dilbera Belqîs sifet teşbîhê Asif pur dirext
Textê Suleyman hate rext rûxtek we da [e]w nîki bext

Îro dirext pur dane perr sor sor dikir ez belg û perr
'Îdim ew e ew bî li text herdem dihat came dirext

Canê ġerîb rûhê ġerîb minnet ez im der menzereş
Rakir ji 'alem bed ji bext bextek me dî j'şahê li text

Tirka ji 'enber came reng şu'le dida der cami beng
Cama me bî her hefti reng tali' me bî şêrîn li text

'Ezrû ve Hewrem bûne yar saqî biye xweş şem' û nar
Bezma ku Hewrem bête yar saqî dibî hemçû dirext

Bezma ku 'ezrû bête yar Hewrem dibî murşid çu yar
Saqî surah da min ji yar Hewrem digo ya se'de bext

Şîrîn me dî teşbîhê Tûr bangê *Enellah* j'kohê Nûr
Cam cam dida j'nûra di cûr 'ezrû ve Hewrem ser li text

Textê şehî pur hat gulî ber çîçekê k'hukmê gulê
Derket ji minqar me mest mîmek mudewwer ber direxť

Çîçek sipî min ber dixwand ber sorgulê Hewrem dixwand
Guftem peder ey şahê xend tebdîl kire her du direxť

Lêkin hebî terkê ji wî 'alem hemî tevda nedî
Ya rebb bide bextê **Se'îd** bade bixwim j'her sî direxť

Ev dilber în reyhan diweş j'weqtê ezel j'lifkê diweş
Der meclisê ez bû[m] tiraş senna' bûyin l'her du direxť

Çend remzeyek gotin **Se'îd** ji wehdeta mutleq Mecîd
Bi mujdeya şahê Wehîd ev guvt û go çende me xest

Min Dî Li Baġê Mîri Zeyn

Min dî li baġê Mîri Zeyn ew nêrgiza şehla û mest
Çeşmê ewê awir diriht hemçûn hebîbê pur di mest

Awir dihatin j'mujjeyan teşbîhê tîrê begleran
Kakul reşa remz dan nihan şubhê Şirîna çem di mest

Kakul reşa bûne xelek tata digot ey çengî leng
Tayê ji wan çendî çeleng xurrem dibîn wek şeng û mest

Mest bîm ji re'na kakulan kevtin dilî gezmê di wan
Ebrû hilal bûne keman awir dida wek mîrê mest

Tîrê ji birhan goşereş meşha li baġî her bi meş
Xemrî û gîso pur di reş îro **Se'îd** serxoş û mest

Tîrek ji zulfên 'enberî avêhte dil xûn tê purî
Ez sohtiyê wê çenberê lew mest e dil subha Elest

Hey hey dinoşîn bade'ê lew 'işqibazî heyhe'ê
Kîkî dinalîn heyhe'ê hetta ebed sukran û mest

Sukran Se'îdî dilberê ji badeya vê çenberê
Hetta ebed wê meyxwerê der meygedê serxoş û mest

Geh gah gahî 'aşiq im lewma di weqtî Wamiq im
Her dem ji 'işqê Wamiq im pur jê didêrê rind û mest

Ellah ji 'işqa sermedî kêşa **Se'îd** b'ġemzek we dî
Şîrînî û 'işqek we dî hetta ebed serxoş û mest

Ey Şahidê Qudsî Key Vekit

Ey şahidê qudsî key vekit bend û niqabet
Cuz şahidê Xurmal key guşt helqê niqabet

Wey şahidê qudsî key vekit bendê es[î]ran
Cuz Şahê Husamî key bidî bûyê ‘izaret

Ellah ji çi derdî weh dikalim weh dinalim
Leb ġunçe nihanin ji hicab û ji firaqet

Wey bilbilê bethayê fesahet key dihed balê belaġet
Ey tûtiyê xweş go key dihed şekker û abet

Wey şahidê husnê key dihed husn û letafet
Dil bend û esîr im ji firaqet û ji hicabet

Ev ‘işqê **Se‘îdan** gerha sûz û ‘ecîb est
Dil kevte hicabê ji firaq û ji hicabet

Dîsa Ez im L'baġê Gulan

Dîsa ez im l'baġê gulan Mecnûn sifet mexmûr û mest
Mecnûnê husna sorgul în dem dem bidim mexmûr û mest

Dem dem dibîn sekran û mest îro **Se'îd** her butperest
Butta şepala memleket derket ji burcê her di mest

Ahû sifet şengol û şeng derket ji burca pur xelek
Hubb daye dil j'nîvê çelek meşha seher îro di mest

Zulfa Şirîna Farisî tata ji nûr û 'enberî
Tata şebîhê 'er'erî lu'lu' sifet şebnem dixwast

Şebnem li wê her rûz û şeb gîso mu'enber bû qeseb
Ebrû reşan sihrek direht îro em în er butperest

Bit esmerê nûr û surê gerden ji mawerd û durrê
Qişt 'er'erê dama sirrê mexmûr û mest em butperest

Hubb hate dil j'zulfa çeleng ez bend kirim j'xalê helek
Mest kir ewî ev meyperest subh û seher min dî di mest

Ew dilbera reng esmerî xal û xetan lê enwerî
Guft û digot ey rindê xest lew da'ima ez mame mest

Ga ga hû dimînim heyretê hingî diçîne hezretî
Subh û seher çûm hezretî lew gah û gah rencûr û mest

Derket ji burc û penceran lew daye dil ber xenceran
Rûh hat û kam û xenceran awir rijandî meyperest

‘Er‘er Heja Ji Bejnê

‘Er‘er heja ji bejnê ji zulf û şax û qamet
Da me evîn û muhbet cana nede tu firqet

Çeşmek me dî sehergah mexmûr kirim ji nûrê
Ey can mede newayê hem hicr û hem firaqet

Narê newayi yara derket ji çahê Haret
Xarê neway û hicrê mehbûb nede ji rûyet

Saqî werîn ji yara cama wisali weslet
Dîsa werîn ji zulfê bihnek[28] ji baġê weslet

Hubba ji rûyi saqî derket ji hedd û ġayet
Ey ba biyar ji weslê sohtî dil în ji firqet

‘Işqa ji rûyê şaha **Se‘dî** kirim xecalet
Riswayi ‘işq û rindê tenha ne ez ‘elamet

Îro **Se‘îd** ji derdan nayêt sikûn û temkîn
Dîsa **Ġeramî** nar e riswayê baġê rûyet

Qafiya C - ج

Îro Tu Bê ‘Umr û Mizac

Îro tu bê ‘umr û mizac bê şahid û cama zucac
Ney şahid û saġer zucac zanim te nînin yek ‘ilac

Ev şahidê Belqîsî rû zulfê di xwe rihtin [j]i bû
Zulfên ji ‘enber xal û bû ‘alem didet bac û xerac

Xerc û xerac rûh bî rewan der muhbeta şahê butan
Dêmê zerîn ‘enber weşîn gerden ji qar û rû zucac

Bazû ji mawerd û bixûr bûya lefan miska di cûr
Çeşmê siyah b’ġemr û sihûr nûra rûya surc û sirac

Ev şahidê gerden bilûr lê bûn reqis şem‘ û bixûr
Horî dihatin xweş bi pûr ey şahidê gerden ji ‘ac

Gerden zirava yasemîn lê bûn selîb lev ‘enberîn
Sosin qed e rû sorgulîn lê hat seher bay û ‘ecac

‘Ezra û Meryem her ew e husna ruxa tev muhbet e
Şox û şepala esmer e gerden durr e bazû ji ‘ac

Rûyê sipî zendê semîn qamet elîf dêm ‘enber î
Îro **Se‘îd** meynoş tu yî j’vê nêrgiza şehla û ‘ac

Kuştin ewê çend ‘aşiq e wek min **Ġeramî** Wamiq e
Îro **Se‘îd** çend natiq e ji badeya cama zucac

Dîsa Dixwazit Qelb û Dil

Dîsa dixwazit qelb û dil husna şirîna rû zucac
Saqî bide qelbê di kul nûra zelal j'cama zucac

Saqî ruxeş wek mahê nû bazû ji qar û rû bi bû
Le'lên di wê şekker digo her jê dibê hûre zucac

Şewqa ruxa şems û qemer ebrû li min kirne çeper
Çenber belav b'tîr û di şer dane dilî bada zucac

Nûra rûya xeclî ji ber cama zerîn her goşe reş
Cama Cemî kirye fikir ez le'l û ruxsareş ji 'ac

Bazû ji mercana zirav ebrû keman sîr-ab û av
Selwa sehî qamet zirav nûra di çeşman bû sirac

Nûra sipêde perde zer perda rûya her goşe zer
Ey ba hilîn benda kemer da dil bibî cama zucac

Da ez bibînim çeşmê reş zulfên di qer miskê biweş
Îro **Se'îd** wer mey binoş saqî biyar cama zucac

Îro Ez im Rindê Husam

Îro ez im rindê Husam saqî tu yî bazû ji ‘ac
Ebrû ji mercan û zucac saqî biyar cama ji ‘ac

Cama sedef bo min biyar ta ez vexwim ‘işqa di yar
Husna ruxa bûbû bihar ey ba bide derd û ‘ilac

Derdê li min rûyek xunav bigrin ‘izarê hûr xunav
Bisko bi xûn j[ê] hûr xunav ez perwerê noşê zucac

Rûyê zerîn bû yasemîn yara **Se‘îd** bû enwerîn
Gerden zirav e wek zucac saqî bide derd û mizac

Derd û mizac bo min ev e rûyek durrê bû mawerî
Bû ‘enberî gerden perî ker kir ceger nîne ‘ilac

Şoxa şepala xweş xeram bilbil dixûnit ya Husam
Hate bihar gul bû xeram ez kuştiyê şoxek ji ‘ac

Şoxa zirav lê hate rav girtim bi davek wek xunav
Dava durê mûyê zirav helqe bi helqe hem sirac

Girtî xunav le‘lê şefaf noşek ji wan le‘lê şefaf
Şurbek mudam tê de xunav ger em xurîn û bit mizac

Noşîn lebê guft û sirrî mujgan ji mawerd û perî
Derket ji burcan wek gulê saqî biyar cama ji ‘ac

Hezret be şahê qudretê dê xweş bidêrim suhbetê
Her çî bikêşit şerbetê j'vê badeya cama zucac

Derdê wisala hezretî têtin ji noşa şerbetê
Dê em bigrîne şerbetê j'vê badeya cama zucac

Îro **Ġeramî** xweş binal j'vê badeya zulfê şepal
Derdê dilî nayit bi qal dê bê 'ilac j'cama zucac

Derdê **Se'îd** birye qerar rûz û şeban dê kit hewar
Kî kî dinalit bêqerar saqî werîn derd û 'ilac

Qafiya H - ح

Ellah Di Ber Subha Elest

Ellah di ber subha Elest da dest min û yara qedeh
Hey hey dinoşim leb bi leb vî Hewremî pur kir qedeh

Saqî li min reng esmer e zulf ‘enber e gerden per e
Qamet elîf gerden zer e saqî werîn pur kin qedeh

Vê dilberê perwaz hene rakir ji dil nar û sirr e
Wek sahiran da min sirr e tevda mey e her în qedeh

Ca’iz l’me noş j’destê di wê ew esmera j’nû[r] û durê
Ya rebb ez im şeyda li wê derdê li min safa qedeh

Saf e qedeh j’weqtê ezel tê da heye ‘işqa ecel
Hûr hûr digo ber tayê gul saqî were pur kin qedeh

Ey ba were bîne meyê ruxsar ji wê bêxe di wê
Bejna elîf bîne ji wê dêm ‘enberî hate qedeh

Dêm ‘enberê sosin perê benda rûya j’tayê gulê
Teşbîhê semnî bû ji wê bûs kir ji min minqar qedeh

Bûsek me kir ber payê yar lewra me bir ber ‘erşê yar
Bûs kir ewê mîma bihar guft û digot noşe qedeh

Guftar hebîn esrar melek hetta me teyy kir neh felek
Ev Hewremê teb‘et melek destê me girt sor kir qedeh

Berr û behir j’cam û qedeh sor kir li min rîş û qedeh
Teşbîhê bayî ev qedeh teyy kir j’me re betha qedeh

Tirka ji ‘eynê her digot remza huwiyyat her digot
Minnet ez im her min digot minqar sedef sor sor qedeh

Bend rakirin j'yara 'Ereb bend û niqab goşe qeseb
Ebrû reş in ew rûz û şeb her daye wê lêvê qedeh

Îro qedeh xweş bî 'eqîq rind û sipî rû bî 'eqîq
Remzek nihan got û şefîq 'ezrû biye yara qedeh

Îro 'umir borî **Se'îd** der muhbeta şahê mecîd
Ey ba nesîm kanî we'îd zulfê bide nava qedeh

Bade biyar ya Hewremî hetta ebed em serxweşî
Minnet tu yî behra mey î dîsa were pur kin qedeh

Minnet li me ya 'aşiqî meynoş tu yî j'vê natiqî
Ellah di ber qebza ezel mexmûr kirîn dagrit qedeh

Dagrit qedeh j'nûra evîn nîşan ji wî rûyê şirîn
'Ezrû ve Hewrem her kirîn 'aşiq bi xwe min dan qedeh

Hê hê didêrîn serxoşî derbendê rûyê mehweşî
Saqî du zulfek daweşî da destê min cam û qedeh

Wê da qedeh j'weqtê ezel avêhte dil 'işq û xebel
Lew serxoşî hey hey ji dil ji badeya cam û qedeh

Derdîkeş em der 'işqê yar kîkah didêrim barebar
Sed nale wû ah û hewar nale ji vê cam û qedeh

Dîsa **Ġeramî** nale kir der meşrebê **Se'dî** me kir
Ev behr û ber xoş ture kir der badeya cam û qedeh

Qafiya X - خ

‘Işqa Şepala Bêmisal

‘İşqa şepala bêmisal qelb û ceger kirye pilox
Qelb û ceger wê bûne xûn sîne pelek meş‘el pilox

Îro li min nû bî hecir çendî kirim yekser pilox
Dûdê dilî bû xûn û zox yekser pelim dil da di zox

Zoxa ji hicra dilbera telxe w reş e rûl û misal
Hicret li min dil jî vemal em ateş în ta pa û rux

Ruxsar ji me ‘eyn sorgul e çendî di dil da ateş e
Hecr û newa her ateş e hicret kete vî betn û rux

Van lûliyan birne sebir çendî dikim nayê sebir
Telxe sebir ya ‘ezruwê umêd ew e bûsîn du rux

Ruxsarê yara ‘ezruwê teşbîhê şem‘ û xawerê
Birhên di wê her mawerê şebnem kete ber zend û rux

Şebnem kire lef ‘enberî xalê siya gerr dan li rux
Taca serî j’sîm û zerî zulfê bide ya bedre rux

Sîm û zerî girte du zulf gîso w lefan bûne di xef
Kakul reşa kirne sedef dînê tu yî wek şems e rux

Dêna nedî şubhê di wê subhan ji Xellaqê şehê
Tu ‘er‘er î rû xawer î le‘lê di wê pur bûne surx

Surx û lebê durdî weşê guftar şebîhê kewkebê
Şebnem li ser dêmê gulî bazî kirin ba zuhre rux

Bazî kirin van kewkeban ber gerdena şahê butan
Xaka riya van dilberan bîne li ser dêm û du rux

Lale ‘izara ‘ezruwî reqqas kirim wek muşterî
Zuhre rux e sîma ber e taca serî le‘lî we surx

Rehmê bike ya dilberê qetlê meke der hicretê
Carek were kasa meyê rewşen bike b’zulf û du rux

Le‘la Bedexşan her ew e Şîrîn û Leyla her ew e
Tebrîz û şeh îro **Se‘îd** derdê me bî husna li rux

Ey saqiyê sîmîn û zer lillah were ‘enber kemer
Ruhnî bike kasa di reş b’le‘la meyê hem b’zulf û rux

Wê muhbetê dil herişand şîşê di sor tê da tewand
Lê hicretê sîne revand qelb û ceger wê bîne rox

Tuġra cebînî zerkeşî zulfên mu‘enber pur weşî
Le‘l û leban ser da weşîn hem şems û hem bedra ye rox

Le‘l û lebê toq ġebġebê reftarê şubhê kewkebê
Derket ji burca ‘eqrebê bû mawer e ew şahê rox

Qafiya D - د

Îro l'Me Da Bêhnek Şirîn

Îro l'me da bêhnek şirîn bêhna gulê bû ya **Se'îd**
Bêhna evîna çend şirîn têtin ji bo me ya **Se'îd**

Bêhna şepala nazikê derket ji burca muşterî
Têtin ji nav baġê gulan bêhna şepala pur **Se'îd**

Şahê şepal û lûliyan îro seher bûbû 'eyan
Gerden şebîhê 'er'eran xerram dibê li baġê **Se'îd**

Xe[r]ram kirin zulf û pelek ahû sifet çenber helek
Gîso kirin hûr hûr gelek her tu ġulam î ya **Se'îd**

Rûz û şeban nalan dikîn ba tûle'ê koha şirîn
Nalan ji awazên hezîn sohtin dilî zahid **Se'îd**

Awaz ji me enwa' têtin şoxê nekir rehmek l'birîn
Nazê bibe aġûşi dîn sohtî dilê îro **Se'îd**

Ger em bipêçîn ya 'ebîr destê d'xwe û zulfa herîr
Dê em hebîn *'ela herîr*[29] pur we'de û textê **Se'îd**

Yara cuwan ez sohtime avête dil tîr û rim e
Rûh hate der xweş kuştime carek neda weslek **Se'îd**

Şoxa şepala 'ezruwê çeşmê siyah û nergisî
Birhên di qer zer-ab kirî ger tu hebim her 'îd e 'îd

'Îda me 'aşiq ew perî rû esmera gerden durrî
Qamet elîf selwa sehê bejn û ji mercan ey berîd

Carek were qamet elîf saq ‘enberê gerden xefîf
‘Aşiq dixwazit ey letîf destûr j'me re yari mecîd

Ger tu bidî pêçî lefan zulfa du ta bigrîn heman
Berde ji wê xal û xetan derkev ji burcê yewmê ‘îd

‘Îda ‘ewaman libs û xûr ‘îda me rindan zulfê hûr
Hecca ‘ewaman Ke‘be ye ‘umra me ye yarek **Se‘îd**

Ke‘be tu yî Eswed tu yî se‘y û tewaf dîsa tu yî
Beytu’l-qudus goya tu yî hecca me bî nûra mecîd

Zulfit biye her Ke‘be ye cebhet biye xumxane ye
Rûyet metaf û xane ye *şerrif ‘eleyna*[30] ya **Se‘îd**

Zehra we şemsa xawerî gerr dan li ser dêmê perî
Tac û kulah meş‘el gurrê teşbîhê rojî yewmê ‘îd

B’xal û xetê rû kewkebê ‘enber weşê toq ġebġebê
Zulfê mu‘enber lewlebê rengîn bike j’nûra mecîd

Enwer bike zulf û perran mehweş bike dêm û ruxan
Cebhe w enî wer ke ‘eyan sohtî dilîn yara we‘îd

Tac û lefan cezbek dixwand qed ‘er‘erê Qur’an dixwand
Zeqna xunav ‘enber weşand textê şehî bextê **Se‘îd**

Textê perî bextê zerî me’d xergeha burca surê
Cama Cemî mey da sirrî dîdar ruxê nîşane ‘îd

Dîsa Suwar Bî Nûcuwan

Dîsa suwar bî nûcuwan şubhê ġezenfer her me dîd
Teşbîhê tayê nêrgizan xemlî ji xemla rojê ‘îd

Xemlî ji berg û çiçekan dêmê zerî girt gîsuwan
Xal ‘enberan girtî ‘eyan şox û şepala pur we‘îd

Bext û tewali‘ bo te bî efser kulah da’im hebî
Tac û kulaha seltenet her bo te bî *yewmu’l-we‘îd*[31]

Mislê Cemî cama zerîn mey tê hebî ey nûrê ‘eyn
Innî ġerîbun hûri‘în ey mûfiyê we‘d û we‘îd

Saqî biyar er xweş biyar cama sedef bo min biyar
Da dil bibînit xweş di yar saqî tu yî nûra **Se‘îd**

Yara ji nûra lemyezel mey rihtiye çendî b’ecel
Xemlî ji xemla der ezel daye dilî hicra cedîd

Minnet ez im meqtûlê yar meqtûlê ‘işqa şehsuwar
Weslê bide j’zulfê bihar dad û meded j’tîrên hedîd

Minnet ez im mexmûrê yar mexmûrê xemra şah û yar
Cama zerîn bo min biyar dad û meded sed ah cedîd

Zulfa du ta wek ‘enberî teşbîhê tayê ‘er‘erî
Sunbul ji nûra enwerî ebrû-reşa em jê be‘îd

Şubhê heyîva ezha em jê dixwin sihr û surûr
Hem xemr û badê bi fetwa fetwa ev e qewlê cedîd

Qewlê cedîd fetwa dihe qewlê qedîm teqwa kire
P[î]rî muġan ew meyxur e lew meyxur im j’zulfê **Se‘îd**

Em meyxurê xemra helal b’qewlê emîn fetwa celal
Baġê e’lê[32] nûra celal em ‘aşiqê nûra mecîd

Îro Ji Remza Nûcuwan

Îro ji remza nûcuwan em bûn şebîhê nabedîd
Teşbîhê zerrê hûri bîn da'im ez im her nabedîd

Remzê cuwan çun neşteran teşbîhê tîrê asiman
Ġemzê di wî batin şewand teşbîhê pola û hedîd

Ġemzê mujan dil kir kerî mujgê di wî mujgê perî
Ebrû ji tayê sosinê bejna şirîn mahek me dîd

Bejna ji balayê xeram weqtê seher têtin xeram
Ġemza didî j'qend û şam lewma ez im îro şehîd

Bejna cuwan da merheba ber tu Husam sed merheba
Minnet ez im mexmûrê yar sed merheba rindê şehîd

Minnet em în medhûşê yar medhûşê xemra bêġeşîn
Em serxweşê vê nêrgiz în yara şepal ez kir şehîd

Medhûşê bûya nêrgizî remz û sira dil kir kerî
Dil bû kerî j'remza zerî ey can were nûra **Se'îd**

Xalî nebî tu j'vê meyê wek saġer û cama Cemî
Ey ba bide kasa meyê hetta bibîn bo te şehîd

Herdem ez im bo nabedîd şubhê hilala nû cedîd
Herdem ji mihra esmera subh û seher têm nabedîd

Îro Ji Derba Firqetê

Îro ji derba firqetê zanim perîşan î Se'îd
Mecrûhê hicra dilberê lewma perîşan î Se'îd

Mecrûhê qewsê purweş im sohtî dilê hicrankeş im
Hicra tu kî pur pê xweş im lewma tu rûhan î Se'îd

Rûh bî fida bo dilberê sûndê dixwim b'zulf û perrê
Rûhî ji 'işqa dilberê lewma tu nûran î Se'îd

Nûra cemala lemyezel mecrûh kirim j'roja ezel
Vê dilberê zulf kirne bel lewma tu meyxan î Se'îd

Kalan û qalib her ez im nûrek mucerred bê leş im
Şubhê perengê ateş im lewma tu sekran î Se'îd

Îro ji hicrê dojeh im wek asiya bayî weş im
Dîsa ji yarê ez xweş im lewma tu şahan î Se'îd

Sekran û meynoş her ez im sekranê Lata enwer im
Narek muqebbes purweş im lewma tu xaqan î Se'îd

Tu b'xwe bizan vê rê nezin[33] bê murşid û bê nûrê 'eyn
Sed zahidan kevtin ji ġeyn lewma tu sultan î Se'îd

Setwet bi muhbet bo te hat çendî ji 'işqa enwerî
Dilber ji rengê sorgulê lewma tu canan î Se'îd

Canim fida bo dilberê bo min rijand behra meyê
Dîsa dinoşim hey heyê lewma ne insan î Se'îd

Ellah ji ber Qalûbelê bo min hinart tasa meyê
Wer meyzeke îro şehî lewma tu butxan î Se'îd

Zanim ji kilk û xameyê her tu dibî remza meyê
Her sîneê bêsû w meyê meşhûrê nadan î Se'îd

Min ji seher j'yara keleş girt û girift û em bi meş
Mey hate fincana sedef lewma tu coşan î Se'îd

Mensûc dikim neqşê belîğ ber şahidê esmer bedî'
Min dî li wê sed xal medîd lewma tu 'Usman î Se'îd

B'ilham bibî ya fetweyê her tu dinoşî vê meyê
Şeb ta seher j'sûza meyê da'im bi kalan î Se'îd

Me'şûq bi husnê bûne yar 'aşiq bi zulfê bûne har
Co co rewan nabin hewar lewma tu nalan î Se'îd

Wer saqiyo bo min bibê bo çî nedî kasa meyê
Sohtî dil în ji hicra meyê lewma tu hewlan î Se'îd

'Aşiq bi zulfê bûne dîn me'şûq bi husnê bûne mîr
Îro tenê min dîte dên lewma Suleyman î Se'îd

Nûra cemala şahidî kevte di cama zerkeşî
Min dî xeram wek 'er'erî lewma tu gerdan î Se'îd

Lat û butan dê em hebîn hetta bi roja axerîn
Ustad li min ev surşirîn lewma tu 'umman î Se'îd

Îro **Ġeramî** bêhiş e wek min **Se'îd**î serxweş e
Bazî dikit destan weş e lewma tu şîran î Se'îd

Dîsa ji Bejna ‘Er‘erî

Dîsa ji bejna ‘er‘erî xûnê dixwim wek **Se‘dê** be[n]d
Der subh û şama enzelî yarê dida min noşê qend

Qenda ji tayê ‘enberî mest kir hebîbê meyxurî
Lew da’ima dil bû kerî der bendê zulfa qendi rind

Zulfa diraza ‘er‘erî kirye çeper wek çenberî
Biska şepala sosinî mestîn wekî xummar û rind

Ew nêrgiza sîmîn beden qendê dirêjit guft û ken
Zulfa ‘ebîra ezferî şekker lebayê germ û serd

Weşşand ji qedda yasemîn çeşmê di mest serxweş kirîn
Ew ahuwa re‘na û dîn xûnê dirêjit ta ebed

Çeşm ahuwê ebrû reşê gerden ji miska ezferê
Şîrê di dest çityane wê ker kir ceger da’im kebed

Tîrê ji birhan ġemze qend danî min û yara di xend
Lerzîm ji ber ta pa û ser tirsim ji wê hetta ebed

Rind e **Ġeramî** natiq e der ‘işqê yar çend ‘aşiq e
Wek min **Se‘îd**î Wamiq e hetta ebed serxoş û rind

Ew ahuwa re‘na û dîn Ferhad ez im ew bû Şirîn
Gorî dikim şîrê nûrîn şam û seher bêhoşê rind

Camek ji bada enwerî avêhte qelbê meyxorî
Meczûb kire j'pa wû serî hetta ebed serxoşê rind

Saqî Biyar Cama Sedef

Saqî biyar cama sedef vê firqetê batin kewand
Şoxê li min batin disot her ro li min mêlak kewand

Her ro li min xûn kir ceger qelbê **Se'îd** xûn lê qemer
Qelb û ceger têk bûn şerer nazê li min dunya hejand

Ew nazika pur naz û şox zilfê di wê dil kir pilox
Biskên siyah da xûn û zox yekcar li min batin bijand

Zulfên siyah têk 'enberî xalê di qer têk ezferî
Bûya lefa bû mawerî şoxa şepal batin şewand

Şoxa delal ez qeyd kirim da'im ji dil xûnrêj kirim
Kakul reşa ez şaş kirim her roj li batin xeşand

Ez bendê zulfa 'enberê gîso û lefa mû da dilî
Çenber belav kir ber serî her dem li dil xar lê diçand

Xarê gulê wek şekkerê ez bilbilê mihnetkeşî
Mihnetkeş im tehlîkeş im xarê gulê her min hewand

Xarê gulê dil herişand bûya gulê her ez teband
'Işqa dilî 'aşiq kujand hubba di wî her ez tepand

'Işqa şepal dil herişand lewma **Se'îd** sehra tewand
Ker kir ceger xwê lê reşand xaran li min batin şewand

İsmê Yar Min Diye

İsmê yar min diye mektûb di lewhê bê ‘inad
Lê ji nûr pur şewqe bû eswedê jê kir ‘inad

Min di baġê surşirînan dî ‘ecêb resmek ġerîb
Sefheya lewhê muhîtê min diye ji nûra siwad

Wer dilo daçîn serî ew perî peyker ku tên
Hin gulab û netrik in ew min perî j’nûra siwad

Min di baġê neynikan dîtim du mîr û begleran
Lê ketim baġê buharê surperî ji nûra siwad

Saġir û camê dixwazim ez ji zatê zu’l-celal
Lezzet û terb û xweşî dîtim ji nûra pur siwad

Mutribê terb û sirûrê her ji baġê pur cemal
Melhemê derdê Se‘îdan ew şepal ji nûra siwad

Min li ser lewhê ku dîtim ‘er‘er û nêrgiz xeram
Sosinê go tu hebîbim ev tu yî ji nûra siwad

Ew di burcê dûr hebûn lale w şiqaqê pur şeveq
... ...

Em ji baġê serxweşan çûne di baġê sur şirîn
We çi wala gewherî gîso hebûn ji nûra siwad

Dî di ‘işqê şîrê sor in mîr demê destûridar
Baziyê semsam di destim ef‘iyê ji nûra siwad

Serxweşê ‘işqa celal im bilbilê baġê cemal
Selb dibî nûra Xudayî ji munkirî gêra ‘inad

Walida şah Mustefa yim ey **Ġeramî** xoş bibî
Merdemîrê pur ġeyûr in munkiran gêra ‘inad

Gih çu Nîl în gih çu şîr în her dema min dil fiġan
Gih çu mîr în gih feqîr în dil tejî j’nûra siwad

Dil me ‘erş û cismê ferş û lew seher min ah û ah
Murġê dil wê xoş dixûnit dil tejî ji nûra siwad

Her seher dî çûne ‘erşê dil ji vê ‘işqa û wudad
Behra ‘işqê nalenal e dî ji ber nûra siwad

Dil ji ber mewcan didêrit nale wû her dem fiġan
Dil bi şerqê wek bi ġerbê jê dizêt nûra siwad

Murġê dil j’nûra hebîb e lew diçit ‘erşê hebîb
Ba hebîbê guvt û go ye lew me dil ji nûra siwad

Guft û go çendî me gotin lê ji remza dil me got
Lê ji hebîb hate gotin tu bigo ji nûra siwad

Guvt û go çendî bebêjim derdê ‘işqê ez dibêjim
Ney ji bo xelqê dibêjim serxoş im ji nûra siwad

Xoş dikim ahan nihanî dî ji ber derdî zemanî
Pur kire ji xelqê nedanî xelqê wan tevra ‘inad

Nagirin yek qetre nûrê dê ji vê ‘işqa çu tûrê
De‘wê têtin weslê horî ew ji ‘işqê ra ‘inad

Kesk û soran dê dipoşin qelb û dil nayên xuroş in
Ġafil în der xabê xoş in ‘aşiqan ra pur ‘inad

Dil ji kevr in teb'ê xar in rûyê sor in ev xusar
Salik û murşid pur leb in ew nizanin pur 'inad

'Abid in bê behre nûr in lê tejî ġillê di hûrin
Muhbeta dunya dixwarin çend rûyê wî pur 'inad

Gewheran çendan dibêjim lê çi feyde ez bebêjim
Malê dunya ez nedêrim ger çi pîr im dil wudad

Zahid în dunya li balê çendî ra'ic çûye balê
Destê dunya bûye malê ew qebûl û ra çi dad

Zêr û mal ger çi nedêrim der riya 'işqê didêrim
Mest û sehbayê didêrim em **Se'îd**ê dil wudad

Serxoşî min cam di destî çûm ziyaret pay û destî
Lê seher direstî ... ... ew şepal ji nûra siwad

Dadi min j'destê zemanî ez kirim êsîr li xanî
Min kire defter nihanî dê bibim ji nûra siwad

Dê bidim destê te canî hakim û sultanê can î
Belkî bêjit ev tu can î ev çi reng ji nûra siwad

Min bes e yek herfe anî van leb û le'lan deranî
Tûle yim ser l'asitanê zulf û xal ji nûra siwad

Ez ji halê xo dibêjim ney ji zahid ra dibêjim
Tu ji min guvtar nebêjim min ji cam ji nûra siwad

Cam nesîb im pur bi ‘eyb im min suruşt cam bû nesîb im
Rahê ‘işqê pur nesîb im min ji kas ji nûra siwad

Her kesî purestî nîne hin ji zahid hin ji ‘işqê
Hin bi cam e hin be subhe fûre dil ji nûra siwad

Ey kesê inkar e ew ne kar e belkî bar e ew
Karê Iblîs da ji kare negrit ew ji nûra siwad

Murde rahê heqq nezanî ew li bin ‘erşê nihanî
Kes ji wan keskî nedanî lê ji ber nûra siwad

Me re în de badexwar in da’ima meczûbê hal in
Ew ji ‘işqê pur kemal in safi yîn ji nûra siwad

Der beyanker û ‘inadê axirî nakî muzadê
Şerbeta rûyê ‘inadê muhrim e ji nûra siwad

Dê ‘inad semmek qetîl e bo kesê inkar fe‘îl e
Sûr û naqûrê dixûnin em rical û dil widad

Qafiya R -ر

Îro Ji Rengê Saqiyem

Îro ji rengê saqiyem mey hate fincana qemer
Yara cuwan bûbû qemer dê bît şehim er rû qemer

Dê bît şehê qamet elîf libsê di ber libsê letîf
Camê di wî bûne nezîf badê werîn ji rûyê qemer

Bade bidî j'rûyê şirîn da se'd bibî rindê şirîn
Rindê du mîr û begleran derket ji meyxana qemer

Dê bît şepal gerden sedef mey rêz bikî ji cama sedef
Îro cuwan bûbû sedef mey xware min ji rûyê qemer

Dîsa werîn bûya 'ebîr zulfa girah bo min weşîn
Derket ġezenfer ew 'Elî saqî werîn rûyê qemer

Dîsa ji newmê daye yar bûya 'ebîr jê hate xwar
Mey rihte fincana zucac kevte di camê rû qemer

Mey hate fincana 'eqîq eşkim rija xûn bû 'eqîq
Mêlak li min bûye nehîf yar hate cam gerden qemer

Eşka dixwim wek sor 'eqîq cergim biye hemçû 'eqîq
Eşkim nehat xûn hate xwar tu j'nû were ebrû qemer

Saqî bide bada şirîn mutrib bide sazek birîn
Derdê li min hubb û evîn hemrah bibim saqî qemer

Yara ji hicra sur şirîn xûn rihtiye xar û xesîn
Saqî bide werîn cama zerîn derdê li min rûyê qemer

Hubba şehî xûn rihte dil kerbê ceger ba sîne dil
Dil bû birîn j'işqa ezel saqî were hemçû qemer

Dê bit şirîn îro **Se'îd** reş kakulê wek rûzê 'îd
Rehmê bike ya perwê 'îd weqtê ku bên gerden qemer

Weqtê ku bê şîrîn sema dê mest bibim îro şeha
Şeh bû zerî j'zulfê perî em serxweşê rûyê qemer

Xizrê rehî rehber j'me re xummar kirim j'zulfê şehê
Meyxane yim ey saqiyem cam cam bidin j'rûyê qemer

Hat Padişahê Neyşeker

Hat padişahê neyşeker ferman dehen ber şa w wekar
Jê kir xecil Se'dê Weqqas durrdaneya gerden buhar

Durrdaneya gerden elîf libsê di ber libsek şerîf
Her da **Se'îd** rehbên letîf ew padişahê gul 'izar

Şahê necîb û pur hebîb ġemzê di wî nûra şerîf
Ġemzê di wan nûra letîf şoxa şepala nûbihar

Nû bû buhar nêrgiz xeram hem sosina ser ab xeram
Mey xordeyem j'nûra di şam ey ba werîn mujde ji yar

Yara hebîb zulfa çelîp çenber hejand bûbû selîb
Bejna semen em lê hebîb bilbil dixwand der baġê yar

Baġê di yar kû lalezar 'Ezra tu yî ey gul 'izar
'Ezra û Meryem ew buhar ey padişahê lalezar

Dav dane min j'biskê siyah mey rêhte ji çeşmê siyah
Lew dil me gah û na ah derbendê rûyê lalezar

Mihnetkeş im roj û şeban xew nagirîn roj û şeban
Beydar e dil min ew heban ey padişahê gul 'izar

Îro Ji Hubba Şahê Min

Îro ji hubba şahê min minnet ez im mexmûrê yar
Yara letîf qamet elîf ew neyşeker gerden buhar

Gerden ji xalan bûye şam weqtê seher ew bû xeram
Xurrem ji bo te her eman dê bêt şepala gul ‘izar

Gulzar biye wechê di yar çenber ji mawerdê buhar
Dê bêt şepal gulzarê raz ayna Sikender zulfê yar

Minnet ez im meynoşê cam der meşrebê Şahê Husam
Saqî biyar erçeng û cam da ez bibim sekranê yar

Sekran û meynoşî ez im rindê xerabatê ez im
Zahid ber û mexmûr ez im şurba meyê ew min çu kar

Sûndê dixwim bo zahidî rindê xerabatê em in
Nayêm kenişt û dêrê to nînin guzar ez zulfê yar

Zulf û ‘izara yari ma her bo min e Firdews û şam
Firdews me navêt ey Husam cuz girtina zulf û ‘izar

Derdê li min nînin qerar bê şurbê mey bê zulfê yar
Hicra ji zulfan ew buhar der bendê şox em bû[n] sukar

Şoxa şepala meyxurî nayêt qerar bê meyxurî
Hicra ‘izara rû-siyah canê me de hicra ‘izar

Hicra ji rûyê esmeran nîm dojeh e nîm dozex e
Firqet li min ‘eyn ateş e ya rebb bibe hicra ġedar

Se‘dî ji hicrê nar û dû ya rebb bibe în nar û dû
Firqet here xana di xû ya rebb mede firqa ġedar

Îro **Se‘îd** hicret kişand derdê li wî dil herişand
Cerg û ceger têk herifand dil sohtiye hicra ġedar

Dîsa Biyar Bayê Nesîm

Dîsa biyar bayê nesîm zulfa siyah çîn ke û biyar
Da em bibîn sekranê yar em noş bikîn bûya di yar

Weqtê seher rabe û biyar ji tac û kulah wer mey biyar
Leb leb bixûn j'zulf û 'izar lala diraz çeşmê di yar

Ahû weş e ew 'ezruwê dêm esmerê misk ezferê
Da'im li ser bazî kirî şems û qemer ber rûyê yar

Subhan ji husna wê butê teşbîhê çîçek pur xetê
Pur muhbet e j'vê qametê 'aşiq ji wê medhûş û har

Medhûşê çeşmê pur siyah xûnê dixwit her gah û gah
Şubhê **Se'îd** min xware ah her bo ji hicra lale zar

Saqî biyar rabe were zulfa herîr tevde durr e
Jê weş bike remz û sirr e cam cam bide j'destê di yar

Der sekretê bînin 'izar çeşmê belek sosin buhar
Zeqna sihir dam sihr û har leb leb ji cama lalezar

Leb leb bibîn j[ê] û surûr derga siya aba tehûr
Wer binger û çendî di hûr sirra bixûn j'zulfê di yar

Carek were bayê nesîm weqtê seher bo 'endelîb
Bûya kulaha 'ezruwê der muhbeta yara buhar

Ber gerdenê bigrîn lefê medhê bixûn bo vê lefê
Xûnê bixwin her j'vê lefê derdê li min bigrin *se yar*[34]

Ellah ji vî derdî dixwim xûna 'eqîq xara dixwim
Xar û xesa j'hecrê dixwim ey ba seba yarê biyar

Îro **Se'îd** çû butkedê dîsa senem saġer gerand
Da em bibîn sekran û har kanê seba zulfa di yar

Dîsa Ji Turra Sosinê

Dîsa ji turra sosinê bîne sefîh û dil bi nar
Narê ji ‘işqa sosinê teşbîhê şîşê sor ji nar

Sohtim bi zulfa pur belav tayên ji wê sîr-ab û av
Zeqna seher pur şewq û tav girtim bi sihrê şubhê nar

Sihra siyah pur ker kire qelbê Se‘îd ta pa w ser e
Şîrê ji sihrê şeşperr e meş‘el ji wê şubhê di nar

Ruxsarê yar şem‘a geş e biska siyah hem meş‘el e
Êsîr kirim şubhê min e lala dilê j‘işqa di yar

‘Işqê tu nîne her xelas ya dosti bît ya rûhi bît
Rûh bî fida bo bûyi bit ez kuştiyê şewqa ġedar

Narê ji ‘işqa sorgulê narê kelîm û dojehê
Çaha zeqen bû dozexê ‘işqê bixor j’zulfa di yar

Narê evîn û ‘işqehê dûr e ji wê emn û selam
‘Işq û selam nabin bira ‘işq ateş e ey gul ‘izar

‘Işqa ji rûyê dilberan tîrê evîn û esmeran
Ma sar dibit b’abê zenan derman ji wê wesla di yar

Saqî bibe destgîr û yar belkî vexwim wesla di yar
Şeb ta seher min kir hewar ez sohtiyê wesla di yar

Yara ji tayê ‘er‘erî ew esmer e wek sosinê
Gerden ji qarûra reş e ruxsarê wê gulzar û nar

Baġê gulan û ‘er‘eran daye xunava çîçekan
Ebrû siyah bûne keman tîr rihtine b’remz û bi nar

Zeqna şepala nêrgizê şebnem dixwar rûz û şebê
Xerram dibî wek şekkerê şirîn biye lale ‘izar

Ew nêrgiza l’baġê Irem daye **Se‘îd** şîr û du rim
Şewqa ruxa da ‘alemê ‘alem biye gulzar û nar

‘Alem ji wê bûne qerar lê ez tenê nakim qerar
Pelk û perik nehtin qerar ez kevtime çahek ji nar

Ey ba seba weslê biyar sohtim ji hicra gul ‘izar
‘Ezra û Meryem ew buhar Sîna û ‘Îsa gul ‘izar

Şoxa Şirîna B'ğemz û Sirr

Şoxa şirîna b'ğemz û sirr rihte dilî 'işq û sihir
Sihra dikir ew bo evîn ker kir kebed vê firq û hicr

Hicra siyah sohtî cesed em 'aşiqê nûra semed
Hicrê tu key *eyne'l-meded* yara bibe vê firq û hicr

Hicrê kirim bend û esîr êsîr ez im îro **Se'îd**
Xwezya nedîta min hecir şoxê mede er firq û hicr

Şoxa ji tayê çîçekê şewqê didit j'gul çîçekê
'Işq daye min j'Qalûbelê mani' biye ev firq û hicr

Da'im dinoşim le'lê mey er ez xurim cama di mey
Qed zabe rûhî ya şirîn her tu didî er firq û hicr

Şîrînî û guft û derî ġemzê te ne b'sihr û sirrî
Qed tabe lî weslen di yar ez bîm esîr der firq û hicr

Ew dilbera zerrîn kulah sîmîn beden 'enber kemer
'Enber ji zeqnê her biweş ey ba bibe vê firq û hicr

Bayê şebîhê zulfê yar xwastim ewî her subh û şam
Perwaz ji wî ber 'erşê yar saqî bibe j'vê firq û hicr

Ew saqiyê sîmîni saq zerrîn beden her guft û ken
Le'la dirêjit b'xende ken carek bibe vê firq û hicr

Ev saqiyê gerden zirav rihte dilî cur'a xunav
Mey jî ji cama qendi av da em nexwin vê firq û hicr

Da em bigîrîn zulfê yar hetta bixûnîn medhê yar
Rûyê ji 'enber bû nehar kakul reşa da min hicir

Dil murġê zulfê yari ma ‘alem reş e ber çeşmê ma
Men zaqe hicren ya Se‘îd *qed zellehu dûdi’l-hicir*

Zillet birîn sal û mehan der bendê zulfê esmeran
Hillil esîren ya cuwan der cergê min er firq û hicr

Sa‘et ji hicrê yek meh in rû-reş bibin gahê hicir
El-hicru zillun ya Se‘îd ya rebb bibe vê firq û hicr

Heyranê dêmê enweşî ez gîsuya miskê weşî
Xwezya bida min baweşî sergeşt e dil j’vê firq û hicr

Dîsa Ji Hicra Dilberê

Dîsa ji hicra dilberê nalan dikîn der firq û hicr
Hicra siyah ew mal xirab ketme di dama firq û hicr

Hicrê tu key ba min hebî ez sohtiyê rûyê gulê
Bergê gulê girtin şerab ker kir ceger vê firq û hicr

Bergê gulê lê bûn belav şubhê şirîna pur belav
Pora belav sîr-ab û av pora gulê dam firq û hicr

Pora şirîn û esmeran bûne belav wek çîçekan
Wek ‘er‘eran şox û ter in her daye dil her firq û hicr

Daye dilî hubb û evîn qismet ev e ey surşirîn
Der defterê em dîn bibîn lê ez girtim vê firq û hicr

Dem dem dikalim b’çeng û ney der firqeta ustadê ney
Saqî bide vî beng û ney lê ez kirim j’vê firq û hicr

Hicra ji wan nar û şereh meş‘el ji an nava dil e
Pêhta dilî ah û duwe sohtî dilîn der firq û hicr

Hicra ji Zîna Mîri Zeyn derket [ji] hedd û pur hezîn
Ultuf bina ey hûri‘în carek bibe vê firq û hicr

Yara şepala perde zer helqe bi helqe goşe perr
Carek hilîn benda li ser ez kuştiyê vê firq û hicr

Carek hilîn poş û setar hetta bibîn sekran û har
Belkî big[î]rîn zulfê yar subhan ji sûza firq û hicr

Carek bide vê wesletê mihnetkeş în j'vê furqetê
Hicra ji wan ... 'aşiq-kuj e der firq û hicr

Meylî ileykum ey cuwan min qebli yewme'l-niş'eti
Qed zabe rûhî hirqeten dil bû kerî j'vê firq û hicr

Dîsa **Ġeramî** serxweş e dem dem **Se'îd** û meykeş e
Qed ġalenî sukre'l-hewa qetle'l-fu'ad û fî'l-hicir

Şoxa Ji Balayê Xeram

Şoxa ji balayê xeram bend dane dil ta pa û ser
Serxoş kirim b'ġemz û sihir nînin qerar wek zulfê ker

Zulfa du ta ya şehleyî mest bîm ji toqa ġebġebê
Ġebġeb pur î mujgan durr î biska siyah kirne du ker

Biska siyah re'na ye qend xûnê dirêjit ta ebed
Mîrî Şeref lerze ji yed Ferhad keş e ew neyşeker

Ferhadi kuşt wek çengi Leng ew nêrgiza şeyda çeleng
Çeşmê di reş b'ġemzê belek xerram dibî wek neyşeker

Zulfa ji balayê çeleng helqe bi helqe kir helek
Rûyê gulê bo ma nemek bilbil ez im xurdim şeker

Ey ba werîn wesla hebîb da sar bibit narê Xelîl
Narê ji 'işqa pur celîl derman ji wesla neyşeker

Ma sar dibit narê Xelîl dil da biye narê celîl
Ey saqiyê dostê Xelîl ka cameya qend û şeker

Wesla gulê tevde durr e saqî bide cama mey e
Saqî gulê reng bade ye bazû ji 'enber bû şeker

Şekker di nêv lêvane wê sekret di nêv çeşmane wê
Meş'el di nêv zulfane wê wek saqiyê wek neyşeker

Mey da **Se'îd** j'lêvane wê remzek ji zulfan daye wê
Min dil **Ġeramî** birye wê derdê dilê wî neyşeker

Da ez binoşim mey bi coş weqtê seher ku em xemûş
Çenga dilî da bête hoş dîsa were ey lebşeker

Noşîn lebê meş kewkebê xwezya bida min ġebġebê
Wek cameyê leb ber lebê min ah û ah dil jê du ker

Çi Xweş Xwandim Durrê Sufte

Çi xweş xwandim durrê sufte li bejna şîrina ʻerʻer
Çi bejnek şeng û şengol e du zulfê wê wekî ʻenber

Ji wê zulfê bide bûyê ji wê bejnê bide nayê
Çi bejnek neyşeker rind e xemîrê wê biye ʻenber

Xemîrê ezferê rake bide ber baweşîn jêke
Ji wê qendê hebîb rêke ji birhên xwe bide ʻenber

Şepala şenga ʻezriya li ser textî çu Belqîsa
Hikimdar e ji bo Kisra mekuş ʻaşiq eya ʻerʻer

Bide carek di salê da tu dîdarê di weslê da
Eya bînahiya **Seʻdî** bike rehmê li min ʻerʻer

Eger bînim cebînê to ew e sersal ji bo ʻaşiq
Du zulfê esmerîn lê de zebad û ezfer û ʻenber

Tu zulfa pur girah weş ke tu beng û ezferê weş ke
Ji wê bengê qewî rê ke heta saġ în dile ʻenber

Ji wê bengê bike ġoşim bibî rewşen ji wê camim
Biteysîne ji wê tamim ji wê zulfê bide ʻenber

Ji husna rux bike camê ji bûy zulfê werîn camê
Ji çeşmê reş birêj remzê ji mujganên wekî ʻenber

Çi mujgan in siyah reng in li ser çeşman xiyam danin
Lihazê mujgê cananî dibarin jê ‘ebîr ‘enber

Nihan kuştin dused Ferhad neman asar li der binyad
Tu pur ihsan û xwey mî‘ad mekuş ‘aşiq siyah kember

Te pur kuştin gelek ‘aşiq **Ġeramî** tu çi pur natiq
‘Ecîb im ez ji vî Wamiq siyeh xalan bide ‘enber

Ji mehbûban tu şîrîn î ji meczûban emê dînî
Ji van rindan emê zanîn ku mexmûr în l’şehê ‘er‘er

Ferraşê Zulfê ‘Er‘er

Ferraşê zulfê ‘er‘er neqqaşê rûyê ‘er‘er
Da min evîn ji ‘er‘er xerram kirîn çu ‘er‘er

‘Er‘er heyv û roj e mexmûr kirîn ji benge
Çenber ji bûyê reng e ew neyşeker çu ‘er‘er

Xûn rêz kire ji ‘aşiq birhên şebîhê lala
Tîran didit ji goşan teşbîhê tayê ‘er‘er

Em dane ji husnê hicret firqet kişand **Se‘îdan**
Derdê li min wisal e qismet me bî firaqê ‘er‘er

Carek Werîn Bayê Nesîm

Carek werîn bayê nesîm şemmek ji zulfa neyşeker
Qamet elîf gerden xefîf xam û xeram ew neyşeker

Derkev ji burcê pur şepal bend û niqab dane li mal
Zulfa girah dîsa vemal çeşmê siyah b'qend û şeker

Tirka ji rengê sorgulê dêm esmer e zerrîn gulê
Tac û kulah sîm û zerê 'ezra ye rux ew neyşeker

Benda li ser dêm û di per ey ba hilîn weqtê seher
Jê weş bike miska qemer aġûş bike me û neyşeker

Ey ba biyar j'wê kakulê bûya Xeten ew ya gulê
Pur bade kîn j'nûra meyê kasa siyah ey neyşeker

Saqî were pur bade ke fincan û cama zer bike
Mey xware min j'cama şeke munkir be û gul zuhd û şer

Mutrib biya bîne bi xwe ra çeng û defê saqî b'xwe ra
Cama di dest zer şu'le ra ruxsar û gerden bû qemer

Serxweş bibîn j'awazê çeng da em bibîn serxoşi beng
Zulfê big[î]rîn ya **Se'îd** pêçîn du dest ber neyşeker

Lillah were ey nûcuwan destim bigîr ba şah û yar
Pur mey bike van kasikan dîsa were ey neyşeker

Dunya ji munkir pur bibê yara cuwan du şame bê
Em jî bixwin le'la meyê dê ew hebin pur kor û xer

Er bo Xudê ey saqiyan derkev ji burcê wek şehan
Vê hicretê kir daġ nihan daġ lê hene ji xûna qemer

Yekser kirîn vê firqetê şubhê cinûnê muhbetê
Sergeşte în şubhê butê carek nehat ew neyşeker

Sergeşte bîn ey surşirîn ji ‘işqa di Leyla û Şirîn
Nageh me dî hat Hewremî rihte dilî j’bejna şeker

Mey rihte dil j’cama sedef kêşan bi leb surxê sedef
Çeşmê şebîhê hem sedef mey rihte dil j’zulfê şeker

Nêrgiz ji balayê surê zulfên siyah pur kenkilê
Destê sipî sor kir gulê bejnek hebî wek neyşeker

Cana Biya Der Camê Ma

Cana biya der camê ma zulfê siyah ker ke w biyar
Ellah li min şekker buhar yara cuwan Hewrem biyar

Bîne w bibe zulfa şuma xerram bibî der baġê ma
Ew neyşeker hat û xuya ey ba yemîn dîsa biyar

Ey ba seba subh û seher rak perdeya dêmê qemer
Ebrû keman bigrin **Se'îd** lale 'izar dîsa biyar

Hem saqi yin hem dilber in mey rihtine j'husna ruxen
Mey pîşe in meyxane in butxan e dil camê biyar

Butxan e dil ey yari mest karê me bî her butperest
Le'la meyê çun *ma'ide est*[35] girtim li ser şahek di yar

Ya rebb neke bilbil 'ebes der camê ma cana bimeş
Van lûliyan da min ceres der saġerî îro du yar

Muhbetkeş în j'vê firqetê em bêhiş în j'vê hicretê
Ev şehsiwar Dundul siwar şubhê di wî nînin tu yar

Ellah ji ber qebza ezel da min qedeh j'rûyê butan
Durdî xurîn hetta ebed der camê ma şaha biyar

Ey Şahidê Gerden Bilûr

Ey şahidê gerden bilûr ebrû ji mawerd û bixûr
Lutfê bike b'ğemz û surûr carek werîn rûyê bilûr

Zulfa bilûr bû 'enber e xemrî ji mawerda reş e
Şeh ke tu gîso w kakul e tayek ji wan wer ke zuhûr

Er gîsuwan 'enber bike tayên 'isabê zer bike
Qewsê di birhan reş bike ey sahibê werdê di cûr

Saqî werîn cama sedef da cam bibî cama sedef
Maha di nû wer bî kerî ker bî ji remza wek bilûr

Minnet bi min da şahidî camek ji cama 'enberî
Xemrî lefan bûne kerî perda rûya îna bilûr

Lillah were ey saqiya bade bide j'zulf û rûya
Mutrib werîn wek saqiyan nayê w defê j'saza bilûr

Xurrem ji bo te ey **Se'îd** reh birye te j'wesla mecîd
J'roja ezel *hette'l-we'îd*[36] j'vê badeya şubhet bilûr

Mehbûb birîn ba reqs û per hetta j'me çû çeng û di per
Bê hoş kirîn bada di pur weqtê ku şîrîn da surûr

Mexmûr û mesrûr em kirîn hubba şehî bê hoş kirîn
Munkir bimir j'buxz û hezîn hêvî neke j'rindî ğurûr

Carek Were Bayê Nesîm

Carek were bayê nesîm biya wer mey ji wê dildar
Şirîn û xûb û mehbûb e ji ‘işqa wê dikim hawar

Dikim hawar wekî berqan dixwim xûnê wekî baran
Dilim surx e ceger nar e kebed xûn e ji wî dildar

Çi dildarek gulîsor e ‘ebîr û ‘enber û zulf e
Wekî baġê pur û şax e ceger kun bî ji wî dildar

Ji dildara şeker xende çi tûtî me bi leb xende
Dixwim xûnê şeb û rûz e werîn ey ba tu wî dildar

Were cana bila şev bî bipêç destim li ser gerden
Lebim ber leb nihe Belqîs bibûsim rux eya dildar

Binoşim mey ji ew çeşman ġezelxwan bim li bo zulfan
Ji helqê zulfik û zulfan bixwim nûrê heya dildar

Wekî ‘Ezra tu meqbûl î wekî Şîrîn tu mehbûb î
Ji sermestan çi meczûb î ji re‘naya tu yî dildar

Ji gîsoyan lefa berde ji wan qiştan pera berde
Ji çeşmê nergisî berde ‘ebîr û ‘enberan dildar

Ne huqa min bide nazan ji kêfxoşî bibîn murde
Şebîhê taqeta min de bipêç destim li ser dildar

Bipêçim ez binoşim ez meya le‘lê ji ew gerden
Li cergê ma eve derd e hebîb û nazikî dildar

Ji rûyê xwe veke benda esîr murde di qeydê da
Tu şahid qudsiyan benda veke zulfan eya dildar

Esîrê rûyê şengol im hebîbê rûyê Cemşîd im
Di hebsê da ezê bend im di hubba Şîrina dildar

Ji dildaran tu sultan î ji mehbûban tu şahan î
Ji ‘eyyaran Mesîha yî ketim benda şehê dildar

Îro Me Dî An Şahê Şam

Îro me dî an şahê Şam xerram dibî wek neyşeker
Zulfên du ta keftin Husam ey nêrgiza wek neyşeker

Nêrgiz xeram her subh û şam meş'el didan wek le'l û cam
Derket ji burcê serweram şubhê ġezenfer neyşeker

Le'la Bedexşan her me dî wek nêrgiza yekta me dî
Qamet zumurrud her me dî şox û şepala neyşeker

Zulfên ji 'enber kir helek bisko ji mawerdê xelek
Helqe bi helqe bûn gelek teşbîhê tayê neyşeker

Tirka ji bejnê bû xeram weqtê seher ba weqtê şam
Meşha li baġê serw û dam qamet zumurrud neyşeker

An rû meya qamet elîf libsê di ber etles qedîf
Gerden zirav e hem nehîf ew şamiya 'ariz şeker

'Ariz şeker zulf bûn kemer ez 'aşiqê birhê 'eceb
Zulfa çelek mey rihte şer ebrû ji mawerd û şeker

Çenber ji xalan kir çeper awir ji tîrên Mîr Şeref
Tîr dane min wek Xan Şeref ew tûtiya xwarî şeker

Kuştin Şeref ba Lengi şer durrdaneya gerden sedef
Kakul reşa her dane şer Çengîz tu yî ey neyşeker

Ew tûtiya minqar bi xef bal û perên her bû sedef
Se'dî bixur j'le'lê şeker şekker ji le'lê neyşeker

Min Dî Şepala Meyperest

Min dî şepala meyperest kember zerîn ebrû qemer
Ser da libasê qudsiyan mehpeykera ebrû di qer

Mehpeykerê reşta dilî ta ta çunîn zulf mawerê
Zî per kirin ew çenberê me'd xergeha ebrû di qer

Min dî ji ġeflet ew perî bû mawerê leb şekkerê
Mada ji bedrê kir kerî bi enguşt û ebrû di qer

Îro seba rakir 'isab ew dêm zerî rakir niqab
Şewqa ruxa dil kir kebab dêm meş'el û ebrû di qer

Min dî ji ġeflet mey rijand ew esmera 'enber weşand
Van saqiyan saġer gerand çîn kirne lef ebrû di qer

Çîn kirne wê sedġê gulî bo bilbilî bi tor û gulî
Dil kuştiye zerrîn gulê meş'el dida ebrû di qer

Ev perdeya 'işq û evîn dad û meded j'remza evîn
Rakir ji dil ah û enîn şeqqe'l-qemer ebrû di qer

Şeqqe'l-qemer j'remza zerî lewma me dil bu sed kerî
Rewneq ku daye saġirî dil 'aşiq e ebrû di qer

Dil meskenê 'işqa meyê wer *bingere*[37] cama Cemî
Bo te bibim remza meyê der 'işreta ebrû di qer

'Işret bike şeb ta seher mîrê 'eses çerx û di ger
Badê binoş j'zulfê di ker şehbazê min ebrû di qer

Şehnew mehasib kuştine halek li wan qet hiştine
Lewma **Se'îd** wê hiştine der 'işreta ebrû di qer

Hey hey dinoşîn badeê yar qesd û guvt û hey he'ê
Çendî dibêjt hey he'ê wer suhbeta ebrû di qer

Îro **Ġeramî** mey kişand wî dest û ser pur daweşand
Ta heşrê mest e cam keşand j'vê muhbeta ebrû di qer

Ev mesri' û beytên **Se'îd** der muhbeta şahê mecîd
J'xûna dilê wî bûn be'îd dad û meded ebrû di qer

Min dî seher wê hate ger çerx û felek wê têne ger
J'işqa Se'îd wê bûne ker dad û meded ebrû di qer

Min dî seher wê birye der j'vê badeya zerrîn kemer
Munkirî da bêt û ver leb teşne ye j'ebrû di qer

Ber bejn û bala xoş bixûn ger dil bidî va mewcê xûn
Behrek ji 'işqê dil vexûn der wesleta ebrû di qer

Kemter nebîn çerx û felek da gêr nebîn j'işqa çelenk
Wesfa bikîn wek zêr û çenk der medheta ebrû di qer

Îro Seher Xeram Bû

Îro seher xeram bû toq ġebġeba beden nûr
Destê sipî kemer bû qed ‘er‘era beden nûr

Hatî seher dilaram zulfê siyah rijand cam
Lê dil ji wê kirî kam zulf bû siyah beden nûr

Ev şahidê **Se‘îd**a xemlî di rojê ‘îda
Ya rebb çi mah û peyda ev dilbera beden nûr

Ellah ji ‘işqê yara saqî ku kase gêra
Da destê min bi vêk ra sed camê mey beden nûr

Hate şepal ji burcê wek kewkeba ji durcê
Nayêt hisab ji durcê ‘işqa me jî beden nûr

Îro seher nihan got badê binoşe ‘aşiq
Kîna zehadê natiq bo te rijand j’dilê kûr

Ġeyza felek qedîm e duşmen gelek hezîn e
‘Işqê bi nû cefayê min tu heyî beden nûr

Narê evîn û ‘işqê derket ji kohê Tûrê
Munkir nedît bi zorê îsa ji vî beden nûr

Vî zahidî ji min bir hiqd û hesed ji ‘işqê
Furyadê min ji destê didin bi dest beden nûr

Reşta dilê me ‘aşiq ev dilbera ‘ezîz e
Ya rebb çi şah û yar e ew bû li min beden nûr

Ev nazika dila çîn derket ji perdê gerçîn
Ceger **Ġeramî** da şîn zulf eswed e beden nûr

Ev enwera cemalê derket wekû lu'alê
Mercan li zend û kalê bû 'enber û beden nûr

Hûr hûr meşa şepalê netrik weşand ji xalê
Şabaş li gîsû xalê canê me kir beden nûr

Meqdem nisarê Yûsif gah gah digîn[38] me canî
Şabaş li xemla canî rûhê me kir beden nûr

Dehr û zeman tu nîne dê 'işqê yar meşîne
Zahid bike tu kîne dil daye min beden nûr

Bextê te kor û tar e dil sîne jî tetar e
Der sem' e rû te ġar e dare ji vê beden nûr

Carek were sehergah min gahi gah nezergah
Meyze bike bi agah ev dilbera beden nûr

Her çî ji dil binalî ji badeyê dikalî
Herro ji dil xiyalî wê tûra dil beden nûr

Ev subhe dane dane nînin xeber buhane
Lew merduman te dane badê binoş j'beden nûr

Ev dave bayê av e têk hîle û ji nav e
Ġayet te dinya nav e dil dûr e te j'beden nûr

Yek cam tu zewqê rake j'vê badeyê mekan ke
Ta qend û şîr te kam ke nazik bebêj beden nûr

Ta tu digêrî zuhd e rû were ya û bend e
Nagêrî j'dil tu qend e zewqek nedî j'beden nûr

Bo te xulasê bêjim wan subheyan ne mêj im
Min sedyê ‘işqê mêjim ji badeya beden nûr

Wer dam biçîne Luqman em ‘erz bikîn dil û can
Nîşan bidîn dil û can da bingerê beden nûr

Bêjin me derd ji can e derman bike tu can e
Derman bike ‘eyan e j’vê hikmeta beden nûr

Ger gote subhe dane derman ji bo te can e
Subhe tu dane dane badê binoş j’beden nûr

Yek car nihane gotî der bezmê Lest nihanî
‘Işqê binoş ji camê ew der dibû beden nûr

Min dil ji camê nûr e wek kohê Nûr û Tûr e
Hey hey me dil bi nûr e j’vê badeya beden nûr

Lew mest û rind û har im min dil wekû buhar im
Pur bihn û bûyûdar im j’vê badeya beden nûr

Diçî hisab ‘eyanî der destê min giranî
Bade ji rûyê canî meş‘el veda beden nûr

Ya rebb qefes çi nûr e mişkatê şewqê Tûr e
Suhbet bi Mûsa nûr e dil Tûr e min beden nûr

Qafiya Z - ز

Ey Key Feruy Di Her

Ey key feruy di her ji xeyalim şeb û rûz
Bibe hemrahi dilî ey tu şepal î şeb û rûz

Ji xeyalê feruy çeşmê belek birhê qemer
‘Eynî e‘yanê wucûdê şeb û rûz

Melhemî derdê birînim were xoş
Çeşmê bed kor şeved er şeb û rûz

Çeşmê **Se‘dî** dixurit bade’ê le‘li
Qismetê hubb û mey e er şeb û rûz

Şeb û rûzan de dikalim we dinalim
Derdî ez dixurim er şeb û rûz

Tu hilîn zulfê girah ji yara şepal
Kederê ez dixurim er şeb û rûz

Kedera zulfê belav û di reşa xûnê dal im
Ketme benda evînê er şeb û rûz

Çi evîn bî nekirim ji mey û qerar
Ji evîna te şepalê çu şemal im şeb û rûz

Ji evîn û ji hewayê dixurim xûnê ‘eqîq
Were canim were xanim şeb û rûz

Ji firaqê me cihan sohte ji deng
Nayî û çengê dixurim şeb û rûz

Şeb û rûz sûye li min er di hewayî
Narê ‘işqê dixurim er şeb û rûz

Ji hebîban me nedî weslê wusûl
Cegerim bûye pelek er şeb û rûz

Rikî canim dijenit her firaq û ji hewa
Me nekir sebr û qerar çun şeb û rûz

Rûz û şeb bo me reqs er ji fiğan
Ji fiğana ji newaya xeberim er şeb û rûz

Şubhê gerdûn û ceres bûme fetil
Ji hicabê were cana er şeb û rûz

Me Se‘îd serxoş e dil îro seher
Bide kasê tu xiyal î şeb û rûz

Şubhê min bûye **Ġeramî** we ji ‘işq
Bi ah û ohîn ji xiyalê şeb û rûz

J'ġema 'Işqê Bi Efġan im

J'ġema 'işqê bi efġan im wekû goyan dibazim ez
Cihan hate bi efġana wekû heyvan nihan im ez

Nihan bûme di camê da ji ber narê di 'işqê da
Esîrê 'işqê Leylê me wekû baran dibarim ez

Wekî berqê dikalim ez ji ber 'işqa şirîn ġunça
Bi cû hatin ġezelxwanê wekû Mecnûn dibarim ez

Di 'işqê da çi sultan im di şi'rê da çi Ferhad im
Dema hatin du pîrê min kemer bestim li ber wan ez

Wekû pîrê muġan da min meya le'lê ji xumxanê
Du zulfê muġbeçe dîtim li wî 'aşiq **Se'îd** im ez

Tenê **Se'dî** bi Ferhad ve dizanit lezzeta 'işqê
Ji pîrê xwe dizanim ez ez im medhûş ji 'işqê ez

Werin meyxaneya 'işqê binoşîn mey ji ferfûrê
Li wê duxter şehê xûban didit badê ji zulfê ez

Debîrê ma bûye serxweş ji ber 'işqa şirîn ġunça
Ji 'işqê Şirîn û Leyla nema hoşim li ser wa ez

Eger Kewser dixwazî tu bibe hemrah ji bo yaran
Kî bextê şahê 'uşşaqan biye mes'ûd li zulfa ez

Ġeramî tu were vê ra dused caman bi yek vê ra
Binoş dîsa bi min vê ra li meyxanê muġan im ez

Dîsa Li Me Bûyek Lezîz

Dîsa li me bûyek lezîz bihna şepala pur ‘ezîz
Hubba şirîna ‘er‘erî têtin ji baġê nû ‘ezîz

Baġê di wî çîçek buhar tê de hene sor ‘endelîb
Gul çîçek û ‘eynê ‘ebîr têtin ji wî baġê ‘ezîz

Yarê ‘ezîz wek bilbilan libsê ‘ebîr û sosinan
Lev çêkirin ji perr tawusan xerram dihat yara ‘ezîz

‘Eynî ‘ebîr û ‘enberan bazî kirin ba sorgulan
Lê hatine Zîn û Şirîn Mem tê ez im yara ‘ezîz

Xerram dihat şam û seher awir rijand j’ġemz û di perr
Awir şebîhê berq û şerr kuştin du sed şahê ‘ezîz

Kuşte melîkê Farisan ba Qeyser û Kisra û an
Top û çeper sed pehlewan bestin li dor yara ‘ezîz

Sed pehlewan ber textê wî Kisra dilerzî j’xewfê wî
Xerc û xerac da ‘alemê kolê li ber şahê ‘ezîz

Kolê di wî şêrê Xudê her koleyek wek çengileng
Şehzadeê şeh kir zulif gîso herîr çenber ‘ezîz

Çenber hejand ber asiman hey hey didin teqdîsi şan
Leyla qedir rewşen ji an j’şewqa kulaha wî ‘ezîz

Ev ser kulaha wî şehî lu’lu’ li ser taca di wî
Benda girîbana qeba lu’lu’ dibestin ya ‘ezîz

Benda girîbana zerîn cezbek dixwand der medhê Zîn
Sor çîçekan mestin şirîn her bû ji ‘işqa wî ‘ezîz

Mestîn ji ber çerxa felek zulfê di xwe kirne helek
Hafiz Xuda ey şud melek medhê dikîn b'rûhê ‘ezîz

Sed Xusrewan bîne ġulam medhê dikîn bo şahê şam
Yarê ji bo te ey ‘izam mestim ji wê zulfa ‘ezîz

Mestim ji bûya gîsuwan ‘enber rijan ber kakulan
Xalê ‘ebîr û ‘enberan rihtin li ser dêmê ‘ezîz

Rûyê ‘ezîz cedwel kirî cedwel ji nûka enzilî
Rû jî şebîhê sorgulê lê hat xunav subha ‘ezîz

Subha Elest nûr hate dil saqî ji newmê rihte dil
Wê sa‘etê hat yari dil rihte dilî xemra ‘ezîz

Dîsa li me da cezbek şirîn cezba şepala pur ‘ezîz
Xerram ketî j’bala w surê reyhan e bisk dêmê ‘ezîz

Bejna j’semen [bû]bû xeram derket ji burcê ew Husam
Mehrem sera bû lalezar muhbet rijand yara ‘ezîz

Muhbet pur e dêm esmer e reyhan reş e kakul xoş e
Çeşmê siyah derdê dil e reyhan pur in l’dêmê ‘ezîz

Balayê reyhan ew hilal gerden ji zulfan bûye mal
Werdê di cûr cama tehûr em ‘aşiqê zulfê ‘ezîz

Taca sedef pur şu‘le da şem‘ û çira mutleq dida
Bû hate dil lew me dida bangê *Enelheqq* ya ‘ezîz

Bangê *Enellah* daye dil lew Ke‘be û hem Tûr e dil
Beytu’l-qudus her bûye dil ustadê ‘işqim ew ‘ezîz

Reyhan ji xalan bû belav cebhet enî lê hat xunav
Zulfa girah sîr-ab û av em ‘aşiqê rûyê ‘ezîz

Dêmê xunav lê hati xal subhan ji remza mîm û lam
Bangê huwiyyat hate mal lew serxweş im yara ‘ezîz

Reyhan li ser zulfê şepal kes dê hebî sirrê vemal
Ew meş‘ela meymûn[39] e bext pur tali‘ û bextê ‘ezîz

Tali‘ ji me îro **Se‘îd** em ‘aşiqê nûra hemîd
Gerçî heye hicret hedîd meczûb ez im yara ‘ezîz

Gerçî ez im dîn û hezîn lêk ew ez im rindê şirîn
Bûya ji zulfa em hebîn hemreh j’me re yara ‘ezîz

Mûnis li xelwet rûyi yar em tûtiyê baġê di yar
Şekker şiken îro **Se‘îd** der medhê wesfê ew ‘ezîz

Qafiya S - س

Îro Ji Nazê Dilberê

Îro ji nazê dilberê bîne xumar û bê nefes
Nazê ji çehvên esmerê mey rêhte dil dem dem nefes

Dem dem kirîn xummar û mest em serxoşê çeşmê di mest
Xûba şirîna meyperest rêhte dilî nûra qebes

Nûra qebes da şahidî ew şahidê rû esmerî
Teşbîhê Zînê bû perî derket ji burcê pur qebes

Eqdes qebes nûra rû ye yeġma kirîn b'zulfa rû ye
Yeġma dikey b'ġemz û sirre tavê dilî hubba qebes

Nûra cemala eqdesî tîz e şebîhê eqbesî
Narê kelîm 'işq û evîn narek ji nûra pur qebes

Yara qebes eqdes me dî ahû sifet îro me dî
Çeşmê siyah enwer me dî nûra du çeşman bû qebes

Tîrê ji mujjan jehriyin weşşand ji mujjan esmerîn
'Alem ji wê bû Tûri Sîn lê ez tenê rû-reş hewes

Rû-reş em în şem' û cemal biskê ji [ser] dêmê vemal
Carek hilîn benda şemal da ez bibînim yek qebes

Da em bigîrîn zulfê to medhê bikîn bo rûyê to
Da ez bibim aġûşê to nûra te ye eqdes qebes

Ger yar bibit aġûşê min em jê bigîrîn zulfê min
'Alem bikev bin narê min **Se'dî** nerêk zerre teres

Îro **Ġeramî** 'aşiq e wek min Se'îd û Wamiq e
Der 'işqê yar xoş natiq e wî dil ji 'işqê bû qebes

Îro Ji Remza ‘Er‘erê

Îro ji remza ‘er‘erê dîsa fiġan im wek ceres
Remzên di wê nabin hewes cana tu yî feryadires

Feryadires min her şirîn biskê ji mawerdê weşîn
Tîr dane min her jê hejîn bûme fiġan hemçû ceres

Ġemzê ji çehvên mesti pur tîz in şebîhê tîr ‘Umer
Derdê evîna pûşezer her tê ji dest feryadires

Tîrên di wê her goşezer mest in wekî xummarê xemr
Cegrê diçîn b’subh û seher saqî tu yî feryadires

Feryadresan bînin rehim ez kuştiyê hicra şeh im
Rehma te ye bê hedd *cemem* hey hey dikîn feryadires

Hey hey dikim efġan Husam saqî werîn yek kas û cam
Ev saqî re mehpare lam got Hewrema feryadires

Saqî ku dîm ‘er‘er şepal ruxsar hebî cama zelal
Em serxweşê xemra helal saqî tu yî feryadires

Ew nêrgiza mader sedef mey rêhte dil j’cama sedef
Hicra rûya da min esef lûlî weşî em kir ceres

Derket şirîna leb şeker şubhê di Leyla neyşeker
Xerram dibî j’semn û şeker Şîrîn biye feryadires

Îro ġezenfer ew Husam daye **Se‘îd** yek kas û cam
Cama Cemî ev tas û cam îro seba feryadires

Qafiya Ş - ش

Se‘îd Rêkir Ji Yarê Ra

Se‘îd rêkir ji yarê ra di ‘işqê da telef bûdeş
Cewab da min ew hudhudî heqîqî ‘işqi dilsûzeş

Ji wê cabê fereh girtim ji leb sorxan şerab girtim
Cewabek şad û xurrem bû ji wê rojê dilim xoşeş

Ji Tirka Hewremî noşim şeraba le‘lê xweş noşim
Çi hudhud bû şerab poşim çi tûtî bû kelam xoşeş

Lebiş sorx û zeban şekker ji le‘lê xod wekû şekker
Şeker xware bi leb şekker ‘ezîzê min bibe şadeş

Ke zahir batinim bo te fereh şa be didim xelwet
Çi pur rehm û xweyî şan e ji bo rindan fereh sûzeş

Ji Tirka Hewreman bînim mey û bade di her weqtan
Purî meqsûd kete caman letîfa nazika rûxeş

Ji cama wê çi xweş bînim bibit meqsûd ji bo rindim
Letîfa nazika xûnim subihgah û di her şameş

Ji meyxanê **Se‘îd** girte cihek tarî dixwit bade
Di camê da dibînim meh rûyê yarê du çeşmaneş

Du çeşmê nêrgisî dîtim ġezelxwan im ku ew dîdim
Te‘alellah çi wî dîdim siyah çeşm e şeh û şaheş

Ji mujganî siyeh rihte mey û muhbet ji bo her kes
Ne şubhê min dixut her kes meya rengîn ji ew şaheş

Li ser textî çu Belqîs e ji sirra ve çu ‘Îsa ye
Ji perwaz û ji sihra ve çu ‘eyyar e sihirdareş

Sihir da min ji çeşmê xwe medih kerdem ji bê xoşî
Ji ‘işqa wê çu girdab im meya tîzî nihan da meş

Ji gulzarê were canê ji ‘eksa rux bike camê
Tu bavêje niqaba zer te sohtan dem çu perwaneş

Ji gulzarê semensayan tu xerram be ji va baġan
Cihan sohtim ji awazim bimeş cana ji ber caneş

Ji meyxanê were şahî ji bamê[40] ‘erş were camê
Cihan sohtim ji hû w hayê kirim canî dil û sûzeş

Ji can û dil disûzim ez di meyxanê dinoşim ez
Ji hicranê dinoşim ez guzar canim me dil sûzeş

Cana Weşîn Zulfa Di Reş

Cana weşîn zulfa di reş hem çenber û biska di reş
Werke li dor çeşmê di reş kakul reşa cana bimeş

Saqî were îro seher zulfa şepal rûyê qemer
Birhên ji rengî mahî nû tîran nedin j'goşê di reş

Saqî were ji burca sedef ev tu derî mader sedef
Mey hate dil j'rûyê sedef şîrîn xef e Hewrem sirreş

Tirka welatê Hewreman guft û kene wek Xusrewan
Xusrew li derbendê şehan Ferhad ez im Şîrîn perreş

Ferhad ez im **Se'dê** ġerîb Şîrîn biye ev 'ezrewî
Tebrîz weş im ey şahê min Şîrîn li min bûye perreş

Mehpare bû ew nûcuwan şems û qemer lebla cuwan
Ya rebb bide selwa rewan hem 'enber û miska di reş

Misk ezferê kakul perrê ġemz ahuwê b'ġemz û sirrê
Derkev j'me re sultan şehê em jî ketin hicra di reş

Hicret biye seddek j'me re şubhê Felatûn firqet e
Firqet ji ta bin rû-reş e hicret ji bala çu nexweş

Her çî ji firqet ber xur e nakit penayê firqet e
Keskî diye ateş xoş e ateş ji firqê her diweş

Em ateşî ya Hewremî mihnetber în firqet xurî
Firqet ji şoxan her ku dî kerbî ceger der firqeteş

Xûn hate dil çun mewcê ab wek asiya ger dam çu ab
Derya ji ateş her em în çerxa felek lingê di reş

Tîmûrileng hatî bi meş îro reqîb her pişt û perr
Hewrem nihan hat û bi meş destim digirt guft û bi meş

Xende ji le'lê qendşiken xaka ji qend rêzkir ji qend
Pişt û penahim her ew e xurrem j'me re kakul di reş

Hewrem dihat j'burca meyê destê me girt çûn butkedê
Dêrê hebî butek se'îd teşbîhê Leyla rûperreş

Min dî li dêrê yek senem subhan ji xellaqê senem
Zulf kirne gir misk lê qerr rêhte dilî j'zulfa di reş

Ba meyfiroş seyr kirde min hetta ketîn dêra butan
But xwaste min j'le'lê di qend destê me gîr ber gerdeneş

Hetta ebed ez 'abid im qible ew e lew sacid im
Der secdegeh ew bî pîrî dêrane tê 'aşiq nemeş

Ya rebb neke terraş 'ebes çun bilbilî xwarxwar û xes
Bo min bide her van senem ba zahidî her xar bi xeş

Zuhd û xudî nakim Husam dîsa nekim zuhdê ne jî
Der defterê rûzê hebî em badexor 'aşiq pureş

Carek Were Ebrû Qemer

Carek were ebrû qemer biska diraz şehke w biweş
Weşşîn ji yara ‘ezruwê bûya ‘ebîr j’zulfa di reş

Reş kakulê ey ba hilîn benda girah hilne weşîn
Êsîr kirim vê surşirîn ez bend kirim b’hicra di reş

Vê hicretê w’ez kor kirim yekser li rê winda kirim
Qet nagirim zulf eswedan ey bade’ê hicret di reş

Saqî were der subhê ma sîmîn lefan bîne bi ma
Ey yar biyar her subhê ma ‘enber weşî firqet di reş

Zulfan di ser dêmê perreş rake were bo min bimeş
Vê hicretê buryand kebed ne‘re-zedim der hicrê reş

Ne‘re ji min çûne sema lewra ez im ber asima
Em çûn sema sekran bela saqî were bo min bimeş

Hişyar û sekran em diçîn hû hû dikîn ba teyrikan
Yara se‘îd tûtî ‘ezîz teşbîhê zumrud her bimeş

Hû hû dikîn ber sorgulan perwaz me bir [ber] asiman
Bangê huwiyyat hat nihan ew neyşeker hat û bi meş

Ew hudhudê minqar zeheb ew neqre perr gerden zeheb
Da merheba ew neyşeker guft *û* digot ey welde xweş

Herdem dixwand merheb selam *guftem peder ya eyyuha*[41]
Cam bî sedef weqtê selam cam bî ‘eqîq weqtê bi meş

Minnet ji bext pur hate ew teşbîhê bilbil got û ew
Se'dî were ey şah pes û şaha ji le'la miskî reş

Weşşand ji biska 'enberî miska Xeten j'remz û sirrî
Cam hate lê ew surperî qubba felek çun zerre-weş

Bangê hûyê ez kirme mest weqtê sehergaha Elest
Lewma em în mexmûr û mest lew wasilê nûra pureş

Yarî dixwand weqtê sema *ey nûri 'eyn eşrib biha*[42]
We'de me dî j'le'lê şeha *minna*[43] bixo j'zulfa di reş

Rûyê qemer kefte di cam merheb rijand Şahê Husam
Guft û digot meczûb 'ezam hetta ebed sekran bimeş

Bangê neyê zumrud me dî rûyê şehê xawer me dî
Labud hebî sebrê bikî min tu kebed j'weqtê tebeş

Reş kakilê cinîn dilî bend e **Se'îd** lê her welî
Mest im ji bûya kakilê meczûb e dil j'vê zulfê reş

Îro **Ġeramî** serxweş e payê didêrit dest weş e
Ev bangê vê çendî xweş e der bezma ma ew bûyê xweş

Dîsa Were Ey [Nû]Cuwan

Dîsa were ey [nû]cuwan weş ke ji xwe miska di reş
Kakul reşa dîsa biweş îro were camê bimeş

Çeşmê siyah rake şeha zulfa şepal ker ke du ta
Gorî bibim xal û xeta hetta heye bada di reş

Bade werîn ey saqiyan der suhbetê lez ke w biya
J'her du lefan berde perra mutrib tu de çenga di reş

Wer mutrib û xweş ke defê awaz her in hetta şeha
Lutfê bike ey surperî da em nexwin hicra di reş

Van lewliyan xar dane şer mihnetber în hetta 'umir
'Umrim telef der 'işqê pur cerg û kebed her bûne reş

Ker bî cesed wek nay û ney van esmeran rehmek nekey
Bê hedd ceger lê bûne key her bo [ji] hicra rû guleş

Qendê gulê bo min bimeş dîsa seher miskê biweş
Der suhbetê cana bimeş tac û kulah dîsa biweş

Baġê şehî sorgul gireh bilbil li wê tûtî heme
Minqar li min bûye gireh mihnetxur în j'hicra di reş

Şukrê Xudê dem dem dikim çeng û defê min dil bidim
Der defterê sade ez im der 'alemê ez bîm nexweş

Serxweş li yaran pur hene saqî li baġan pur hene
Dîsa ez im şekker xure carek negirt zulfa di reş

Hikmet nizam yara çi ye cergim biye nûr û mey e
Sîne w kebed têk bûn ker e fewrek didin j'xûna di reş

Mehze ji hikmet ya **Se'îd** bednam bibî j'işqa mecîd
J'roja Belê ev bû bedîd serxoş bibîn l'yara keleş

Bednam nekin ey Bohtiyan j'roja ezel em Se'diyan
Qadir li ser def'ê niye ger bê 'Elî Kerrar bi meş

Da'im dixûnîn şukriyan her bo ji 'işqa lewliyan
Medhê bikîn wek tûtiyan ber çenber û birhê di reş

Sed Xusrewan dane ecel carek nedîn rûyê ezel
Teşbîhê 'enqa pur ecel nayêt di dam weqtê bi meş

Ji Meczûban û Sermestan

Ji meczûban û sermestan dinoşîn mey bi noşanoş
Lebê le'lê didit der mey meyê noşîn bi noşanoş

Niye hoşim ji ber noşan sehergahan niye hoşim
Meya le'lê nehişt hoşim çikû hoşim li noşanoş

Ji ber noşan nema xorde ji ber coşan nema xwande
Meya baqî didit şewqê emê noşîn bi noşanoş

Ji destê yar dixwim bade ji destek sor sipî zende
Şefîq û enwer û rehmet dinoşîn mey bi noşa noş

Ji balayê weşîn yara zebad û 'enber û bûyan
Ji min bawer ke peyġamê dinoşîn mey bi noşa noş

Were saqî li min durdî ev e serxoş li vî baġî
Se'îdê rindê Leylayê meyê noşit bi noşa noş

Tu wê zulfê bike renge di nav badê bike benge
Ġeramî min te aheng e bikî çengê bi coşacoş

Dil û sîne me ev çeng e sehergahan me ev reng e
Me da 'alem yekî deng e Se'îd bade bi noşanoş

Me rû reş bû di 'işqê to me da riswa ji şewqê to
Me dil hûr bû ji hicrê to me nayê dil bi coşacoş

Bi coşê min ku ez zanî şubhê du zulfê nûranî
Çi eş'ar û ġezelxanî rewanê min bi coşacoş

Yara Şepala Neyşeker

Yara şepala neyşeker wek ku dihat ba zulfê meş
Meşha seher ew neyşeker der baġê mîran her bi meş

Baġê di mîran bû weten dê bêt xeram ew ser weten
Yara kerîm mislî weten der baġê Zînê bûye meş

Carek weşand zulfa du ta ‘alem biye şems û qemer
Burca qemer lê bû teber tîr dan ji qewsên goşe reş

Tîrên ji birhên goşezer kuştin dused Tîmûrê reş
Sed Mîr Şeref kuştin bi perr em wek Helac ber ç[î]zi beş

Perda rûya her goşe zer şems û qemer gerrdan li ser
Dêmê zerî bûye qemer şêrîn tu yî ey şoxi meş

Yara cemîla le‘le poş bayê seba rakir bi weş
Qenda dirêja miskê reş xerram dihat wek kokê meş

Carek hilîn bayê yemîn poşa zera wek yasemîn
Zulfa ji ‘enber daweşîn kakul reşa bo min bi weş

Kakul reşa lê sîm û zer xirrîn ketê subh û seher
Berde ji tacê zer di perr mujgên purî j’miska di reş

Tîrên ji ġemzê ebruwan kerkir kebed l’sahib dilan
Sahib dilan dan sekretan derda diçînim j’birhê reş

Derda diçînim j’hicretê îro ez im rindê butê
Vê hicretê dil herrişand tê da nihan tîrê di reş

Tê da birin bist û kulab dem dem didan penç û ġurab
Can jî bija ew dil xirab herdem ji hicr û firqeteş

Firqet ji yaran niqmet e niʻmet li min her zehmet e
Zehmet ji hicr û firqet e wek ʻeqreb û marê di reş

Tîrê ji hicrê hêsin in çend yek şebîhê ateş in
Dil bû pelek j'hicra şehin cana bibe nar û şereş

Yara ji tayê sosineş bisko ji mawerd û binefş
Mawer di nêv zulfa binefş ebrû ji billûr û binefş

Billûr kulaha esmeran setwet dide bo ʻaşiqan
ʻAşiq ketin dama şehan naxwin ji ġeyr dûdê di reş

Dûdê di reş penc kir nihan şubhê piling û qunçiyan
Dil da diçîn her saʻetan ʻaşiq-kuj e ew dûdê reş

ʻAşiq-kuj e ev dilberî rehmê bike selwa sehî
Çeşmê di reş ahû perî awir didan j'ġemzê perreş

Ġemzê perran xûn daye dil kir sîne min wek cerg û dil
ʻIşqa li van her hate dil zulfa du ta miskê di reş

Zulfa du ta kirye belav qed ʻerʻerê pur ab û av
Em ʻaşiqan dil bû belav qelbê **Seʻîd** bî xûnê reş

Dîsa Were Ey Nûcuwan

Dîsa were ey nûcuwan weqtê sehergahan bi meş
Der baġê lale wer bi meş şam û seher cana bimeş

Îro li min hicret pur e dil ateş e xûn da kef e
Em xûnxurê j'vê firqetê ker bî ceger ez bûm nexweş

Naxwiyê xweşî w firqetkeş im her bo ji hicran în şehim
Şubhê **Se'îd** firqetkeş im îro reqîb b'keyf û xweş

Îro reqîb ker kir cesed zulmet dihe dêw û hesed
Le'net li ser j'nas û semed şaha ji baġa her bimeş

Teşbîhê 'er'er wer xeram vê firqetê kuştim Husam
Xûn bû rewan der qelb û kam daġê di wî xûn daye reş

Minqarê bilbil bû kerî der medh û wesfê surperî
Şubhê şehî nînin perî yara cuwan îro bimeş

Meşha seher şahê perî van kakilan dane kerî
Ber dêm û rûyê esmerî hûr hûr seher cana bimeş

Îro felek wê hate coş şubhê **Ġeramî** min bi coş
J'van şi'r û remzên çendî xoş hûr hûr seher cana bimeş

Îro Se'îd Ji Noşan

Îro **Se'îd** ji noşan maye sukar û serxweş
Ger nîst neyşeker-meş têk ez im çu ateş

Derkev ji burc û rewzen meş'el beden te ruxsar
Biskê belav ke 'enber îro ez im çu ateş

Reng ateş im ji hicran ta key wisal canan
Canê 'ezîz çu şem'ê maye li me çu ateş

Perwane em li şem'ê ey cem'ê nûrê ruxsar
Ruxsar ji Şahê Hewrem dîtim ji rengê ateş

Cana ji çeng û nayê bîne şebîhê şem'ê
Wer guh de rûyê yaran şem'ê şebîhê ateş

Ta key hebîn ji hicran çun bilbilan bi efġan
Carek nexwim meyê le'l kakul nebin li min meş

Ellah ji rûyi saqî mey daye min çu Hewrem
Nêrgiz li baġê şahan sergeşte bî û la-heş[44]

Feyz û 'ulûmê çengê hate ji destê yarê
Hetta nebîn ji noşan sekran nebîn bila-heş

Çenga ji cegerê şahan hate j'me re bi erzan
Wer gu[h] de camê Cemşîd da terk bikî kemaleş

Mutrib ji feyzê fitret da min qedeh ji muhbet
Hey hey binoş tu badê j'wê esmera gula geş

Wer gu[h] de dengê nayê weqtê şirîn sema bê
Selwa zirav wekû bê meşha şebîhi ateş

Ateş rija ji baġan dil xeste min ji hicran
Qelb û ceger dixûnin derdê li min gulageş

Husna ji rûyi yaran bê hedd biye nepayan
Her çî nebî çu ewwel payan niye cemaleş

Derda ji hicrê yaran nalan dikîn çu rindan
Ger rû nedit xunavê têkî ez im bila heş

Vî bilbilî ji baġan mey xware ew ji zulfan
Mehpare rû gulageş em bilbilê cemaleş

Leb teşne çûme abê ev karê min şerabê
Der ‘işqê yar serabê pur dîm j’hicreta muşewweş

Mewc û ‘ucac li dilda şubhê seba bê tê da
Dil qilzem û muhît e j’vê badeya gula geş

Gih rind û gih sukar în gih şeyx û gih îmam în
Gih mest û gih xumar în j’vê şerbeta şîrîn xweş

Gih mîr û gih feqîr în gih şah û gih wezîr în
Gih şîr û gih pejîr în j’vê cameya meya xweş

Gih pîr û gih cuwan în gih behr û gih sema în
Gih ‘erş û gih mezar în j’vê nêrgiza şîrîn meş

Gih tîr û gih tiveng în gih nûr û gih şerab în
Gih tûr û gih bi nar în j'vê sukreta dilê xweş

Gih şad û gih hezîn în gih Zîn û gih Şirîn în
Gih leyl û gih nehar în j'vê muhbeta meya xweş

Gih Şems û gih Se'îd în gih hor û gih ġulam în
Gih şîr û gih çu ab în ji xemreta şehî xweş

Gih mehw û gih belav în gih mehw û gih beqa' în
Gih ġeyb û gih nihan în j'vê şerbeta gelek xweş

Gih bend û gih fena în gih bay û gih teyar în
Gih da' û gih dewa în ji vê meya qewî xweş

Gih ber û gih hewa în gih qaf û gih ġeram în
Gih dîn û gih bihoş în ji vê meya dilê xweş

Gih cezb û gih kemend în gih qend û gih çu cam în
Gih rûh û gih xirab în ji vê meya me dil xweş

Gih neql û gih serab în gih dû û gih cefa' în
Gih derd û gih şîfa' în ji vê meya dil l'wê geş

Gih mehr û gih çu yar în gih yar û gih neyar în
Gih 'işq û gih ne 'işq în ji vê meya me dil geş

Gih tibb û gih tebîb în gih derd û gih hekîm în
Gih terb û gih gulab în ji vê meya me dil geş

Îro Ji Dil Xûn Daye Kef

Îro ji dil xûn daye kef tîrên di birhan goşereş
Reş ebruwan kirme hezîn berdam dinê her bextireş

Necma se'adet bû xefî ya rebb bike bo min celî
Da em bixwin bada ruxî zulfê perî tîr dan bi weş

Weşşand j'me re vî Hewremî zulfa 'ebîr û 'enberî
Ker bî ceger j'derdê perî hicretkeş în şêrîn bimeş

Bextim nema der 'alemê rûyim nema der nezdê wê
Bo çî kirîn sekran li xwe nadî li min îro du reş

Bo çî kirîn Mecnûn li xwe Leyla ew e em erġenûn
Yara niye qedrê **Se'îd** bo çî kirîn rindê nexweş

Heqqê wefa bînin diçe her bo hewe canim fida
Canim guzar der 'işqê wî rehmê bikîn şahê perreş

Sed 'aşiqan xwar bir ji we illa ez im bedbext cuwan
Der defter im sade ev e bedbext bibîn hem rû di reş

Xûban wefa digrin cuwan hellal kirin xûna me jî
Xûna ceger bûye 'eqîq derdê li min zulfa di reş

Van dilberan cergim heland der nezdê wan xûnim helal
Hellac rijand neġme w sirûd ew her ez im ber ç[î]zi [b]eş

Ey yar niye ev sun' û kar her bo hewe em dil fekar
Carek negirt min ew di yar mihnetkeş im j'hicra di reş

Van esmeran kirme esîr her bo Xudê şukrê kirî
Her çî li min bînit Xudê ez pê xoş im wer bên nexweş

Ya rebb çi bî hatî li min Xusrew Felatûn yari min
Nagrit ‘eqil der ‘işqê min Hellac tenê rakir sirreş

Bada ji rûyi esmeran xûn û sirrê pur tê nihan
Tê da heye çûna rûhê ker bî cesed cergim di reş

Hetta niha ateş xurîn lê zêde kir qelbim birîn
Nisan niye taqet ji vê ev reng e em her bextê reş

Vî ateşî rakir ji dil xûn û elem hem tûr e dil
Şett û kenar rihtin ji dil dem dem ez im mexmûr di heş

Îro **Se‘îd** ateş-xur e mihnetkeş e j’bîra cihe
Sed hestiran rihtin ji me îro li min cerg bû di reş

Dîsa Li Min Wer Bû Evîn

Dîsa li min wer bû evîn hubba şirîna cem di reş
Dil Tûri Sîn ateş li nav derdê li min zulfa di reş

Subhan ji Xellaqê evîn weqtê Elest min bû nesîb
Ruqye li min nabin şifa em ʻaşiqê zulfa di reş

Saqî ku tê ebrû di reş tîran didê j'çeşmê di reş
Mutrib li vî baġî dimeş aba heyat zulfa di reş

Vî Hewremî dil kir kerî nûra rûya her bû zerî
Wer bîn şehîd ʻişqa zerî xûna me bî zulfa di reş

Ez bûm şehîd der ʻişqa yar xûna şehîd zulfa di yar
J'weqtê Elest mexmûrê yar mexmûrê ʻişqa rû-keleş

Mihrab ji yarî bû dida hişyar û sekran min dida
Bangê neyê her min dida îro senem rû bî guleş

Ez bûm şehîd yara tebîb derdî li min wesla hebîb
Şehla ji zulfê pur ġerîb dane dilî xûna di reş

Wer Manî û neqşê bibîn neqşê **Seʻîd**ê min bibîn
Ger ʻaqil î xûb î zehîr wer binger û neqşê di reş

Çîn û nigareş em hene em perwê şahê şehle ne
Hem serxweş în îro **Seʻîd** der bendê zulfa miskê reş

Dîsa mubarek sa'ima ew luqmeya *lehmi'l-xebîs*[45]
Mestê xerabatê Elest mexmûr bûyîn l'yara keleş

Qafiya S - ص

Ne Beşer Bû Melekan Guft

Ne beşer bû melekan guft û digo mest û reqas
Nezerek da te şepalê geriham mest û reqas

Ketibû reqsê ne beşer bû ne ji rengî melekan
Dixurim cam bi cam deste bi dest zulfe reqas

Reqisand selwa sehî dama ewê hubba meyê
Senemê hate nihan guft û digo **Se'dî** reqas

Senemek bû ne beşer bû ne zerî dêmê gulî
Çi sefa bî me didîbû çi beheşt bû em reqas

Lê ji işqê we dinoşîn bi sirr e camê sirrê
Me ji dil bûye Ġeramî seherê çengî reqas

Çeng û benga me ji dest çûye sema her bi felek
Lê ji xoş în dimeşîn 'erş û felek hate reqas

Her ev e min çendî xweş bêt û seher şah û perî
Lê ji zulfan biderit gîs û ruxan bêne reqas

Selwa Rewan Pîrê Muġan

Selwa rewan pîrê muġan da destê min zulfa reqas
Ew neyşeker da min reqis weqtê seher ez bûm reqas

Selwa cuwan hat ġeyyirî lew cemmilî b'zulf û perran
Birh[ê]n ji 'enber bû hilal l'meyxane'ê ez bûm reqas

Reqsîm ji wê her gah û gah lew her ez im b'fiġan û ah
Bade rijand sed ah û ah lew da'ima ez bûm reqas

Saqî dihat b'xend û surûr mey rihtiye j'cama bilûr
Sîm[î]n e saq werdê di cûr butxane'ê ez bûm reqas

Butxan e dil îro **Se'îd** Ke'be j'me re husna mecîd
Dêr û mesacid her me dîd der secdegeh ez bûm reqas

Carek nihan got û şirîn bade bixwarî badexor
Çendî dixwim j'cama bilûr hetta ebed ez bûm reqas

Şerbet nihan da min şirîn efyûn gerî j'rûyê şirîn
Saqî digot wer suhbetê lew da'ima ez bûm reqas

Gav gav dinoşim bade'ê lew serxoş im j'vê bade'ê
J'roja Elest min bade'ê bûbû nesîb dil bî reqas

Bejna Cuwan Xweş Xurrem î

Bejna cuwan xweş xurrem î lew ġeyyirî selwane reqs
Mest im ji wê lew cemmilî hem zuhre ye ṣa[ha]ne reqs

Reqsîm bi bangê noşenoş weqtê ku tê selwan bi coş
Libsê di ber feġfûr ji noş lew da'ima mestane reqs

Şam û seher her xemmilî wek 'endelîb guft û kenî
Xende ji le'la surperî suhbet girift selwane reqs

Reqse kinan têtin cuwan serxoş kire rindê cuwan
Serxweş kirim meş kewkeban selwa zirav durrdane reqs

Reqsîm ji ber çeng û defê sûza meyê wek qerqefê
Tûrê kelîm ew qerqefê tîz e evîn xumxan e reqs

Hubb û evîn bîne duwe narê heqîq nar û duwe
Ya dî ew e hubbek nuwe lew her ez im meyxane reqs

Lat û butan da min reqis lew em hene her butperest
Ya ser bidîn ya weslê bit lew her ez im mestane reqs

Rûh û cesed dê dîn butê hetta bidî rûyê butê
Destî bipêçîn ya butê ber gerdenê wesfane reqs

Mestan ez im der butkedê meyxane im der şerbetê
Îro **Se'îd** mexmûr biye dîsa were ṣa[ha]ne reqs

Hetta nebîn mestane reqs ‘aşiq nedî but hate reqs
Ev nûcuwan pîran reqis lew her ez im yarane reqs

Wesfê butê nakit qelem der cegerim xûn û elem
Sed merheba ey Şahê Cem derdê li min şêrane reqs

Meyxan li min baġê Irem şîşe li min cama di Cem
Şoxa hebîba reş di çem lew da’ima baran e reqs

Sukran ji bada ‘işqehê dil bû kerî j’vê ‘işqehê
Dil sohtiye j’rûyê şehê min rûh û can wê dane reqs

Qafiya T - ط

Mey Nexwarî Se'dê Bohtanî Ġelet

Mey nexwarî Se'dê Bohtanî ġelet
Em neçûyîn bo Tewîlanê ġelet

Wek Cuneydî ma tecellaya te dî
Her çi dîdem bê şebîh û bê ġelet

Muhbeta Leyla kirim Mecnûn û Qeys
Bir ji dil sebr û qerarim bê ġelet

Tirkê Hewrem hate banî her digot
Tu ji ceger nîne ġelet nîne ġelet

Zuhd û xwandin her kire zîr û zeber
Pur ji wî girtim seher her bê ġelet

Çeşmê bed kor kor bî ey şahê min
Munkiran ra her hebî xar û xes ew bê ġelet

Pur bike camê ji badê her bi coş
Xoş bikim aġûşê yarê bê ġelet

Her di benda 'ezruyê bîme xumar
Karê min bad û mey e her ney ġelet

Xarê hicranê kirim her bû ji wan
Bend nekir ez cuz Husamî ney ġelet

Fetrikî dared çu bendê Xusrewan
Tê de fitlînit felek her ney ġelet

Fitlî tayek her ji zulfa Hewremî
Bendikirim şubhê teyê her ney ġelet

Ġelt û poşmanî nexwim ey Bohtiyan
Sernuwiştim rinde ye her ney ġelet

Wê şepalê her kirim êsîrê ‘işq
Xoş esîr im her di ‘işqê bê ġelet

Her ji yaran ez dixwim perwaz û pur
Rehberê min her ev e ney kum ġelet

Qewlê zahid her nekim ey serxweşan
Muftîm Hewrem biye her bê ġelet

Çeng dixûnit bo gulê medhê ‘ezîz
Serxoş û badexurim her ney ġelet

Bade da min her ji yaran meyfiroş
Min di‘a-goyem ji bo wî bê ġelet

‘Umrê Hewrem her diraz bit ya **Se‘îd**
Rûh û canim her fida bit bê ġelet

Dewleta şahî bimînit ta ebed
Bende’ê şahê xudim her bê ġelet

Şubhê Xusrew her ew e ey bezmê yar
Saqiyan cam cam dida min bê ġelet

Bilbil im her bo ji ‘işqa nêrgizê
Saqiyim yar û şehim her ney ġelet

Lutfê kin ey saqiyanê bezmê yar
Xûnxur im wek sorgulê her ney ġelet

Remzeya vê camê mey ez dam zemîna zulmetê
Badeya vê camê ‘işqê kes nenoşanî ġelet

Şerbeta ‘işqê venoşim lê ji ber zulf û rûyan
Ê di ‘işqê pare dil bî ney perîşanî ġelet

Ker kir dil û can ji min wê çûne der
Zahidê rûmet veşanî her çi xandanî ġelet

Mey ji fincanê vexware min **Ġeramî** dil bi nal
Lew seher fîġan deranî her ji vî canî ġelet

Ji destê pîrê ‘işqê camek xoş noşî bit
Noşe lê her dem mudam şubhî şêranî ġelet

Her çi noşet noşekê da’im ji dil pur nûre tê
Ser nenoşîn vê şerabê ki li ‘eybanî ġelet

Şerbeta vê kas û camê lê seher xoş daye kamê
Ê binoşî kasê badê ew ji dil kanî ġelet

Guh nedîn ber ‘eyb û ‘aran dê bikin xidmet li yaran
Bilbilê mecrûhê xaran ‘işqê wê kanî ġelet

Ê neçî ber sayê zulfê pur nedî dil jê bi ulfê
Ew nenoşit mey ji lêvê ew ji ‘urfanî ġelet

Dil bidî ber kevrê zulfê da bibînî dil ji lutfê
Ê bi vê bendê wefa bî çûye ‘urfanî ġelet

‘Arifên çalakê rûhî qelb û dil bûyîn fitûhî
Her seher camê subûhê dê venoşanî ġelet

Her kesê camek li destî ew ji hoş û dil verestî
Qet kire nabin dubestî ka ji meyxanê ġelet

Min li baġê meyfiroşan dî ‘ecîb gulzarê nûr
Pur veda ji enwar û nûrê qet li meyxanê ġelet

Min ji nûra bade’ê dîtim cemala bêmisal
Ê bi vê tûrê veda’î kanî rewhanî ġelet

Ev dilê min nay û çeng e lê ji ‘işqa dilberan
Gih bi nar û gih bi nal e pur ji derdanî ġelet

Gih li dest fincan şerabê wî nedî carek serab
Dil wekû ‘erş û sema’ê kanî insanî ġelet

Gih çu Nîl in gih Furat in lew me dil ateşê Tûrê
Lew di dilda behrek heye ew ji ‘ummanî ġelet

Qulzema vê ‘işq û nûrê muhbeta vî rûyê sor
Min di dil wê bûye gurê her bi mewcanî ġelet

‘Aşiqê meyxanê perest wê çûye ber der mezel
Xerqe destarî firotin pur li meyxanî ġelet

Neşter û şewkê firaqê wê li dil pur bûne lê
Ah ji vî derdê firaqê çendî nalanî ġelet

Ateşê ‘işqê hebîbê wî li dil bûye pereng
Sîne wê çûye fiġanê lê ji hicranê ġelet

Salikê vê rahê ‘işqê murşidê vî derdê şewqê
Wê dinoşîn badeê ‘işqê lê bi ‘urfanî ġelet

Cameya ‘işqê binoşîn da herî ew jengê dil
Seyqel e batin ji nûr e rûhê fincanî ġelet

Min ji birhê saqiya dil bûye me tiryaq û raq
Çûme rê wek qurbê ... lê bi rewhanî ġelet

Karê dil ‘işq û şerab e lê ji fincana gulab e
Min li dil wê bu hebab e çerx û dewranî ġelet

Min ji bada ro Elestê xoş binoşî cam ji destê
Sed şukur bur[46] û durustê dest bi funcanî ġelet

Min di benda yarekê dil da bi destê meyfiroş
Rêhte funcanê gulabê lê ji xalanî ġelet

Min ji can kirye giranî lê di xumxana fiġanî
Dest bi dest dane **Ġeramî** lê Se‘îd kanî ġelet

Çeşmê Yarê Ez Kirim Şeyda

Çeşmê yarê ez kirim şeyda û mecnûn bê ġelet
Dîn kirim awazê Se'dî bê guman û bê ġelet

Bê guman û bê ġelet Tirkê kirim 'aşiq li xwe
Can guzar bî bê 'elîl û bê guman û bê ġelet

Ser di rê da daniye çend yek ji 'işqa zulfekê
Mihnet û barê belayê dê kişînim bê ġelet

Keştiya bade w meyê her tê de me ey surperî
Çilliya pîrê muġan girtim ji wî her bê ġelet

Ez giham xumma Felatûn her ji roja yar tenê
Hêj li ser 'ehda di yar im her yeqîn û bê ġelet

Keştiya cam û meyê dê em xurîn îro **Se'îd**
Şubhê şem'ê her hebîbim ey hebîba şubhê bet

Gerdena pîrê muġan dîtim bi zulf û gîsuwan
Saqiyan cam cam dida min bê derîġ û bê ġelet

Ger kesê badê nenoşit murde ye hetta ebed
Min di dest yarê vexwarî bê guman û bê ġelet

Ez dibînim ew şepalê netrik û bazû ji 'ac
Riştiya canê **Se'îd** im ew şepala şubhê bet

Lê **Ġeramî** serxoş e ew jî ji cama surperî
Nagirî sebr û qirarê gahi gah û bê ġelet

Qafiya V - ڤ - F – ف

Da’im Ji ‘Işqa Dilberê

Da’im ji ‘işqa dilberê rûyê **Se‘îd** digrî xunav
Cerg û cesed têk bûne av qelbê di kul digirt xunav

Hicret ji wî her bûye tab hicrê tu yî her mal xerab
Vê hicretê da me şitab rûyê gulê ê bû xunav

Rûyê gulê lê hate rav ew nêrgiza sîr-ab û av
Derdê li min rûyek xunav bigrin ‘izarê hûr xunav

Gerden bilûra yari ma surx e û ‘izar wek laleya
Lale ‘izar rûyê gulê durr dane min hemçû xunav

Werda diçînim ‘er‘erî j’rûyê xunav ê surperî
Huzna dilî hicra zerî gerden diraza rû xunav

Zulfê gulê ‘enber weşand kakul reşa ezfer reşand
Biska xunav zerab rijand sîm ebruwan dane xunav

Ce‘da siyah miskî reşand şubhê gulê her ġunçe dan
Reş ebruwan ‘aşiq teband zulfê du ta bûne belav

Ebrû ji qewsê mal zirav werdê di cûr girtî xunav
Tîr dane min teşbîhê av em dane ber rimhên zirav

Ew rim ji xanî ‘eyn zirav curhên di wan lê bûne rav
Mecrûh kirim zulfa belav derket ji burcê rû xunav

Derket ji burca sunbulê reqsî şebîhê muşterî
Nîne li min ew muşterî ġeyrî nedî tîrên belav

Tîr dane wî jehrî belav teşbîhê Leyla por belav
Ġemzê di wê bûne belav hetta ebed tîr dan belav

Şoxa şepala mey-perest roja Elest ez kirme mest
Serxoş kirim Leyla di mest ruxsar ji wê daye belav

Gul-ab ji biskan bûye rêz em jî ji wan nabin çu têr
Qelbê ġerîb bûye belav ez bûya şoxa bisk belav

Şoxa şepal pur gîsuw e xemrî ji tayê sosin e
Zer-avê wek tûtî dide zulfê bilûr lê hat xunav

Ravên şebîhê moriyan vîzvîz kirin wek tûtiyan
Van tûtiyan şekker geran her bû ji biska pur belav

Merheba Ya Ta'irê Bal

Merheba ya ta'irê bal û du perr herdem ji nû nûra sedef
Gerden dirêja perde zer setre di ber hûrê sedef

Gerden sedef her guft û ken bayê ji zulfan qend şiken
Weşhand ji birhan sîm û ken sed merheba gerden sedef

Bejna ji mercan qende xend durdî weşand ji le'lê di qend
Kakul reşa şekker ji qend kuştin dused wek Mîr Şeref

Biskên dirêj çîn çîn kirin zulf esmerî 'enber kirin
Em tûtiyê şekker şiken medhe dikîn bor û sedef

Balê ji zumrûda qemer her jê weşand bada qemer
Husnê tu yî ebrû kemer ehlen we sehlen Xan Şeref

Se'dî dixûnit medhê to Xusrew tu yî yara sedef
Rehmê bike ya poşezer poşî bi xef cebhet sedef

Îro Li Min Bayê Nesîm

Îro li min bayê nesîm ba xwe birîn ta Qafe Qaf
Şubhê Şirîn bûbû şirîn ‘alem ji cinnan hate taf

Min jî digot bayê nesîm zûke w lezîn îro seher
Guft û digo ey ‘aşiqa ho ho me kir ta ‘erzê Qaf

Ez bûm çu bilbil ber gulê medhê dikîn ber sorgulê
Der ‘uqbetê mîmek me got hetta me bir ta Qafe Qaf

Teqdîr û tenzîh her me kir lewma me bir ber asiman
Wek kewkeban hatî nihan hetta me bir ta Qafe Qaf

Sed bar dikim şukrê Xuda em meyxurê roja Bela
Em kuştiyê cama meyê rewşen dikir ta Qafe Qaf

Rewşen kirîn bada şirîn ‘ezrew we Hewrem her birîn
Bejna şirîn bû yasemîn ba Hewremî çûyîn bi Qaf

Suhbet me kir ba Hewremî ‘ezrew dihat her surperî
Saqî ze mutrib bû kerî teşbîhê dînî Qafe Qaf

Saqî were bade biyar vî mutribî da zulfê yar
Lew her vexwim ‘işqa di yar lewma me ber ta Qafe Qaf

Bade vexwar îro **Se‘îd** lew serxweşê şewqa mecîd
Weqtê Elest min bû nesîb bada şirîn zemrûd e Qaf

Yara cuwan gote nihan hû hû bikîn l’baġê gulan
Teşbîhê tûtî em geran lew teyy kirim ta Qafe Qaf

Selwa Zirav Lê Bûne Rav

Selwa zirav lê bûne rav şebnem li ber rûyê gulav
Ew esmera gerden bilûr dêmê zerî lê hat xunav

Bergê gulê girtin xunav selwa çeman pur ab û av
Ew bejn û bala pur xeram sîmîn qed e ebrû xunav

Îro **Se'îd** şekker-xur e der medh û wesfê sorgul e
Lew serxoş im j"işqa gul e derdê li min rûyê xunav

Rûyek xunav le'lek şefaf bigrin 'izar pur ab û av
Ev nûcuwan 'enber gulav saqî weşîn zulfa xunav

Dîsa Ez im Mader Sedef

Dîsa ez im mader sedef saqî werîn cama sedef
Vê dilberê zulf kirne xef saqî werîn cama sedef

Bada şeref her xordî min hetta ebed lew serxweş im
Em serxweşê nûra semed yara şepal gerden sedef

Gerden dirêja neyşeker ez qeyd kirim ta pa û ser
Benda li min zerrîn kemer çeşmê di mest bazû sedef

Bazû ji mawerd û bixûr lew xordî bûya bixûr
Sîmîn beden zulfê di hûr rihte dilî nûra sedef

Qenda dirêja pur xeram her daye min hubb û ġeram
Subha Elest çenber xeram mest bîn ji durrdana sedef

Durrdan xeram bû yarê min selwa sehî bû canê min
Mest im ji reqsa şahê min durrdaneya ebrû sedef

Biska ji mawerdê weşand Şahê Husam her bûye qend
Mest im ji leb şahê di xend awir didan mujgê sedef

Ey yar mede nazê di qer tîra nede j'burca qemer
Şahê 'Elî l'burca qemer saqî werîn cama sedef

Carek werîn bayê yemîn bûyek ji zulfa esmerîn
Zulfa semen bû baweşîn reş kakula gerden sedef

Zulfa çeleng bûye helek mest im ji wê herdem helek
Çaha zeqen bûye xelek yek yek li ser dêmê sedef

Dêmê zerîn lê nûrek in mest im ji wê şekker şiken
Tîr rihtine j'le'lê di ken kuştin dused mader sedef

Behmen ji tîran kir hezer Behram te kuşt b'xewf û hezer
Sed Xusrewan lerzin ji ber em kuştiyê rûyê sedef

Hêjî **Se'îd** nakey hezer j'wê nazika b'tîr û teber
Çerxa felek sergeşte wî em 'aşiqê rûyê sedef

Îro Ji Zulfa Duxtera

Îro ji zulfa duxtera mey hate fincana sedef
Mey hate fincana ‘eqîq bazû hebîn ji ‘ac û sedef

Bazû hebîn j’nûra zucac gerden pur e meş‘el sirac
Zulf û di gîso her ji ‘ac em meyxurê rûyê sedef

Dîsa bibare ey nesîm vê duxterê lê ke ‘ebîr
Lê ke du zulfê esmerî saqî were ebrû sedef

Saqî ku bî gerden bilûr gîso hene çenber di hûr
Dê dil vexwit cama surûr şîrîn biye gerden sedef

Şirîn ku bî b’coş û surûr dê em vexwin ‘işqa di cûr
Werdên di cûr îro **Se‘îd** têkda hene ber rûy sedef

Reş kakulan bo min werîn dê ez bibim rindê şirîn
Xerram kete j’zulf û perrîn dê bêt şehim cebhet sedef

Dê bêt şepal dêm esmerî badê bixwin j’rûyê zerî
Leb leb hebin cama surê ya dê hebit rûyê sedef

Ilham dihat j’husna şirîn bade bixo j’cama zerîn
Fitwê binê ya surşirîn lew serxweş im l’rûyê sedef

Fitwe we da yara mecîd badê binoşet ey **Se‘îd**
Der wehdeta mutleq mecîd îro **Ġeramî** bû esef

Ya Şahidê Qudsîsti în

Ya şahidê qudsîsti în ya gewherê mader sedef
Ya ‘er‘erê baġê husun ya nergisê gerden sedef

Ya Ke‘be û Beytu’l-qudus ya *Cennetu’l-me’wa*sti în
Ya zuhre rû şahim bela ya tercumanê rû sedef

Em bilbil în her bû li wî ya şahidê quds û felek
Zulfa şiken ya ‘enberê ya şahidê kakul sedef

Dane l’çema[n] zulfa girah jê weş bike ‘enber şeha
Ey ba biyar miska Xeten j’wan ‘enber û gerden sedef

Ya şahidê ebrû keman ya huqqe û durcê ‘eqîq
Ya perdeya sîm û zerî ya sosina çenber sedef

Ey pur veke tac û kulah ya esmera ebrû zucac
Ev tu Şirîn ya bûyi Zîn ya bilbilê minqar sedef

Ya tûtiyê şekker şiken ya bilbilê beydayê ġeyb
Mehpareya şemsa felek ya dilbera mujgan sedef

Ya ġemze ya nûka hewa ya cameya cama meya
Şebîh di Leyla ew hebîb ya çîçeka baġê sedef

Ya çîçeka baġê şirîn da d’beġçeya ridwanê ġeyb
Ya esmera mujgan perî ya gewhera betha sedef

Ya ehmera nergis belek ya şahidê xûb û husun
Ya saqiyê baġê ezel ya gulşena baġê sedef

Ya ġunçeya berşê perî ya dilbera **Se'dî** cuwan
Ya sahira zulf û pelek ya hatifê mercan sedef

Ya sosina ġunçe kulah ya mehweşa Tirkî qeba
Ya sahira Hindû ġurab ya cameya bada sedef

Ya Farisa şekker zeban ya saqiyê saġer geran
Ya hatifê ridwanê ġeyb ya şamiya gerden sedef

Ta‘et Li Min Zîr û Zeber

Ta‘et li min zîr û zeber can jî biye nar û esef
Vê dilberê tîr dan ceger co co rewan nar û esef

Billah ji nal û zariyan xew nagirîn şev tariyan
Çendî dikîn ah û fiġan lew sohtiyim b’nar û esef

Daġ daġ li min bûne nihan çehrem zer e her mest e dil
Mest im ji bûya kakulê can bû ze‘îf dil da esef

Zulfa şepal bayî revan[d] ‘alem ji wê zîr û zeber
Şert e ji ba Şahê ‘Elî ahên dilî nar û esef

Zahir ‘ezîz em serxoş în lêkin bire yar û hebîb
Dem dem bigo ey butperest xemrê dixor çendan esef

Perwîz ji Fursê her were *bişnew*[47] ji min etwarê ‘işq
Çeşma evîn min qam dida lew da’ima dil bû esef

‘Arif di weqtî serxweş în Me‘rûf ji Kerxê bêt bila
Xetrê rehê da ez bibêm em serxweşê rûyê sedef

Bûya gulê ez mest kirim rûyê şehê ez qeyd kirim
Saqî ji zulfan bend kirim saqî werîn cama sedef

Saqî li kû da herme cem da ez vexwim bada di Cem
Yarê bibûsim dem[bi]dem da ez vexwim ‘işqa sedef

Zahir dibêjim ya **Se‘îd** ehlê besîret kem pur in
Zahir şeh in dil şubhê qîr zulfê negîr b’nar û esef

Qafiya Q – ق

Nûra Meyê Xef Hate Dil

Nûra meyê xef hate dil çendî me xef kir bûye berq
Ferda şebîhê zîbeqê dengê me bû her re'd û berq

Nûra meyê nabî xefî wek zîbeq û berqa sema
Çinka me xwar le'la meyê awaz me kir wek re'd û berq

Berqa ji dil enwa' dihat sêgah ji dil îro dihat
Hubb û evîn enwa' dihat derket ji dil awazi berq

Hubba ji rûyê esmeran kîmyayi yar ger bext hebî
Necma se'adet bû xuya der muhbeta rûyê 'ereq

Ey ba hilîn bend û niqab derdê li min zulfa gulab
Benda li rû sîm û zerab ez kuştiyê rûyê 'ereq

Riswa kirîn rûyê 'ereq gerden ji toqê bû ġereq
Kewkeb li ser dêmê şeriq lew sohtiyim j'hicra 'ereq

Saqî were ey yari ma derkev ji 'eynê şahê ma
Şeh ke li van der burcê ma em serxweşê rûyê 'ereq

Dîsa ji Tirka rû xunav bo min werîn zulfa gulav
Zer-ab bike dêmê xunav derdê li min zulfa 'ereq

Tirk û nigarê pur nigar mey daye min j'rûyê nigar
Destê te ye b'neqş û nigar 'aşiq te kuşt b'zulfa 'ereq

Gîso ji Tirkê bû xelek tîrê di wan goşe çelek
Rihtin ji wan ġemzê felek bisk û du gîso pur ‘ereq

Cezbek me xwar j’rûyê ‘eqîq tûtî sifet yara şefîq
Teşbîhê hudhud bû şeqîq minqar zer e gerden ‘ereq

Minqar ji mercan û sedef gerden pur e ebrû bi xef
Çîçek ber e zîba lef e zeqna sihir çaha ‘ereq

Çaha zeqen mader durr e tê da giran hûre durr e
Em jê dixûn xûn û mey e kengî bidî ebrû ‘ereq

Bade me noş j’destê Şehî axir dihe cama meyê
Şekker li lêva mawerê le‘la ji wan girtin ‘ereq

Ey ba werîn rûyek qemer gerden li ser şems û qemer
Gerden durr e ebrû kemer lala ‘izar girtin ‘ereq

Da em hebîn mexmûr û mest lewma **Se‘îd** her butperest
Zulfa herîr şehla û mest ber leb bine rûyê ‘ereq

Îro Seher Mey Hate Dil

Îro seher mey hate dil bada ji husna rû ‘eqîq
Gerden ji mawerdê xefîf çeşmê di reş durcê ‘eqîq

Tirka ji balayê xeram rihte dilî hubb û ġeram
Bejna diraj bû Şah Husam dîsa were ebrû ‘eqîq

Ew lûleya şubhê Şirîn guftar digo şubhê te Zîn
Gufta ji wan hûrê zerîn leb xendeyan ho kir ‘eqîq

Hûr kir li min cerg û ceger çendî hebîn şebîhi ter
Hicrankeş im j’hicra di qer dil bû kerî ey rû ‘eqîq

Ev nazika qend û şeker wek neyşeker rihtin şeker
Xarî ji hicrê her di şer ez kuştiyê rûyê ‘eqîq

Gerden xefîf ew lûli ye libsê di ber her Şamî ye
Ber gerdenê cama mey e şems û qemer ew rû ‘eqîq

Herçî nekî medhê j'te re şubhê sihir lê feyde ye
Herçî nebî tûlê te ye keyber li wî xarê ‘eqîq

Her tu biya ya nêrgizî qamet elîf selwa sihî
Derkev ji burcê ey Şehî ‘eksek bide j’rûyê ‘eqîq

Mahê te kir şeqq û kerî xawer kete xesf û çûyî
Em jî şebîhê xawerî carek nedî zendê ‘eqîq

Tirka ‘ezîz û pur letîf mehrem sera bûye ‘eqîq
Er tu bimeş nazê letîf her weş bike zulfê ‘eqîq

Zulfa belav ke ey şepal ber gerdenê dîsa vemal
Sê tayekan rêke delal ber gerden û rûyê ʻeqîq

Tayê herîrê gîsuwan çîn girtine ber cebhetan
Lale ʻizar baġê gulan xalê ʻizar ew bû ʻeqîq

Tac û kulaha tûtiyê lê xwande bû qaz û qetê
Sed tûtiyan wek min **Seʻîd** meqtûlê ʻişqa rû ʻeqîq

Meqtûlê hicranê kirîn mexmûrê xemra bêġeşîn
Xûna **Seʻîd** hellal kirîn van dilberê ebrû ʻeqîq

Ger em bikîn bûsê leban carek bibîn aġûşê wan
Ber gerdenê pêçîn leban xûnim helal bî ey şefîq

Şefqê bike ey nû hebîb da şa nebin eswed reqîb
Em kuştiyê wesla hebîb derdê li min rûyê ʻeqîq

Îro Me Dî Yek Ma'ide

Îro me dî yek *ma'ide* tê da hebî etwarê 'işq
Mada ji 'işqê her me girt lewma **Se'îd** sekranê 'işq

'Işqê kirîn her Ke'be dil hem Tûr û hem Sîna ye dil
'Işqa hebîb û dilbera her tê ji dest sultanê 'işq

Dîsa me dî Tirka xwe dî 'enber feşan bû 'aşiqî
Guft û digo ya 'aşiqî dîsa tu yî sultanê 'işq

Şahid me dî der suhbetê bala dibî şîrîn butê
Bangê neyê der butkedê lew her ez im pîranê 'işq

Qalet lena[48] ya 'aşiqî ehsen ji *medhun ta lena*[49]
Herdem digo *emdih lena*[50] şahid me dî der xamê 'işq

Camek me girt j'fezla di yar me'şûq di wê her bû xuya
Cama hemî nakit 'edîl ayna Sikender camê 'işq

Der ayinê dîtim şehim der camê Cem dîtim mehim
Meş'el ji wê bûye çiram ez perwerê sultanê 'işq

Pîrê evîn û 'işqehê kirme di bezma şahidan
Şahid hebîn hem kewkeban perwane im bo yari 'işq

Perwane im tûtî sifet ey yar weşîn zulfa di mest
Der baġê badane were mecmer dilim 'enber di 'işq

Ey ba biyar her gah û gah weşke 'ebîr j'tac û kulah
Carek bixun *şurbu'l-me'ab* lew murşid im der bezmê 'işq

‘Işqa hewe payan niye feyz û hewa ġayet niye
Vî munkirî hesret-xur e em meyxurê esrarê ‘işq

Cama Cemî girte **Se‘îd** bada ji le‘lan pur mezîd
‘Eksa ruxa bûye be‘îd em meyxurê enwari ‘işq

Herdem nema der camê ma ‘eksek ji rûyê saqiya
Saqî ji xala bû bila der camê Cem dîtim ji ‘işq

Der bezmê Şah dîtim du yar saqî hebî ‘enber bibar
Cam cam biyar saqî biyar îro şepal der bezmê ‘işq

Suhbet me xwar ba saqiyan yar saqiyan wek dilberan
Saqî ew în mehbûb ew în sekran ji yaran camê ‘işq

Mutrib dihat sazek digot dengê di wî ġemzek digot
Saqî digot *eşrib*[51] **Se‘îd** ‘aşiq tu yî der bezmê ‘işq

Qafiya K - ك - G – گ

Dil Bû Qebes Ji ‘Işqê

Dil bû qebes ji ‘işqê ‘işqa şepala çalak
Em bîn cebel çu Tûrê her bû ji rûyi çalak

Dil bû çira ji hubbê hubba hebîba nazik
Heyret kirim ji zulfê kuştin ewî çi çalak

Dil bû şemi‘ ji nûrê perwane im **Se‘îda**
Sohtî dilîn ji hicran hicra hebîba çalak

Durdîxur im bi ilham qudsî me dît di mir’at
Mir’at çira û Tûr e ji zulf û kulahi çalak

Subhan ji rûy-dênê[52] Leyla hebî hebîbim
Mir’at me got ji Hewrem yara hebîb û çalak

‘Er‘er heja ji xûbî meş‘el xuya ji birhan
Qewsê hilalê ebrû naza didin çi çalak

Zulfa ji rûyê Leylê em jî dikin bi meylê
Meylek me kir li ruxsar carek çuwe me idrak

Hoş çûye me ji şurbê bada ji rûyi yarê
Ellah ji ‘işqê naza hoş çû nema çu idrak

Ji işaret Bi Sefawet

Ji işaret bi sefawet didirim neġmeê çeng
Me ji dîwanê se'adet dixurim bade û beng

Bi fiġanê ney û nayê digerim durrê 'ecîb
Şems im felek ya zuhre im *nezerî fîke helek*

Neġme'a şahê se'adet bi me ket ji roja ezel
Qemerê kir te kerî bi du enguşti belek

Şahê şîrîn qemeran diderit remz û sirran
Wekû bê şahidê qudsî digerim bîme helek

Me ji 'umrê xwe yê bêber me nexwar bade'ê le'l
Belkî bê feyde **Se'îda** geriha canî helek

Ezelî bî tu hebî rindê şerab û ji subûh
Me ji bûsan me dikir j'camê şerab cane helek

Ji derê pîrê muġan ger biderîn bade'ê reng
Dê ji ber perde'ê dil xoş bebihîn raze'ê çeng

Her wekî ber çeng û newayê ku 'umur bûyî fena
Ew li nêv deftera rindan me hesîb kin çi puleng

Ah ji ber derdê evînê me ceger bûye fiġan
Dil û sîne çi xumar în we ji batin ve pereng

Ey hewayê seherê berde ji xalan tu nesîm
Lê ji vî derdê firaqê me nema sebr û tu reng

Di riya dostî **Ġeramî** me nekir karekî pak
Wer bikîn şîn û girînê di riya şahidê şeng

Lê ku carek bebihî deng û newayê me seher
Da bidî ‘aşiq seherê nîmî nezer rûyê çeleng

Ahê bigavî dinalim me ji ber derdê ceger
Ku birîndar û xerab în me ji ber derbê xedeng

Gav û bê weqtî dikalim me ji hicra te ye yar
Me ji ser ta qedemê ateşê sûzan û pereng

Ceger û dil herdu dinalîn me ji ‘işqa te ye saf
Lew ji ‘işqa te ye dil bûyî wekî şubhetî çeng

Gih di ber dengê şerabê ku seher tête ji raz
Subh û êvar û dereng e bigirîn şahidê şeng

Dîsa Ketim Hicra Di Yar

Dîsa ketim hicra di yar can û cesed têkda helek
Her çî bibînit hicretê *la-budd* bixwit narek gelek

Narê evîn û ‘işqehê ez dam zemîna hicretê
Îro reqîb da min jehir can û cesed dê bin helek

Kuştim reqîb îro **Se‘îd** keyber birî narek mezîd
Ta key xelas bim ey ‘Elî qelb û ceger her bûn helek

Kengî bidî ey nûcuwan yek ku şemal j’wesla di yar
Sergeşte yim j’hicra şepal ev ‘ezruwê zulf kir xelek

Zulf û du gîso bûn belav rû û ‘izar lê bûn xunav
Bada ji rûyê ‘ezruwê çend reġbet e can bû helek

Xwezya bida min ew gireh jê rîz bibî remz û sirre
Çîn çîn kire l'dêmê pure kuştin dused Tîmûrileng

Kakul reşa ‘enber sifet çeşmê di mest ahû sifet
Bangê hewa da b’vî sifet lew da’ima dil bû pelek

Herçî bixwit yek cam şerab dê dil bibit *husnu’l-me’ab*
Lew mest kirim zulfa gulab can bî fida zulfa çelek

Îro ‘eceb der butkedê min dî senem teb‘et furuşt
Saqî digot ey butperest yan rûh bidî yan can helek

Îro seher çûm meykedê selwa rewan meş'el sifet
Wî Hewremî da min qedeh der 'işqê yar dil bû pereng

Yarê dixwand tûtî sifet rindê subûh ey butperest
Hetta ebed sekran tu mest çîn kir zulif kakul helek

Îro me dî remzek ġerîb mutrib digot sazek 'ecîb
J'cama tehûr da min hebîb der 'işqê yar sohtim gelek

'Işq û selamet ey **Se'îd** nefret kirin zû zû be'îd
Der wehdeta mutleq mecîd sahib dilan nînin gelek

Ji Derê Badefiroşan

Ji derê badefiroşan bixorin bade'ê reng
Dê ji dil bigrî sefa'ê biretin perde'ê jeng

Lew ji dil ah û fiġan în me ku dî nale û çeng
Dil ji ber 'işq û ġeramê me seher bûye pereng

Her ji burhan direşînit cegerê tîr û teber
Me ji dil kirye hedef rûhê 'ezîzî çi pereng

Me ji nû xoş ke şepalê bi du le'lanê ji şeng
Bide carek xet û xalan me ji biskê di çeleng

Vegerîne îro celebê hatiye newbet ji 'Ecem
Lê ku peyweste bi hevra tu bidî tîr û tifeng

Xusrewa min were vêra lê ji bejnê tu xeram
Dilê bê derdê **Ġeramî** ku ji 'işqê wekû çeng

Şah şirînî dihena bûye xeramî bi seher
Fetehe'ş-şerq û beynenî bi siwarê bi tifeng

Fetehe'l-ġerb e şepalê bi şu'a' ew bi fiġan
Ney ji 'işqa te siwarî ku dinalîn be du deng

Bi newayê ney û nayê ku veda bend û şibak
Wer temaşayê şehîdan ku hemî rengê bi reng

Bendê rindan kî vekê her ji firaqê û ji hicab
Ew esîr în di hewayê biderîn zulfê ji reng

Lê ji ‘işqê ku dinalim seherê şubhê durenk[53]
Her ji derbê te dinalîn Xusrew û Gîw û Peşeng

‘Eynê ‘işq în û ġeramê me ji dil şubhê pereng
Mest û serxoş venumayin me ji hicra te ye ‘enk

Ne tenê Xusro didêrî ku hewadarî Şirîn
Heme Ferhad û **Se‘îda** ku esîr bûne li reng

Ne bi vê tewrê şirînî diderî xûb û husun
Ew bi sifatê şekerî kuştine ‘aşiq çi çeleng

Her seher mest û xirab în me ji le‘lên di ‘eqîq
Lê hema mest û xumar în me nexwarî mey û beng

Em ji husna te şirînê ku bûyîn lal û xurûş
Me ji hoşî qet nema nuqte fikrê bi tu reng

Were bê bade **Se‘îd** vê ġezelê bîne meqam
Her dema bêt û cuwan e bi newayê ney û çeng

Kiye bê reşte ġezel bînê di behr û bi meqam
Her dema bête serayê me şepala çi çeleng

Qafiya L – ل

Îro Ji ‘Işqa Sorgulê

Îro ji ‘işqa sorgulê dîsa ez im mexmûr e dil
Mexmûrê xemra bêġeşîn lew da‘ima sekran e dil

Sekran û şeydayê dil în kanî hebîba ġemrevîn
Zulfa siyaha nêrgizîn lewma yeqîn mexmûr e dil

Xemra ji rûyê sorgulê her tê ji destê vê şehê
Şehzadeê mey rihte dil lewma yeqîn medhûş e dil

Avêt dilî hubb û evîn yara şepala sunbulîn
Reş kakulê dil kir hezîn lewma yeqîn ferfûr e dil

Rihte dilî derdê Husam selwa sehî xweş bû xeram
Xerram dibî her subh û şam lewma yeqîn feġfûr e dil

Ew sunbula mercane weş girtin xunav zulfa di reş
Rav bûn belav li rûyê keleş lewma yeqîn meczûb e dil

Qelb û dilim mecrûhê ‘işq mecrûh kirîn ustadê ‘işq
Zulfa çeleng bûbû helek lewma yeqîn nîran e dil

Yara şepal mehbûbê dil naza cuwan sultanê dil
Bergê gulê mexmûrê dil lewma yeqîn mecrûh e dil

Şahê evîn û ‘işqehê rihte dilî nûra meyê
Hostayê ‘işqê rihte dil lewma yeqîn hem Tûr e dil

Tinnab dihe ew surperî avêt dilî ta pa û serî
Helqe bi helqe zer kirî lewma yeqîn Sîna ye dil

Vî şahidî dil jê revand dem dem li min batin pijand
Remza *Enelheqq* dil kişand lew da'ima Mensûr e dil

Tenha ne Mensûr hew dixwand remza *Enelheqq* her dixwand
Rindê xerabatê dixwand lewma yeqîn Mensûr e dil

Dil da'ima her nûr e lê 'işqa hebîbî daye lê
Bangê huwiyyat daye lê lew da'ima şeyda ye dil

Mexmûrê xemra dilber în rindê xerabatê em în
Rindê Husam îro em în lewma yeqîn me'zûr e dil

Suhbet me xwar her subh û şam got merheba Şahê Husam
Îro **Se'îd** rindê 'uzam lewma yeqîn Mecnûn e dil

Cerha dilî hicra hebîb 'işqa ġedar nar û selîb
Narê kelîm l'rûyê hebîb lewma yeqîn meşhûr e dil

Meşhûr î tu îro **Se'îd** der wehdeta mutleq mecîd
Ev zulf û nûra Şah 'Elî lewma yeqîn mehcûr e dil

Yara ji rengê sorgulê lew keç kire tac û kulê
Ew qed durrê bû mawerê lewma yeqîn her nûr e dil

Yara ji nûra kewkeban meşha xeram wek nêrgizan
Remz û sirra nayên nihan lewma yeqîn merġûb e dil

Medhê cemala qudretê herçî dibêm sadiq we tê
Remza evîna qudretê ger em bibîn mecnûn e dil

Naza ji balayê xeram dîsa ez im weldê Husam
Ev nûcuwan xoş bû xeram lewma yeqîn bêhoş e dil

Ya rebb bibînim qende xend da hel bibit ev qeyd û bend
Dil bendê wê bednam dixwand lewma yeqîn mehbûb e dil

Qelb û ceger min bûne xûn lew her ez im wek erġenûn
Çeşma siyah her bûne nûn lewma yeqîn mestûr e dil

Lew dil ji te mexmûr bitin em jî ‘Elî destûr bitin
Dê dil hebit pur nûr bitin lê da’ima me‘şûq e dil

Saqî were ji ber camê derman bike derdê min î
Der bezmê Lest belkî Belê lewma yeqîn sultan e dil

Îro Ji Husna Dêm Durê

Îro ji husna dêm durê minnet ku min her Tûr e dil
Feġfûr e dil îro **Se'îd** lew da'ima mesrûr e dil

Sekran biye qelb û ceger çendî ji çeşmê mesti pur
Zulf û du gîso ew du perr lew da'ima mexmûr e dil

Mexmûrê xemra bêġeşîn tac û kulahê zerkeşîn
Tayê 'isab û yasemîn lew da'ima ferfûr e dil

Terfê 'isabê bû xeram em kuştiyê wesla Husam
Teşbîhê maha bê ġemam lew da'ima meġdûr e dil

Rû û 'izar lale weşand çeşmê di reş 'enber feşand
Bejna semen selwa dixwand lew da'ima her koh e dil

Medhûşê çeşmê nêrgisîn mujgan perî dan ezferîn
Subhan ji Xellaqê semîn lew da'ima medhûş e dil

Mecnûnê zulfa dilber în ew dilbera reng 'enberîn
Gerden ji wê pur zeyyinî lew da'ima kisra ye dil

Tirka ji tayê zulfê mest mey daye dil j'weqtê Elest
Îro Şehê ahû sifet lew da'ima 'umman e dil

Îro şehî rakir niqab bend û niqaba pur gulab
Destê me girt birme sema lew da'ima mîran e dil

Tirka ji mader cewher e perde zer e dêm esmer e
Xwastim ewê ey bilbil e lew da'ima şahan e dil

Şahî ji roja enzelî rihte dilî nûra dilî
Herdem ji husnê serxweş î lew da'ima mesrûr e dil

Mesrûr kirîn yara şirîn lewma ji ‘işqê dojehîn
Minnet li te se‘dê **Se‘îd** îro tu yî mexmûr e dil

Necma se‘adet her me girt j’rûyê şehî ... ...
Leyla me girt j’lutfa şehî lew da’ima perwaz e dil

Kolê şehî îro ez im rûh jî ew e qalib ez im
Tenha ji qalib ez heme lew da’ima firr daye dil

Rindê şehî wek zerreyan lê ez tenê canim fidê
Canê min î rûhê min î lew da’ima nîran e dil

Suhbeta Tê Tunebî

Suhbeta tê tunebî çay û mey û yar û ġezel
Se'diya can û cesed têkî kebed tête ecel

Suhbeta tê hebitin cam û mey û zulfê butan
Dixorîn badê leban camê bi cam qewl û ġezel

Suhbeta yarê kirim j'weqtê ezel ta bi ebed
We go xelqê digerin name w rewan bûye ġezel

Me ji dîwanê se'adet geriham rindê şerab
Bes ke bê feyde **Se'îda** te rewan bûye ġezel

Me ji zulfên te yê rengîn ku vexwar camê şerab
Lew seher mest û xumarîn ku rewan têne ġezel

Me ji 'işqa te ye ateş ku li dil bûye fiġan
Lew ceger hate benal û me rewan dane ġezel

Ah ji 'işqa te **Ġeramî** ku seher bûye pereng
Ceger û dil her dinalin ji hewarê me ġezel

Gav û gav her dem dinalim me ji hicra te ye nar
Ahê bi gavê me rewan in me li dil daye ġezel

Rûhî pur derdî dikalit me ji firqa te ye nar
Ne 'eceb mewcê ruwan in me ji 'işqa te ġezel

Xemra Helal Ba Zulfê Yar

Xemra helal ba zulfê yar hey hey dixwim j'roja ezel
Hezret li min qend û şeker lewma ez im rindê ezel

Mujgê perî b'ġemz û pur in çaha zeqen b'sihr û sirr in
Kakul ji şamê rêz kirin *mabeynena*[54] nîne cedel

Yara şepala ʻerʻerê leb ġunçe ye qed sunbulê
Kakul ji mawerdê girê em ʻaşiqê maha çetel

Yara şebîhê mah çetel şewqê didî j'roja ezel
Zulfê di xwe çîn çîn li mil yara tu yî maha çetel

Yara ji rû maha felek hemçû Mesîh b'sihrê gelek
Girtin du şeq maha felek ba ġemzeya maha çetel

Xalî li rûyê nêrgizî werbûn şebîhê xawerî
ʻAlem ji wê b'lez û girî j'wê qameta mellek ecel

Kirye du ker qelbê **Seʻîd** ji remz û ġemzê ji hedîd
Gav gav kişand ġemzek mezîd qelb û ceger dane ecel

Min ji seher dil bûye mest ji gîsuwa îro dimest
Ber dêm û ruxsarê şukest k[ê]şa li min tîra ecel

Kêşa ji qewsê ebruwan qews û qezeh bûn gîsuwan
Leb leb rijandî j'ebruwan derbên ku rûhî da ecel

Ġemzên ji çehvên şuhelî hatin ji tîreka belî
Endaze da min kahelî lew qelb û dil wê tên ecel

Îro Senem Mexfe Se'îd

Îro senem mexf e **Se'îd** sergeşte yim wek to zelîl
Vê firqetê buryand kebed îro senem naxwiy zelîl

Hicra ji rûyê vê senem hûr kir ceger kun kir kebed
Her bo Xudê ya dilberê vê hicretê kor kir zelîl

Şu'lek ji ruxsarê cemîl ger dîtiba metrûd pelîd
Secde dibir weqtê ezel her bo ji Adem pur zelîl

Şukrê Xudê îro ez im şeyda li wî dîsa ez im
Îro perî mexfî li min çun asiya gerr da zelîl

Ey ba were ba çeng û perr perda rûya rake ji ber
Zulf û perra hilne ji ber lew sohtiyim j'husna cemîl

Roja nebî bû yek ji wan şeyda wu mecnûn em geran
Ya rebb bibe hicra giran perdê bibe j'rûyê cemîl

Ya nûcuwan weqte bibîn ġerqî di xûn û dil xurîn
Der suhbetê bîne emîn zulfa di xûba wî cemîl

Billah ji rengê saqiyan bîme 'eqîq ber asiman
Kengî hebî 'eksek ji wan çun 'adetê ber min zelîl

Billah ji lutfa Şa[h] Husam herdem dixwim ho ho xeram
Firqetkeş im j'bade w di cam ez kuştiyê nûra cemîl

Weqtê ku tê derdan weşî cam jî dibî zerrîn weşî
Wek asiya heft asiman ber cami ma gerr dan zelîl

Saġer me girt j'fezla şehî qed ‘er‘erê selwa sehî
Wek kewkebê meş‘el dida îna Sikender ney ‘edîl

Cama Cemî daye cemê em perwerê cama meyê
Saqî dixwand her vê demê remzê ‘ezîz û pur cemîl

Mutrib kirim sekran û mest lewma ez im rindê di mest
Saqî bi zulf û perki mest camek nihan da min zelîl

Gerçî ez im **Se‘d**ê zelîl lêkin kirim yarek cemîl
Lew pur bibin munkir ji min piştim şepal yarek cemîl

Lew pur bibin dujmin j'me re darim henoz Kerrar ‘Elî
Der munkir û keydê neke îro ‘Elî şahek celîl

Ey Saqiyê Sîmîni Saq

Ey saqiyê sîmîni saq carek biyar cama zelal
Dil bûye ker j'hicra delal carek werîn cama zelal

Da dil vexwit 'işq û evîn weqtê ku lê ew surşirîn
Hem bû zerî ew hori'în ruxsarê yar her lê cemal

Ruxsar ji wê 'eyn kewkeb e kakul reşa nûr û sur e
Ser hatiye cama sedef weqtê sehergahê celal

Mey hate fincana zucac weqtê sehergaha Elest
Hey hey dinoşim ta ebed cama sedef j'destê şepal

Yara şepal birye hewes dil bî cuwan ma yek nefes
Lehzê cuwan dil kir ceres çîn çîn kirin zulfê kupal[55]

Biska siyah xûb û dur e ruxsar ji wê wek kewkeb e
Ew meyperest dêm esmer e ew neyşeker şubhê ġezal

Yara cuwan şekker dixwast kuştin dused rindê Elest
Dem dem dinoşîn bade mest çeşmê siyah şubhê ġezal

Çeşmê di reş ez dîn kirim yekser ji dil xûn-rîz kirim
Şems û qemer bûbûne şeq weqtê ku da remzek şepal

Gerden diraza neyşeker xweş bû xeram l'burca qemer
Qed 'er'er e gîso gireh ez sohtiyê dêmê hilal

Xemrî ji xalan bûn girê şeqqe'l-qemer b'enguşt perê
Ew dêm zerî wek xawerê çeşmê di reş her bê misal

Çeşmê siyah l'dor bûn gelek werdê di cor lê bûn helek
Fî hubbiha rûhî pelek[56] dêm 'enberê lê bû cemal

Gerr dan li rû xal û xetan ew dilbera şahê butan
Reş kakula lê bûn ‘eyan çenber ji mawerda zelal

Çenber kire çîn çîn gireh qewsê hilal mal xencer e
Burca cedî wê ker kire xalê rûya qerqef zelal

Qerqef me xwar j’rûyê şirîn serxoş kirîn remza evîn
Qerqef şebîhê ateş în rindê di wê her bûn delal

Bê hoş û serxoş em buyîn weqtê me dî rûyê şirîn
Vê qerqefê em dîn kirîn husna ruxa ew bê misal

Selwa cuwan pur zeyyinî şam û seher her xemmilî
Gîso seher her kemmilî çaha zeqen da xemrê al

Ew al şerab sor û zer e em girtiyê b’sihr û sir e
Xal ‘enberan girtin gireh mujgê çeman lew kir qital

Qetlê dikit b’ğemz û sirê ew bî Mesîh muhyî dênê
Xal eswedê gerden purê biskên siyah lê bûne xal

Xalê siyah sor û bilûr wer bûn li ser werdê di cûr
Min dî li ser bedrê di hûr hê mîm û kehfê yek di dal

Qerqef niye her muhbet e husna rûya her mutleq e
Şem‘ek li nîva dil kete ebrû ji ‘enber bû hilal

Ebrû hilal bû qewsê tîr qetlê dikit b’ğemzê çu tîr
Çûm hezretê îro **Se‘îd** eqreb ji qewseyn ew hilal

Qurbet me girt j’narê meyê saqî kirîn rindê meyê
Bê şerbet û nûra meyê kes dê herit nezdî şepal

Îro Ji Dengê Hatifan

Îro ji dengê hatifan minnet ku min mesrûr e dil
Şehzadeya terha cuwan remzek nihan avêhte dil

Mey rihte fincana sedef ew dêm perî gerden sedef
Ma dê vexun îro bi xef *fî'l-hal* evîn avêhte dil

Terha cuwan b'ġemz û sur e efser kulah meş'el pur e
Zulf û perran b'lez û pur e remza evîn avêhte dil

Ġem jê keşîn rûz û şebê em kuştiyê vê ġebġebê
Şehzadeê şîrîn lebê remza heqîq avêhte dil

Serxweş kirîn van hatifan dengê *Enellah* hat 'eyan
Xûb û şepal nabin nihan mutrib sirûd avêhte dil

Şoxa şepal zerrîn kemer leb xende ye şam û seher
Ebrû ji mawerdê çeper remz û sirûd avêhte dil

Mecrûh kirîn zulfa belav şêx û mela dil bûn belav
Qisse w hikayê dêm xunav ġemze nihan avêhte dil

Bê hoş kirîn bûya Xeten xemrî ji mawerd û Xeten
Avêhte dil şahê Xeten neġm û surûr avêhte dil

Sermayê dil ew lûliye şahê dila her lûliye
Dîsa **Se'îd** her gorî ye zulfa du ta avêhte dil

Me j'boyî yar da'im digot remza evîn her dil digot
Remza *Enelheqq* her me got şehzadeê avêhte dil

Subhankeş în rindê Husam wek Bayezîd bihter xeram
Mecrûr kirîn hubb û ġeram *'eyne'l-'eyan* avêhte dil

Bexşîd bike ey hori'în *'eyne'l-yeqîn* ey nûrê 'în
Etwar ji 'işqa surşirîn wek zîbeqê avêhte dil

Îro Ji Remza Nûcuwan

Îro ji remza nûcuwan sirr hate da mexmûr e dil
Mexmûr kirîn ebrû reşê îro ‘eyan mey rihte dil

Remzek ji le‘lê pur şefaf bo min hinar weqtê seher
Derkev ji burcê surperî îro ‘eyan mey rihte dil

Remzek ji nû da min şepal gîso w lefa lê bûne xal
Bezma ku mutrib lê zelal saqî ‘eyan mey rihte dil

Bezma ku mutrib lê diyar terha cuwan da çeng û saz
Rûyê beraq zulfê di naz îro ‘eyan mey rihte dil

Mexmûr em în ey saqiyan mutrib bide sêgah û can
Vê hicretê qelb jê giran îro huwiyyat rihte dil

Cam cam dida min saqiyan gerden bi zulf û gîsuyan
Zulfê zirav lê hate rav lewma **Se‘îd** meczûb e dil

Van dilberan suhbet kirin suhbet bi noş û ser kirin
Lef rêz kirin ‘enber kirin îro ‘eyan hûr rihte dil

Dilber ji rengê sorgulê da min ji rû cama meyê
Efyûn ger e saqî mehê îro ‘eyan medhûş e dil

Saqî kirîn mexmûrê Zîn mexmûrê xemra bêġeşîn
Meczûbê bada ehmer în îro şehî mey rihte dil

Qafiya M - م

Ji Hubbê Yar Çu Ferhad İm

Ji hubbê yar çu Ferhad im ji hicranê çu nayan im
Ji efġanan çu goyan im dikim feryad ji hicranim

Ji badê rû ezê bîme şebîhê rindi meyxanê
Ji meyxanê te girt goşek ji pîrê meyfiroş zanim

Ji butxanê me dît buttek şebîhê Zîn bi husnê ve
Kemerbest im li ber zanû ji ‘işqê rû ġezelxwan im

Ġezelxwan im çi çalak im butagîr im çu tûtî me
Seher xwandim ji Hewramî ji lutfê ew seher zanim

Felatûn hate Hewramê ji medhê o çi sekran im
Heya ‘ezrû were banî ji xwe bade bide canim

Ji goşê ebruwan rêke zebad û ‘enberê pur ke
Ezel hate dilê rindî meyê ‘ezrû we hewran im

Ji ‘işqa van perî rûyan dixwim xûnê ji bo zulfan
Çu zulfê esmerê dîtim wiha bazim çu goyan im

Li ber tîran kirim amanc me kir mertal dil û canim
We tîrek da ji ġemzê ew diçin dil da şirînan im

Li ber rûyeş şibî perr hat li dor le‘lan ji rav û nem
Ji xalê taci zer dîtim qemer bazî li ser canim

Heya dînê me[57] yî mexfî ji hicranê emê dîn î[n]
Li cergê da diçin ateş ji hicranê çi sekran im

Ji girdabê çu gerdûn im li bo maha kulah zerkeş
Were Hewrem ji butxanê bide **Se'dî** hebîban im

Hebîbê Hewremî xwastim li der suhbet we pur mey da
Yeqîn ew bî li butxanê şebîhê durr li meyxan im

Ji meyxanê me xwand esrar bi awazê ney û nayê
Şebîhê ney borûzan im ji ber zulma reqîban im

Li min derd e bidim jehrê ji destê yar ji bo dêwî
Kirim canim bi yek camê bide **Se'dî** ji yaran im

Di ber qebza şehê xûban ez im riswa li van yaran
Fidayê 'ezrû û Hewrem dil û canim ji sedqan im

Dîsa Ji Ġemzê Dilberê

Dîsa ji ġemzê dilberê mesrûr e dil pur şade cam
Şad û xweş în weqtê niyam weqtê ku tê durrdane cam

Tirka ji husnê pur nigar neqşê ġerîb lê bûne çar
Hê mîm û kehv û ta û lam min dî li ser bedra temam

Hate xeram weqtê seher xemlî ji rengê sîm û zer
Zulfa girah bayî di ker ‘enber weşand der sirr û cam

Her min dixwar misk û ‘ebîr bayî weşan zulfa herîr
Perwaz birin da burcê mîr me’d xergeha tas û du cam

Cam ‘enberî rû sorgulî teqbîl me kir ber pa şehê
Xaka ji ber payê şehê ni‘me j’me re der sîne cam

Şukrê Xudê **Se‘dî** dikê îro ez im xaka perê
Ew ‘enber e ya şekker e îsand ewê ev sîne cam

... nabit ‘edîl xaka riya dilber cemîl
Bikşîn ji çehvan ya **Se‘îd** eşkî ‘ecîb der sîne cam

Hetta ebed em dê hebîn şeyda û mecnûn em hebîn
Muhbet-xur în mihnetkeş în da’im ew e der sîne cam

Zulfa Ji Ser Dêmê Şepal

Zulfa ji ser dêmê şepal ey ba hilîn subh û di şam
Şehzadeya şîrîn zelal derket ji burcê pur xeram

Xwezya li **Se'dê** ma bela serxweş biye şirîn qeda
Nayet qerar rûz û şeba der bendê zulfa pur xeram

Ev bû keser bo 'aşiqî şîrîn qed û leb şekkerê
Rabe ji xew wek nêrgizî şebnem li ser zulfê xeram

Ev bû keder bo serxweşî dêm 'enberî dava dilî
Lêkî li ser zulfê perî her 'enber û qend û di şam

Min dî li ser dêmê gulî lam û elif her 'enberî
Ebrû keman tîr dan dilî xwezya biba şîrîn xeram

Dê bit şepal gîso zirav şebnem li ser dêmê vemal
Tac û kulah bigrin xunav em sohtiyê bejna xeram

Dê bit seher şahê seher dorê bibîn xalê di qer
Qamet elîf zerrîn kemer xwezya li burca ew xeram

Derket ji burca sunbulê dil refte bî j'cama perê
Nuqte bi nuqte filfilê ber gerdena Şahê Husam

Hicret keşan vî 'aşiqî xwezya li min weslek zerî
Dil bû kerî j'hicra 'Elî ya rebb çi ye nayê xeram

Îro seher hoş çû ji ser şehzade'î xef hat bi der
Heywan ji kû munbit li ser wer bêt şepal qamet xeram

Dîsa bibê ey rindi ma boçî dikî nalan şeba
Wek tûtiya bûyî xuya der şewqi yara pur xeram

Narê evîn û 'işqehê bû zîbeqe hem meş'el e
Nabî xefî rûz û şebe selwa sehê nabî xeram

Ey zahidê xişk û xudî dîsa neke lewmê li vî
Dil bûye xûn vî 'aşiqî der hicreta Şahê Husam

Sur'et li min bûne du sal vê hicretê dil bûye mal
Rûreş bibin xane w di mal dîsa ketim hicra Husam

Xame w midad nakit wefa şerha firaq û hicreta
Şîşê di sor ta ta tewa vê hicretê kuştim Husam

Dil Tûri Sîn ey surşirîn lewma ez im muhbetkeş în
Lew heyy ez im firqetkeş în ey can were Şahê Husam

Îro Seher Mexmûr e Dil

Îro seher mexmûr e dil j'vê dilbera şîrîn kelam
Lewma seher min dil ġeram j'vê esmera ez bûm ġulam

Bayê seba rakir niqab lew bûn ‘eyan zulf û gulab
Dinya li min bûye kulab sed merheba şîrîn kelam

J'bezmê [E]lest min bû nesîb ‘işqa şepala min hebîb
Dê kor bibê eswed reqîb ey padişahê surkelam

Leyla ji ‘Amir bû xuya kêşa niqab j'zulf û rûya
Birbû ji min zuhd û riya lewma **Se‘îd** bûbû ġulam

Bayê seba ji ma[h] rû avêt niqaba zulf û rû
Enguşt hejand ji dest xwe şeqqe'l-qemer j‘ewr û ġumam

Şeqqe'l-qemer j'remza zerî kesrî ji wê belz û kirî
Mîr û ġulam dil bû kerî ez sohtiyê şîrîn kelam

Qafiya N - ن

Ji Bikr û Duxtera Esmer

Ji bikr û duxtera esmer wiha girtim çu sehharan
Ji wê bikrê dixwim bade ji zulfê wê dixwim bûyan

Çi bikr û duxter û naz e ji ġemzê xwe diweş sihr e
Ji ebrûyan didit bade ji çeşmê xwe didit yaran

Siyah çeşmê leb û leʻlê ji vê badê dikîn sihrê
Sihir da min ji cama xwe ji wê sihrê me kir nalan

Heya duxter bike rehmê tu kengî bê ji wê burcê
Ji burca muşterî derkev xumar im ez dikim nalan

Ji bo yarî were duxter du zulfê xwe bibarîne
Nesîmê ʻerʻer û çîçek bibarîne ji wan baġan

Ji baġê ʻezruwê pur ke sebîl û turq û awazan
Tu wê ceʻdê bibalîne ji zulfê xwe bixûn nayan

Ji wê ceʻdê ez im medhûş ji bûya wê ez im serxûş
Ji hoş û bikrê bînim nitac û bikrê efkaran

Ji van rindan we bêhoş im ji bada leʻlê meynoş im
Sehergahan li ney hoş im teʻalellah ji van yaran

Te‘alellah ji husna duxtera ‘ezrî ji balayê xeram hatî
Ji husna wê Eyaz ber xwar ji ‘işqê wê ez im mestan

Nesîmê min bibe hemrah li cergê da bibe agah
Ji hicranê dixwim xaran bibe hemrah li ber yaran

Çi hemrahek çi çalak e ji wî rûhim ez im qalib
Fidayê hezretê şah im Husameddînu we’l-canan

Ji Tirka ‘ezruwê zanim **Se‘îd** şeyda li ruxsaran
Kezalik meyfiroş zanit bibîn aġûş li ber yaran

Bide Canê Ji Meyxanê

Bide canê ji meyxanê şibak û pencer û rewzen
Ji butxanê bide xanê bi tar û keş li derdê min

Li min derd e bibim aġûş senem Hewrem bi ‘ezrû ve
Heya dildar bimeş îro ji xan û pencer û rewzen

Subihgahan were saqî li min pur ke meyê baqî
Ji goşê ebruwan başî ‘ebîr û ‘enberan sosin

Du zulfê eswedî pur ke ji çeşmê reş ‘ebîr pur ke
Ji ruxsarê Xeten rêke ew e îro li derdê min

Ji derdê xwe dikim feryad ji hicrê ew ez im Ferhad
Evê zalim ceger buryand bidê jehrê eya can min

Li min poş bî şirîna yar çi car **Se‘dî** ji hicra yar
Meger saqî werîn dildar biçit hicrê ji cergê min

Ji cergê min ‘eceb xûn e ji dildarê di xûnxûr e
Ji vî saqî dixwim bade ji zulfê ew ceger rewşen

Ji şu‘la rû ezê şem‘ im çi perwan im li damê cem
Fitîla dil biye ateş şebîhê Tûr biye rewşen

Ji tûrê Hewremî bînim di camê da Cemî bînim
Ji van yaran çi şirînim çeraġê dil biye rewşen

Bide saqî mey û bade kî rewşen bî dilê sade
Ji bê bade dilim sar e dilim kor e ji bê rewşen

Ji seccadê eya saqî qedeh pur ke ji meyê baqî
Çu seccade nebî rewşen meger bade bikî rewşen

Ji enwarê şirîn ġunçan me dil tûr e purî nûr e
Ji Tirka Hewremî meş'el kenarê Qaf buta me'den

Çi Tirkek saf û pur nûr e cihan tûr e di dil xane
Kerem lutfeş niha nîne ġerîb kir te ji wî rewşen

Ji 'işqê ew felek rind e dilim mest e ceger rind e
Felek xwande medih zêde bixûn kilkim medih sosin

Ne kemter bûm ji gerdûnê nekim medhê ji bo yarê
Wefa an est[58] bikim medhê ji yaran ra segim ez min

Ji bednamî rûyim xecl e ji pur xamî dilim sade
Meger dildar bikî lutf e bibî bala fikarê min

Dîsa Werîn Ey Nûcuwan

Dîsa werîn ey nûcuwan ġemzê ji goşê ebruwan
Qewsê hilal îro ʻeyan dil da birin tîrê di wan

Minnet ez im mexmûrê wan sekran ez im şubhê livan
Sekranê rûyê ʻezruwan heyranê dêm û ebruwan

Manga ji ruxsarê butê kevte di cama sekretê
Sekran hene l'rûyê butê lê ez tenê rindê di wan

Teşbîhê bilbil ez heme perwaz ji wê ez girtime
Hey hey ebed ez rişтime heyranê zulfa meyweşan

Bûya ji ruxsarê ewê mexmûr û serxweş ez kirî
Şukrê Xudê ew bo me bî kakul reşa em lê bixwan

Xwande li min vê Tirk şeh e ahû sifet pur ʻenber e
Îro seher ezfer weş e zulfa şepal derdê weşan

Ellah ji vê Tirka şepal durrdane bî lê xett û xal
Medhê bike bi kilk û dilam perwaz bibîn ba zulfekan

Ey ba nesîm weqtê seher weş ke li min çaha di qer
Zeqna xunav ez kirme ker lew her ez im wek tûtiyan

Îro **Seʻîd** şiʻrê bixwan her bo li bejna ahuwan
Em şaʻirê p[î]rê muġan îro seher bêhoş rewan

Borden[59] ji min van ahuwan hoş û ʻeqil bo zulfikan
Şam û seher min xwar ji wan hubb û selam j'leʻl û leban

Subha Elest dîsa heman mexmûr kirîn şahê butan
Ellah di ber qebza Elest avête dil ‘işqa butan

Ellah sehergaha ezel rihte dilî hubba ezel
Hey hey dinoşim mey ecel ba ġemzeyê le‘l û leban

Xûnîn dil în reng esmer în hû hû dikîn di sekret în
L’vê dilberê husnek şirîn payan niye her an û an

‘Işqa cuwan û esmerê nayêt hisab û defterê
Ellah ji cama zerkeşî da min qedeh j’rûyê di wan

Zulfan û biskan her weşîn bayê yemîn bo rindê dîn
Nînim ġerîb lew yar hebîb şefqet pur e j’zulf û perran

Îro **Ġeramî** serxoş e çeng û defê wî da xweş e
Ma’il dibî destan weş e der bendê şahê ebruwan

Carek Bibar Bayê Nesîm

Carek bibar bayê nesîm zulfa girah bo min weşîn
Herdu perra lif ke û bipêç bin da rûyan bo min hilîn

Tirka ji tayê ‘er‘erî tac û kulah zer-ab kirî
Zîyr bire kakul reş e ‘ezra rux e gerden perîn

Ya rebb ji Tirka perde reş bûme ġerîb ceger di reş
Zulfa siyaha bû di weş ey ba yemîn miskê weşîn

Hilne w bibe ta Qafe Qaf çerxa bideyn çun bayê şam
Perwaz herin ta Qafe Qaf cam jî meyê hem etles în

Cam jî bibî zêr û sedef dîsa ku bî îro sedef
Da em hebîn meczûb ne xef herfa ji miskê reş weşîn

Meş‘el hebin wek sîm û zer şems û qemer geran li ser
Çerx û felek bêtin li ser meş‘el hebin wek yasemîn

Herdem bibin sekran û mest cam jî bibî xummar û mest
Rengê sedef meş‘el dirext zerre bi zerre bû weşîn

Teqrîrê cama zerkeşîn nakit wefa halim yeqîn
Wesfê şepala surşirîn nayêt ji me w Iskender în

Şu‘la ruxa şems kir siyah zendê spî cam kir siyah
Ellah ji wê husna rûyan xellaq kirin em serxweş în

Cibrîl ji wê rakir niqab nûrîn dikir bi[s]k û j'gulab
Tûba wu qedda ew me'ab hem ins û cinn û canwer în

Canê **Se'îd** neqda te bit rûhê 'ezîz nextê te bit
Sed Xusrew û Şîrîn bibit sedqa serê zulfa zerîn

Leyla wu Mecnûn her hebin şubhê Şirîn û Xalida
Canî biden bê 'eyb û reyb her bo ji çeşmê nêrgisîn

Her çî ji dil canî nedit şubhê gulê pur xari bit
Kilk û **Se'îd** pur bade bit em bilbilê rûyê geş în

Carek Were Bayê Yemîn

Carek were bayê yemîn biska ji ser dêmê hilîn
Şoxa şepala leb şirîn her daye min hubb û evîn

Hubb û evîna nazikê sohtim wekî perwanekê
Perwaneê li rûyekê şoxa şepala pur evîn

Hubba şirîn û esmerê nayêt hisab û defterê
Bednam kirim vê defterê em dîn kirîn dînek şirîn

Dînê Şirîn her bûme ez ‘aşiq li xalan bûme ez
Mihnetkeşîn her bûme ez dînî kirîn rindek şirîn

Ferhad ez im naxwiy Şirîn şîrîn dihat wek tîr û şîr
Tîr dane min wek tîrê Mîr ez kuştiyê zulfê Şirîn

Naza şirîn û pur letîf libsê di ber her bû şerîf
Şoxê kirîn ze‘f û nehîf hem nazik û gerden şirîn

Gerden Şirîna Farisî êsîr kirim b’zulfa herîr
Êsîr kirim b’hicra evîn Ferhad ez im kanê Şirîn

Êsîr kirim wek zift û qîr ez kuştiyê rûyê emîr
Tîmûrileng ev Zîn e Mîr her Mem ez im tu bûyî Zîn

Dîna şirîna Mîri Zeyn gul beġçeya hubb û evîn
Da d’beġçeya ridwanê ġeyb Tebrîz ez im kanê Şirîn

Leyla kirîn dînê Şirîn ew nazika baġê evîn
Se‘dî tu yî şahê evîn Mecnûn ez im şekker kirîn

Dîsa Li Min Nû Bû Evîn

Dîsa li min nû bû evîn bûya gulê nû kir evîn
Şîrîn qeda sahib evîn rihte dilî hubb û evîn

Şîrîn xeram wek neyşeker qendê dirêjit her şeker
Selwa çeman zerrîn kemer her daye dil şekker kirîn

Şekker kirîna yari min em qeyd kirîn bi qeyda rim
Qeyd û kilîla bilbilî her tê ji vî destê şirîn

Bilbil dixûnit medhê yar ez sohtiyê zulf û ‘izar
Derdê **Se‘îd** ‘işqa ġedar xarê gulê em şîn kirîn

Carek Ji Tayê ‘Er‘erê

Carek ji tayê ‘er‘erê daye dilî xumma evîn
Minnet ku îro dêm durê serxweş kirîn der enzelîn

Serxweş kirim wê ‘er‘erê wê xûb û nûrîn esmerê
Ruxsar perî mujgan durê mexmûr kirîn der enzelîn

Mexmûr bû ya sunbulîn biska du ta miskê weşîn
Kakul reşa lê ‘enberîn heyranê dêmê mehweşîn

Medhûşê bejna çîçek în derket ji burca sunbulîn
Dê bêt şepala ġemrevîn ew nêrgiza gerden şirîn

Gerden durrê b’ġemz û surê wî şahidê qudsî gulê
Durrdane yim zuhra ye dêm bazû ji miska şehleyîn

Şehla û zulfa poşe zer kerkir ceger ta pa û ser
Derket ji burcê wek qemer şox û şepala sunbulîn

Şoxa şepal zulf kirne ker ta ta ji miskê bûne qer
Xerram dibî zerrîn kemer hem tûtiye şekker kirîn

Ew tûtiya şengok û şeng mey daye min j’biska çeleng
Saqî werîn maha felek der bendeê zulfê reş în

Şaxê gulê wek ‘er‘erî ahû sifet xirrîn ketê
Çeşmê di mest xummar butê tîra didin j’ebrû reşîn

Derda dixwim j’wê nazikê ez bendê zulfa yarikê
Derdan dikî selwa bekê hey hey dixun xar û xesîn

Xarin gulê ser neşter in mislê di remzê dilîn
Ta key xelas bim mehweşê ey can were halim bibîn

Ew tûtiya minqar zeheb bal û perrên j'hûrê qeseb
Şebnem li ser dêmê ġureb hem 'enber û dêm yasemîn

Yara ji mercana zirav dîsa seher lê hat xunav
Ateş dibarit her seher ateş dilîn muhbetkeş în

Mihnetkeş im her gah û gah ateşxur în ey mehweşîn
Ew nêrgiza bi lutf û hesîn Behmen ji wê hezr û hezîn

Lerze ji wê Behramê Gûr Efrem biye besret ji kor
Îro **Se'îd** der 'işqê hor lew serxweş im j'Qalûbelîn

Îro Ji ‘Işqa Nêrgizê

Îro ji ‘işqa nêrgizê dîsa ji ‘eynê ateş în
Tîrên di wê ateş helîn biska ji ‘enber raweşîn

Biska siyah re‘na ye pur ateş dibarit her seher
Ateş gerrînim ev qeder wer binger û ateş dilîn

Ateş dilim wek dozex im derdê li min cama meyim
Wesla şehî derdê dilim hem dozex im wek ateşîn

Ateşxur e îro **Se‘îd** dûr û diraz û pur be‘îd
Wesla du zulfa ew mecîd saqî biya em ateş în

Saqî biya wesla bi yar ker bî ceger der ‘işqê yar
Yara şepala neyşeker em tûtiyê şekker-ger în

Şekkerxur im her subh û şam saqî bizan ayet ji cam
Cama zucac çu camê Cem lutfê bike sohtî dilîn

Sohtî dilîn her gah û gah saqî tu yî baġê meram
Carek biya wesla Husam em sohtiyê hicra gul în

Hicra siyah her rûsiyah her jê dirêjit dûr miyah
Yara tu yî rehmê kemal em ‘aşiqê rûyê te yîn

Ruxsar ji xalan bûye rav rav rav hene çun mewcê av
Fî hubbiki zabe’l-fu’ad[60] saqî were miskê weşîn

Biska siyah ‘enber weşan vê tûtiyê şekker geran
*Zabe’l-fu’adu*61 ey cuwan rûz û şebê firqetkeş în

Îro Se'îd Mexmûr e Dil

Îro **Se'îd** mexmûr e dil mexmûrê husna dilber în
Dilber ji 'eynê kewkeb în zulfê siyah hatin milîn

Biska siyah 'enber weş e tûtî sifet cam û dil e
Cam daye min j'nûra mey e biska siyah ser dan milîn

Ser dan li ser dêmê qemer nuqtê ji 'enber her du ker
Nuqte bi nuqte bû kemer em bilbilê bûya gul în

Nuqtê siyah 'enber reş in kakul ji mawerda reş in
Reş bû ji şu'la rû kuhen derdê dilî rûyê şehîn

Rû esmerê xwastim seher ew nêrgiza yekta li merr
Nêrgiz xeram bî ew seher em bilbilê rûyê geş în

Dilber biye wek yasemîn bûsek me kir ber pa zerîn
Gerçî li min hate hecir mihnetkeş în bo dilberîn

Ev dilbera rengînê rû şems û qemer gerr dan li rû
Destê spî zulfê di bû rav rav rijan ber yasemîn

Rav bûn selîb ber 'ezruwê derdê li min ev Hewremî
Şehbazê şahan Hewremî heyranê dêmê ehmer în

Perwaz ji şahê pur siyah qamet elîf dêm şubhê mah
Dê bêt seher Şahê Husam heyranê zulfa şehle yîn

Ev tûtî minqarê sedef dakevte nêv cama sedef
Sed şahibaz hatin bi xef rûh bî fidayê şahnişîn

Şekker dehaneş bûye rîz îro li me perwaz [bi]rîz
Ta Qafe Qaf ev mîzemîz em Hewremî şekker-ger în

Îro şepal min dî seher xerram dihat j'burca qemer
Şeşperr li dest qerqef li ser lew sohtiyê zulfa reş în

We'de dikir bo 'aşiqî hetta ebed sekran tu yî
We'da şehî nabî xefî destgîr ez im *der o û în*[62]

We'da şepal nabî xilaf lewma **Se'îd** meşġûf xilaf
Mezre' fene ey nûrê saf camê bidar bavêj kemîn

Min dî li suhbet mahî-rû camek rijand j'zulfa digo
Qalet lena ya 'aşiqî ġenni bigo şi'ren berîn[63]

Dîsa Bibare Ey Nesîm

Dîsa bibare ey nesîm lale ‘izar bo min werîn
Şimşad û şemsa rû-perî şebnem li ser xeddî zerîn

Lale ‘izara ‘işqehê xef hate dil der xergehê
Birhê hilal qewsê mehê medhûş kirîn wê mehweşîn

Weqtê ku tê tev bûme çav weqtê dixwand tev bûme guh
Leyla xeram dêmeş xunav hatin mila ew reş weşîn

Ya rebb çi ye ev surperî reyhan li ser dêmê gulê
Dem dem nihan û ney xefî bû ‘enber e bisk şehleyîn

Libsê di ber bergê gulê eswed ‘uyûn setwet begê
Xef xwande wî wê negnegê ‘aşiq tu yî der enzelîn

Saqî biyar cama meyê sohtî dilîn j’rû heykelê
Sekran bibîn j’wê tilsimê cana were zulfê weşîn

Saqî were têk mutribî rast kin j’me re çeng û neyê
Ferd ferd bibêm *şi‘ru'l-meyê*[64] der bezma cana esmerîn

Mutrib were weqte ‘esir roj hatiye burca hemel
Lê de defê bo serxweşî saqî weşîn miska reşîn

Mutrib bide saza zirav da çeng nebî zîra zirav
Bezma ku mutrib tê kuzav saqî dibî zulf ‘enberîn

Bezma ku saqî yari bî Hewrem dibî ‘enber weşîn
Hewrem dibit saqî j’me re saqî dibit ew mehweşîn

Bezma ku Hewrem lê diyar hoho dikîn ber ‘erşê yar
Hoho diçît mayîn sukar hingî em în her serxweş în

Bezma qemer lê hate xwar bilbil dibit baġ û bihar
‘Ezrû vehewrem lê diyar em ‘aşiqê her sî zerîn

Bezma ku bilbil tê bifir teşbîhê bilbil em difir
Hoho fehîm ra her dibir hetta ketin baġê emîn

Saqî ku tê pur xew xweş e kakul reş e reyhan weş e
Reyhan me girt û her xweş e yarî digirt ‘erqeh cebîn

Bezma ku pîrim lê dimîn ‘ezrû dibit ‘eynê ‘ebîr
Serxweş dibit dîsa **Se‘îd** lewma em în şeyda dil în

Mahê bibîn ber wî Şehî lew serxweş im j’cama meyê
Bezma Şehî heft reng weşî saqî tu yî reyhan weşîn

Dîsa l’me Da ‘Işqa Şirîn

Dîsa l’me da ‘işqa Şirîn rakir ji dil xûn û enîn
Xûnrîz kirim wê şehnişîn ker kir ceger vê surşirîn

Meşha şirîna ‘ezruwê xemlî ji zer-ab û perî
Xemlî ji bergê zer gulî ruxsarê wê mehbûb şirîn

Şêrîn qeda qamet elîf husna rûya husna letîf
Zuhre ye ew bejna şerîf bûyê ji miska reş weşîn

Ey ba hilîn benda rûya da em nexûn ah û eha
Ber gerdenê pêçîn du ta destê min û zulfa şirîn

Çenber dihat l’Çengîzi da derbîn ji şîra pur dida
Berqa ji zulfa bû dida Belqîs ruwe ew surşirîn

Birhên ji ‘enber bûn hilal qewsên di wan mû mû vemal
Tîr rihtine wek tav û lam rûz û şebê mihnetkeş în

Mihnetkeş în roj û şebê der muhbeta şêrîn lebê
Xwezya **Se‘îd** ew ġebġebê qendê dirêjit surşirîn

Şîrîn e ew guft û kenê firqetkeş im der ġurbetê
Şewqa li ‘alem ew butê husna ruxa l’banê şirîn

Ger şemmeyek j’husna te bî bêxîn di cama sukretê
Dê kîn cihan pur nûri bî awaz herin ta Çînê Çîn

Vê duxterê husnek heye qet kes bidî wesfê heye
Ew surperî diva dilî rihtin dilî nûra evîn

Cama Cemî şemmek ji wê xumma Felatûn j'sihrê wê
Ey ba bide zulfek ji wê bendê bibe bîne Şirîn

Bendê bibe j'rûyê zerîn ebrû keman dîsa werîn
Ebrû hilal derdê min in melhem ji dil derdê şirîn

Çend yek hebin pur cerh hebin dê xweş bikit bihnek ji wê
Dê xoş dikit çeşmê di kor 'Îsa ye sirr ew surşirîn

Meyxan biye menzil li me carek nehat ew şahê me
Ya rebb 'ebes bilbil neke em 'aşiqê rûyê şirîn

Neqşek Me Kir Şubhê Se'îd

Neqşek me kir şubhê **Se'îd** her bû ji rûyê dilberan
Dilber ev in 'aşiq-kuj in gerden pur in ev dilberan

Neqşê me bî medh û sena dengê me bî nay û newa
Nay û defan gerhan b'meqam sêgah û enwa' dil-geran

Nûka zerîn gêrand neqiş her bo nigara pur neqiş
Neqşê 'ecîb û pur ġerîb rindî te kir ber dilberan

Carek bibar bayê nesîm zulfa siyah rake kerîm
Mesned tu yî ya ser ne'îm zulfê weşîn j'va dilberan

Bo min werîn zulfa belav hem çenber û miska xunav
Ev qas hebin j'gerden zirav 'aşiq em în bo dilberan

Van lewliyan gerden xunav biskê di xwe kirne belav
Çîn girtine li dêmê xunav zulfê siyahê dilberan

Dilber pur in hem ahû in ġemzê di wan 'aşiq-kuj in
Remzê ji qewsê ebruwan tîr eswed in bo 'aşiqan

Wer meyfiroş tasê bide em 'aşiqê rûyê te ne
Hicrê kirîn pur mihnet e libsê şerîf ber dilberan

Çun bilbilan awaz dixwan her bo ji 'işqa dilberan
Bo çî nekîn neqşê li wan hem ebruwê qewsê gulan

Gerdûn kire ji hubb û evîn em jê xur în hubb û evîn
Ber defterê hikmet hebî em bûn cunûn bo dilberan

Herdem dikim şukrê **Se'îd** der wehdeta mutleq mecîd
Zuhd û diraz û pur be'îd der wesleta van dilberan

Meyxan hebî j'roja ezel ew jî j'me re xan û mezel
Badefiroş badê bide em 'aşiqê rûyê butan

Me'şûq bi ruxsar kewkeb in ebrû ji wan her eswed in
Qewsê di wan zer-ab kirin çenber ji wan eswed-geran

Tirka ji 'enber neyşeker le'lê ji mey weşhand şeker
Zulf şeh kirin zerrîn kemer hetta ketîn dama şehan

Ber defter im sade ev e tirsim ji zuhdê her niye
J'roja ezel em meyxur in qible li me ev dilberan

Qible w 'ibaret her ew e Ke'be w hecer her min ew e
Butxan e dil ey surperî roja we'îd çîn nezdê wan

Îro Ji Remza Esmerê

Îro ji remza esmerê mihnetxur în em ‘aşiqan
Remzê di wê şêrîn lebê daġê dilim wek laleyan

Lûlû weşê horî weşê gerden purê meş kewkebê
B’ġemz û sirrê dama dilî ker kir cesed van lûleyan

Lûlê ji rengê ‘enber in dêm esmer in reş kakul in
Çeşmê belek din sihreyîn hem ‘enber in damê dilan

Qed nêrgizê selwa sehî hate xeram l’baġê gulê
Meşha li baġa esmerê ruxsar ji ‘eynê kewkeban

Ew kewkeba nûrîn beden her bo min e guftar û ken
Xende ji le‘lê qend şiken bazû ji mercan û durran

Lûlê ji balayê xeram her daye dil hubb û ġeram
Wek nêrgizê hecc û di şam ber bestiyê ser bû giran

Bazû ji mawerd û sedef qamet letîf gerden elîf
Ew bejn û bala pur şerîf derket ji burca ġunçeyan

Leb ġunçeyê wek muşterî reqsî şebîhê zuhreyî
Kirye girê burc sunbulî şîrê di dest ‘eyn ‘eyn zeran

Bejna ji ‘enber daweşand biska siyah bayî weşand
Şîr daweşand dil jê revand yekser girîn em ‘aşiqan

Zulfa siyaha şehhilî reqsî seher wek kewkebê
Şimşad û şemsa zuhreyî gerr dan li ser dêmê gulan

Xalê ji ‘enber sor û zer bazî kirin ber rûyê zer
Ebrû hilal qewsê qemer bayê seher ezfer weşan

Me j’muhbetê çûm hezretê herdem ji narê muhbetê
Sohtî dilîn der butkedê tenha ne ez bû ‘aşiqan

‘Aşiq-kuj in b’sihr û sirrê Sîna ji wê zanî sirrê
‘Ezra û Meryem ew perî der ‘işqê wê reqsîm kunan

Reqsî Mesîh wek muşterî awaz gihan burca cedî
Cellet ‘eleyna[65] ya **Se‘îd** lew reqqisîm wek kewkeban

Dîsa Me Dî Terha Cuwan

Dîsa me dî terha cuwan rîşê kulah ‘enber weşîn
‘Enber weşand ez her teref xala ji miskê reş weşîn

Xalê rûya ev daweşand kakul reşa ezfer weşand
Zulf û perra mey daweşand lale ‘izar wek ‘enber în

Çîçek li xalan bûne xan çîn çîn kirin zulf û perran
Van gîsuwan Qur’an dixwand ey ba weşîn miska reşîn

Birhê di reş şubhê hilal emrê humayûn da şepal
Leb ‘enberan guftar zelal guftar şebîhê nêrgiz în

Emrê humayûn her dida bo te **Se‘îd** destûr me da
Lew hekk û tûr meş‘el dida ez kuştiyê wesla şehîn

Bada ji le‘lan bûye qend hat û digot j’le‘lê ji xend
Saġer bigêrr j’zulfa hebîb *xuz ‘aşiqî*[66] miska reşîn

Mehrem sera baġê gulan çîçek ji xalan lê geran
Zer-ab û sîmê mehweşan ‘enber ji zulfan daweşîn

Bayê nesîm lê da seher derdê li min zulfa qemer
Gulçîçek û lale kemer xurrem dibîn l’taca zerîn

Tac û kulaha seltenet her bo te bî pîroze text
Cama meyê pur bade riht destê sipî zendê berîn

Şîrîn biye ruxsar gulav şeyda kirîn l’zulfa belav
Rûhî fidaen ya cuwan şîrîn tu yî şubhê Şirîn

Destê sipî lê bûne rav ez sohtiyê dêmê xunav
Her gah û gah sîr-ab û av teşbîhê tayê yasemîn

Bejna j'semen û yasemîn nesrîn û çiçek lê pur în
Şehla û zulfê 'enberîn xwendin li min ey nûrê 'în

Kakul reşa bû yasemîn lê xwande bo vî 'aşiqî
Teşbîhê bilbil 'endelîb tûtî sifet şekker şirîn

Şekker geran îro **Se'îd** der 'işqê yara pur mecîd
Şi'rê ġerîb mewhûbê şah weqtê Elest û enzelîn

Weqtê sehergaha Elest ez bûm tiraş ew bûn senem
Hingî me xwar bada di mest lew da'ima şeyda dil în

Îro Ji Nû Pur Ateş în

Îro ji nû pur ateş în her bo ji husna surşirîn
Perwane im sohtîn dilîn şubhê perengê ateş în

Perwaneê rûyê geş în saqî were zulfê weşîn
Dil mecmerê rûyê şirîn rûz û şebê mihnetkeş în

Mihnetkeş în j'hicra perî bîn tasekê nûra meyê
Nûra rûya meş'el xuya îro ji dil ateşxur în

Ew selwa ar gerden perî avête dil cama meyê
Dunya li min eswed xuya weqtê nebî ew surşirîn

Zulf û du gîso pur belav avête dil remzên belav
Ker kir kebed ebrû zirav em serxweşê zulfê şeh în

Serxweş li baġan pur hene mehbûb ji xalan pur hene
Lê ez tenê her sohtime şubhê pereng û ateşîn

Herdem dikîn nalan ji 'işq hetta ebed dê kîne 'işq
'Işqa ji rûyê 'ezruwê yekser kirîn ateşxur în

Îro Şirîn da min evîn hetta ebed em meyxur în
Cana ji miskê reş weşîn bo bilbilî şeyda dil în

Şeyda li Leyla her em în em kuştiyê cewra evîn
Saqî bi zulfê 'enberîn em dîn kirîn l'rûyê şirîn

Dil bû qebes j'kakul reşa derdê li min wesla şeha
Çenga me jî ateş reva lewma **Se'îd** behra evîn

Dîsa Li Me Rabû Evîn

Dîsa li me rabû evîn ey ba nesîm perdê hilîn
Biska li ser dêmê zerîn riswa kirîn *heqqe'l-yeqîn*

Tenha ne ez riswa heme der subhê Lest riswa heme
Der hikmeta şerxa kerîm bûbû nesîb hubb û evîn

Hubb û evîna sorgulê birye 'eqil j'vî bilbilî
Hoşê **Se'îd**ê hoşimend avêt evîna 'işqê Zîn

Zîna li baġê mîrekan şad û xurem wek bilbilan
Nagah me dî mîrza ye Zîn rakir ji dil hoşê şirîn

Awaz û perwazê evîn derket ji burca sunbulîn
Awaz û perwaz û enîn hatin ji cama zerkeşîn

Etwar û ehwalê evîn ma ez dibêm *heqqe'l-yeqîn*
Hem nay û def em meyxur în lew madihê bejna şirîn

Mestî ji qala muhbetê Tûr in şebîhê Eymenê
Meşġûf li mihra neynikê sohtin ji hicra esmerîn

Dilber ji 'eynê kewkeb in bisko ji rengê sosinê
Reş kakula bû 'enber in em kuştiyê le'lê şirîn

Ruxsar ji wê cama sedef gerden pur e rû mawer e
Zeqna sihir çaha sirr e ebrû hilal qewsê çevîn

Goşê hilalê ebruwan ma'il dibin ber kakulan
Zulfa muselsel dêm geran ce'da siyah bû reş weşîn

Ce'da muxedder bû dida qetlê dikit rûz û şeban
Xûna di rindan kir helal lew bûm şehîdê reş weşîn

Naza dirêjit neyşeker guftar ji mawerda qemer
Naza ji mercana qemer der hikmetê riswa kirîn

Saqî werîn dê[m] 'enberîn ez kuştiyê hubb û evîn
Kuntu tufeylen fî'l-hewa der qebzê Lest û enzelîn

Cama Cemî bo min biyar hetta ebed badê biyar
Lew *kuntu kenz*a ya xefî derdim *huwe heqqe'l-yeqîn*

Min dî şepala meyperest weqtê sehergaha Elest
Bekren eqûlu[67] ey hebîb bo min tu yî hubb û evîn

Zulfa siyaha bêwefa lew min girift jê û sefa
'Eynî tereye 'eyne's-sefa lew serxoşê rûyê geşîn

Zulfa siyah 'enber weşand reş ebruwan ezfer weşand
Ellah şehîdun fî'l-hewa remza *Enelheqq* her keşîn

Tîr dan ji burca 'eqrebê xwezya li nûra ġebġebê
Derket ji burcê kewkebê ey can bigo *ma te'murîn*[68]

Zulfa siyaha bêqerar lew mest kirim her bêqerar
Xebl û cunûn Şahê Husam her min girift j'hubb û evîn

Dîsa Werîn Ey Nûcuwan

Dîsa werîn ey nûcuwan zulfa ji misk û ‘enberîn
Saqî werîn qerqef zerîn kakul reşa dîsa weşîn

Ew kakula reş ‘enberî sohtim wekî selwa sehî
Lale ‘izara xemmilî rengîn dikir j’miska reşîn

Bejna ji ‘enber ba weşan zulfa geran bû derdê şan
Bîne li min ‘eyne’l-‘eyan vê badeê ey şehnişîn

Durdîxur im îro **Se‘îd** der wehdeta mutleq wehîd
Sahib dilan ew pur be‘îd der camê ma bî şehnişîn

Ev baziyê bê bend û dam pîrê evînê ew Husam
We‘d û we‘îd da min cuwan hetta ebed lew serxweş în

Em serxweşê bada şirîn rû esmer e ‘enber weş e
Xerram biye j’zulfa gireh Leyla biya miskê weşîn

Leyla û Hewrem bûne yar saqî li wî *husnu’l-me’ab*
Narê kelîm l’cama şerab min dî perî dêm ‘enberîn

Minnet j’me re mehbûb ew e beyza yed e bala sirr e
‘Îsa sirr e Belqîs rux e dîsa were zulfê weşîn

Zulfa weşîn ey nûcuwan xerram were der qelb û can
Îro ketim benda şehan çengê bide zulfê weşîn

Her ker bike helqa şehî miskê ji zulfê her weşî
Îro ez im der bendê wê em yar kirin mezre‘ weşîn

Yar girtin û her meyxurî her pîşe im j’roja *Belî*[69]
Her bo te bî Belqîs perî textê se‘adet bû weşîn

Ev esmerên ebrû keman xûnê dirîzin b’mêjiyan
Mujgan ji wan b’sihr û sirran ew nûcuwan her şehnişîn

Textê şehî îro **Se‘îd** Belqîs li ser j’libsê cedîd
Qamet elîf gerden xefîf em perwerê her ew şeh în

Carek Veke Bayê Yemîn

Carek veke bayê yemîn bend û niqaba surşirîn
Helqe bi helqe çîn bi çîn ew qudsiye dêm bade în

Zulfa siyah[a] bû werîn yek sal ez im li dama şirîn
Şaha bipirs ez weslê Zîn kengî bibî wesla zerîn

Ev şahidê qudsî libas feġfûr sirr e feyrûz libas
Ey nûcuwan ka şehnişîn ey ba bibe bîne şirîn

Benda Şirîna Farisî rabî ji destê Şah ‘Elî
Neqş û nigar çêkir **Se‘îd** Rûhu’l-qudus feyzê kirîn

Feyz û meded îro kirîn j’feyyaz û hem qudsî kirîn
Hem çar muqerreb hemleta *rûhu’l-nebiyyin* wer kirîn

Bûbekr û Farûqu’l-fesîl hem Hefs û Nûran û ‘Elî
Behru’l-meşîxet ya Husam hem *cumletu’l-eshab* kirîn

Bi lutf û rehm zulfa hilîn nazê di wî ġem jê revîn
‘Aşiq-kuj e birhê reşîn destûr ji wî bayê yemîn

Destûr heye bo te cuwan benda bibe j’yara cuwan
Ev nûcuwan mehbûb cuwan bîne j’me re rûyê zerîn

Destûr heye bo te hilîn benda bibî j’dêmê zerîn
Destê te ye destê şepal rehmê bike benda hilîn

Teb'ê tu lê teb'ê letîf emrê humayûn bû şerîf
Gerden elîf libsê xefîf em tûleyê koma şirîn

Koma cuwan pur tê hene tûtî sifet şekker şiken
Lê ez tenê sekran mihen der bende'ê zulfa reş în

Benda rûya sîm û zerîn şems û qemer bazî kirîn
J'qebza Elest em serxweş în dîsa hilîn bayê yemîn

Carek veke zulfa girah çîn çîn bike her gah û gah
Asif li textê şahê mah ser ta qedem em ateş în

Rûz û şebê firqetkeş în mexmûrê xemra bêġeşîn
Kan ew hebîba ġemrevîn rehmê bike sohtî dilîn

Sergeşte yîm j'weqtê Elest cam daye min j'subha Elest
Mexmûr kirim ez bûme rest j'ab û gulê lew serxweş în

Carek Were Şoxa Şirîn

Carek were şoxa şirîn bendê ji ser dêmê hilîn
Zulfa mu'enber daweşîn biskê ji miska reş weşîn

Çenber ji xalan daweşîn rux kewkebê bo min werîn
Rûyê ji xawer ser hilîn perda mu'enber daweşîn

Damê ji miskê reş weşîn kengî tu bê ey nûrê 'în
Remza evîn bo min derîn kakul reşa zulfê di çîn

Zulfê di çîn ber ba mede da xûn neçî j'qelb û dile
Vî 'aşiqî rencûr neke tîran ji xalan naweşîn

Textê şepala 'er'erî lê xwande bû vî bilbilî
Tayê 'isabê daweşî ta 'aşiqan saġ bin dilîn

Bes 'aşiqî mecrûh bike dîsa dilê wî hûr neke
Dama zerî wer sîm bike 'aşiq te kuşt b'hicra şirîn

Hicrê dixwar qelb û ceger lew 'aşiqî xûn bû ceger
Carek werîn rûyê qemer da em bixûn bada şirîn

Carek bide vê şîşeê qelbê me talib şîşeê
Pîrê muġan dam şîşeê behra meyê rûyê şirîn

Ruxsar ji me dasa hilal yara bide ebrû hilal
Mihra te kir canim delal xef bî ji qelbê xod xefîn

Mihra butan bo yexlê ma lew bû sefa qelb û dila
Vê muhbetê bihtir kirîn hetta me xwar xar û xesîn

Çeng û defê perde dirand awaz gihan hetta şehan
Şi'ra me çû ta Farisan dîsa senem bû mehweşîn

Derdê evîn û 'işqehê nayêt ji destê Xusrewî
Çûm butkedê ba mehweşê serxweş kirim her şehnişîn

Şahî ji cam û şîşeê bo min rijand behra meyê
Şukur Xudê îro **Se'îd** rindê xerabatê em în

Rûyê Gulê Daye Dilî

Rûyê gulê daye dilî sed new‘ ji new‘ê cezbeyan
New‘ek dilî lerzîn û ta new‘ek dibî şubhê neyan

Şubhê neyê rewzen cesed qelbê di gel narê semed
Hubba butan ‘işqa semed sermayê dil husna butan

Hubba şirîn û esmeran qet ney ji destê Xusrewan
Husna ji rûyê dilberan paya niye her an û an

Ev dilbera semn û semîn daye dilî ah û enîn
Nalan ji me qet tên ‘eded çend yek ji husna dilberan

Ev dilbera şîrîn sifet herdem çu tûtî ye sifet
Şehzadeê cezbek diriht lew serxweş im *‘eyne’l-‘eyan*

Cezba dilî sed reng dihat lewma şehî mexfî dihat
Rûz û şeban b’muhbet dihat dil bûye xûn bo xirbeyan

Suhbet me xwar her subh û şam ba esmer û Şahê Husam
Lew dil dixut hubb û ġeram j’wê kakula şahê butan

Husna ji wan nîne çu hedd meyxan biye xan û mexed
Minnet me xwar husna wedûd meczûb em în l'rûyê butan

Hubba me bî şahinşehan lew da’ima dil bû fiġan
Tib‘et pur e heybet pur e guft û kene ba ‘aşiqan

Meczûbê husna wê butê teşbîh rimala Mûsilê
Lê ez tenê şeyda dil în gencê **Se‘îd** husna butan

Genc û xezînê serxweşan bada ji rûyê dilberan
Genc û gewahir her em dixwan lew bilbilim l’meyxaneyan

Dîsa dixwazim şukreyan qet nabirim hêj hêviyan
Rişta dilî husna butan *cezbe’l-hewa* da’im ‘eyan

Dilo Her Seyrê Gulzaran

Dilo her seyrê gulzaran bibîn yarê hezar rengan
Di gulzarê semensayan bibûs ruxsar ji cananan

Me dî canan hezar lewnî me heyret girt ji wî çehrî
Ji çehrê duxtera zer-poş dikim seyran li ser zulfan

Du zulfê duxterê zer zer rijand bade ji wî çehrî
Ji bûya wê diteysî cam weku tewrê şirîn ġunçan

Me go esrar ji meyxanê ji rûyê duxterê wafir
Li meyxanê dikim awaz li min derd e şirîn ġunçan

Ji etrafê gulê bînan hezar enwa‘ ji esraran
Bigo cana tu esraran te heyret da ji leb ġunçan

Ji ‘ecz û heyretê hoş çû di gulzarê tebabî çûn
Qerepoşa hilîn yara ji ġeyrî tu niye şahan

Ji ‘ecz û heyreta yarê fesahet bû di şi‘rê da
Bigo sihrê ji bêhoşî ji ġeybê yar mego sirran

Ji sebr û mexzenê ehzan me dî yarim di gulzaran
Sebir xoş e bi perwerdan me girt pîrek ji meyxanan

Me hacet çû ji eş‘aran ji ilhama perî rûyan
Bixo badê bi şi‘rê ma dikim neqşê li Şîrînan

Fesahet da Şehê Hewran kete reqsê di bîrê an
Dixwim îro çi heyret *z'an*[70] ji zulfê Şahê Ş[î]rînan

Carek Were Bayê Yemîn

Carek were bayê yemîn biska ji ser dêmê hilîn
Ew rû zerê dêm sorgulê bûya du zulfa ʻenberîn

Zulfa ji ʻenber bû çeper çenber ji qend û ey şeker
Leʻlê di wê j'nûra qemer kakul reşa cana weşîn

Zulfa ji misk û ezfer în xal bûne lê wek sunbul în
Çeşmê siyah her nergis în xana tu xala her weşîn

Şoxa ji şuʻla xawerî qamet diraza nêrgizî
Gerden perî selwa sehî gerr dan dera ber zulfê çîn

Zulfa siyah çîn çîn şepal ew neyşeker her bê misal
Meşha li baġa wek hilal ew nêrgiza yekta weşîn

Şirîn dihat çun camê Cem bada di leʻl j'cama di Cem
Perda di ber her birye ġem leʻlan ji mawerdê weşîn

Leʻlan ji durrdana birêj şubhê di Leyla ʻAmiran
ʻIşqa di Leyla pêt û dû leʻla Bedexşan her weşîn

Leyla kirîn zeʻf û nehîf libsê di ber etles qedîf
Ruxsar ji cana pur letîf ez bîm fida zulfa reşîn

Lutf û şepal her bo te bî cama zerî pur bade bî
Gerden ji leʻlan pur hebî ya bû bide ya misk weşîn

Kakul reşa pur nuqte lê rûha min î j'Qalûbelê
Nalî ji ber nay û neyê derkev ji burca sunbulîn

Yara letîfa pur ʻecîb neqşê di wê neqşê ġerîb
Îro reqîb lê bûn selîb tîrên ji ebrê zehreyîn

Çîn girtine zulfa du ta *rûhî fidake Mustefa*[71]
Lew xef bibî j'rûhê bela dê can bibî mihnetkeşîn

Meyxur dibîn j'yara di mest weqtê sehergaha Elest
Hey hey ez im lew butperest wer saqî zulfê weşîn

Mihnetxur în j'hicra di pur em bilbilê bê çeng û perr
Saqî were b'zulfê di perr çeng û defê bo min werîn

Bo min werîn cama zucac da dil bibî nûr û sirac
Sergeşte bîn kanê mizac der bendê zulfa ba weşîn

Ya rebb dilim bûye ceres hey hey ez im mîrê 'eses
Dîsa **Se'îd** nakî 'ebes rehmê bikî j*'eyne'l-yeqîn*

Me d'pur şevan hetta seher cam ber kef û Leyla di ber
Me d'perdeya cama qemer îro seher lew serxweş în

Me j'hesreta Leyla şirîn xew tê de çev[72] ey nûrê 'eyn
Mîrê 'eses îro ez im der 'işqê yar firqetkeş în

Zulfa çeleng şêrîn sifet ew neyşeker xummar û mest
Mest bîn ji nûra çeşmê mest zahid em în her meyxur în

Hêvî nekîn ey zahidan j'van rind û mest û meyxuran
Lêk 'eybiyê kin kin 'eyan j'roja ezel em meyxur în

Meyxur dibim j'şahê ecel der qebzeya subha ezel
Her wî senem mey riht ecel *kella*[73] hebîn em zahidîn

Dîsa Me Dî Ew Nûcuwan

Dîsa me dî ew nûcuwan taca serî her xende ken
Berda j'kulaha serwê qed şaxê zerîn û xende ken

Xende ji le'lê şekkerî hudhud sifet lew xemmilî
Şêrîn sur e lew kemmilî b'sidq û sefa lew xende ken

Le'lê di wê durdî weşand gerden durra şebnem weşand
Hudhud sur e 'enber reşand tûtî sifet şekker e ken

Ew tûtiyê l'baġê gulê da'im dixwand wek bilbilî
Ruxsare wê bergê gulê durdî reşand j'zulfa di ken

Berda ji le'lan noşi noş lew her ez im rindê bi noş
Xam û xeram ew le'lê noş *ehlen we sehlen* le'lê ken

Ev hudhudê l'baġê gulan lew serxweş e j'gîso û lefan
'Îsa ye ew ew şehnişan ruxsarê wê her xende ken

... ...
Lew serxweş e j'roja ezel ilham dihat j'guft û di ken

Îro Ji ‘Işqa Nêrgizê

Îro ji ‘işqa nêrgizê dîsa sukar û serxweş în
‘Işqa gulê mexmûr kirîn mexmûrê bûya nêrgiz în

Ew nêrgiza qamet elîf libsê di ber etles qedîf
‘Işqê kirîn ze‘f û nehîf şewqa buta medhûş kirîn

Dîn im ji ‘işqa [wê] gulê bilbil ez im minqar qedîf
Minqar li min bûne nehîf zulf û perra bû nêrgiz în

Ew nazika qamet letîf bûya du zulfan bû şerîf
Bûya lefan bûye xefîf şewqa ruxa mexmûr kirîn

Mexmûr kirîn zulf û perran wê kakulê ‘enber reşan
Zulfa du ta ezfer weşan yekser ji ewtana kirîn

Ewtan bûyîn l’çol û çeman mislê Şirîn û Xusrewan
Ferhad ez im hem Xusrewan mecnûnê ‘işqa sorgul în

‘Işqa gulê çend zehmet e herdem dixwim ez firqete
Firqet ji yaran zehmet e rûz û şebê firqetkeş în

Firqetkeş im sal û mehan der bendê zulfa esmeran
Reş kakulan her bûn ‘eyan yekser kirîn dînê Şirîn

‘Işqa ‘izar dil hûr kirîn yekser ji xelqê dîn kirîn
Bend im bi zulfê şehleyîn mehcûrê zulfê şehle în

Sergeşte yim hetta ebed yek cam ku da min der ezel
Lew bilbil im minqar ecel der medhê wesfê sorgul în

Ew sorgula zemrûd semed medhûş kirim hetta ebed
Zulfê li ser j’nûra semed tûtî sifet şekker-gerîn

Şekker-gerîn im şehnişîn wek bilbilê mewtûn gulîn
Îro **Se‘îd** dilber hebîn em bilbilê rûyê gul în

Îro Ji Husnê Yarê

Îro ji husnê yarê bîme sukar û mestan
Der defterê hebî yar ez bîm hebîb li yaran

Yarê ji husnê sorgul tîr dane min çu mîran
'Eyne'l-'eyan dixwazim cana yeqîn bibexşan

'Ilme'l-yeqîn bibexşe bade bide ji zulfan
Bada ji rûyê şirîn nayêt ji destê mîran

Mey hate dil ji yaran hetta ketîn çu mestan
Dam girte min li 'enqa dam hate pur ji yaran

'Enqa niye çu Leyla dam hate çîn ji 'işqa
Heyret gihaye damê Hewrem kirîn şirînan

Damê girift du şehbaz Leyla nebit 'edîl şah
'Ezrû girifte damem Hewrem mu'în e yaran

Ellah li min çi şah e sihrek heye çu 'Îsa
Rakir niqab ji Leyla destûr ew e ji yaran

Kevte 'ekis ji Leyla der camê Cem nihanî
Da'im hebit çu mîran dewlet ji şahê Hewran

Hewrem li min heyat e 'ezrû li min nebat e
Şirîn li min cemal e lew serxweş im li yaran

Bend û niqaba Leyla rabî ji lutfê Hewrem
Medhê dikim li ber wan bed kor bibîn ji hicran

Bendê sitanê yarim şubhê **Se'îd** dixûnim
Ber dergehî dimînim her bo ji husnê yaran

Mîr im şebîhê mîran lew mest ez im ji yaran
Şahî li min çu nîne der bezmê husn û xûban

Newayê Se‘dî We Dîtim

Newayê **Se‘dî** we dîtim dibêjim her ev e Mecnûn
Bigo mutrib newayê saz meger yekdem bibim Mecnûn

Min im Mecnûn li weqtê xwe li bo rûyê şirîn Leyla
Ke der weqtan wiha dîn im li der kohan ez im Mecnûn

Ez im Ferhad li Şirînê li van cewlan digêrînê
Wiha sohtim ji êvînê ji hicra wê ez im Mecnûn

Ji hicra zulfê Şirînê nema taqet li vî dînî
Ke taqet çû ji meynoşî hecir telxe ji bo Mecnûn

Ji jehrê telxi hicranê wiha dîn im li meydanê
Dilê dînan biye xûne ji hicranê geran Mecnûn

Ezel da min ji bayê xwe evî derdî ji ‘işqê xwe
Ji bo canim heye pur xew j’firaqê şah ez im Mecnûn

Ji bo derdê dilê Mecnûn cemalê rûyê Leylayê
Dilê mexmûr biye mecrûh ji bo firqê wesa Mecnûn

Dewayê derdê mecrûhan heye dîsa li cem yaran
Dilê yarim weku aban dikî rehmê li bo Mecnûn

Ji hicra wê nema xwabe ji firqa wê nema xorde
Ela yara guzer Mecnûn di weqtê da **Se‘îd** Mecnûn

Dilim nare ji ‘işqê şah bibîn mahê bi rûyê şah
Ji ber firqê nema agah ji ber ‘işqê dilim Mecnûn

Weqtê Bihar Gul Hat Xeram

Weqtê bihar gul hat xeram bilbil dixûnit ya cuwan
Ney ba me bî her an û an dê ez bidim rûh û rewan

Yara cuwan bîne gulab j'zulfa di Leyla û 'isab
Da ez biçim *husnu'l-me'ab* bade werîn terha cuwan

Terha cuwan xûn hate dil şehzadeê mey rihte dil
Hicretkeş în j'zulfa li mil mihnetxur în ey nûcuwan

Badexur în şahê cuwan wê kakulê xweş ke 'eyan
Çîn çîn bike zulf û perran saqî were j'baġê cuwan

Ellah di ber qebza Elest da min meya gulgûn û mest
Hey hey ez im lew meyperest lew serxweş im rûyê cuwan

Herdem dixwim xemra helal b'vê fetweya şahê celal
Ilham ji remza zulcelal da fetweya rûyê cuwan

Ellah di ber bezma ezel daye **Se'îd** 'işqa ecel
'Işqa di Leylê bû emel saqî j'me re ev nûcuwan

Leyla û Hewrem bûn hebîb weqtê Elest ev bû nesîb
Nakîn hezer ji dêw û reqîb ez perwerê şaha cuwan

Saqî bi zulf û xeml û bû weqtê seher xerram dibû
Mutrib bide çengê bi hû ey yar were terha cuwan

Qismet me bî bada şirîn cam û qedeh min bû nesîb
Qismet hebî wesla hebîb em meyxurê terha cuwan

Îro senem bûye şepal teşbîhê bilbil bû vemal
Tûtî sifet ew xett û xal der suhbetê şahim cuwan

Leyla me dî îro seher der suhbetê ebrû qemer
Zehra û şemsa neh felek kevtin di cama nûcuwan

Zehra ye dêm Sîna ye sirr teşbîhê ‘er‘er bû weşan
Weş kir ji zulfê şehleyî misk û ‘ebîr zulfa cuwan

Minnet em în der baġê wan şekkerxur în wek tûtiyan
Lew her ez im şekker-geran pêşî **Se‘îd** yara cuwan

Carek Were Bayê Yemîn

Carek were bayê yemîn bûyê werîn ez yasemîn
Bejna ji bergê sorgulê de'lê şebîhê yasemîn

Selwa ji tayê yasemîn şam û seher her zeyyinî
Ebrû kemanan reş kirîn bûya ji zulfa 'enberîn

Xalê ji 'enber bûne lê zulfa siyah zêr-ab e lê
Gerden bilûr rav bûne lê zulfa ji miskê reş weşîn

Ruxsarê Zîn lew kemmilî qamet elîf lew xemmilî
Çeşmê siyah lew cemmilî xûnê dirêjit ew şirîn

Remzê ji mujjan mêrkuj in lew da'ima 'aşiq-kuj in
Meqtûl ji wan îro em in dîsa seba zulfa hilîn

Ew şahibazê 'aşiqan dakevte l'nêva tûtiyan
Ew şah e *yetîrû fi'l-'eyan qelbî yera 'eyne'l-yeqîn*[74]

'Îsa nefes ew yarê ma tûtî sifet ew şahê ma
Der 'işqê wan xorem bela ehsen ji husna şehnişîn

... ...
... ...

Şox û şepala Kewserê ruxsar pur e wek sorgulê
Cebhet durr e gerden perî saqî werîn le'la şirîn

Ev saqiyê gerden bilûr mey daye min j'cama tehûr
Zulfê siyah werdê di cûr ebrû ji mawerda şirîn

Sîmîn ber e kakul reş e xal ‘enber e nergis xweş e
Zeqna xunav b’sihr û sirr e ey ba biyar bûya şirîn

Wesla Şirîna Farisî pur hat j’me re vî bazehî
Ev baziyê b’tor û gulî perwaz birin ber sorgulîn

Ev baziyê quwwet esed zulfê li ser j’nûra semed
Şubhê ġezenfer bû lebed xwezya ‘Elî em wasil în

Ev baziyê bê qeyd û dam dakevte nêv rindê xeram
Kuştin du sed Tîmûrileng lê ez tenê mihnetkeş în

Derdê me xwar j’baġê gulan em ‘aşiqê pîrê muġan
Dê em bidîn b’tac û kulah b’vê badeya rûyê şehîn

Kes bi xerabat muġan em birsîn dê bixurîn bad û mey in
Bi xerabat Husam em birsîn cegerî têkde bideyîn

Reş û zer e b’ġemz û sur e mey daye min j’cama zer e
Mey daye min j’çeşmê reş e remzê di wê ġem jê revîn

Şox û Şepala Dev Bi Ken

Şox û şepala dev bi ken mey da **Se'îd** j'xemra kuhen[75]
Ew nêrgiza şekker-şiken her ba min e guft û di ken

Guft û kenê naz û şehê naza dirêjit wek mehê
Selwa sehê behra meyê em kuştiyin b'le'lê bi ken

Guftar durê cama meyê xemrê bide j'rûyê şehê
Sirr dane min j'zulfa reşê miskê biweş j'le'lê bi ken

Zulfa diraz bûye çeper çenber dihat wek Mîr 'Umer
Qewsê hilal rihtin teber em suhbetê ew bê li ken

Tîr dan ji qewsê mal zirav cebhet enî girtin xunav
Tîr dan ji zulfê pur belav Behmen dikuşt b'le'lê bi ken

Se'dê Weqas jê kir hezer Cengîz dixwar xûn û hezer
Tîr dane çeng j'burca qemer em 'aşiqê yara bi ken

Le'l û lebê meş kewkebê em 'aşiqê vê ġebġebê
Hicra gulê j'roj û şebê derda dixwim j'le'lê bi ken

Selwa ji balayê xeram xweş daye min hubb û ġeram
Ez perwerê Şahê Husam em 'aşiqê yara di ken

Hubba buta her bê misal min bû nesîb j'subha Celal[76]
Em meyxurê bada helal saqî j'me re her guft û ken

Îro Ji Nû Firqetkeş im

Îro ji nû firqetkeş im dil bû kerî nûrîn beden
Ebrû reşê tîr dan bi ken tîran mede zerrîn beden

Xende şepal îro **Se'îd** zulfê ji 'enber bû mecîd
Der wehdeta mutleq **Se'îd** da'im li wê her xende ken

Selwa zirav lew xemmilî her tê reqis lew kemmilî
Mestan em în lew cemmilî weqtê ku bê şîrîn li ken

Weqtê ku bê şêrîn lebê destê bibim ber ġebġebê
Saqî li wê meş kewkebê mutrib dibî nûrîn beden

Mutrib were ez serxweş im îro ji nû firqetkeş im
Dîsa ji wî her ez xweş im amanc e dil ber le'lê ken

Amanc li ber tîran hedef qelb û ceger îro bi xef
Hat padişahê rû sedef got remzeyek j'le'lê bi ken

Butxan e dil j'subha ezel firqetkeş im j'zulfê li mil
Meyxane bî me'wa û hil hetta me girt zerrîn beden

Carek Hilîn Bayê Yemîn

Carek hilîn bayê yemîn perda li ber rûyê zerîn
Perda li ser zulfê perîn lew ‘enber e bû yasemîn

Bûya ji bejna yasemîn carek werîn bayê yemîn
Carek were ey nûrê ‘în saqî li min kember zerîn

Saqî bide hubb û evîn zulfa şepal bo min werîn
Yara şirîn bo min werîn saqî werîn wesla şirîn

Burca hemel textê şirîn şekker lebê ‘enber weşîn
Bûya du zulfan daweşîn kakul reşa ku ba weşîn

Berde ji zulfa şehleyî bûya ‘ebîr û ezferê
Xalê ji mawerdê girê ey ba seba bo min weşîn

Helqe bi helqe çîn bi çîn bestim li ber der enzelîn
Em ‘aşiqê şehlayê dîn mestim ji wê der enzelîn

Weqtê sehergaha Elest min dî şepal fincan di dest
Jê da **Se‘îd** lew maye mest hetta ebed em meyxur în

Şoxa ji tayê yasemîn avête dil remza evîn
Bağê tu lê ey hori‘în mehrem seray bû enwerîn

Bağê şepala gul ‘izar ‘Ezra û Meryem lê buhar
Sîna û tawus lê hewar da’im ew în muhbetkeş în

Mecrûh ji wê nînin tebîb derdê li min wesla hebîb
Hubb û evîn kuştin reqîb ez perwerê şahê emîn

Şahê cuwan û şêr wekî lerzin ji ber feġfûr dikî
Qelb bûye ney j'soz û dikî em 'aşiqê zulfa şirîn

Textê emîr û begleran Asif li ser şahim 'eyan
Belqîs li cem canim li can can bî fida zulfa şirîn

Tenha ne Belqîs da xerac hem tawusî da xerc û bac
Efrasiyab anî rewac xercê me bî rûhê şirîn

Te‘alellah Çi Şahîn im

Te‘alellah çi şahîn im qedeh l’deste li meyxanan
Li meyxanê me girt yarek di meyxana şirîn şahan

Bi ilhamê dikim bûsan ji rû û ebruwê canan
Werîn meyxaneê yaran vexwin bade ji leb ġunçan

Ji meczûban **Se‘îd** mest e ji ‘işqê yar dilim xeste
Wekû saqî dibit meste me dî canan di her weqtan

Ji goşê ebruwê saqî me got remzek çu Mensûrî
Ne tenha dil wekû tûrê belê can jî li meyxanan

Bi vî rengî dixwim bade bi bangê ney **Se‘îd** saġ e
Qedeh saf e ji weqtê şeh wezîrê ‘ezrew û Selman

Ji ‘işqa duxtera ‘ezrû dinoşim mey bi noşa noş
Ji zulfa esmera Hewrem dilim Tûr e ji ber noşan

Bi ilhama şirîn ġunçan diçim îro li meyxanan
Ji pîrê xod ‘Elî bîme ġezelxwanî li bo yaran

Ji sirrê ebruwê duxter dikim mexfî sirr û remzan
Rumûzê mest û serxoşî me go îro ji dildaran

Rumûzê ‘ilmê ilhamî tejî camê ji Hewramî
Niqab û poş vekir saqî li ser dêmê şirîn ġunçan

Te‘alellah tu subhan î bi ilhamê ġezelxwan î
Eger sojim ji ‘işqê wî nekim efġan ji hicranan

Dilo Her Seyrê Dildaran

Dilo her seyrê dildaran li butxanan û meyxanan
Bibe secde ji bo şêrîn ji gulzara semensayan

Me bir secde be meyxane du yar dîtî me kir şehde
Di babê ‘işq û mestane me kir seyran di gulzaran

Hecer ew bê te dî **Se‘dî** di nav beġça buta baqî
Me pur dîte şirîna şeng di bezma Şahê Hewraman

‘Elî Leyla digot îro heya bînahiya rindan
Bibûs ‘ariz ji Leyla xwe ji sermestan tu yî canan

Qemer borî ji burca xwe me dî canan di bezma xwe
Subihgahan ew e pur xew wiha dîn im li meyxanan

Ji lêdana şirîn ġunçan dikim bazî li eywanan
Bi bangê hû direqsînim Mesîh û hem sureyyanan

Felek borî di camê ma cihan sûze ji ‘işqê ma
Ji mihra wê mehê ger ma qedeh dagrim li ser destan

Wekû bêtin buta şîrîn hebit saqî Husameddîn
Tecellayek hebî ey ‘eyn dibî mutrib li bo rindan

Were saqî tu tiryaq î di gulzara meya baqî
Ji ehlê Necdê mehbûb î li baġê wî ez im heyran

Te‘alellah ji vî saqî qedeh pur kin ji bo rindî
Mizacê dil ruxê saqî were şêrîn ji butxanan

Fezû ‘işqem wezû wecdem ez im îro qewî rind im
Fesillim saqiya necdem ez im serxoş li mehbûban

Mizacî dil meyê tîz e siracê dil ruxê şahim
‘Ilacê dil meyê nabe çi sultan im li meyxanan

Di qelbê ma çi mehbûb e di camê ma çi xweş nûr e
Huwe’l-mehbûb[77] di ‘işqê ma bixwin badê ji van yaran

Feya hebezza necdun ehaliha biha wecdun
Fenehnu biha wecdun ez im medhûş li wan zulfan

Di qelbê ma şemal pur bî di ‘işqê da dilim Tûr bî
Huwe’l-me‘bûdu we’l-meqsûd[78] di ‘işqê **Se‘dî** Hewraman

Îro Ji ‘Işqa Lûliyan

Îro ji ‘işqa lûliyan xûn hate dil ey saqiyan
Lûlî weşan hatin xeram der baġê şahê saqiyan

Ger bê şepal weqtê seher şahid hebî gerden qemer
Ey ba seba weqtê seher bo min werîn van saqiyan

Zulfê herîr êsîr kirim bûya du zulfa dîn kirim
Hicra ġedar ġemgîr kirim badê werîn ey saqiyan

Ger mutrib û b[ê]te surûr saqî bi qet çengê di cûr
Ey yar bide sewta rebab xemrê bidin ey saqiyan

Saqî hebî mehweş perî gerden biye meh-peykerî
Çenber belav kir ber serî pîrê muġan çûn saqiyan

Pîrê muġan j’vê şîşe û dabî **Se‘îd** cama meyê
Şukrê Xudê em xur meyê cama zerîn da saqiyan

Tu j’nû werîn cama sedef da dil bibî nûra sedef
Saqî were ebrû sedef mihnetkeş în em saqiyan

Ela Ey Yara Dêrînî

Ela ey yara dêrînî werîn bade ji leb noşan
Mizacê dil mey û bade bide bade ji leb noşan

Du zulfê ʻenberî lê ke gulab û ʻenberê lê ke
Turabê esmerê weş ke qedeh pur ke ji leb noşan

... hate ji pur xûnê çu cobaran ji hicranê
Ceger kev da ji hicranê werîn ʻenber ji leb noşan

Şepala ʻezruwê bada du zulfê ʻenber û şehle
Mudam şerbet dixwim îro ji goşê ebruwê şahan

Mudam lew bê qerar im ez li bada rû dixûnim ez
Şebîhê zulfê Leylayê di hev wer têm sehergahan

Ji rengê saqiyan bînim perî-rûyan di camê da
Ji ʻeksa rûyê Leylayê ez im medhûş ji leb noşan

Di deh mahan esîr bûme di benda Hewrem û ʻezrû
Cihanê da kirim riswa evê şengê ji leb surxan

Xizir hate ji meyxanê heyata dil li min anî
Ji xod çûme wekû anî biye saqî ji leb noşan

Xizir hate seher îro ji ba yarê qedeh anî
Biye rencûr reqîb û dêw ji vî Xizrî di meyxanan

Ji goşê ebruwê saqî direqsînim sureyyanan
Şehê bazan li min winda ketim hicra şirîn ġunçan

Ketim hicra meyê baqî sebahu'l-xeyri ya saqî
Ji mabeyna du ebrûyan me dî canan li eywanan

Nebî Şîrîn bi vî rengî çu Leylayê dida bengî
Ji benga duxtera şengî me dî saqî hezar rengan

Ji leb noşan me xwar bade evî saqî rijand bade
Heyata dil ji **Se'dî** ra mey û efyûn ji şîrînan

Weqtê Buhar Gul Hat Xeram

Weqtê buhar gul hat xeram tûtî dixûnit ey cuwan
Ney ba me bî selwa rewan dê ez bidim rûhê cuwan

Weqtê rebî‘ ez bûm ġerîb bilbil dixûnit ey hebîb
Ney ba me bî Luqman tebîb ‘aşiq li firqê cane dan

Can ber leb e ey nûcuwan weqtê me dî firqet ji can
Vê firqetê ateş rijan dil ateş e ebrû keman

Er can bigir ber hezretê firqetkeşîn der ġayetê
Hazir bibe der sekretê çeşmê siyah bîne eman

Zulfa ji ‘enber daweşîn wek duxtera ku baweşîn
Werke li min ey şehnişîn zulfa du ta rûh û rewan

Çeşmê ġerîb bûne ġerîb j'wê esmera nûra hebîb
Ez bûm ġerîb j’wesla hebîb wer duxterê dîsa ‘eyan

Ya rebb cuwan qelb û dilim Dundul siwar şahê dilim
Kirye du ker qelb û dilim em kuştiyê zulf û xedan

Çeşmê bedan dûr bit ji te rûhim fida bo çeşmê te
Ya rûh bibe ba weslê te her bî fida rûh û rewan

Muhbet hebî mihnet nebî şubhê gulê her şu‘le bî
Baġê tu lê gul lê hebî derdê **Se‘îd** yara cuwan

Ne Tenha Ez Qedeh L'dest e

Ne tenha ez qedeh l'dest e dikim bûsan li ber gerden
Ji 'ariz sosinan çînim şeraba surx û bûs gerden

Ne tenha min qurab kêşin ji emrê *kun* xeberdar in
Ji rojê Lest şerab noşin dikim bazî bi leb xenden

Ji meyxana şirîn şahan me kir bala li ser baman
Çi bilbil bûm li vî baġî dikim medhê ji leb xenden

Bibûs zulfa ji Leylayê binoş bade ji Şirînê
Ne tenha ez li meyxanê belê derdim buta xenden

Hewayê şeng û şengolê di canî da çi xweş rik da
Te'alellah ji yarê ma didit bûsan bi leb xenden

Bi rûz û şeb bi efġan im bi tûlê kûyê şîrînê
Ji meczûban çi meczûb im sekar û meş'el û xenden

Biya saqî bi nîmî şeb me hişyar ke ji xwab ġeflet
Bide zulfê ji rûyê hebb bibûsim ez lebit xenden

Ku cuznê 'işqê lami' didit li Tûrê ma hebîb lê didit
Bi rûz û şeb tecella didit dikim hawar ji leb xenden

Wekû cazib bibit Leyla dibûsim ez li wî 'ariz
Didit mutrib def û nayê ez im serxweş ji leb xenden

Ne tenha şeng û şengol e semen bû ye ‘izar sor e
Du çeşmê nergisî nûr e revand canim ji leb xenden

... ...
... ...

Ġeramî dil te hişyar bit wekû dilber bi sehra bit
Du zulfê enwerê yar bit me dil tûr e ji leb xendan

Me ‘aşiq dîne pur kalî ji ceger û dil dibin nalî
Se‘îd îro eger kalî me dil rewşen ji leb xendan

Kengî Bibarî Ey Nesîm

Kengî bibarî ey nesîm zulfa girah bo min weşîn
Weş ke ji le'lên xwe 'Elî remz û sirra ey mehweşîn

Mehpare bû yara **Se'îd** hem sahibê bextê we'îd
Firqetkeş im zor û be'îd xûn bû rewan ber nergisîn

Nêrgiz li min bûne çu ab em 'aşiqê zulfa gulab
Her bû ji şahê pur şebab lale 'izar bo min weşîn

Weş ke şehim der camê ma bûya'ebîr j'zulfa şuma
Da dil hebit wek ayîna mihnetxur im ey şehnişîn

Mihnetkeş im j'hicra gulê muhbetxur im j'tac û gulê
Ez bûm ġerîb j'wê xawerê hicra tu kî pir pê xweş în

Ey tûtiyê mehpare rû ba în ġerîb xweş xwanî tu
Hetta ebed mexmûr ji to *min 'indikum men wasilîn*

Bade dida vî Hewremî saqî li wî 'enber weşî
Munkir bicû xar û xesî[79] *fî 'işqiha*[80] em meyxur în

Badexur im j'rûyê şehî vî zahidê xwar û xesî[81]
Vî zalimî kuştim mehê hem jî reqîb mihnetkeş în

Ey şehnişîn rabe were çeşmê siyah bîne j'me re
Her bo **Se'îd** çêke were kakul reşa ey hori'în

Billah Ji Nû Pur Ateş în

Billah ji nû pur ateş în lewma ji nû mihnetkeş în
Muhbetxur în rûz û şeban der firqeta şekker-ger în

Şekker-şiken ew tûti ye hudhud li baġan hori ye
Şirîn kelam dil gori ye rûh bî fida zulfa reşîn

Sed bar selam îro Husam ber esmera şêrîn kelam
Ey hudhudê hubb û ġeram ey tûtiyê şekker-gerîn

Rûhu'l-qudus ev tu binê şêrîn lebê guft û kenê
Meş kewkebê wê ġebġebê gorî bibim dêmê zerîn

Sîne û kebed vê hicretê ker kir şehî der ġurbetê
J'vê hicretê dil pur ji tê xûn û elem hem ateşîn

Îro ewê da min surah xumma Felatûn bû milah
Saqî bide bada mubah miska di reş dîsa weşîn

Mawer ke zulf û gîsuwan j[ê] rîz bike aba gulan
Zulf û perran her bûn 'eyan ez perwerê [wî] şehnişîn

Weş ke ji ruxsarê di xwe miske reşê ba zulfê go
Derkev ji burcê rû meh û guftar hebin şekker bixwîn

Meşha şehî wek neyşeker îro seher rû bî qemer
Dîsa seba zulfa di ker ey can were em serxweş în

Serxweş em în le'la meyê jê 'enberê weş ke durrê
Qendê şepalê esmerê zulfa siyah ku baweşîn

Badê werîn saqî ji xwe meqtûl em în j'hicra di rû
Kuştim şepal b'zulfa di go şubhet **Se'îd** mihnetkeş în

Mihnet li min ref ref dihat vê bilbilê şekker dixwast
Em tûtiyê serxoş û mest derdê me bî medhê şirîn

J'weqtê Elest ew yar di mest b'ilham digo ey **Se'dî** mest
Em bo te ne mexmûr û mest hetta ebed wê serxweş în

Billah Ji Nal û Zariyan

Billah ji nal û zariyan xew nakirîn şev tariyan
Her bo ji ‘işqa lûliyan lew da’ima dil bû miyan

Keyber li min hê bihtir in çendî ji ‘işqa dilber in
Dil mewc didin j‘işq û mey in lew da’ima dil bû keyan

Dil bû birîn j’hicra evîn nîne qerar şeb tariyîn
Şeb ta seher em naliyîn her bo ji ‘işqa darûyan

Her sîne dil mecrûh e bed tîr û teber her min kebed
Re‘na û çeşmê serwi qed qetlê dikin her b’gîsuwan

Şîr û teber min bihtir in çendî ji ‘işqa sorgul in
Bilbilkuj in mihnet birin şahid li min her bû ‘eyan

Çeşmê di reş b'remz û sirr in tîr dane min b'sihr û sirr in
Badê didin j’cama sirr in zulfê ji ser dêmê ‘eyan

Hostayê ‘işqa dilberan dil daye min ber kaşuwan
Vî sîne tê da agiran remza huwiyyat her ‘eyan

Remza *Enelheqq* her me got em ‘aşiqê husna wedûd
Hebba eqûl[82] ey wedûd dîsa were bo min ‘eyan

Lahût û nasût her digot bavêj niqab ey ba hewes
Bay û hubûba dilbera îro seba anî ‘eyan

Îro seba anî hubûb teşbîhê berqa pur hubûb
Fî hubbiha hubbu’l-wedûd teşbîhê lami‘ her ‘eyan

Innî cerîhun ʻaşiqun mecrûhê ʻişqa dilbera
Fî hubbiha ʻumrî telef saqî werîn zulfê ʻeyan

Ber leb binih şeb ta seher sef sef werin weqtê seher
Ref ref belav bin ew çeper tîr û teber da min ʻeyan

Remza heqîqet bû mecaz kes dî heqîqet *la-mecaz*
Ellah di ber qala Elest da min meya gulgûn ʻeyan

Min dî subihgaha Elest der destê yar bade w dimest
Jê da **Seʻîd** rinda di mest ma ez vexwim îro ʻeyan

Dîsa li min batin evîn hubba emîn a pur şirîn
Sohtî dil în em horiʻîn teşbîhê berqê pur ʻeyan

Tîr dane min j'qewsê hilal bikşîn tu xûnê her vemal
Da'im dinoşî vê meyê bê to bi ilham yan ʻeyan

Îro Ji Nû Mexmûr e Dil

Îro ji nû mexmûr e dil mexmûrê xemra bêġeşîn
Rakir ji dil nar û enîn şehzadeya ġem jê revîn

Şehzadeya şîrîn leb e tîr dane min b'remz û sirr e
Hûr hûr didî narê dile mecrûhê zulfa eswed în

Hey hey dinoşî vê meyê her min nesîb cama meyê
Şeyda li nûra badeyê biskê hilîn bayê yemîn

Dîsa seba bo min hilîn perda li ser dêmê zerîn
Yekdem sukar û dîn bibîn bavêj niqab perda zerîn

Tayê ‘isaba zer hilîn biskê ji miskê reş weşîn
Ser ta qedem em ateş în dîsa em în mihnetkeşîn

Ya rebb ji husna dilberê zulfê di wê b’remz û sirrê
Da destê min kasa meyê ev nûriya lahût şirîn

Lahût bi perwaz hat digot remza huwiyyat her digot
Ma-dame[83] husna ey emîn xalî nebî j’bada şirîn

Şubhê Cemî pur bade bî şubhê Felatûn sirr hebî
Serwet ji xemra mêwe bî ya rebb çi wê mihnetkeşîn

Ev mêweya xemra helal destûr dide l’xemra helal
Şi‘rên **Se‘îd** j’xemra Celal her bo ji ‘işqa pur em în

Ev beġçeya gulzar û raz em bilbil în b’naz û niyaz
Da’im li wî her bû bihar hawar ji hicra ġemrevîn

Rabû ji xew por kir belav biska rûya sîr-ab û av
Leb leb ji xalan bû xunav em kuştiyê cewra evîn

Derket ji burcê surperî teşbîhê findê bû gurrî
Em jî ji ‘işqê bû[n] gorî biska ji xalan her derîn

Biska ji miskê reş weşîn ‘eqreb li burcê bû zerîn
Selwa di perdê pur xefîn perwaneê rûyê geş în

Îro were meyxane’ê şewqê ji rindan her bigîr
Pîrê muġan j’weqtê Elest ev **Se‘di**yê qurba keşîn

Biya Saqî Ji Gulzaran

Biya saqî ji gulzaran qedeh pur ke ji wan xemran
Ji bada zulfê dildaran bide rindê li der bezman

Werîn saqî ji dildarim ‘ebîr û ezferî û bûy
Li min hate buhar saqî cuwan serxoş ez im l’yaran

Bide saqî mey û nûrê ji kasa xwe li bezma yar
Ku mutrib bête awazan li bezma şah û dildaran

Biyar saqî ji le‘lê xwe meya nûrîn bi rûz û şeb
Wekû goyan biçerxim ez li gulzarê semensayan

... ...
... ...

Ji ‘işqa saqî û yarê seher hoşim nema ser da
Evê muşkil li min hel ke esîrê ‘işqê dildaran

Were saqî di baġê Mîr bireqsim ez li cem Zînê
Meya baqî eya saqî bike kasa çehê yaran

Eya saqî were banî di ‘işqê da ġezelxwanî
Mecaz ateş dilim sohte ez im serxoş li meyxanan

Bide saqî yekî fincan tu xod zulfê bide badê
Hebî yek ta li ser rûyim binoşim mey ji ferfûran

Weşîn saqî ji mujganan rumûzê *Hikmetu’l-‘eyn*ê
Ku hel kim me‘neyên asê j’rumûzê zulfê dildaran

Were saqî ji rû zanî du zulfê reş bide alî
Bibit rewşen dil û sîne reqîb îro bi xûnxwaran

Were saqî li min sa'et biye nêzîk û erzanî
Cihandarî nebî pêş im ke meġrûrê cihandaran

Ela ya eyyuhe's-saqî edir ke'sen we nawilha
Tebîbê min du zulfê to ez im serxweş li dildaran

Heya saqî li min ava heyîv û bedr û suhbet yar
Merîx borî ji cayê xwe me tali' bû ji dildaran

Bide saqî du tellê mey ke dildarî biye yar im
Şehê Hewrem ew e meyxur didit bade ji pur xûban

Were saqî ji eywanê serî îro li wî mutrib
Tiraz û neqş û alatan hemî gotin li eywanan

Qesem Barî eya saqî ez im medhûş ji 'işqê to
Li tûlê xwe bipirs îro me 'unsûr bû li meyxanan

Qesem îro eya saqî bi tacê to we rûyê to
Me 'unsûr bî we ava bû çi kû îro tu [yî] canan

... ... but û latan ji rengê saqiyim îro
Dema saqî bi lez xoş bî me mîranî nevê yaran

Were saqî ... ...
Bi tacê jî kirim mexmûr ji bada zulfê dildaran

Hemî çehrê gulî soran li der tehqîq hemî yar in
Wekû zahid digot le'b in belê tali' ji dildaran

Ji wê rojê me girt tasek ji destê saqiyê enwer
Heyata cawidan saqî te da hingî [bi dildaran]

Gelek mexmûr kirin saqî ne şubhê rindê ‘Usmanî
Hemî saqî bi min rihte meyê tasê ji wan yaran

Ela ya eyyuhe’s-saqî ġulamê to ez im heyran
Bi navê tûleyan bakî[84] ku canê min [bibit qurban]

Bixemlîne eya saqî du zulfê xwe bi gulsoran
Hemî rojan bireqsim ez im li gulzar ... ...

Tu kengî bê eya saqî li min canan biye mexfî
Le‘lê şirîna duxter bixwazî min ... ...

Eya saqî tu mehbûb î bike camê meyê baqî
Ke kilkê ma biye serxoş ji ‘işqê şahê [dildaran]

Eya saqî biya wer mey merîx îro qewî dûn e
Meger bade bibit îro xemê gerdûn [ji eġyaran]

Nezer pur ke eya saqî bi Suleymanî binêr morî
Nezer kerden bi an morî ne nuqsanî [buwed yaran]

Bi rûz û şeb eya saqî me dane rê çem û azan
Belê canan bikî rehmê gula canim ji [dildaran]

Ela ya eyyuhe’s-saqî ji mehbûban tu sultan î
Ku nûrê tu kire rewşen dilê rindan [ji enwaran]

Biya wer cam ela saqî ji nû bîne ‘izara xu
Bibûsim ez bi erzanî wekî canan [digel yaran]

Ela ya eyyuhe’s-saqî di ‘işqê da tu tiryaq î
Fehewwil haletî saqî ile’l-meyxan we ...

Fehewwil saqiya camen li bezma Şahê Hewramî
Belê tali‘ bibî meymûn me dî canan [di meyxanan]

Ela ya eyyuhe’s-saqî edir ke’sen we nawilha
Ku şirîn bû li eywanê direqsim ez [digel canan]

Bela saqî werîn zulfê binoşim ez ji wê badê
Ku şehkasa ku qerqef tê wuzû kerdem ji erwahan

Sehergaha bela saqî digo bigre wuzû **Se‘dî**
Bi bad û eşk û xûnbarî bixun bade li meyxanan

Nihan got min evî saqî were îro li bezma me
Ku şerbet telxi ye baqî bibe serxoş li meyxanan

Wekû pîrê meyê saqî bibit murşid di ‘işqê da
Di ‘işqê da ez ê pîr im niye hoşim ji ber noşan

Seher ‘arif ziyaret kir li ser çeşmê heqîqê ‘işq
Siroşê ġeybê awaz da were banî li cem yaran

Şeh û saqî nihan gotî li ser destan qedeh al bî
Tejî têde meyê baqî me dî camê du zulfê wan

Me dî ‘eksa ruwê saqî di cama zerkeş û tarî
Wekû şemsê dida meş‘el xusûf girte qemer yaran

Zeher-rû bûn mey û saqî wekû xawer çi xweş hatin
Goyînê min çi xweş qaf e çi xweş guvtin[85] li ba caman

Emînê Cibri’îl avêt niqaba saqiyê qudsî
Tebîb ku min li cem yaran bixur xûn û gelek xaran

Te‘alî Saqiya Ber Xîz Ke

Te‘alî saqiya ber xîz ke derd e ke’siye’l-meknûn
Fehemdellahi ya Se‘dî we innî ṣa‘irun Mecnûn[86]

Biya wer mey eya saqî di bezma gewhera meknûn
Tewessel bi’l-hebîb ṣa‘ir we innî sahirun Mecnûn[87]

Ya Perwerê Şahê Husam

Ya perwerê Şahê Husam ya ‘aşiqê qudsîsti în
Ya meyxurê le‘lê cuwan ya bendeê şahîsti în

Ya merkezê ‘işqîsti în ya bilbilê sehwîsti în
Ya madihê şah û qudis ya wasifê zatisti în

Ya gulşenê ridwanê ġeyb ya la‘lê şekker-bari în
Ya şahidê ebrû-keman ya *Cennetu’l-me’wa*sti în

Ya bilbilê beydayê ġeyb ya Ke‘beya Beytu’l-herem
Ya sûreta xal û xeta ya hatifê ġeybesti în

Qul lî hebîen[88] ey şirîn ya tûtiyê şekker gerîn
Ya baġçeya sidq û sefa ya ‘er‘era balasti în

Ya cameya p[î]rê muġan ya saqiyê *heqqe’l-yeqîn*
Ya esmera gîso-belav ya mehweşa nûresti în

Ya mîm û ya tuġra sedef ya le‘lê şekker xwari în
Ya cebheta guft û kenî ya nêrgiza bû hestit în

Ya ‘enbera meş‘el çeraġ ya Tirkiya ahû şebîh
Ya şîweya xal û pera ya dilbera Necdîsti în

Ya perwerê baġê evîn ya kaseyê lewhê muhît
Ya sûreta ebrû senem ya me‘denê badîsti în

Ya xetti ya Şîrazi în ya bade ya hemresti în
Ya silsila nûra il[a]h ya nergisê ahûsti în

Ya meş‘ela rencûri în ya nêrgiza fexru’l-beser
Ya mektebê eşkistî în ya tehne’ê asrîsti în

Sed merheba ya Mustefa ya meyweya bara Celal
Ya melhemê ġeybesti în ya **Se‘di**yê neqşîsti în

Dîsa Ji Husna Şahidan

Dîsa ji husna şahidan îro ez im nûra cihan
Dil Tûri Sîn ey ‘aşiqan em serxweşê zulfa butan

Butxan e dil îro **Se‘îd** qelb û ceger misli’l-hedîd
Narê mecaz şîşî hedîd nûra semed l’zulfê butan

Nûra cemala şahidî der xal û zulfê enwerî
Rûyê butan nûra semed em serxweşê rûyê butan

Nûra cemala şahidî kes dê vexû îro xefî
Meyxware’ê j’xumxaneya şeyxê şuyûxê serxweşan

Sen‘a li wê şeyxek hebû ew ‘aşiqê yarê hebû
Remza evîn lew şu‘le bû dêr û kenişt rûyê butan

Ew butkeda ew tê hebû ew Ke‘be û firdews dibû
Nûra meyê peyda hebû çerx û felek asas nedan

Hê hê nebû ‘erş û sema em serxweşê zulfê mila
Ev asiman gunbed nebû em ‘aşiqê şahê butan

Lewmê nekin ey bezmê yar Heqq ‘aşiqê zatê xwe bû
Zatê qedîm ew şu‘le bû lew meş‘el e rûyê butan

Zatê qedîm der-ane bû ew ‘aşiqê husna xwe bû
Çêkir hebîb der-ane bû lew sirr kete rûyê butan

Husn û cemal zatek hebûn lê hikmet e lew fesle bûn
Lê bû nihan pur nale bûn husna qedîm rûyê butan

Avêt li qelbê bê dilan cezbê cemal l'nîva dilan
Şehzade kir qibla dilan 'aşiq li xalan bûn belan

Da 'aşiqan cezbe w surûr lew sirr ew in b'ğemz û sihûr
Lew ew hebîb b'werdê di cûr nûra ezel rûyê butan

Zatê cemala *lemyezel* jê kir ji xwe şahek ecel
Hey hey dixwin nûra ezel em sohtiyê zulfa butan

Zatê ji husna *layezal* yek mûm ji 'işqê da dila
Find û şemala şahida avêt dilê ehlê dilan

Eflak û burcê neh felek hatin ketin qelb û dilan
Îro **Se'îd** meyxwar ji wan j'roja ezel em meyxweran

Biya Mutrib Ji Wan Baġan

Biya mutrib ji wan baġan bide bûyê ji wan şaxan
Bide çengê ji alatan em în serxoş li gulzaran

Eya mutrib ji wî baġî li ber rindan tu yî raʻî
Riʻayet bû ji dildaran bide terbê li eywanan

... roj hat bi te meşġûl ez û rindan
Heme xûbî bi te meşġûl çi kim îro ji van baġan

Newayê mutribê yarê kirim medhûş di şewqê da
Ji husna mutribî mest im ez im ʻaşiq li van zulfan

Dikim gorî eya mutrib ji bo zulfê te badayî
Rih û canim bi erzanî bide dîsa tu wan sazan

Sewaş û fitne û cengê te bir îro ji vî canî
Te şahid da ji vî baġî bibî sazî li wan baġan

Ji awaz û ney û sazê revand hoşim eya mutrib
Ji sewta dengê tenbûran te kir medhûş dil û canan

Dikim qurban dil û can jî ji bo husna te de gêra
Mizacê renc û meġmûmî nema îro li cem rindan

Fehebbîb mutriba îro bibe rindî li baġê xwe
Ji qebza Lestê erwahan te da rahet ji bo rindan

Bi ilham go evî mutrib tu mexmûr î bi rûhanî
Ki rûhê to mizac kû dim bi bada zulfê dildaran

Nihan gote li baġê xwe yeqîn mexmûr tu yî ʻaşiq
Tu ʻaşiq bû ji qebza Lest we hem enzel bo medhûşan

Çi mutrib bî bi pur xûbî dikî rehmê li bo rindî
Nehat mewcûd felek hey hey kirim meyxor ji van zulfan

Gelek xwande evî mutrib eya rindê xerabatê
Tu meynoş î ji ʻunwanî ji weqtê Lestê erwahan

Nihan mutrib bi ilham go te ʻunsur bû ji ʻişqê ma
Hebîb û muhbet û dildar gelek da rê ji gulzaran

Xidara mutrib û ey go we razê sîne'ê min go
Bi gufta mutribê xweş go tu mehbûs î ji erwahan

Çi xweş guft û evî mutrib tu meqtûl î ji ʻişqê ma
Ki *kullu'n-nasi meġfûl*[89] ji ġeyrî rindê wî xoşan

Digo mutrib gelek cara eya meqtûl ji ʻişqê ma
Muhedder ney kî xûnê lew dibit ez bûm li în û an

Nihan gufte kî bîʻ kerdem ji qebza raheta enzel
Bi rûhê to di xûnê to semen ez bim we hem zulfan

Me bîʻet kir bi mutrib ra didim rûhî di ʻişqê da
Belê xweş go qebûl kerdem li der ʻuqba ez im canan

Çi xweş erzan kire mutrib dimûʻê[90] ʻaşiqê yaran
Bi xûnxwarî dikim bazî ji qeblê Lestê erwahan

Çi dengê mutribî xwandim were ʻaşiq li der suhbet
Biguftem *ey neʻem*[91] mutrib tu subhan î ji nuqsanan

ʻUqûd û bîʻetê mutrib bi min kerde bi xûnê min
Ki herkes min qetîl kerdem li bo wî ez dibim canan

Fehemdê mutribî kerdem bi qelb û ayinî w erwah
Bigufta ʻaşiqa wî to ji ʻişqê ma tu meqtûlan

Şehîdê husnê mehbûban dibit *xwahen*[92] ji vî mutrib
Kefalet da evî mutrib kefîl im ez ji bo rindan

Bigufta mutribê çengê şehîdê Kerbelayê ‘işq
Ġefûr û hem qetîl kerdem ki ‘aşiq talibê yaran

Besî xwande li min mutrib şehîdê zulfê dildaran
Ki ġemxwarî li der baġan penah û pişt li tu canan

Ġema ‘işqê dilim soje meger mutrib bidit saze
Bi awazê ney û saze nihan gufte eya mestan

Bixûnî xweş eya rindî wekî bazî li van baġan
Bi heqqê Ehmed û Mehmûd qetîl î tu ji mehbûban

Bi heqqê an hebîb zanî ki *lewlahu lema* peyda
Sema û ‘erş û an kursî tu mehbûb î li cem yaran

Tu mehbûb î ji qebzê ma tu meqbûl î di ‘işqê ma
Gelo mutrib gelek dare ‘uhûd û emnê meyxwaran

‘Uhûdê mutribî dîtim gelek mesrûr dil û canim
Xilaf nabî li cem mutrib hebîbê rind we serxoşan

Ji dengê sazê elmasan me heyret girt li gulzaran
Di babê sirrê rûhanî dikim medhê bi erwahan

Di seyra husnê dildaran me dîwan kir bi erwahan
Bi ilham go evî mutrib **Se‘îd**ê ma were baġan

Bi ilham go evî mutrib were suhbet li eywanan
Tu mexmûr î tu çalak î ez im şahê we meyxwaran

Şewqê mutrib bûm şehîdê ‘işqê saqî bûm
Kelamê mutribî nîne xilaf û batil û erzan

Huwiyyat da evî mutrib ji baġê nûr û alatan
Xemûş û heyret ez bûm ji dengê saz û alatan

Li baġê heyret û ilham çi xweş bazî kirim îro
Çu zerre *ke'ena*[93] mewcûd geram îro ji erwahan

Bi seyra rûh û Hewramî ketim îro li nav beġçan
Ku mutrib hate awazan ji 'işqê Ehmedê canan

Hebîb û mutribî guften tu medhûş î ji van yaran
Çi xemrek tîz û qerqef bû sehergahan geram nalan

Bide mutrib tu lahûtan bikim seyrê li ser 'erşan
Helal e qerqef û tenbûr li der bezma şehê şahan

Çu dengê sazê mesmû' im bi bangê rindê meyxanan
Bi medhê kin eya 'aşiq bi lisanê ġeybê dildaran

Fesahet bû di şi'rê da *ki 'işq asan* dihat ewwel
Ki pes efyûn gerî saqî disûzit qelb di ca[na]nan

Rehîm û mutrib û xweşgo ji dengê terbê alatan
Bi min bexşîd heme awaz ji rehm û lutf û awazan

Te'alellah ji vê suhbet bi bangê ho bi erwahan
Dilê rindan ji van sirran biye hatif ji meyxanan

Dihê bi ilham çi xweş hate bixor bade ji van yaran
Rumûz û mest û serxoşî nihan mutrib bi min bexşan

Ki ger kes *xwahî*[94] firdewsan were îro li meyxanê
Tu *bişnew* dengê alatan ji mutrib serxweşê yaran

Bi mey seccade ra'ic kin kî mutrib go ji 'unwanî
Ki mutrib şah û dildar e ji meydana şirîn ġunçan

Ji ‘ariz sosinan bîme xumar û rind û meynoşî
Meta ma telqe ya salik tu guh de sazê mutrib can

Fela edrî[95] çi mehbûb e me heyret girt ji meczûban
Kî ma qumtu we la numta belê seyrê dikim l’ber canan

Se‘îden la tukellimu feenneh fi’l-fena da’im[96]
Kî kullî fi’l-hewa fanîn we qelbî fi’l-fena canan

Ġeyûr in *fi’l-fena* în est bi şubhê şerê rencûrî
Fexuztu fi’l-hewa mutrib kî *qed zaġe’l-beser* yaran

Li baġê wehdeta mutleq çi mesrûr im ji ilhamê
Te‘eccub heyretê girtim ji nûr û heyreta yaran

Kî b’semtê an gewahir hew temîz û ‘eql û hem hoş çû
Iza zeqtu fema qumtu ji ‘işq û mutrib û canan

Ki sermest im ji ‘işqê ew buta sekretiyê saqî
Femekûlun lena el-‘eqlu fekullî fi’l-fena şahan

Ji ser mestan e’ bûm riswa evî mutrib kirim şeyda
Newayê bilbilî dîtim *fehemden fi’l-hewa* canan

Bi ilham mutribî gufta temedduh kin ji esraran
Ez im ‘ebdê dilaram û were saqî ji meyxanan

Bi heqqê Mustefa saqî qedeh pur kî ji mey baqî
Ji ‘işqê tu birîndar î ‘elîlê sûz û alaman

Ki meczûb î li vî mutrib tu mehbûb î li van baġan
Di hebsa şewqê dildaran dikim nalan ji hicranan

Ketim benda şirîn ġunçan ki *ma zaġe’l-beser* dîtim
Du zulfê şehleyî bînim li baġê şahê şahanan

Qafiya H - ھ

Ji Camê Mey Xeberdar îm

Ji camê mey xeberdar îm kî ma xwahîm ke lutfullah
Fehemdellahi ya ‘aşiq kî bûdî to kî Ke‘bullah

Ji razê mey çi agah îm ji emrê *kun* xeberdar îm
We razê di her kem xwahîm bigo îro tu şey lillah

Ji zikriş fi’l-fena da’im dikalê min dil û sîne
Ji çenga erġenûn goyîm kî zikrima kî hubbullah

Bered îro li meyxane bigîr yarê ji butxanê
Ji Îzid ra bike medhê *we entum min ricalullah*

Ji Şîrînê mego raza kî kes negoşded în esrar
Teqetteb Seyfê rebbanî be zikri fi’l-fenafillah

Se‘îd*en la tukellimu feenneh fi’l-fena da’im*
Te‘eşşuq kin eya cana bigo dîsa tu hemdullah

Îro Li Min Ateş Rija

Îro li min ateş rija der firqeta lewlî û şah
Cerg û kebed têk bûne xûn der hicreta lewlî û şah

Ev lewliyên şengol û şeng biskê siyah lew bûn xelek
Dil bendê wan bûbû helek xûzya dilê lewlî û şah

Gerden dirêja dêm perî biskê ji ʻenber ker kirî
Lew sîne min bû sed kerî ahê me çûn sema lewlî û şah

Ah û fiġan min têne der bûme ġulamê derbider
Wê bêne dil tîr û teber sohtî dilê lewlî û şah

Îro seba benda hilîn da bête der ev horiʻîn
Biskê muʻenber da weşîn dam dane dil lewlî û şah

Wer bête der ew sorgulê bavê niqaba kakulê
Der dil hebit ji bûya gulê pur meşʻel û lewlî û şah

Tirka şirîn û pur nigar davê here rû neqş nigar
Pur da **Seʻîd** ʻişqa ġedar dil mecmer û lewlî û şah

Îro **Ġeramî** serxweş e der bezmê yar destan weş e
Çeng û rubab neġme xweş e der wesleta lewlî û şah

Feleka Etles û Sergeşte

Ġezelî Muhemmed Se'îd ber ġezelî Melayê Cizîrî

Feleka etles û sergeşte di cama me hubab e
Me di dil da heye narek ku hemî 'işq û şerab e

Me ji zulfên di siyeh reştir e tali' me şepalê
Ku sehergeh tu meşî bêt û biret baġê gula be

'Eyni 'işqîn û şebê alî ku di cama me gulab e
Mewc didit qulzumê 'işqê me li ser dest ġurab e

Dil kemerbest e di 'işqê me xwe zunnarperest in
Me ji lahût pirî xefî dixorîn camê şerab e

Dil kemendarê hebîban me ji nû xar perestin
'Eynê de'wayê evînê mey û derdan û şerab e

Xef dibî 'işqê hebîban me 'eyan kûze vexwarin
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e

Ji hicabê were der nazik û mestane bimeş tu
Te ji dil hoşî revand û bi firaq û bi hicab e

Meqtûlî kirîn tîr û kulabê ji firaqan
Te bi çewganê firaqê te revand hoşî şebabe

Ji 'isabê bîne der netrik û werdane bi lez tu
Te cihan zîr û zeber kir bi Xudê ev çi hicab e

Destê Cibrîl hilavêt ji bejna te niqabê
Bi rumûzatê şerabê dibihim 'işqê te tab e

Ku heqîqet ku hilanî ji 'isaba te sebaê
Heme Cibrîlê alihî ku vekir sîne hicab e

Wekû durrdane me ra bêt û biret şubhê şemalê
Bi yeqîn qaf e tu rojê were der sîne niqab e

Me bi işraqî su'alek ji lebê ġunçeguşa kir
Mulhman ġeybe belavin di su'al û di cewab e

Me bi eb'adê sualek ji leban bûne xewariq
Himmetê rindê şerabê ji keramat şerab e

Me bi ilhamê xewariq ji gulan ġunçeguşa kir
Go bi ilhamê dizanî di su'ala me cewab e

Tu binê sazî bi awazî çi rengî me dixwazin
Were hindamê me rindan tu sema' sewtê rebab e

Em ji 'işqê dixorîn lezzet û îza gul û yara
Xalê le'lan çi xeram în bi Xuda ew çi şerab e

Tu nezer de were saqî me çi rengî te bibînin
Ellah Ellah bi Xudê qet dibihê ev çi xitab e

Gu'de na'ê ji lebê le'lî bi qanûnê hikayet[97]
Ji lebê xende şeker dûre riya hem bi sefa be

Guh nede yarê hudûsan tu bigêrr camê şerabe
Sed hezar bende kirin Keyxusrew û şahê 'ucabe

Ew bi Yûsif neke îfa hebsê zîr û zeber kir
Dê çi şehde bi defê ra bidirit şehde rebab e

Xoş perîşan sifet û mecme'ê sûretê hal în
Derd û êşan ku nehatin ji firaq û ji hicab e

Heme 'alim ġelitîn nisbetilî rindiş eban
Şêxê Sen'an bi du cama geriha şêxê celab e

Em perîşan sifet û meykede û yarê şepal [în]
Pîrê ‘işq în û cuwan-teb‘ û dilê ‘ehdê şebab e

Dûredest în ji xeyalan me divê yek ji Xudê ra
Heme xal û xetê caman ji cemalê bi nisab e

Yek xeyal bû me duhî dît ji le‘lan
Pur revand bûyî riya û hesed rihte şerab e

Dûredar în ji delalan were camê ji Xudê ra
Xef di behsa me ji dil bêt û biret ‘eynî sewab e

Me muşerref ke du çeşmên me bisata qedemî ke
Pur li min derd e ji rê bêt û bidet zulfê gulab e

Me muqeddes ke şepalê bi wisal û bi du caman
Hem birîndar û feqîr în bi xeramî were rabe

Me ‘eyan ke bi lebê xende ji bûya di ‘isaba
Pur li nik min heye mey meyze ke min sîne kebab e

Kesk û soran tu binê çerxi li dora du hilalan
Herdu ebrû bi şu‘a‘ în ji gulab û ji şerab e

Nêrgizê mestê çemen hatine dora te şepalan
Her bi mîzan diweşin şebnem û abê ji ‘isab e

Dorê zulfan tu binê helqe li dora xet û xalan
Du qiran mane beraber şefeqê perde ‘isab e

‘Er‘eran ta di şepal in wereqan cezbe vê ra
Gul û sunbul bi hevalan dibihin xoşî şerab e

Ġezelan badê hebîban qeleman serxoş e vê ra
‘Işqê dilsûzê **Se‘îdan** gerha şehr û şihab e

Melekan pa di qiyam in şefeqa dane jimara
Sunbulan girtî xunav û li gulan taze gulab e

Mest û hişyarî hemî kec-kuleh in reqs û sema tên
Sûfiyan tac-belav in ji şu'a'a di şerab e

Mest û hişyar me rindan kuleh in bûne zera min
Weh ji sûz û eleman bûne sukar û çi kebab e

Mesti lala dikevin tac û xerq her bira hatin
Ez nizanim çi neseq keyf e nizanim çi şerab e

Xakê payê te di rêza sek û dûlan xwe dinasîn
'Aşiqan muhbet sûzan ne wisal û ne çi ab e

Koz û kûya te ji îro Heceru'l-eswed zanîn
Wekû xawer were îro ji şu'a'a bide ab e

Dîn û meczûbê şepalê dikirin çol û çiyayan
Me ne sûc û gunah û ne xeta ev çi 'iqab e

Çîçek û qews û qezeh reng hezar rengê sema ye
Hem ji husna te delalê qezehan girt û çi tab e

Sed hezar rengê 'ezîz tên ku li bejna te şepalê
Nêrgiz û sunbul û sosin ji sera payê şehab e

Hem li bejna dixûnîn ney û qanûn û çiğan e
Nêrgizan ser di giran in li binefşan xem û tab e

Ji wisala xwe zekatê bide miskîn û feqîran
Ji ku peyweste bi hevrane hebîb û ne çi tab e

Ji cemala te ye îro ku bûyîn mehk û hekîmek
Hem feqîr în li zekatê ku şu'a'a te nisab e

Ji gulaba serê zulfa te zekatê bide îro me feqîran
Ku cemala te ye kamil di kemala xwe nisab e

'Aşiqê mes'ele xwahî were em muftiyê 'işq în
Rûzibexşan bi me da butkede û sewti rebab e

Serixoş û mestê mey tu were em murşidi rahîn
Rûzeê rûzê Elestê bi me da cam û şerab e

Ger sefa xwahî **Se'îdan** were mahîn ji sefayê
Destekî sunnet e têkda di yekê nessi kitab e

Dil bişo tu ji nifaqê ku bidit sîne beraqê
Tu 'Ezazîl î meger dil û canim çu ġurab e

Dili jengar bişo bi meykede û bi abê nicalê
Heme efsûn û derew bû ku cihan 'eynî 'ezab e

Dil bişo tu ji cihanê ku bibî sidq û sefa'ê
Bi sefa hemrehê erbabi dil û ehli sefa be

Nezera 'eynê 'inayet bi me da şahê wilayet
Ji ku her ġunçe dilim bi sefa û bi şerab e

Nezera pîrê muġanê sebebê rûh û heyat e
Weku pey şahid û mehbûbê dilim ew bi cila be

Nezera şahê se'adet bi me kit ji tûrê fiyazet
Ji 'inayet nezerê dil me tejî 'ilmi 'ubab e

Lebi le'lên te di bê her bi yekî nuqteê 'ilm in
Xet û xalê bi me ku nûr û mey û sewbê turab e

Tu ji le'lên şekerî em dibihin remzê 'ulûman
'Ellandîn di firaqê ku biye sîne kebab e

Xet û xalê lebi le'lê bi me da behri fuyûzat
Bi xetê herfi elîf cezme şubê helqeê bab e

Xet û xalên te bi mû mû ji me ra mes'ele-goy în
'Elimandîn ji du le'lan şeker û qend û gulab e

Lebi noşîni te hû hû ji me ra mes'eledar în
Me ji çeşmên te şepalê belek û husni me'ab e

Melekan bestine îro ku li dora du 'izaran
Me ji wan haşiyeyan sîne tejî şerhi lubab e

Abi heywan te divê rast binoşî şebi qedrî
Bi fena be bi şepalan ji 'izaran noşe gulab e

Abi noşînî dixwazî were îro ... ...
Leyletu'l-qedr û berat in di wisalê ... ...

Talibên abi heyatê were hemrah bi me ra be
Desti ber gerdenê pur pêç û xem an zulfi du ta be

Me ji biskên te girihdar ji bextê xwe girê ne
Me ji le'lên te gulabî ku ji eslê xwe gulab e

Me ji xalên te yê çîn çîn ku ji husna xwe çinine
Me ji taca te delîla ku heme rîş û bi 'isab e

Me ji çeşmên te yê nûrîn ku hemî nûr û heyat e
Me ji zulfên te xem û tab di dil da xem û tab e

Te divê berq û birûskan bireşînî tu nezer de
Tu ji nû wer ke gulabê bi serê zulfê şerab e

Te divê îro se'adet li me rabit were cana
Tu di xalan bide an mah ecelê şeyxê şebab e

Sedğê elmas û 'izaran bide yaran ne xwe rabe
Te divê roji xuya bit ji şibakê tu xuya be

Te divê zîr û zeber kî me du zulfan bide ber ba
Heme an xalê siyahî bike rindeş bi sema be

Te divê rûhi derînî were xanim tu sehergeh
Şahê şîrîn dihenê ey tu şepalê çi 'iqab e

Ah ji le'lên şekerî her bi fena û bi beqa me
Te divê qenc qiyamet li me rabit bi xwe rabe

Qesdi serçeşmeê heywani heqîqet ke Nişan[î]
'Eyni e'yani wucûdê were îro bi me ra be

Xizir û murşid bi me ra be ne xef e çeşmê heyat
Me bi xef berde sebîlan ku şerab 'eynî şebab e

Xizir noşî j'heyewatê were îro tu neşa ke
Bi cihanê mebe meğrûr ku cihan 'eynî serab e

Serkeşî şîwe'ê erbabi wefa nîne rûhê min
Dilê dildarê cemalê weke noşe ji gulab e

Serkeşê şem'ê hebîban neke îro bi esîran
Nefesek bê me tura hem hecer û 'eynî sewab e

Şubhê perwanê te sohtî dilê miskîn û feqîran
Te ji dil sohtî Mela bes bi Mela ra bi cefa be

Dilo Çendî Tu Bêrehm i

Dilo çendî tu bêrehm î ceger nare ji derdê te
Bike rehmê eya Hewrem bide ‘ezrû li derdê me

Dilê ateş nekir rehmek kebed kun bî ji dîdarek
Evî cergî dixwar narek şeb û rûzê di ‘işqê de

Ji ‘işqê nazikê bîme çu Ferhadî ze‘îf bîme
Li min ateş şeb û rûz e ji ‘işqa lûleya şenge

Ji ber hicrê bi nalan im çu girdabê dibazanim
Ġezal winda li damanim ji ‘işqê wê me sergeşt e

Felek hate di burcê da zehir dabû di camê da
Ez im ‘aşiq di hebsê da ji ‘işqê wê ezî mest e

Ez im buryan ji hicranê li min xar in ġema xanê
Qewî bûme ze‘îf canê te kir amanc dil û can e

Şeb û rojan çi xûnxwar im li ber cengê çi amanc im
Wekû goyan dibazanim ji derba nazika rinde

Ji nazik şehleya dêmdurr dikim nalan şeb û rûzan
Ji narê dil pirî xweş im di kerbê da ceger nar e

Ji ġemgîrî nema xorde ji ‘işqa wê nema xwande
Ji hoşê ser nema nuqte li derbendê şirîn ġunçe

Şukurxwaz im ji ‘umrê xwe kirim ‘aşiq li zulfê xwe
Hebîba esmera pur xew ewê kuştim bi sed derbe

Ji cengê dilberan bîme çi nazik dilbirek bîme
Şebîhê tûtiyan bîme ‘umir borî di ‘işqê de

Ji pîrê xwe şukurdar im ji rehma wî xeberdar im
Ji lutfa wî çi şehbaz im ji ‘işqê wî **Se‘îd** mest e

Ji pîrê meyfiroş zanim ez im mexmûr li cananim
Ji ‘arizê sosinan çînim rumûz û bûs siyeh *çerde*[98]

Ji pîrê xod wiha zanim ji ‘işqa nazika dîn im
Nihan got min were canim bibûs zulfa siyeh çerde

Di ‘işqê de sebir nîne me ‘umrê Nûhî pur nîne
Heta kengî bikîn şîne nebî ġewsim şirîn rind e

Di cergê da hene keyber ji meyxanê qedeh pur gîr
Te‘alellah çi meyxane çi meynoş im şeb û rûz e

Ji zulfê esmeran çînim firr û perwaz di xwe nînim
Fidayê hezretê Şah im ji lutfa wî dixwim bade

Ji 'Işqa Dînê Ez Bûme

Ji ‘işqa dînê ez bûme çu Tebrîz û çi Xusro me
Heya dîn î were dîn î çi çalak bîm wiha bûme

Wekû Ferhad bi bazû bûm niho bûme çu Mecnûnî
Heya bînahiya **Se‘dî** were îro çu mah û meh

Ji rû-mahê ezê bîme zirav û surx ezê bîme
Ji pa û ser ze‘îf bîme nesîmê min biya bo me

Nesîm rake ji dildarî du zulfê ‘enber û ezfer
Ji wê bîne ‘ebîr ezfer şebîhê çiçekê bûme

Ji gulzarê semen-sa’ê weşîn bûyê subihgahê
Du zulfê esmerê bîne rumûz û cilwe û bo me

Ji bejna ‘er‘erî bîne gulab û ‘enber û bûyê
Ji goşê ebruwan berde suhûr û şîwe û bo me

Ji Tirka Hewreman bîme şebîhê sihr û sehharan
Sihir rêz kir ji bo rindan ji weqtê Qalubel bo me

Ji wî weqtî şerab-çîn im heta axir weha dîn im
Ji butxanê me girt Zîn im biya hirsê qewî bûme

Ji wê rojê ez im Ferhad çi şeyda me li Şîrînê
Şirîn û ‘ezrew û Hewrem nihan saġer kirin bo me

Ji xumma esmeran noşîn mey û bade bi awaz in
Du zulf û gîsuwan bîne were mutrib were bo me

Çudar im ez yekî şîşe ji bo yaran dikim şîne
Were Hewrem bide şîşe ji rûy-dênê besî bo me

Bixemlîne ji gulzaran binefş û çiçek û yaran
Di kasa min biderxîne şeh û saqî hemî bo me

Îro Ji Nazên Dilberan

Îro ji nazên dilberan nakîn qerar û meşrebe
Nazên di wan şêrîn suran sohtim bi pêta ‘işqehe

Leb ġunçeyê her sohtime her roj ji nû ez kuştime
Kuştim bi zulfa şehle ye hem nazik û şêrîn leb e

Şirîn lebê girtî xunav wek nêrgiza sîr-ab û av
Selwa sehî lê hat xunav wek ġunçeyê nem ber leb e

Van ġunçeyan girtin gulab derdê dilê min ew şerab
Şirîn lebê da min ‘ezab wek bilbilan xar lê heme

Wek bilbilan nalan li me derdê dilê min ew gul e
Ez bilbilê pur nale me herdem dixwim xarin gule

Wek tûtiyê va hindiyan herdem dixwazim şukriyan
Tûtî ez im kanê şekir ez bilbilê şêrîn lebe

Şukkur di nêv zulfane wî ya le‘lê şekkerbarê wî
Meş‘el di nêv xalane wî derdê dilê min ġebġeb e

Ġebġeb kire wek sorgula lew bilbilan lê lam û ha
Hemze w du lam baha **Se‘îd** her gotiye der meşreb e

Ya rebb bibînim yarê ma ta ez bixûnim la û ha
Der mey bixûnim medhê yar saqî werîn wê ġebġeb e

‘Aşiq mirin her sa‘ete lew serxoş û rindê but e
Ey yar were her sa‘ete firqetkeş im j’wê ġebġeb e

'Işqa Di Leylê Kuştime

'Işqa di Leylê kuştime carek bi zulfan girtime
Girtim bi xalê 'enber e ġemzek l'me da ez kuştime

Kuştim bi tîra goşe zer ebrû ji mawerd û kemer
Derket ji burcê ew qemer nazek ji çeşman sohtime

Sohtim bi hicra 'işqehê dozex li ber 'eyn şekkerî
Dozex ji narê 'işqehê 'işqa 'izar hem dozex e

Hubba Şirîna Farisî derket ji ġayet ey perî
Ew bejn û bala şekkerî qelb û ceger tev sohtime

Xûna qemer têtin ji dil şehzadeê mey rihte dil
Şeqqe'l-qemer teşbîhê dil lewma **Se'îd** ez sohtime

Ela [Ya] Yari Dêrînî

Ela [ya] yari dêrînî biya ba min ‘izar lale
Li der gulzar û gulbeĝçan wiha çînim ‘izar lale

Li gulzaran dixwim xemran dikim bûsê ji çalakan
Kî xemra bergê nesrînan qewî tîz e gelek al e

Dilê bêxemr û bêbade nekit bûse ji leb surxe
Biyar saqî ji meyxane xemîr û ‘enber û ale

Şerab surx e li ser dest e dilim nar e ji meyxane
Se‘îdî zar û bîmar e dixwazit cam qewî al e

Şoxa Şepala Gul-‘İzar

Şoxa şepala gul ‘izar xerram dibî ‘izar lale
Ji awazên şirîn ġunçan bi efġan in wekî lale

Fiġan têtin ji sentûrim şebîhê dengê dildarim
Ji ‘işqa nazika yarim dilim daġ e weku lale

Were saqî ji meyxanê li bîmaran tu ‘Ezra î
Dilê ‘işqî biye sade ji hicra wê Şirîn lal e

Ji ber hicra wî dildaran ceger nar e şeb û rûzan
Were saqî ji wan xemran bike saġer qewî al e

Şepal hate ji gulzaran şebîhê werd û nesrînan
Bi vî çavî hebîb bînan ‘izar surxî û gulî lale

‘Izar surx e ‘ebîr bûye du reşmaran li ser fetl e
Şebîhê min qewî reqs e li ser dêmê ‘izar lale

Li ser dêmê qemer gerdan şebîhê find û nesrînan
Ji ‘işqê wî **Se‘îd** nalan bikin rehmê ‘izar lale

Gelek dîtim li ser birhan qeseb zulfan bi zêr-abê
Ji ‘işqê yarê dêrînî dinoşim mey qewî al e

Ji meczûban çi bê hoş im li goya wî çi meynoş im
Me dil daye bi mehbûb im cerîzgaha mi’ mey al e

Dîsa Bibare Ey Nesîm

Dîsa bibare ey nesîm vê nuqreyê zîber bike
Biska ji ‘enber weş bike vê ‘ezruwê rengîn bike

Tirka ji maha yek şevî der suhbetê wî danişî
Zulfa li ber ruxsar weşî saqî biya şirîn bike

Saqî ku tê mehpare-rû taca li ser cezb û bi hû
Mehpeyker e birhê di ew zulfa siyeh esmer bike

Hewrem biye saqî li min bade didî bo derdê min
Pur kin qedeh ez yari min saqî ji perdê pur veke

Bezmek me kir ba saqiyan yar esmer in b’çeng û perr in
Sihrê didin j’zulfê mey in saqî were Hewrem veke

Cama ji rengê ayinê girte j’xwe re mujgan perê
Kakul kerî dêm ‘enberî zulfa du ta dîsa veke

Yara şebîhê sahiran hişyar û mestan cam geran
Mehbûb hebîn reş kakulan bayê nesîm wer ker bike

Sahib dilan Hewrem l’kuwe[99] da ez vexwim bada ruwe
Bazgeşte yar j’dama min e ey ‘ezrew[î] pur ker bike

Munkir ji min bazgeşt bibe qews û neslê yarim l’mil e
Nabit xilaf weqtê weşe munkir *berew*[100] ‘ezrû bike

Dujmin tu keydê her bike yar yareke bimre w here
Minnet ji me re setwet bike yarim şeh e ‘ezrû bike

Tirka j'ruwê mahê nuwe qetlê dikit b'ğemzê hewe
Pur kuştine dujmin şehî munkir *bemîr*[101] yarim bike

Wek tûtiyan bişkin şeker da yar bidit rûyê şeker
Çeşmê di reş birhin qemer der suhbetê zîber bike

Leyla li min mehze **Se'îd** îro reqîb b'keyf û nesîb
Yara werîn rencûr bikîn xara bidin dêwê seg e

Kengî bibarî ey nesîm xûnxware dil ez hicrê dîn
Dunya li min zîr û hezîn 'alem reş e derdan bike

Ateş bide her dem bi dem her bo ji dêwê seg segan
Îro li min 'alem reş e 'ezrû nehat şahim bike

Ev şahibaz teb'et ferişt ser ta qedem zulf kirne qişt
Qelb û ceger çendî buruşt şekker zeban teb'et bike

Ji Serayê Were Der

Ji serayê were der selv û qeda lale kulah
Te dilim zîru zeber di heman gah û bi gah

Reşîn bi abu gulabê tu ‘isabê bi ġurab
Em bûyin pêt û pereng ji firaqa te di şah

Em bûyin narê cehîmê ji firaqê me nema sebr û sukûn
Te cihan sohte ji hicrê digerim ah û bi gah

Şerhê halî çi bibêjim çi nebêjim me negot
Qelb û dil bûne cehîm û dikirim nal û bi ah

... xûnrîz dibêjit were camê tu şepal
Me di dil da heye ‘işqek ku kirim nal û bi ah

... ra û xan ne tenê sîne dixwazin
Cumle e‘zaê wucûdê dibihin ah û bi ah

Ah û nalan dikirim her ji firaq û ji newa
Me **Se‘îd** bûye pereng û ji firaqa te di mah

Hat û Me Dî Terha Cuwan

Hat û me dî terha cuwan xerram dibî tac û kulah
Xerram dihat gah û bi gah xaka ji qend rêz kir kulah

Weş kir ji le'lan sîm û zer guftar ji mawerd û şeker
Bejna şepal bû neyşeker rîş û perran zerkir kulah

Rîş û perran cezbe kirin îro seher min cezbe kir
Meczûb bûyin ta pa û ser lerze ji ber tac û kulah

Meczûb ez im her gah û gah lew her ez im fîġan û ah
Terha şepal b'tac û kulah *qum ya Se'îd*[102] vê subhigah

Me'mûr kirîn leb xendeyê şekker rijan j'cama meyê
Minnet em în der çay û mey meczûb û lerz j'rûyê di şah

Cezba ji husna dilberan rakir ji dil lerz û eman
Îro dilî rakir heya riswa kirîn der bezmê şah

Payê me ket 'işqa buta mey hate dil j'rûyê buta
Meyxori dêm ey can meta hicretxurîn j'rûyê di şah

Herdem bi bangê nûcuwan cenga me bî sed reng rewan
Zêde didîn sêgah û rast çengê birîn ber taci şah

Çengê dixwast dîdari mah hetta ketin dama di şah
Dama şehî bû rengê mah avête min her gah û gah

Zêde li min her mihnet e ya rebb çi yarek muhbet e
'Ezrû bi şah dan muhbet e ez kuştiyê tac û kulah

Şaha şepala ‘ezrûy têtin di camê pur zerî
Rehmek bike her bo Xudê carek bide zulfa kulah

Da pur kirîn zulf û ‘izar îro şepal bû lalezar
‘Ezra û Meryem bûn xidam meş‘el kirin tac û kulah

Meş‘el bike kasa siyah b’zulf û ruxa ey şah û mah
‘Eksa ruxa wek şems û mah pêçe li min zulfa kulah

Bîne li ser çeşmên **Se‘îd** biska belava pur mecîd
Em bihn bikîn j’nûra mecîd em ‘aşiq în j’subha belah[103]

Rih hate der her gah û gah çend yek ji hicra dilberê
Rih hate der ya ‘ezruwê mey xware min weqtê belah

‘Işqa te ye rû daye dil lew da’ima meynoş e dil
Serxoş kirîn zulfa belav kengî bidî biska girah

Îro Li Min Ker Bî Ceger

Îro li min ker bî ceger yara nekir rehmek li me
Sohtî dilîn bo rûyi we kengî hebî de'wayê me

Meqsûd ji me zulfê ewan de'wa dikîn wesla ewan
Her bû cunûn bo rûyi wan fîĝan kire vî qelbê me

Ya rebb nekî sorgul xefî ez kuştiyê selwa sehê
Rûh bî fida bo mehweşê sed ah û ah bo yari me

Tirka şebîhê nêrgizê kerkir ceger hicra xefî
Keyber gihan navê dilî xûn rêz kire vî derdê me

Tirka ji 'enber bû şepal biska diraz ji xemra helal
Berdan li ser çeşmê ġezal medhûş kirim der 'işqê me

Çeşmê şepal mujgê xemal hicra di wê dil kirye mal
Sergeşte în îro delal goya felek der cami me

Hem padişah û Xusrewan kuştin ewê b'tîrê keman
Hem dûr kirin sed merhelan ez kuştiyê şahê xwe me

Ey ba were îro seher qerqef derîn j'burca qemer
Ew Xusrewê zerrîn kemer xûn rihtiye cergê di me

Ey ba were weqt e w eman derdê li min ew nû cuwan
Rih ber leb e der hicrê an hicret biye qismet li me

Ey ba nesîm zû ke w bilez rûz û şeban cezbe w bi lerz
Ahên dilî rûyê di zer qismet j'me re ev 'işqê me

Saqî bilez xoş bû biyar cama siyah naêt bi kar
Wê qerqefê dîsa bibar da dil bibî Ke'be w li me

Rabe w bilez ya 'ezruyê hicra te jî dil kir kerî
Bavêj dilî rûyê zerî ez kuştiyê dêmê te me

Pur bade ke vê tasikê meş'el bike b'wê zulfikê
Kakul li ser dêmê bikê bazî bikîn bo derdê me

Mutrib were çengê biqut sewta rebab dîsa biqut
Îro **Se'îd** reqqas hebit b'şertî hebî selwa bi me

Dîsa Me Dî Lala Cuwan

Dîsa me dî lala cuwan çeşmê belek birhin siyah
Qewsên ‘ucab j’rengê di mah xalê li ser werda siyah

Lale ‘izar der în sebah guft û kene çendî milah
Rihtin dilî cam û surah rûh ber kevî bo yari mah

Ew lalezara Hewremî lê bûn du biskê enwerî
Îro sebah kirbûn[104] kerî tac esmer e zerrîn kulah

Teb‘ê di wê teb‘ê letîf libsê di ber libsê qedîf
Îro dihat kember şerîf mehrem sera bû burcê mah

Mehrem sera kaxa sihan gerdan li dor mar û qetan
Qumrî li ser ref ref geran rûzin şebîhê cam semah

Jê hate der lala cuwan vî Hewremî guft û kenan
Guftar rijan wek kewkeban weşhan ji le‘lan durr siyah

Le‘lê ji mercana letîf zeqna xunav lê hate rav
Xurrîn ketê j’sîr-ab û av hetta me da cezbên siyah

Cezbe me xwar fiġan û an awaz me dan wek bilbilan
‘Erş û sema awaz gehan le‘la Bedexşan ew kulah

Le‘la Bedexşan ber ruxan çiçek pur in bilbil nihan
Çîçek ji husna ebruwan cezbek me xwar j’tac û kulah

Xalê ji ‘enber bûn belav ber gerdena ser ab û av
Her bo te bî ya Hewremî textê se‘îd tac û kulah

Mislî Cemî her tu hebî pur setwet û cama zerîn
Xalî nebî tu j'muhbetê mihnet nebî ya Şahi Şah

Da'im hebin em bilbilî medhê bikîn ber sorgulê
Şa'ir hebî **Se'dê** ġerîb medhê bikit ber canê şah

Mislî 'Elî setwet hebî wek Xusrewî hikmet hebî
Şirîn tu bî Tebrîz ez im kilka me da medhê di şah

Ta key hebî ya Hewremî sergeşte bîn b'derdê dilî
Badê werîn j'husna temam em tûle yîn bo padişah

Îro nigara neyşeker awir didan wek çengê şer
Mujgên siyah b'tîr û şerer mekhûl kirin lehze di şah

Çeşmê siyah mekhûl kirî xûnê dibet j'vî 'aşiqî
Mehbûb nigara sorgulî yeksal ez im di bendê şah

Rindim ji 'işqa dilberê ev dilberên 'enber perê
Zêde li min ew 'ezruwê her bûn 'eyan wek zulfê şah

Lala 'izara 'ezruwê nayêt ji burca muşterî
Cilwek nekir bo serxoşî hem badeya çeşmê siyah

Bade biye nan û nemek zulfa girah bûbû helek
Qelb û ceger bûbû pereng saqî werîn bada siyah

Îro Ji Husna Sorgulê

Îro ji husna sorgulê dîsa me kir nalîn û ah
Burca hemel kir vîje vîj nalê ji **Se'îd** pur bi ah

Ahên me tên j'ceger di kul qelb û ceger min bûne kul
Tîrê me tên j'ceger me dil lew da'ima her nale ah

Ahên me tên j'hicra hebîb jehrê didî min her reqîb
Rû-reş bibin hicr û reqîb j'destê segî sed nal û ah

Nalê me borîn ya hebîb j'burca cedî geştin reqîb
Sohtin ji ber ahên hedîd çerxa felek her subhegah

Yarê mede hicra ġedar mecrûh e dil ey gul 'izar
Yara şerîf gerden xefîf libsê di ber pur qedr û cah

Yara şepal min dî seher meşha li baġê wek qemer
Xerram dibî şam û seher ev padişahê pur sipah

Nêrgiz qed î bû 'enber î kakul ji miska ezfer î
Bejna di wê selwa sehî xemrî hejand her weqt û gah

Ev xemriyê tayê herîr bihn kir ji wî vî rindê dîn
Çeşmê di reş serxweş û mest tîr awir e ew padişah

Îro Ji Tirka Hewremî

Îro ji Tirka Hewremî mesrûr e dil her gah û gah
Mesrûr ji ‘işqa sorgul în têtin şepal her gah û gah

Çeşmê belek bi coş û sur e birhê di reş bi ġemz û sirr e
Qewsê di wan nûbar hene tîr dane min her gah û gah

Em ‘aşiqê şox û şehan birhên di reş tîr û keman
Tîra didin j’goşê di wan teşbîhê baran gah û gah

Şoxa ‘ezîza ‘ezrewî saqî ji wî ew Hewremî
Da min meya gulgûn mehê saqî were her gah û gah

Yara nigara ‘ezrewî qamet elîf gerden letîf
Biska siyah çîn çîn şerîf şebnem li ser [her] gah û gah

Dîsa bibarî ey nesîm bînî j’me re bihna ‘ebîr
Bihna kulah û kakula lê dey[105] ji wî her gah û gah

Mexfî kire ruxsar ji min rehmê bike ey şahê min
Tac û kulaha yarê min keç ji me re ey şehnişah

Bîne ji wî kakul reşa çîn kirne wî zulfa du ta
Sirr e kire rûy û ‘izar perde zerîn billûr kulah

Lale ‘izara ‘ezrewî mexfî li min ey Hewremî
Bihnek ji wî hate cihan serxweş kirî j’weqtê belah

Mexmûrê bûya ‘enber în şeydayê rûyê enwer în
J’weqtê ezel hey hey dixwîn hetta ebed mest in ji şah

Saqî were weş ke ji *an*[106] şaxê ʻebîr û sosinan
Xumma Felatûn em nihan pîrê muġan pur bade şah

Saqî were weqt e w eman mexmûr bike rindê şehan
Rake j'me re çeng û fiġan mutrib bide sêgah û ah

Ahê dilî çûn asiman her bo ji hicra dilberan
Saqî were weqt e w fiġan goşê rikab girtî [ji ah]

Ketme di goya tey şepal da bihn bikim zulfa kemal
Neʻrezen im her subh û hal ba tûleyan her gah û gah

Di Gulzara Şehê Qudsî

Di gulzara şehê qudsî me dî şahid rijand cilwe
Meger Şirîn tu yî şêrîn di bezma şahê pur cilwe

Ji cilwa nazika ‘ezrû geran dikim li ser zulfan
Du kakul bûn li ruxsarî belê carek numand cilwe

Di benda cilwekê dil çû li goya pîrê meynoşî
Dused Ferhad li wê dîtim belê kuştim bi yek cilwe

Di bezma şahê meyxwaran dibim medhûş ji bo zulfan
Herîrê zulfika hatin kirim serxweş bi yek cilwe

Ku pur me‘na rijand cilwe dibêm îro ew e Ke‘be
Re’îsê zulfikan hatin kirim medhûş bi xweş cilwe

Nişanê gîsuwan dîtim **Se‘îd** ‘işqa biye mexmûr
Li toqa ġebġebê wer bûn şehîrê xemriyan b’cilwe

Zulfê Bestin Ji Yaran

Zulfê bestin ji yaran xemr û şerbet tê heye
Lew di baġê sebze poşan her ketim bezma weye

... nebînit Şirîna Farisî belkî bibînim zulf û xal
Da tewaf kim kûy û perdan berzex û hem dîde ye

Da tewaf kim pê û destan ez dibêm meqbûl ew e
Rişţiya derd û dilî ez çim tewafa şehleye

... dê ‘eyb pur bikin ... û **Se‘îd** tûle ye
Şerbeta le‘lan ku zehr e ez dibêm her Ke‘be ye

Gerçî mexf im ez ji nasan bê derîġ û bê derew
Bendeê pîrê muġan im butperest her pîşe ye

Îro Ji Yara Pur Cemal

Îro ji yara pur cemal kirim bilbil li rûyê xwe
Durr û mercan dirêjim j'ew kirim êsîr di 'işqê xwe

Ji rûyê ew dixwim bade hilo rabe seraperde
Kulaha 'enberî rake weşîn miskê ji rûyê xwe

Ji zulfê 'enberî bîne li me w rindê eve derd e
Biya saqî ji eywanê werîn bade ji rûyê xwe

Were mutrib bi yaran ve bide çengê ji zer tacê
Li der suhbet *befermaye*[107] ku saqî bêt ji bûyê xwe

Ji şahê Hewremî bînim qedeh bade ji şêrînî
Li min lûlî bibe saqî bide suhbet ji rûyê xwe

Ji qewsê ebruwan rîz ke durr û mercan'ebîr weş ke
Ji koşê zulfikan berde 'ebîr û ezferê pur xwe

Di 'işqê da ez im sultan **Se'îd** saf e di qewlê xwe
Ku dil îro ji şêrînê tijî bade ji teb'ê xwe

Tijî nûr e dil û cergim ji bada wê diçînim hew
Ji yari xwe me xwand îro qebiz hate li teb'ê xwe

Firaq bînim ji yari xwe ceger kun bî ji hicra w[ê]
Li min rindî biye zulmat ji hicra wê melek pur xwe

Ji remza ebruwan bîme kî qurbê *qabe qewseyna*
Ji wê rojê ez im mexmûr ez im 'aşiq li zulf û xwe

Ji leb xwandim eya 'aşiq were banî eya 'aşiq
Li ser zanû me perwaz kir me dît yarim xwe mahê xwe

Qafiya W - Û - O -و

Seherê Bade Bixor

Seherê bade bixor *celle celaluh* bigo
Bade bixor bi şi'rê min *celle celaluh* bigo

Yarî bigîr ji meykedê *celle celaluh* bigo
Xizrê muġan di meykedê *celle celaluh* bigo

Hikmetê Dawer bigoş *celle celaluh* bigo
Çengê biqut eya **Se'îd** *celle celaluh* bigo

Saqî bi remz û mu'cize *celle celaluh* bigo
Yarê bibûs bi zulfê o[108] *celle celaluh* bigo

Heyret û bê temîz diçim *celle celaluh* bigo
Ji lef weşîn ji rûyê xwe *celle celaluh* bigo

Xizrê muġan di butkedê *celle celaluh* bigo
Destê şehî bi mu'cize *celle celaluh* bigo

Hû û huwan bigo *celle celaluh* bigo
Zulfê bigîr ji rûyê o *celle celaluh* bigo

Saqî sîm û zer û saq *celle celaluh* bigo
Le'lê bibûs bi dem bi dem *celle celaluh* bigo

Wahid û enzelî ew e *celle celaluh* bigo
Ewwel û axirî ew e *celle celaluh* bigo

Bade dixwim ji ew firîn *celle celaluh* bigo
Bade binoş ji ew perî *celle celaluh* bigo

Camê meyê bixor *celle celaluh* bigo
Fetwa me girt ji ew perî *celle celaluh* bigo

B'ğeybî dixwim evê şerab *celle celaluh* bigo
Medhê bikin ji ew perî *celle celaluh* bigo

Seherê Xizir digo hû û huwan bigo
Hû û huwan me go *celle celaluh* bigo

Şeker dibar ji le'lê o *celle celaluh* bigo
Zulfê biweş tu ey perî *celle celaluh* bigo

Lûlî weşî biya were *celle celaluh* bigo
Neyşekerê xeram weş e *celle celaluh* bigo

Cihat niye ewê perî *celle celaluh* bigo
Mekan niye ewê zerî *celle celaluh* bigo

Çu hedd niye ewê husn *celle celaluh* bigo
Seher bixor tu badeê *celle celaluh* bigo

Minnet Dibînî Dem Bi Dem

Minnet dibînî dem bi dem rûyê gulê ba zulfê ew
Mexmûr dibîn her subh û şam carek werîn zulfa di ew

Bûya ji bûya nêrgizê ‘ame dihat bo ‘alemê
Lê ez tenê mestim ji wê ey ba bide weslek ji ew

Bûya şepala ‘er‘erî dûr e ji min sed menzilan
Saqî were weslek ji an belkî bibîn mexmûr ji ew

Mexmûrê xemra sorgul în dem dem bide bada zerîn
Hicra ji wê mar ledġeyin ey ba seba ka weslê ew

Weslê dixwazim ey şepal her tu didî hicra ġedar
Hicra siyah kuştim **Se‘îd** ta key hebî wesla di ew

Wesla şepala ‘er‘erî dê bêt ji destê vî şehî
Ew ‘er‘era baġê gulê remza didit bo weslê ew

Remzê di wê Sîna hebî perwaz ji wê ‘Îsa hebî
Weqtê xuya bû ew perî muhbet weşand ez ġemzê ew

Ġemzê Şirîna Farisî kuştin dused wek serxweşî
Weşşand ji mujgan mey perî hafiz Xuda bo rûyi ew

Hafiz Xuda bî ey cuwan rehmê bike ey nûcuwan
Vî ‘aşiqî mehcûr nekî yeksal em în mecrûh ji ew

Mehcûr û mest û serxweş în narek li dil hem dozex în
‘Işqa ‘izar riswa kirîn ez dam zemîna hicrê ew

Hicrê heya rakir ji dil ya Rebb bibe hicrê ji dil
Carek werîn bayê yemîn bihna şepala yarê ew

Bihna ji bûya zulfikan serxweş kirîn ey saqiyan
Rehmê bike b'wesla şirîn tu b'xwe were ba weslê ew

Saqî werîn cama meyê da şa bibit qelbê meyê
Da qelb bibînit rûyi wê carek werîn wesla di ew

Carek werîn cam û neyê da dil bibînit rûyê to
Yeksal xurim vê hicretê saqî werîn weslê ji ew

Wesla Şirîna Farisî dûr e ji min sed merhelan
Derkev ji cam û 'eynikê em 'aşiqê zulfa di ew

Şîrîn biye mexfî li min ta key bibî mezher li min
Saqî dida merheb li min da dest min û zulfa di ew

Li Butxanê Me Dî Îro

Li butxanê me dî îro buta şîrîn hilal ebrû
Me dî Leyla di amancê kulah şah bî şirîn ebrû

Me fincan xwar ji dest saqî gulê sor bî qemer ebrû
Ji fincanê me dil Tûr e ji Hewramî keman ebrû

...e'l-fincan ji meyxanê wekû rindî ji dest saqî
Dikim seyran bi ehlê dil safa camim ji tac ebrû

Bişo sîne ji jengarî bibe hemrah li bo yarî
Me dil îro tijî tîr e ji remzê saqî û ebrû

Ji remzê ebruwan dîtim şebîhê berqê lami' bî
Me dil hate ji pur badê bi Tebrîz û buraq ebrû

... şehê bazan li butxanê me kir seyran
Tejî bûme ji gulzaran şerab da min ġezal ebrû

... bar û me dil ker bû ji berqa lami'a şer bû
Ji ulfê şubhetî zulfê mudam dîtim hebîb ebrû

Li gulzara diçim banî me dî reyhan li nav baġî
Me dî nesrîn li ser tacî nesîbê min şemal ebrû

Ji qewsê ebruw[ê] saqî rijand bade li nav tasê
Ji 'eksa rû zuher winda kî şemsa min mudam ebrû

Ez ê de'wê bikim îro kî sultan im di 'işqê da
Ji 'işqa yar me dil Tûr e ji nazik şehleya ebrû

Ji ‘işqa yar **Se‘îd** mest e ji hicra wê me can xeste
Ne tenha dil ezî şeste[109] bi bada meş‘ela ebrû

Reqis dikim ji serxoşî şebîhê min di ‘işqê da
Fete‘lû zumreten seyfî ji remzê şîrîn û ebrû

... ...
... ...

Dikim bûsan ji yarê xwe niye xewfim ji dêwê xwe
Li meyxanê me kuşt şehne mehasib kuşt ji min ebrû

Ji lutfê Şahê Xurmalî kî pîrê ‘aşiqan ez bûm
Qedeh saf e ji weqtê Lest fidayê can me can ebrû

Hê Ji Ber Roja Ezel

Hê ji ber roja ezel lami'a 'işqê hebû
Heqq ji zatê *lemyezel* ew 'aşiqê zatê xwe bû

Lami'a husna celalî em kirîn dînê cemal
Dîn kirîn remza evînê ew ji husna zati bû

Lem'eyek j'husna şepalê pur revand hoşê delal
Serxweşê bada helalî ev **Se'îd**ê ma hebû

Husn û hubb zatê qedîm in lê ji hev bûn imtiyaz
Hubb kete nava dila bî ew kete zulfê dibû

Remzeya nûra cemalê dîn kirin mîr û ġulam
Ew perî rabû ji xew da ker kirî zulfê di xwe

Ew purî 'aşiq hebû her da'ima baqî hebû
Heqq tenê da min geda'î lami'a şewqa xwe bû

Ha ila[110] *Lewla* nebû dê em ji kû peyda dibû
Bilbilê baġê cemalê ew tenê lewma hebû

Me'neya mîmê bizane pur bizan sidq û sefa
Heyder û Cemşîd û Xalid ew ji şu'la wî hebû

... ila Lewla ew talibê husna xwe bû
Kuntu kenzen xefyeten ew da'ima ew xef hebû

We huwe me'rûfi bela lewma *bela sahib* hebû
We huwe yehwî setwetu kenzen xefyeten pur hebû

Me'neya *lewla* dizanî pur vekir erz û sema
Her tenê Baqî hebû lew [her] dema baqî dibû

'Aşiqê setwet piling î pur fena dît û beqa
'Aşiqê zatê şepalê lew dixwe xûna xwe bû

Qafiya Î - Ê - ي

Ey Bê Hezan Ji Yaran

Ey bê hezan ji yaran lewmê nekin li **Se'dî**
Lezzet ew e dixwim ez serxoş em în li 'ezrê

Benda li rûyê 'ezrû rakir j'me re çu enyar
'Eksek ji hate camê 'aşiq em în li 'ezrê

Yara cuwana Hewrem xûbî ji wê kemal e
Zulf 'enber û Xeten misk bend rakire ji 'ezrê

Hafiz Xuda cuwanim dewlet mudam şehanim
Bade ji nafê miskê rake niqab ji 'ezrê

Weqtê sebah were ba lê de ji wê 'ebîr cam
Cam girtiye me jengê bîne j'me re xwe 'ezrê

Maha ji rengê sorgul xordem ji wê pelê gul
Çeşmê siyah çu ahû bêxe di cam çu 'ezrê

Maha welatê Hewrem pakîze hat ji mêran
Rakir ji dil emanim êxiste cam çu 'ezrê

Tirka welata 'ezrê guft û digot eya qend
Şam û xeram li bo te 'aşiq tu yî li 'ezrê

Badê me got nihanî camê bide hebîbî
Kifş be ji rû temamî 'aşiq ez im li 'ezrê

Cab hate cam ji yarê sebr û fereh bike yar
Xwandim li wê çu tûtî bilbil em în li 'ezrê

Ebrû keman ji yarê burca cebîn çu mahê
Xal ʻenberan kirim şaş Leyla nebit çu ʻezrê

Tac û kulah çu mahî zulfê siyah ji şahî
Zeqna xunav kirim şaş tûtî ez im li ʻezrê

Dêm şuʻle da ji nûrê teşbîhê ʻîdê mahî
Mujgan siyah çu şahî hafiz Xuda bî ʻezrê

Lale ʻizara ʻezrê terfe kehîle Leyla
Zulfê siyah belavin xûn hate dil ji ʻezrê

Xûn hate dil ji hicrê her bê heza çi zanin
Lezzet-xur în ji badê em teşne în ji ʻezrê

Ateş li min belav e cerg û dilim çu nar e
Şurbu'l-mudam[111] dixwazim *ʻeyne'l-ʻeyan* ji ʻezrê

Biya Wer Mey Tu ʻUsman î

Biya wer mey tu ʻUsman î ji rûyê şahê ʻEdnan î
Me dil sûze ji hicranê meded ya şahê ʻUsmanî

Ji hicra rûyê Hewramî me dil çûye bi talanî
Bi talan çû bi efġanî meded ya şahê ʻUsmanî

Ji firqa şahê xûban e dikalî min dil û sîne
Bi ta key me dil çîn e meded ya şahê ʻirfanî

Dil û cergim bi awaz im bi awazê ney û saz im
Dibê sazan dil û cergim meded ya Ġewsê Geylanî

Bide saqî meyê baqî di ʻişqê ma tu tiryaq î
Me go **Seʻdî** tu mercana meded ya seyfi rebbanî

Di ʻişqê da çi serdar im wekû Belqîs bilind şan im
Suleyman her ez im îro di ʻişqê yari subhanî

Di ʻişqê da me go îro durd û mercan ji wê mey go
We razê dehrê *ma nercû*[112] ebrû îro li wî xanî

We razê camê Cemşîdî bigêrr îro bi rûhanî
Kemendê seydê gerdûnî nebe îro bi erzanî

Bi erzanî bi awazî dibên îro çi sazanî
Bi lutfê Şahê Hewramî ez im mehbûbê subhanî

Bi *ġanî*[113] go nihan xwace biya ʻaşiq bi meyxane
Ji lutfê qutbê ʻUsmanî ez im **Meczûb**ê rehmanî

‘Ecîb im Ez Ji Vê Dehrê

‘Ecîb im ez ji vê dehrê dikin lewmê li bo **Se‘dî**
Ne tenha ez bibûm riswa li bo çeşmê şirîn **Se‘dî**

Çi şêrîn bî bi vî rengî meger Şîrîn bi vî rengî
Seher da min ji ebruwan kulaha keç kirî rindî

Ji meczûban me xwar bade ji zulfa duxtera zade
Perîzade bi vî rengî li min zêde şehê rindî

Şehê qudsî numand cilwe ji zulfa ‘enbera xende
Bi hoho me dida awaz ji sirra duxtera xendî

Te‘alellah çi subhan î ji zulfê yar me ġeyb zanî
Di seyra rûh û Hewramî me dî yarek gelek xendî

Biya ba ma bi seyrê ma meşim qudsî ji ew rindî
Ji seyra dilber û saqî me dî qudsî gelek qendî

Dikim seyrê bi yarê ra biye saqî şehî w saqî
Ji zulfa duxtera ġeybê digot mutrib biya rindî

Digot yarê binoş bade ji ma û yar ji ew şahim
Ji cama enzelî rindî ji vî qudsî tu yî rindî

Teqeddes yarê subhanî ji ‘eynê neqs û erzanî
Hemî guftar bi vî rengî hemî sun‘ şehî w rindî

Binal Se'dî

Binal **Se'dî** ji zexmê ew pilingê
Pilingê şeng û şengol û çelengê

Zeximdarî pilingan nîne derman
Meger derman ji destê ew pilingê

Eger lûlî li baġî bête xweş xweş
Dibit qelb û binal û hefti rengê

Di pabûsa şepala zuhre her ro
Me dî gulzar nebû ro camê rengê

Du lûlî bûn di baġê şahişahan
Qedeh dan min ji rûyê hefti rengê

Ji zulfa duxtera zer çehre îro
Dikim nalan ji zehrê zulf û bengê

Dihat saqî bi beng û cam û saġer
Ceger ker bû ji zexmê ew pilingê

Dilo nalan me kir ez hicrê duxter
Dibit saġer tehî ez beng û rengê

Dikim nalan ji husna şah û duxter
Were îro ji baġ şaha pilingê

Ji zulfa ku dikim nalan ji derban
Bi derba kakulan xweş daye bengê

Ji gulzaran me dî duxter direqsî
Ji wê rojê niye derman tu rengê

Tu rengan nagerim derman û derdî
Kesê *dared hubî*[114] qet nîne dergê

Bibe saqî ji rûyê duxter û Zîn
Şirîn da min bi bûs û pori bengê

Me dî Şîrîn belav kir kakulê xod
Ji wê girtim çi tîr û jehr û bengê

Du saqî bûn li der baġê şirînan
Perî-rû bûn ji jehrê ew pilingê

Bi bangê saġeran kulah nebîn coş
Bi coş hatim ji zexmê ew pilingê

Dîsa Ji Tirkê Serxweş im

Dîsa ji Tirkê serxweş im mest im ji bûya kakulê
Ebrû keman qewsê hilal ‘enber feşan wê kakulê

Gulzar zer e selwa sehî mexmûr ew e gerden durrê
Baġê tu lê her bû weşî her tu weşîn wê kakulê

Derkev ji baġê çîçekan xalê siyah lê bin xeram
Zulfa mu‘enber ba weşan rişta dilî ew kakulê

Rişta dilî îro **Se‘îd** dêmê zerî bû mawerî
Kakul reşa bigrin kerî derdê dilî reş kakulê

Vî bilbilî mihnet dixwar der hicra rûyê esmerî
Derkev ji burcê surperî billah bide wê kakulê

Billah ji nal û zariya xew nehte dil j’hicra rûya
Xwezya nebî hicra rûya dil mecmer e bo kakulê

Dil bû kerî j’hicra te yî derkev ji burca muşterî
Xwezya li toqa munteha lê wer dibî reş kakulê

Derkev ji burc û penceran dîsa bide ber xenceran
Can bî fida bo esmeran rûhê **Se‘îd** reş kakulê

Li Min ‘Ebîran û Gulabê

Li min ‘ebîran û gulabê ji zulfa duxtera çun şahê ‘amî
Eya şaha were canî bide **Se‘dî** ji camê xod surahî

Li min pur ke ji lutfê şah li min mesned tu yî ey şahê ‘amî
Ji pur derdan çi ye halim bide rindê şerab û hem surahî

Ji bada rû ez im Mecnûn li min Leyla du duxter bûn ji ‘amî
Ji zulfa duxtera xûn daye cegerim meger gîrim berî meqsed ji şahî

Berî meqsûd ji min *bişnew* eya **Se‘dî** me girt îro ji şahî
Ji şahê sefderê Kerrarê Heyder xitabiş ey ‘Elî Hussamê şahî

Çi şahek sefder û ewladê şahan û du perran
Sefayê xatiran ez husnê lutfiş dil û cegerim tu şahî

Li min ‘alem bibit yekser çu kesra çu zerre fehza û caniş guzad
Du ‘alem ra Xuda dariş ji ihsan l’min lutfiş hem kûhî ‘amî

Ji min *bişnew* ela yara yekî pendê Husamî cuz nekon pîranê caneş
Xired ‘eql û ney feşand kemaliş meger Barî kire iltaf li ‘amî

Were saqî ji ihsanê qedeh pur ke ji bada rux weke şah
Bide mutrib çu şengan newayê çeng meqamatê [li] ‘amî

Li min derd e bibit duxter we Hewrem qerînê cam subihgahan bi derdim
Ji lutfa duxtera Hewrem me girt ew der-aġûşim hene her du ji ‘amî

Şukurdar im ji ixlasê me girt camek şebîhê camê Şeh Cem
Hemîşe pîşe’ê sefderê Hewrem ji ihsaneş tu yî meczûbê ‘amî

Sebahu'l-Xeyri Ya Saqî

Sebahu'l-xeyri ya saqî were bînahiya **Se'dî**
Heya bînahiya rindî veke bendê ji vî rindî

Ji nav rindan me bêhoş im sehergaha l'neyê hoş im
Ji şurbê dembidem noşim binoş le'lê ez im rindî

Ji şurba bê qiyas bîme şebîhê rindê meynoşî
Ji hicra esmera 'Ezre çu Ferhadî ez im rindî

Ji ruxsarê ewê bîme bi alûdê mey û nûrê
Çu ruxsarek qewî nazî ji nazê wê ez im rindî

Ji 'işqa nazika derdan ketim çaha ji narê da
Ji hicra wê ez ê Mecnûn çu Tebrîzî ez im rindî

Nigara 'ezruwê dîtim şebîhê Leyl û Şîrînê
Çu yeksal e dixwim xûnê ji 'işqa wê ez im rindî

Nigara esmerê rabe du zulfê 'enberî bade
Li ser çeşmî siyeh berde bireqsî zend û mest rindî

Nigar û Tirk û mehbûb im çu 'Ezra'îl bi perwaz e
Şebîhê Leyl û Şîrîn e dused mestûr kirin rindî

Nigara çapikê [esmer] ji wî burcî xeram rabe
Du zulfê jenkirî berde ji 'işqa wan bibîn rindî

Te'alellah ji wan çeşman şebîhê ahûyê dîtim
Ji wê husna Xuda da te meke mehrûm evî rindî

Hezar şukran ji yarê xwe kirim 'aşiq li zulfê xwe
Kirim şeyda li riya xwe şukur îro ez im rindî

Ji wê Tirka gireh biskan çi sermest im ji van yaran
Te'alellah ji husna wan dixwim bade ez ê rindî

Îro Di 'Îda Min Şepal

Îro di ‘îda min şepal dê kim tu bî rengî bikî
Rengê te bî şu‘le û şefeq sebrê şirîn vê tu bikî

Sebr telx e îro **Se‘îd** gerçî heye meywek mecîd
Şeyda di bilbil her tu yî mihnetkeş în vê tu bikî

Xaran dixun j’hicra gulê xarê di wî ab û gulê
Îro reqîb kuştim belê her bo Xudê wê ger bikî

Ger tu hebî bayê şirîn dê em bixun bûya şirîn
Zulfa ji ‘enber daweşîn zerab û sosin vê bikî

Sosin ber e cewher rux e ew bî di husnê yek durr e
Sîm ab û zer gul lê perr e zulfê tu xwe wer ker bikî

Zulfê muxalif ba bide da ez bibim şeqq û kerî
Şeqqe’l-qemer enguşt zerî şurt e ji ba vê ker bikî

Şurt e ji ba zerrîn kemer ahû sifet şubhê qemer
Ebrû keman j’burca qemer kakul reşa wer ker bikî

Şurt e hilîn j’ruxsari Zîn benda ji ‘enber helqe çîn
Biska siyah ker ke û weşîn vê çenberê wer ker bikî

Tirka ji came zer gulê nayêt derî ez muşterî
Xawer li ser bejnê gerî mihr û felek wer ger bikî

Xawer ji ‘işqê wek felek lerzîn ji ber behr û melek
Sergeşte yîn şubhê felek ew ‘aşiqê zulfa bekî

Sed Xusrewan can daye wî textê Suleyman daye wî
Belqîs e rû rengîn e wî dîsa dilî wer hûr bikî

Şubhê Suleyman b'setwet e hemçûn Felatûn b'serwet e
'Îsa ewî ew heyy kete Cibrîl niqab her ker dikî

Saqî were çengê bide mutrib were badê bide
Şurte were esrar bide vê dilberê dil ker dikî

... nişînim ey hebîb şurt e bikuş dîsa reqîb
Derdê li min rûyê hebîb vî 'aşiqî mehcûr nekî

Bi Dil Guftim

Bi dil guftim û xweş xwandim li bejna Şahê Hewramî
Bide Leyla ji husnê xwe **Se'îdê** Şahê Hewramî

Eya Leyla were canî bi husn û xûb û zîba'î
Ji zulfê xûb û re'na'î ji zulfê yarê Hewramî

Were xweş ba bibarîne du zulfê 'er'erê şengî
Şeh î canan tu yî dildar bi tîrêj Şahê Hewramî

Ji Tirka Hewremî xwarim mey û efyûn di 'işqê da
Di 'işqê da şehim yara ji Leyl û Pîrê Hewramî

Li min *bişnew* hebîbê min tu mexmûr î di 'işqê da
Kesê negrî yekî yarê hewadar im ji Hewramî

Eya şîrîn bide sazê di 'işqê da bibim reqqas
Li meyxanê bibim serxoş ji bada Leyl û Hewramî

Du zulfê ezferî bîne li min weş ke di camê da
Ji firqê şahi mecrûh î meger melhem ji Hewramî

Ji min mecrûh çi bî firqet şebîhê dîn bi efğan im
Meger melhem ji bada rû bibit şafî ji Hewramî

Bide saqî mey û bade du zulfê 'enber û beng e
Di 'işqê da ew e serma şirîn yar im çu Hewramî

Bide bade ji husna xwe meger munkir bibit teşne
Bi fetwayê dixwim bade meded ya Şahê Hewramî

Çi xweş dar im yekî fetwa nepursin wî ji bo Yûsif
Bixun badê ji mehbûban şebîhê rindê Hewramî

Li min fetwa ev e yara dixwim bade ji meyxanê
Ku şirîn ‘aşiqê Leyla meded ya qutbê Hewramî

Binoş îro ji dildara meyê birhan bi erzanî
Çi dildar in weku ġunçan şebîhê baġê Hewramî

Ji leb ġunçan kuşadar im çu işraqî bi sed menzil
Su’al û me‘denê esrar ji zulfê Tirkê Hewramî

Sebahu'l-Xeyri Hewramî

Sebahu'l-xeyri Hewramî ji Leylayê bibe saqî
Du çeşmê nêrgizî bîne şebîhê çeşmê vî saqî

Ji goşê ebruwan xwandim 'ecêb remzek li der suhbet
Ji Leylayê biyar muhbet şebîhê zulfê vî saqî

Te'alellah çi dildar in ji mehbûban tu yî bes min
Ji nav yaran ew e mehbûb bixûn **Se'dî** li vî saqî

Ji meyxanê binoş noşê reqîb kor bî ji pur nîşê
Bi dengê hû bixwin noşê biya Hewrem weke saqî

Biyar Hewrem tu vê badê ji Leylayê bibe şafî
Li min 'ezrû biye yarî du zulfê saqiyim saqî

Ji mabeyna du ebrûyan dixwim bade subihgahan
Buta mezre' ji bo dasan were Tirkê weke saqî

Du çeşmê saqiyim dîtim şebîhê Leng çu xûnrîz bî
Li min sa'et qiyam hate ji hicrê şahî û saqî

Bi dama muhbetê çûme wekû mecnûn li meyxanê
Zemîna firqetê da me ji hicra wesleta saqî

Ji pur firqet dikalim ez ji ber 'işqê dinalim ez
Ji 'işqê şeh disojim ez esîrê 'işqê vî saqî

Du çeşmê saqiyî lale werîn şaha li der baġe
Li ser çeşman xeyma dane lihazê eswedê saqî

Evê Tirkê li min anî qiyama sa'et û tarî
Ki meynoşim ji mey baqî di benda zulfê vî saqî

Ji dildaran min ê girte du mehbûbê gelek şoxe
Se duxter bûn li baġê ma ji weqtê enzelî saqî

Ji bêhoşî em în hatif ji cem'a mexzena ġeybê
Şukurdar im ji yari xwe kirim 'aşiq li vî saqî

Eya Se'dî Bixor Badê

Eya **Se'dî** bixor badê ji Leyla û ji Hewramî
Fiġan cana ji ber hicrê me dil nar e ji Hewramî

Ji hicranê me xûn xware ela ey canê dinyayê
Ji ihsanê bide badê ji zulfê Şahê Hewramî

Şerabê tîzi mîxohem[115] meger yekser bibim serxweş
Cihan cana ne pêşî min ji ġeyrî yar û Hewramî

Sehergahan weşîn cana du zulfê 'enberî şaha
Ji şengolan *se yar dar em*[116] ji lutfê Şahê Hewramî

Eya saqî di bezma yar bibe saqî ji bada yar
Bibe erzan ji bo 'aşiq ji nav bezma vî Hewramî

Ji bezma şah tu yî canan çi dildarî bi bejnê ve
Te'alellah çi meynoş im ji lutfê p[î]rê Hewramî

Ji meczûban çi mecnûn im j'ġezelxwanan çi şahîn im
Ji ihsana şeh û saqî çi yar-gîr im ji Hewramî

Heya cana ji pur şengî du zulfê 'er'erî rengî
Ji tayê çiçekan weş kî gulabê zulfê Hewramî

Çi terfê yar ji dildaran ji pur xûbî çi şahanan
Bi te xûbî kemal hate bi bejna xwe tu Hewramî

Şehê yaran bi Qur'anê tu yî 'ezra bi Furqanê
Mekûj rindî ji hicranê esîrê 'işqê Hewramî

Zemîn coş e ji husnê to şebîhê min ji ‘işqê to
Me xwar bade ji remzê to xweyî rehm î tu Hewramî

Ji nav yaran tu pur xûb î tu yî canan ji pur xûbî
Sebahu’l-xeyri ya saqî sehergahan çu Hewramî

Sebahu’l-xeyri Şîrînê ji şêrînî çi şêrîn î
Çi zîba’ î bi ruxsar î ez im perwer ji Hewramî

Ji helqê zulfikan weş ke zebad û ‘enberê saqî
Ji bo ‘aşiq tu xweş pur ke sebahu’l-xeyri Hewramî

Biya Cana Di Mehmel da

Biya cana di mehmel da veke poşan li ser dêmê
Du goşê ebruwan binma[117] şebîhê qewsê ser dêmê

Di mabeyna du qewseyna me dî şêrîn bi zîba'î
Te'alellah ji van birhan kirin mezher li ser dêmê

Du biskê şehleyî ker ke ji nava misk û 'enber ke
Şebîhê şahê werwer ke bila bê poş hebî dêmê

Me go j'aşiq bi hicranî tu yî sultanê mehbûban
Bi te meşġûl ez û **Se'dî** were camî bi gul dêmê

Ġezala şeng û şengolî ji van çeşman tu re'na î
Tu pur ker ke ewê biskê bi enguşt û 'eqîq dêmê

Te'alellah ji van zulfan bide bayî ji qewseynan
Were bade herîra bisk di nava gulgulî dêmê

Qemer hate li mîzanan ji ber hicra te canan
Ji awazim kete naqe di nava gul qemer dêmê

Nema hoşim ji hicranê çu girdaban me ser geşte
Heya saqî were cana sehergahan bi nûr dêmê

Ji hicranê bi coş hatim ji awazim sehab barî
Te'alellah çi şehbaz e li ser textê gulî dêmê

Qemer hate xusûf yara çikû mexf e li min Leyla
Çi sergeşte meh û mihrî ji efġanê me dil dêmê

Li min Yûsif biye mexfî Zuleyxa bûm li vê Misrê
Di burca qews û mîzanê ez im Mecnûn li wê dêmê

Ġezel guftim û xûn rihtim li bejna Leyl û Hewramî
Ġezelxwan im ji vî derdî me renc bûye gulî dêmê

Ger Dil Hebî Zuhdek Xuşik

Ger dil hebî zuhdek xuşik[118] bada cuwan dê nûr bikî
Bada ji rûyê esmeran meh ke[119] j'me re dil nûr dikî

Şûşt û şowik der meykedê ferz bî li me j'weqtê Elest
Xirqê riya alûde ger alûdeê bada şekî

Alûde bî xirqê beyaz b'le'la meyê der meykedê
Alûdeê husna yekê lew meyxur în j'selwanekê

Alûde bî bada şirîn lewmê nekin ey dil hezîn
Pîşim ev e bada cuwan mihrab ji wê wek xummekî

Ger dil hebî pêş bade bî rûyê senem pêşber me bî
Sed can 'ezîzê min hebî dê ez bidim yek zulfekê

Leyla dide remzê mujan dil şûşte min der saġeran
Butxan e dil îro **Se'îd** cama Cemî husna şekî

Gerçî ez im her badenoş lêkin heye duxter bi coş
Her meyxur im zahid berew dil bendê dama zulfekê

Van duxteran mey rihte dil ebrû keman kevtin di dil
Gerden pur in zulf têne mil ez bendê dama yarekê

Şêxê cuwan j'vê 'alemê girt û cuwan ba duxterê
Leyla ve Hewrem bûne yar ez 'aşiqê mehbûbekê

Minnet me dî ev herdu şeh gerden durr in bû mawer in
Teşbîhê şemsê şeşperr in minnet ez im rindê şekî

Şahan e dil der ‘işqê yar qismet me ye j'subha Elest
Qismet me bî cama sedef pêşî me bî bada şekî

Îro me dî duxter şehî şeh bû mu‘în ya esmerî
Dilber heye Leyla cuwan saqî hebî zulfa şekî

Saqî hebî şoxek şepal şêrîn dida bada helal
B’ilham dixwim bada cemal dîsa reqîb mihnet dikî

În ‘Er‘erê Balayê Min

În ‘er‘erê balayê min bispêr bi min ya rebb ewî
Têtin xeram der baġê tu ya rebb bide rûyê ewî

Zulfê biweş şahê min û çeşmê di reş dîsa werîn
Bîne ji wî bûya ‘ebîr kakul reşa ez baġê wî

Weş ke ji wî miska Xeten tac û kulah bişken seba
Weqtê seher rêke j’me re ġemze w sirra j’hicra di wî

Çaha zeqen ez bend kirim bendim ji roja enzelê
Ey ba nesîm j’roja Belê dîsa tu yî mehrûm ji wî

‘Enber bike cam û qedeh weqtê ku xweş têtin xeram
Çendî hebî perwaz û perr weqtê seher bîne ji wî

Gah gah ez im nalan dikim nalê ji ber hicra şehim
Mehbûb ew in rehmê bikin xaraxur[120] în ez baġê wî

Hicrek ji wî em hiştine bê ‘eql û hoş û bê temîz
Ala ‘eqil têtin j’me re weqtê ku bîn aġûşê wî

Ev gerdena girtî xunav bilbil ji wê sîr-ab û av
Lu’lu’ ji bend bûne zirav ez kuştiyê çeşmê di wî

Dama **Se‘îd** ‘enqa dixwast dama zerîn qet jê negirt
‘Enqa şikara kes nebî bazgeşte dam negrit ji wî

Dil da Dixwim Çi Xûnê

Dil da dixwim çi xûnê sergeşte yim ji zehmê
Sergeşteyim ji ‘işqê yara bike l’me rehmê

Yara şebîhê sorgul bilbil ez im li ser bil
Hetta ebed me xûn dil dê em bixwin surahî

Şukrê Xudê bi dem b'dem behrek me dî ji badê
Fincan me kir di badê ġem hate dil ji surahî

Saqî rijand li ber min behrek ji badê yarî
Saqî were çu Hewrem pur kin ji mey surahî

Saqî biya çu yarî ruxsar bike di camê
Şeyda ez im li zulfê dîsa bide surahî

Tirka ji baġê sorgul mey rihte dil ji enzel
Derdê li min eve yar dîsa bixwim surahî

Tirka ji baġê nêrgiz xordem ji dest pur reyhan
Reyhan hebî ji ‘erqê rindî vexwar surahî

Der suhbetê hebî yar bilbil dixwande Leyla
Xwande li wî me bilbil perwaz me bir surahî

Ferhad **Se‘îd** ji ‘işqê xweş xwande min li ber wî
Dengê ‘ezîz me seh kir l’şi‘rê bigo l’surahî

Şi‘ra ji ‘işqê sorgul nav badeye tiraz gul
Ger tu dixû tu badê dîsa bigêrr surahî

Butxan e dil ji ‘işqê meyxorde yim ji ‘Îsa
Ellah li min hebê yar dil şade min j’surahî

Îro senem ji bêzê şeyda kirîn çu mestî
Ellah çi ye ji husnê neqş û nigar l’surahî

Îro Ji Sewta Bilbilî

Îro ji sewta bilbilî nakîn qerar wek sorgulê
Ev bilbilê sewt û hezîn dîn bî ji ‘işqa sorgulê

Wê sorgulê daye xunav şaxê di wê bûne belav
Bergê di wê sîr-ab û av bilbil ji nûra sorgulê

Hubba gulê xweş ateş e bilbil heman têk ateş e
Ateş dirêjit ber dile ez kuştiyê hicra gulê

Hicra gulê sohtan dile ker kir ceger b’yek xencere
Bûya gulê bû ‘enber e ah û fiġan bo sorgulê

Sorgul ji tayê sunbul e cama zucac nûra gul e
Cama sedef j’bergê gul e saqî werîn wesla gulê

Bejna gulê bejnek tîr e ma’il dibî wek sunbul e
Çeşmê şehî xûn rîz kire saqî li min her sorgulê

Saqî biya sohtî dilim da’im dibêm feryad-res im
Saqî tu yî feryad-res im ka saqiyê j’bergê gulê

Ev bilbilê mihnetkeş în ahan dikit j’derdê evîn
‘Alem ji ahan ateşîn ateş-xur în j’xarê gulê

Xarê gulê keyber bire kuştin dused wek bilbil e
‘Işqa **Se’îd** ‘işqa gul e ey ba nesîm weş ke gulê

Yarê gulê nayên ‘eded lê ez tenê xummar û rind
Tenha ne ez yarê gulê mihnetkeş în j‘işqa gulê

Îro Seher Hate Dilî

Îro seher hate dilî bûyek ji bihna kakulê
Bihna şepala cilweker bihna gulê ya kakulê

Kakul ji şu'la çenber î reyhan li ser çeşmê perî
Ġemze pur î mujgan durr î bûya 'ebîr bû kakulê

Biska herîr bazî dikir ber çeşm û dêmê enwerî
Dêmê zerîn xalê herîr şeyda kirîn wê kakulê

Biska siyah marê livan bazî kirin ber zulfikan
Bazî kirin gîso w l'perran ez kuştiyê wê kakulê

Gerden biye şubhet bilûr biskê li ser werdê di cûr
Em jê hene b'sihr û surûr der bendê zulf û kakulê

Benda şirîna 'ezrewî tayê herîr û çenberî
Benda li me yekser herîr em 'aşiqê xal kakulê

Helqê girahê zulfikan çendî kirin em 'aşiqan
Helq û girah çend sahiran bayê semûm ew kakulê

Sihra ji biska pur girah 'alem ketî ta pa w sera
Lê ez tenê ser ta qedem girtim bi helqê kakulê

Tirsim nedî ew 'ezrewî zulfa girah û çenberî
Yekser kirîn şeqq û kerî rûh bî fida bo kakulê

Ummîd ew e ya 'ezrewî teb'ê te ye weslet dihî
Vî 'aşiqî mehcûr nekî dîsa bide wê kakulê

Ger tu bidî zulfa girah ew tûleyên her gah û gah
Em koleyên ya şahnişah mihnetkeş în bo kakulê

Şeb ta seher nînin xeyal ez ġeyri hicra te'y şepal
Şeb ta seher nalan vemal der hicreta reş kakulê

Me'den ji sîm û zer ev e husn û cemala esmer e
Zêde te'eccub girtime bo xûbiya bû kakulê

Husnek heye vê dilberê keskî nedî şubhê mehê
Subhan ji husna dêm durê derdê **Se'îd** ew kakulê

Ya rebb neke bilbil 'ebes can daye wî hemçû ceres
Ġa'ib neke j'dîdarê bes rişta dilî lew kakulê

Îro Ji Çeşmê Mestê Yar

Îro ji çeşmê mestê yar derda diçînim bilbilî
Ateş dirêjit ber dilî mihnetkeş im em bilbilî

Xarên gulê nayên hisab mihnet ji wê nayê hisab
Xarên gulê hem şîr û tîr tîran dirêjit bilbilî

Em bilbilê firqetkeş în billah ji dil em ateş în
J'hicra gulê dil sufte yîn zehmet keşan vî bilbilî

Yara çeleng zulf û xelek *fî hubbiha* dil bû helek
Bay û 'ecac *eyne'l-felek* medhê bike ey bilbilî

Medhê şepala neyşeker nayêt hisab ey rû qemer
Minqar **Se'îd** bûye du ker der medhê yara bilbilî

Em bilbilê bal û sedef bûme esîr d[er] 'işqê xef
Ew bilbilê *natwan*[121] û xef mest e ji sewta bilbilî

Gerçî ez im meyxor cuwan lêkin ez im seydê 'Elî
Ew şêr û şahê nûcuwan der 'işqê wî ez bilbilî

Îro Siwar Bî Tirkê Ma

Îro siwar bî Tirkê ma wek Xalid û şêrê ‘Elî
‘Enber weşand j’zulf û gulî şahê mubarek ya ‘Elî

Şahê Husam da min evîn hubb û evîna surşirîn
Yara şepala pur emîn kuştim bi zumrê xwe ‘Elî

Ew şahibaz Dindil siwar şubhê di leys û ‘endelîb
Libsê di ber etles qedîf şahê mubarek ya ‘Elî

Hat padişahê pur kemal guft û digo j’durcê cemal
Da min kemend ew şehsiwar ez kuştiyê fitrak ‘Elî

Leşker ji ‘alem wer bibin dujmin ji bo min ey **Se‘îd**
Yek car kişînit şîr ‘Elî ‘alem bibit şeqq û xwelî

Ateş ji ‘işqim wek cehîm dil bû gurrî j'nara evîn
Pişt û penahim ew perî can lê fida Şahê ‘Elî

Dîsa Li Min Nû Bî Evîn

Dîsa li min nû bî evîn hubba Şirîna Farisî
Pur kin qedeh ba Hewremî saqî weşîn zulfa şehî

Şeh ke du zulfê gîsuwan lê ke bixûr û ‘enberan
Wê kakulê ker ke nesîm kakul reşa rûyê şehî

Îro **Se‘îd** şahê evîn saqî werîn rûyê şirîn
Ev hudhudê ş[î]rîn em în rûh kî fida zulfa şehî

Hubba Şirîna Hewrema bê hedd biye der camê ma
Sed sed selam ey şahê ma pur kin qedeh j’rûyê şehî

Pur kin qedeh j’vê duxterê şubhê di Leyla ‘Amirê
Ey ba nesîm vê dilberê derxe li me hemçûn şehî

Ev dilbera ‘Îsa nefes qelb û ceger kirye ceres
Îro ez im tev da hewes der muhbeta duxter şehî

Qelb û ceger l’min bûne ker j’hicra şehî ez bûm du ker
Rihtin li min remz û di sirr serwa qeda selwa şehî

Selwa seh î ‘ezra rux î çenber perr î rû esmer î
Nuqte bi nuqte zer kirî her ser ruxê yar û şehî

Zulfa di reş bû fulfulî bilbil li wê kir ġulġulî
Bê dest û pa îro gulî rehmê bike Hewrem şehî

Ev dilbera şehbaz û yar êxiste dil ah û di nar
Ah û enîn nû çûn sema saqî biya hemçûn şehî

Er bo Xudê Hewrem şehî pur ke li min remz û sirrê
Pur ke li min saqî şehî ‘eynê ‘ebîr hemçûn şehî

Rake nesîm benda ewî ta key hebîn der hicrê wî
Hicretkeş im îro gulî der firqetê Hewrem şehî

Ez sohtiyê hicra Cemî nar û esef rake Cemî
Cam cam birîz îro perî da cam bibî cama şehî

Îro Se'îd Lê Hat Evîn

Îro **Se'îd** lê hat evîn 'işq û evîna rû mehê
Mehpare bû qamet sihê dêmê ji 'enber bû mehê

Durrdaneê da min evîn saqî kirî efyûn şirîn
Saqî hebî kember zerîn 'ezra rux û gerden mehê

Zehra û şemsa xawerê bazî kirin ber çenberê
Vî mutribî da min defê dêmê şehî hemçûn mehê

Ey mutribo lê de defê serxweş bibîn ba rû mehê
Sekran em în b'zulfa di wê ev saqiyê ebrû mehê

Van saqiyan mey rihte dil weqtê sehergaha ezel
Hetta ebed em serxweş în j'vê badeya gerden mehê

Yara şepal bûbû xeram weqtê sehergah û di şam
Meşha seher Şahê Husam çenber hebî şu'la mehê

Er ebruwan bûne hilal mislê di yar bûbû cemal
Zeqna di wê bend daye mal îro me dî şehinşehê

Îro reqîb bûbû selîb 'ezra ruxê ew bû hebîb
Ateş rijand ber wî tebîb rûyê di wê nûra mehê

Maha felek kirye kerî şeqqe'l-qemer b'remza zerî
Remzek nihan da min perî lew serxweş im j'hubba mehê

Hubba şehî ez kuştime bê 'eql û bê hoş hiştime
Şubhê Şirîn Ferhad heme ş[ê]rînê û guft û mehê

Guft û digot meynoş ji ma hetta ebed sekran ji ma
Cama meyê der destê ma rihte dilî şahê mehê

Dil Mecmerê Rûyê Zerî

Dil mecmerê rûyê zerî şem'a me bî rûyê zerî
Lale 'izar dava dilî derdê li min wesla zerî

Xal 'enberê dil kir kerî ruxsarê şeh her bû celî
Ruxsar şebîhê kewkebê meşha xeram l'baġê zerî

Remzek cuwan avêhte dil lew da'ima mexmûr e dil
Mexmûrê xemra bêġeşîn derket ji burcê ew zerî

Derkev ji burca muşterî kakul reşa ez muşterî
Ġebġeb ji toqa muntehî her bû celî ew surzerî

Sirr rihte dil îro zerî gîso w lefan bûbûn herîr
Dama lefê dama herîr ez kuştiyê wesla zerî

Derkev ji burca zuhreyê da dil bixwit bada şehî
Saqî hebîn sor sor kezî mey pîşe im ey dêm zerî

Mey hate dil j'roja ezel lew her ez im rindê ezel
Weşhand ji zulf û gîsuwan pergê gulê ew surzerî

Wê çenberê lê ke 'ebîr da dil bibit baġê emîr
Şem'a dilî bû nîzenîz ez kuştiyê turra zerî

Rav girtine rûyê perî mehra felek hate kerî
Zehra û şemsa xawerî gerr dan li ser dêmê zerî

Bazî kirin van kewkeban ber nûr û xalê cebhetan
Dilber ji rengê sorgulan ez kuştiyê rûyê zerî

Dil dava rûyê ‘er‘erî min bistexur narê di yar
Îro seher dîtim perî berg û perran l’dêmê zerî

Meş‘el rux e kakul reş e xalên di qer zêr weş e
Meşha seher yara min e dêm lê gulî ebrû zerî

Qamet elîf bî ew perî şubhê sehê xerram dibî
Dê bê seher şahê **Se‘îd** b’çeşmê reşî b’dêmê zerî

Leyla ji ruxsarê di xwe mey rihte dil wek zulfê xwe
Kengî bibarî ey nesîm zulfa şepala pur zerî

Tu J'nû Bibare Ey Nesîm

Tu j'nû bibare ey nesîm dil bû kerî j'hicra zerî
Derxe li min ebrû reşan rûh hate der j'hicra zerî

Dêm esmer e weş ke ji xo zulfa herîra şubhê go
Xûn-xwar e dil îro ji nû vê hicretê dil kir kerî

Amanc te kir cerg û cesed lew da'ima nare kebed
Kakul reşa eyne'l-meded ez bendê zulfa dêm zerê

Vê firqetê dil he[r]rişand yekser ji dil ateş rijand
Cegr û dil[an] w[ê] kêr gehand ehsen ji husna dêm durê

Lutfê bike ey dêm durê subhan ji Xellaqê şehî
Çend muhbet û hem şefqet e dîsa were ey surperî

Sirr hate dil j'cama bilûr xalê 'ebîr werdê di cûr
Bazû ji mawerd û bixûr ez kuştiyê vê enwerê

L'baġê şehî ez çîçek im rindê xerabatê ez im
Dîsa li meyxanê ez im fincan li ser destê zerî

Ebrû keman sirr rihte dil lew da'ima butxan e dil
Der meykedê xûn-xwar e dil xwezya ji ber perdê derî

'Işq û evîn min bû nesîb nakîn hezer j'lewma evîn
Riswa du 'alem her em în mey rihte dil j'rindê zerî

Mey rihte ser j'cama 'eqîq dilber ji husnê pur letîf
Dil bû 'eqîq j'işqa şerîf nalan dikîn j'hicra zerî

Nalan dikîn wek erġenûn dil bendê zulfa helqe bûn
Zulfa ji ‘enber helqe bûn rav bûn selîb l’dêmê zerî

Biska şepal bûbû belav dêmê gulî lê hat xunav
Zulfa duta lê dav û dav ‘eqreb xuya l’dêmê zerî

Tîr dane min vê esmerê xal ‘enberê rû enwerê
Daġ daġ nihan da min şehî em kuştiyê rûyê zerî

Vê zalimê kuştim Husam dîsa ji burcê wer xeram
Kuştim bi tîrê pur nizam saqî werîn wesla zerî

Can daye min bo bûsekê rûh jî zemana zulfekê
Dil bendê dama ulfekê em ‘aşiqê çeşmê zerî

Îro **Se‘îd** can daye rê her bo ji wesla dêm durê
Ey ba nesîm badê derê sohtim ji ‘işqa dêm durê

Dilo Her Seyrê Gulzaran

Dilo her seyrê gulzaran bixwe badê ji wê yarê
Di bezma yari subhanî dikim çerxê wekû goyê

Wekû nayê bi perwaz im ji ber hicra şirîn yarê
Di bezma mutribî dîtim hezar enwa‘ ji hû w hayê

Wekû çûme di gulzara sebuk hate li cem **Se‘dî**
Bi saqî ve dikim çerxê bi dengê hû di hû hayê

Li min derd e bidit şîrîn du zulfê ‘enber û ezfer
Ji zulfa Şahê Hewramî dikim çerxê li cem yarê

Were Leyla bi leb xende werîn badê ji gulgûnê
Me dil tûr e ji vê badê diçerxim ez bi hû hayê

Werin Meyxaneya ‘Işqê

Werin meyxaneya ‘işqê binoşin mey ji ferfûrê
Li wê duxter **Se‘îd**ê ma didit bade ji ferfûrê

Werin meyxaneya rindan bibin sekran li van çehran
Li tu werbin zerî esmer bidin bade ji ferfûrê

Me can bûye fida yaran dikim hoho li meyxanan
Ku ew pîr im me fetwa da dinoşim mey ji ferfûrê

Zuleyxa bû **Se‘îd**ê ma we Yûsif bû Şehê ‘Ednan
Du duxter bûn wekû selwa geran Leyla di ferfûrê

Du eylan dîm li wê selwa di wan bade ji rû zulfê
Şehê xûban li min me‘şûq werîn cana tu wî zulfê

Me pur dîtin gelek zahid kirin lewme li bo rindan
Me kir mertal dil û canim li ber tîrê rû û zulfê

Ez im riswa di ‘işqê da kesê muhbet diye bê ‘eyb
Kî riswayî ji bo yaran dikim îro ji bo zulfê

Seher ‘arif digirt tuhre bi abê çeşm ji bo badê
Qesaret girt dil û sîne ji bada rûyê ferfûrê

Wuzû bestin li meyxanê li me ferz e weku ferzan
Du secdatê li me lazim li ber bejna gulê tûrê

Me xiclan bû ji dildarî weku ku te nihan rindim
Me go j’yarî ez im ‘abid ji bo zulfa li wî tûrê

Me dî sehhar di Tûrê da digo Samir nekî sihrê
Kî hewce sihrekê nîne bikî sewda tu wê zulfê

Me dî selwa dibû xerram ez im rindê Şehê Hussam
Me ew ‘alî gelek dîte kirim medhûş ji ferfûrê

Me bir secde li ber şirîn di babê seyrê rûhanî
Me tali‘ bû ji subhê Lest e bûm şeyda ji ferfûrê

‘Etîqê ‘işqê şîrîn im şehîdê tîğê Cemşîd im
Di ‘işqê da ez ê mîr im ji ‘işqê zulf û ferfûrê

Edir Ya Eyyuhe's-Saqî

Edir ya eyyuhe's-saqî li 'işqê ma tu tiryaq î
Werîn bade ji wî baġî ez im mexmûr ji tu saqî

Şeraba erġenûn noşî ji zulfê Şahê 'Ednanî
Biya wer Şahê 'Usmanî du saġer mey ji mey baqî

Were saqî ji nav baġan esîr im ez li ruxsaran
Se'îdê Şahê Hewraman bi te meftûn eya saqî

Zebad û 'enber û bûyê tu pur weş ke ji wê zulfê
Li wan zulfê te badayî ez im 'aşiq eya saqî

Tu şimşad î eya şafî ez im riswa li vî baġî
Li min bîne qeda şahî tu derkev can ji bo saqî

Sebahu'l-xeyri ya Husam yeqîn îro tu yî Kerrar
Reqîb û dêwê pur şerrar bidî tîra j'xwe û saqî

Te'alellah bi xêr hatî di 'işqê ma tu tiryaq î
Hebîb hate li vî baġî sebahu'l-xeyri ya saqî

Teqeddem Şahê ʻEdnanî

Teqeddem Şahê ʻEdnanî ji kax û qesrê nûranî
Seʻîd sohte ji hicranê meded ya Şahê ʻEdnanî

Di ʻişqê da dibêm îro rumûzê ʻişq û gerdûnê
Meded ya Şahê ʻUsmanî te ez kuştim bi hicranê

Ji bêhoşî me go îro durr û mercan bi erzanî
Meya baqî emê noşîn di ʻişqê da Suleyman î

Sehergahan were saqî birîz bade ji wî baġî
Yeqîn zanim tu nûran î li ser textê Suleyman î

Ji mabeyna du zulfeyna giham canan bi qewseyna
Yeqîn ez Asif im îro ji ʻişqê Şahê ʻEdnanî

Her Dema Dênê Bibînim

Her dema dênê bibînim xweş ez im sekran û dînê
Ez tenê mexmûr û dîn im wê ji ber ‘işq û evînê

Her dema dînê nebînim dîn dibim heyran dimînim
Her tenê sekran û dîn im wê ji ber şewq û evînê

Hate ber ‘eynê şuhûdê şubhê Ferhad û Şirînê
Sikkeyên j’cama bilûrê serxweşê rûyê şirînê

Xweş qeder bû em sukar bû ew şepal mû mû belav bû
Ew delal cama tehûr bû ez kirim Ferhad li dînê

Ba hilanî zulf û xala ez kirim fikra delala
Zulfik û toxa û ‘ala ez kirim dînê evînê

Muhbeta eswed ‘uyûnan pur revand hoşê **Se‘îdan**
Şehsiwar min dî di holan lew vekir qulfa[122] evînê

Quflê zerkeş ger belav bû durdiya le‘la şefaf bû
Hat li baġan pur belav bû lew ez im sekranê dînê

Dîn kirim remza evînê şubhê Ferhad û Şirînê
Xef nebî şewqa evînê her dema dînî bibînê

Her dema mehbûb zuhûr bit dê ji kû muhbet star bit
Ew şepal dê xweş xeram bit dîn kirim şubhê şirînê

Sa‘eta min dî bi qelban xweş ketim nava di baġan
Ġunçe leb hatin xeraman Heqq tenê da min evînê

Dê ji ber şewqa Şirînê lew ez im Ferhad li dînê
Şerbeta cama evînê ez kirim behra evînê

Di Babê Hilm û Sebrê da

Di babê hilm û sebrê da me ber xware ji meyxanê
Me genca ‘işq û xoşxwanê çi xweş girtim ji meyxanê

Bike sebrê ji yarî ra sebir telx e çi şêrîn e
Werin meyxaneya ‘işqê vexun bade ji meyxanê

Li wê şengol û re‘nane qedehdar in li meyxane
Seqakellahu ya Se‘dî[123] bi hubbê yarê subhanî

Binoş badê bi noşa noş bike hawar bi coşa coş
Kî zahid xod gelek bîne xeber nîne ji meyxanê

Were saqî tu çîn çîn ke tu zulfa şehleyî l’ba ke
Muqeddes Tûr î ce‘da ke çi xoş rindim li meyxanê

Neke we‘zê li rindê ma hewa de li yarê ma
Heme efsûn û efsane ji ġeyrî şurbê meyxanê

Sema‘ê[124] ney bike îro neke guhdar tu we‘zê ew
Sema‘ û we‘z *kuca*[125] îro şirûbê camê meyxanê

Sema‘ê saz û ney pur ke ġema ‘işqê ji nû pur ke
Şeraba rû tu mefrûz ke bimeş îro bi meyxanê

Kî ‘aqil an ew e ‘aşiq serî danî li meyxanê
Cihanê dûn dikî kufre bilez her be li meyxanê

Kî Rûh û ‘Ezre’îl îro hemî medhûş ji ‘işqê ew
‘Ezazîlî bidîta ew dibir secde di meyxanê

Çira lewmê dikin îro li vî rindî di ‘işqê da
Şuyûxê mescid û Qur’an hemî serxweş li meyxanê

Ne tenha ez li wê zulfê me can daye ji ulfê wê
Besî sûfî ji bo zulfê dinoşîn mey ji meyxanê

Bes e teqdîr ji cem Barî çira lewmê dikin sûfî
Huwe’l-fe‘alu la texter[126] nesîbê min li meyxanê

Qesem îro ji bo zahid bi tacê Şahê ‘Ednanî
Nekim terka gulîsorê binoşim mey ji meyxanê

Îro Li Min Lewmê Nekin

Îro li min lewmê nekin em serxoşê cama meyê
Şehzadeê rihte dilî şehkaseya cama meyê

Daġê ji cama meykedê bûne nihan nava dilan
Wek laleyan daġê dilan herdem ji şehkasa meyê

Bade xeram da min evîn hetta bi roja axerîn
Min dî li dêmê surşirîn husna ji şehkasa meyê

Ne'ra li ber birhê şirîn meş'el dida j'nûra birîn
Îro seba anî emîn nûra ji şehkasa meyê

Çeng çeng kirin van bişkuwan awaz birin ber asiman
Çerx û felek hatin nihan der badeya kasa meyê

Tirkê ji ġemzê cebhetê ez dam zemîna suhbetê
Asif bi remzê sekretê dabî **Se'îd** kasa meyê

Selman ji Fursê yarê ma Hewrem biye hem pîrê ma
Leyla ji 'Amir şahê ma qismet me bî kasa meyê

Sen'a ji şêxê meyxurî bû 'aşiqê duxter perî
Qamet şebîhê 'er'erî dêm esmera nûra meyê

Dîsa em în çûn butkedê yek secde kir bo yek butê
Ev sin'etê rindê butê dîsa vexwar cama meyê

Rindê li bejna şahidî şems û qemer têk xawerî
Ev saqiyê meh peykerî hat suhbeta kasa meyê

Nalim ji min çûne cesed lew her ez im şêxê meded
Feyyaz ji qudsê hem meded em qulzem û behra meyê

Rûhu'l-qudus ew şêxê ma Şahê 'Elî ew pîrê ma
Kasa meyê ew rûzê ma mest in ji şehkasa meyê

Rûhu'l-qudus şemsa dil e Leyla perîzade dil e
Saġer mudam dava dil e ez perwerê kasa meyê

Îro bi xef hat û perî Rûhu'l-qudus mey da dilî
Pîrê muġan her bû zerî ez beççeê pîrê meyê

Îro senem hat û xeram dêm enwerê lê xal û lam
Subhan ji husna Şah Husam ya rebb bide kasa meyê

Nayit şeban em xew çevan em 'aşiqê rûyê butan
Yara hudûsa bê xiyam dan xencerê xar û meyê

Vê ʻAlemê Riswa Kirîn

Vê ʻalemê riswa kirîn der bendê zulfa enwerî
Dîsa bide kasa meyê saqî ji zulfa enwerî

Wesfê evîn û ʻişqehê îro neşêm der defterê
Defter ji ʻişqa dêm durê nayêt hisab û defterê

Îro dilim xoş mecmer e zulfa siyah nûra dil e
ʻEnber ji zulfa reş kire xwezya dilê wek mecmerî

Nûra rûya her qerqef e husn û cemala mutleq e
Şeyda û dîn û bilbil e sohtî dilîn bo enwerî

Neġmek rijand vî bilbilî çendî ji ʻişqa sorgulê
Rû heykelê rişta dilî dil kuştiyê wê enwerê

Rû heykelê resma gulê derket ji burca xawerê
Ibdaʻ kire nû xawerê dil bî fida vê enwerê

Cemşîd ji burca sunbulî mey rêhte nava [vî] dilî
Saġer mudam pur lale bî em ʻaşiqê wê enwerê

Ser ta qedem em ateş în rûz û şebê şeyda dil în
Pur sûz û soj û bilbil în xwezya ji wesla dêm durê

Dil bû esef j'hicra sedef bê saġer û cama sedef
Saqî bi saz û nay û def saġer geran der defterê

Bexşîde kir îro **Seʻîd** rûh û rewanê min ʻebîd
Dûr û diraz û pur beʻîd der wesfeta vê enwerê

Ta key bidî vê firqetê sohtî dilîn j'vê hicretê
Suhbet bi yaran xoş me tê ez 'ehdeya vê enwerê

Zanim heqîq îro ez im meczûb û serxoş er ez im
Mehpeykera Belqîs ez im riswa bûyîn der defterê

Raz û rumûzê 'işqehê dîsa nebî bo 'alemê
Navêj dera bo 'alemê hepsî seg in dunya xurî

Me nekir li wî va hela gerçî 'eyan zahir cela
Batin seg in zen bûn bela rû û riya şubhet xurî

Îro Ji Remza Nûcuwan

Îro ji remza nûcuwan mey hate fincana sirê
Minnet ku îro dêm durê da min meya rûyê perî

Hostayê zuhd û meyxuran dîsa li min bûye ʻeyan
Xaka li ber payê şehan daye li min selwa perî

Selwa sehî lew cemmilî weqtê seher lew kemmilî
Çîçek ji bejnê ġeyyirî ez ʻaşiqê rûyê perî

ʻAşiq li xalan bûn bela şehê helac der Kerbela
Îro li min zahir cela mey hate fincana sirrê

Fincan li ser destê şehî geran ʻeyan duxter şehî
Zer duxterê raza meyê kengî ji ber perdê derê

Ez kuştiyê raza meyê lew her ez im behra meyê
Ez perwerê şahê Cemî dîsa ji ber perdê werî

Şahê evîn û muhbetê ez dam zemîna sekretê
Asif bi remzê dehşetê nûye cemal l'cama surê

Dîsa ber û îro **Seʻîd** der wehdeta mutleq mecîd
Ehlê dilan dûr û beʻîd der sekreta vê enwerê

Vê enwerê bes kuştine enguşt ji xûnê riştine
Ez kuştime b'wê qiştine der wesleta vê dêm durê

Co co rewan şahê cuwan der muhbet û baġê gulan
Weqtê ku tê îro cuwan tavê dilî zulfa perî

Wê ʻenberê ʻenber weşand ta ta li min zîber weşand
Yekcar li min batin şewand ez kuştiyê şahê perî

Leyla ji burcê derkete ʻaşiq ji ʻişqê sekret e
Xurşîd ji xawer telʻet e can bî fida rûyê perî

Sebahu'l-Xeyri Şahanim

Sebahu'l-xeyri şahanim li min rûh î eya canim
Çi tu şah î li bo **Se'dî** ji min qalib tu yî canim

Çi canan î eya cergim ji dildara tu peyġamim
Çi peyġam bî te da îro ez im meqtûl ji cananim

Sebahu'l-xeyri cananê ji ihsanê were camê
Ji çeşmê mest werîn badê ji nava 'enber û nûrê

Du zulfê 'enberîn berde subihgahan were weş ke
Biya wer ba ji ihsanî şeb û rûzan ji 'enber ke

Eya rindî bixûn medhê ji derdê şahî 'enber ke
Ji nû bîne eya saqî du tayê çenbera zer ke

Sebahu'l-xeyri ya saqî ji nav yaran tu yî pur weş
Subihgahan li min weş ke du tayê çenbera pur weş

Reşî hate ji enwaran şebîhê şeb bi zulmet reş
Ji mujganê siyeh çeşman werîn ezfer ji birhê reş

Sebahu'l-xeyri Hewramî ji rûzana were meş'el
Bi xeml û reng werîn yarim şebîhê findê pur meş'el

Ji rûyê xûbiya bade çi şêrîn e wekî meş'el
Ji husna duxtera pur geş bide bade wekî meş'el

Sebahu'l-xeyri cananim bi deng û med[h] ġezelxwan im
Biyendaz minneta yar û şebîhê rûh ew e canim

‘Ezazîlî nebir secde çi kî ruxsar nedîd canim
Ji butxanê me kir terraş li min mescid tu yî canim

Ji dêra can me kir secde ji bo Şîrîn wekî Leyla
Ji Leyla ra me bir secde çi Mecnûn im li bo Leyla

Li min Leyla ew e Mûsa yedê beyza perî taceş
Gelek sehhar birin secde ji bo Leyla li ber taceş

Ji tac û çenbera duxter me dî mîmek med û rîyeş
Neşovê wî xuya cem se yekî dalî qewî zerkeş

Sebahu’l-xeyri ya saqî du reş birhan çu qewseynan
Birêj bade ji çem eswed were baġan eya canan

‘Aşiqê Şîwe’ê Nazik

‘Aşiqê şîwe’ê nazik û şahan im
Badexorê Cemşîd û Tirkan im

Te‘alellah ji yarê çi şi‘r-dan im
Bendeê Cemşîd û Şehê Kurdan im

Pîşe û sun‘ im badexorê yaran im
Bilbilê leyl û şehê Hewraman im

Zuhdixor im ez lutfê şahan im
Serxweş û rindê dildaran im

Belakeşê şîwe’ê zulfê mehbûban im
Xencerxorê Şîrîn û Leylan im

Menbe‘ê sihr û ġezel ez lutfê canan im
Sidqe’ê zulfê ‘ezrû we Hewraman im

Zabitê ‘işqê şeh û yaran im
Cegerxûn û ez dil buryan im

Suhbetxorê yar û canan im
Ateşxorê jehrê hicran im

Ta key bibexş ey şehê xûban im
Zulfên ‘ebîr ey şehinşahan im

Surperî û Belqîsê zemanan
Sed kezî û sultan û di xûban

‘Aşiqê zulfê şêrîn û Hewraman im
Dil bendê gireh û zulfê perîşan im

Sidqe'ê bûyê 'ezrû û Leylaxan im
Kemerbeste'ê dildar û mehbûban im

Şeb ta bi seher can hel û efġan im
Lew ta bi seher mest û perîşan im

Dil butkede û meyxor û **Se'd**ê an im
Dil tûrê tecellî me ji zulfê xan im

Şêrîn di weşa bade' û şîşan im
Her mestê xerabatê canan im

Me ji dil bûye kerî ez hicranim
Firqetkeşê Şehê Hewraman im

Bela gerde' û sifetê mestan im
Zahir me mebîn çu mecnûnan im

Der dest digirim qedeh û fincanim
Ellah Ellah mestê ezelê subhan im

Te'alellah di dilim zulfê yaranim
Bende'ê 'ezrû û Şahê Hewraman im

Butxan e dil û ji ser ta bi qedem dîwan im
Dîwanê ezel tekyegehê mestan im

Dîwan û firîn ji dildaran im
Lew digerim Hewrem û Leylanim

Ey Şahid û Cemşîd

Ey şahid û Cemşîdê zemanan
Veke esrim ji kemendar du zulfan

Bes û neke li min xar û firaqan
Sultanê hubb mehbûbê dil û can

Mehbûb l'me tu yî 'ezrû leylanan
Şahim bike şahî ji esîran

Şirîn çi yara ku hebin an
Meqtûl ji firaq rindê **Se'îdan**

Tîr derd hewayê kî ez im xer û xaban
Perwaz li me ev şahidê 'Ednan

Ey şahidê Xurmal çi 'ezîman
Cuz 'ilmê Xudan dehr 'ezm di şahan

Sefder 'ezîm şahî dil û can
Şehbazê şehan bî cay û mekanan

Rindan subûhî teşne leb in an
Yarim ji zulab xaqan di zulfan

Tayek ji 'ebîr şe ke di şahan
Mujgan xîme zenan ber balayê di çeşman

Ey şahidê qudsî veke bendê ji esîran
Derdê li me canan bûyê du zulfan

Min Dî Li Selwa Hate Xwar

Min dî li selwa hate xwar zulfên siyah ‘enber feşan
Dilber ji rengê mahê nû herdu lefa zer-av feşan

Wer dilber û çîn ke lefan can bî ‘elîl ji hicrê ewan
Co co rewan alam rijan lew da’ima dil bû fiġan

Alam di dil bûn ah û nal wê ġemrevîn tîr dan sihan
Şeb ta seher nalan dikîn dêm ‘enberê bûbû nihan

Ev dilbera ġem jê revîn Tirkê kişand j’birhê keman
Kember girê da yari ma toq ġebġebê ‘enber feşan

Îlan li bejnê bûn fitil ez kuştiyê birhê keman
‘Aşiq dixwe xûna ceger çehre zer e alam dilan

Derwêş ji ‘işqê çehre zer rû esmerê em can nihan
Şubhê hilala şekkişek her bû ruyim da’im nihan

Îro şirîn birme sema guft û digo şi‘ra bixwan
J’subhê Elest peyman kişan tu bo **Se‘îd** l’meyxaneyan

Vî zahidî cergim heland j’xod xod nebî carek nihan
Tamat mego rindê Husam da’im here butxaneyan

Rindê şirîn û ‘ezrû im hêvî nekin ‘ehd û eman
Saqî bide bade b’nemek yekcar bibîn bê ‘eql û dan

Mihrabê ma birhê şirîn minber j’me re ber lef ewan
Ke‘be û Hecer Leyla şepal Beytu’l-qudus rûyê ewan

Xana Şirîn min dî ‘ezîz hacet niye bim haciyan
Bendê dil im meyxane yim der butkedê wek gogeran

Goya şirîn ew Ke‘be ye xulda berîn zulfê şehan
Miska Xeten ew surşirîn wer ‘ezrewî ba serxweşan

Billah li goya meyfiroş lê dî me jî bade w eman
Butxan e dil ji weqtê Elest ev bû nesîb em bûn sihan

Ew surperî lew xemmilî her kemmilî weqtê seher
Der bendê wî ez bûm ‘elîl lew bêhiş im şeb ta seher

Dîsa Li Min Wer Bû Evîn

Dîsa li min wer bû evîn em sohtiyê zulfê reş în
Zulf û perra ey ba hilîn em kuştiyê dêmê zer în

Bayê nesîm lez ke w revîn biskê ji ser dêmê hilîn
Şem'a dilî bûye xurîn sohtî dil în em hori'în

Werdê weşê xal Hebeşê xwezya li burca ew şirîn
Derkev ji burcê ya şehê em kuştiyê behra evîn

Lillah ji hicra kakulê cerg û dilim bûne enîn
Xûn hate dil çun rûyê Zîn em 'aşiqê rûyê şirîn

Maza teqûlî ey şirîn derdê li min dêmê zerîn
Fî hubbikum ma te'murîn[127] ey can were halim bibîn

Can ber leb e ey surşirîn carek were biskê hilîn
Yaqût û mercan em bibîn der ġebġeba gerden şirîn

Vê ġebġebê dîwan digirt der bezma zulfa şehnişîn
Vî bilbilî lê qal weşîn xwezya li burca hori'în

Vê ġebġebê girtî xunav biska li nav şekker-gerîn
Vê hicretê dil kir kerî em mewc didin j'behra evîn

Îro ji 'işqa ġebġebê mecrûh e dil ey şehnişîn
Bo min werîn cur'ek ji nav rûhim tu yî ey nûri 'în

Ev padişahê horiyan ferman dide ber hori'în
Lew saqiyan saġer geran mutrib bide l'saza evîn

Dil da'ima bû nalenal der 'işqê yara surşirîn
Bûya lefan lê bûne xal dil bûye xûn j'mewcê evîn

Der mewcê 'işqa dîn û zîn nakit wefa ev **Seyfedîn**
Der de'weya 'işq û evîn nakîn derew ey munkirîn

Merheba Ya Şahidê Ebrû Keman

Merheba ya şahidê ebrû keman ya ‘er‘erê bazo ji ‘ac
Ya gulşena baġê Cizîr ya enwera meş‘el sirac

Ya hatifê ridwanê ġeyb ya le‘lê şekker ew mizac
Ya Tirk û rimbazê ‘Ereb ya dilbera nûr û sirac

Ya bilbilê baġê Irem ya hudhudê minqar zucac
Hellil ‘uqûden teşte‘il dîsa werîn nûr û sirac

Sed merheba Tirka **Se‘îd** bavêj niqab j’rûyê zucac
Qulfê veke da bibte bac em kuştiyê cama zucac

Vê dilberê da min evîn bazû ji qarûr û zucac
‘Enber selam Şahê Husam şeb tarî ye kanê sirac

Leb badeyê tuġra zerî kengî bidî bûyê ‘ecac
Goya te ye Ke‘be û necah dil daye min kanê ‘ilac

Ya hatifê ġeybesti în ya gulşena subh û xerac
J’le‘lê zucac her tê mizac Mensûr ez im belkî Helac

Ya turreya zerkeş çiraġ tîr dane min şubhê Helac
Sed Rustem û Efrasiyab kuştin ewan nadin ‘ilac

Sed merheba ey şehsiwar kir şefqetî kanê rewac
Keyber gihandin rast û çep em sohtiyê baġê sirac

Ya bilbilê *sedru’l-hebîb*[128] ya kewkeba şemsa bi rac
Reyhan û sunbul da xerac subhan ji kasa mey zucac

Ev dilbera sîmîni saq rûh û rewan her bo te tac
Canê min î nûra min î ez goriya zendê ji ‘ac

Vi Bayî Ra Bi Her Ah În

Vi[129] bayî ra bi her ah în ji Barî ra ġezelxwan în
Hebîba ġemrevîn bînin bi perwaza çi şahîn în

Çi şehbaz [î]n li gulzaran bi awazê ney û saz în
Wekû bilbil bi efġan în sehergahan bila hoş în

Ji hoş û muntezim çûme li gulzarê şehê şah în
Çi xweş şah e **Se'îd**ê ma bi perwaza bi rûhan în

Li baġê wehdeta mutleq bi awaza çi xweş zanîn
Were saqî ji xumxanê birîz badê ji leb noşîn

Ku dêra ew bibînim ez ji emrê *kun* xeberdar în
Sucûdê ma ji yarê ra di babê Lestê rûhan în

Tera fi'l-mehwi menzûr în di babê suhb û dîwan în
Li dîwanê ġelet nabîn di behsa zulfê dildar în

Ji behsa zulf û gîsuwan li dîwanê 'eceb goyîn
Gelo dîwan xeberdar e ji behsa rindê meynoşîn

Ji behsa zulf xeberbêj în li dîwana şehê xo yîn
Çi behsa me ji Cemşîdî himem mekir û cebel koh în

... goyîn di vê behsê di bezma rindê medhûş în
Te'eşşuq kin eya 'aşiq li husna şahê şahîn în

Çira bednam dikin îro hemî teqdîr ji subhanî
Wekû Heyder bibit dafi' nebî teġyir ji subhanî

Şahidê Baġê Risalet Medenî

Şahidê baġê risalet Medenî
Serwi qed şahidê qudsî Medenî

Bilbilê baġê heqîqet Medenî
Tûtî xûde şeker her Medenî

Me'denê sidq û sefa her Medenî
Şahidê 'aşiq û rindan Medenî

Menbe'ê hubbê Xudê her Medenî
Çeşme'ê hilm û belaġet Medenî

Serwi qed dêmê qemer an Medenî
'Er'erê şahê sexawet Medenî

Mehremê sirra Xudê her Medenî
Perde û setrê hed her Medenî

'Aşiqê sûxte dil în ya Medenî
Lutfê kin b'hilm û kerem ya Medenî

'Aşiqan ra tu yî derd Medenî
Derdê min baġê wisalet Medenî

Qedrê weslê cemalet Medenî
B'çeşmê ahû bike rehmê Medenî

Derdê **Se'dî** eve yara Medenî
Qedehên baġê wisalet Medenî

Destê lewwam[130]
Destê lewwam bişikest der min û to

Bê Tu Ey Leb Şekker î

Bê tu ey leb şekker î ya beşer î her di kenişt
Neqşê elmas î bibê ya beşer î horî sirişt

Rû û zulfa xemmilî ew ji şerab û ji noşit
... ji du ‘alem ‘eql û hoş nehişt

Ser û malî didirim her du sal û bi du qişt
Sûndê ‘aşiq kemer û zergul e ew du nivişt

Ke‘be û Beytu’l-qudus herdu tewaf in te nehişt
Bê tu ya leb şekker î ya teber î ey serê qişt

... genc leban her te me da horî sirişt
Şîr û tîran didihî j’zulfik û xala bi du qişt

Sirr û taqet min nema canê dila her bi nivişt
Ba vebir her seherê netrik û rîşê bi dirişt

‘Elilandim di firaq û di hicûdê
Ev e min qible w mescid û qiyam û di sucûdê

‘Işqa Te Meger

‘Işqa te meger hûr hûr j’me ra hat
Zîber ji firaqê mû mû j’me ra hat

Nêrgiz bi *sebîkî*[131] mehbûb j’me ra hat
Cergim ji şewatî melfûf j’me ra hat

Ev qelbê çu lale menzil j’me ra hat
Bê hoş ji fena’ê medhûş j’me ra hat

Menna‘ ji huwiyyet munkir j’me ra hat
Heyhat dilê efrûz te‘ne j’me ra hat

Ev felek û debîrim serxweş j’me ra hat
Haşa di hewayê bel medh j’me ra hat

Mutrib çi surûr e mexfî j’me ra hat
Saqî ji şerabê saġer j’me ra hat

Ellah di fena’ê mehbûb j’me ra hat
Wasil ji hebîban da’im j’me ra hat

Der şer‘ê qedîmî me‘şûq j’me ra hat
Mehbûb bi gulabê ehsen j’me ra hat

Her cane hebîb bêt meġmûm j’me ra hat
Bê saġer û derdê hurmet j’me ra hat

Her ca ku hebîb bê Firdews j’me ra hat
Xelwet bi hebîbê ni‘met j’me ra hat

Harût bi me ra bêt sekret j'me ra hat
Saqî li kuca bêt Kewser j'me ra hat

Horî û hebîbê şerbet j'me ra hat
Çengîz ji 'eceb bê Leyla j'me ra hat

Der wesfê hebîban i'caz j'me ra tê
Neqşê me **Se'îdan** dîwan j'me ra tê

Ev Peykê Qeza'ê

Ev peykê qeza'ê bi teġaful j'me ra tê
Şahînê qeza'ê bi ġerîbî j'me ra tê

Ya rebb ji çi rû û leb di sena'ê j'me ra tê
Ev şem'ê dil-efrûz hûr hûr j'me ra tê

Mû mû ji firaqê dil sûz j'me ra tê
Xûn bar û rewan in her j'me ra tê

Ev behrê hewayê leb leb j'me ra tê
Cana ji cemalê çi 'ecîb e j'te ra tê

'Işqa te meger hûr hûr j'me ra tê
Mir'at ji firaqê bêhoş j'me ra tê

Leb teşne guzeştîm ber çeşmê heyatê
Manendê **Se'îd** îm meşhed j'me ra tê

Harût bi me ra bê teqdîr j'Xuda tê
Merheb ji belaya bo min j'qeza tê

Ya nûrê dilê efrûz nêrgiz d'xera tê
Şimşad ji hewayê nazir j'te ra tê

Sosin ji qezîbê serkeş j'te ra tê
Sunbul bi du alî mexmûr j'te ra tê

Dil bendê du zulfan der qendê fena tê
Em 'aşiq û me'şûq wasil j'xwe ra tê

‘Aşiq di fena wasil b’tu ra tê
Der ‘eynê beqa wasil b’tu ra tê

Yek wahid e ew hew mehbûb j’me ra tê
Wahid ji ezel bû baqî di beqa tê

‘Eliyy di wisalê ya sedġê hebîbî
... ...

Selwa Ciwan Da Min Şerab

Selwa ciwan da min şerab mehbûb bi husnê bûn bela
Minnet ku îro dêm durê da min meya zulfa mila

Îro reqîb dil kir kerî ketme zemîna Kerbela
Em teşne în j'hicra şepal abê heyat zulfa mila

... heqîqet bû mecaz lew dil kete çaha bela
Ey saqî xweş ke w bilez em teşne în der Kerbela

Wê surşirîn da min evîn lew da'ima cergim hela
Hellac li ber darê **Se'îd** teşbîhê ma der Kerbela

Teşbîhê Mensûr her me got remza *Enelheqq* der dila
Zulfê but û rû esmeran seh dane wan der Kerbela

'Aşiqê çeşman bûne em derdê li min 'ezrû hela
Şîrîn ve Hewrem kas didan derdê li min zulfê bela

Ev şahidê qudsî libas bişkoj ji bend û lu'lu'a
Zulfa herîr bo min weşand weqtê subihgaha bela

Talib li yaran bûne em meczûb ji yaran her hela
Tîrê di wan co co rija xûna qemer j'cerg û dila

Derd û bela bikşîn hebîb her bo ji yara pur bela
Lu'lu' ji benda dilberan teşbîhê kewkeb her l'mila

Ev lûliya şengol û rind guft û digot bikşîn bela
Sebrê berî şêrîn bixwan peymankeşî j'weqtê bela

Îro şirîn da min reqis der reqsê wê guftim hela
Ho ho me go der bezmê da der 'işqê yar ketme bela

Dama tu gêrî badexwar teyrê humayûn dam hela
Dama li 'enqa badexwar canê me bî derd û bela

Tirka ji Xurmal esmer e ser ser perr e bi nesl û perr e
Qewsê hilalan bar kire duşmin 'Elî pişt û perr e

Sebahu'l-Xeyri Go Se'dî

Sebahu'l-xeyri go **Se'dî** were xanê di camê da
Niye halim ji hicrê to bike rehmê di salê da

Ji rûyê esmerê rêke 'ebîr û 'enber û ezfer [da]
Du zulfê xwe bide ber ba bila bînit di camê da

Sebahu'l-xeyri cananim ez ê dînim ji 'işqê to
Were xanim ji ihsanê ez ê çûme ji şewqê to

Çi nazik teb'ê paşa ye du biskê xwe bide renge
Du zulfê 'enberî şeh ke kulaha zerkeşî keç ke

Kulaha seltenet pur ke ji wê rîz ke mey û benge
Ji ruxsarî tu her rêke şeraba erġuwan renge

Sebahu'l-xeyri ya xanim meyê noşim ji zulfê to
Bibe ġoşim bi yekcarî kerîm û muhsin î her to

Ji ihsanî bide zulfê were saqî bike rehmê
Bide nûrê ji zer tacê biteysîne evê camê

Bike beyza yedê 'aşiq şepala min tu pur rehm î
Heya bînahiya **Se'dî** birêj xemrê ji wê camê

Sebahu'l-xeyri ya xanim şerab noşim ji rûyê to
Were saqî ji teb'ê xwe bibim medhûş ji 'işqê to

Bibûsîn le'lê pur ġunçe vexwim îro meyê rûyet
Çu yek sal e di hicrê da dileş nar e ji ew hicret

Dileş dûd e ji hicranê ġezelxwan e ji bo rûyet
Medih girtim we durr suftim li ber zulfa herîr teb'et

Sebahu'l-xeyri ya xanim Mesîha yî ji bo 'aşiq
Bide dîdar di camê da dizanim tu pur î fa'iq

Bi te geştim çu girdabê qemer hate li mîzanê
Ji bo ġemz û işaratan *fehuwwel*[132] haletê canê

Ji vî halê segî berde ‘utarid hat li mîzanê
Dilim xûn e ji hicranê bike lutfê eya xanê

Sebahu’l-xeyri ya xanim bike kasê serê zulfê
Ji wê biskê xumar bîme esîr bûme ji wê zulfê

Ji zulfa ‘enberî perde girah û çenbera li ba ke
Di gulzara çemen dane bide bayî ji şewqa ke

Ji şewqa ebruwan rê ke Xeten miskê me pê şa ke
Du çeşmê nergisî rake ji wan ġemzan belav rake

Sebahu’l-xeyri ya xanim tu yî mûnis l’xeyala min
Ji mehbûban tu yî bo min bibe hemrah li cama min

Perî xûyê ferişt rûyê te sohtim ez wekî findê
Ji nav mesta te ez xwandim ji meczûban te dam findê

Ji mehbûban tu pur xûb î ji zîbayan tu pur rind î
Çelenga nazika şehla tu yî ġemra li vî bendî

Sebahu’l-xeyri ya xanim di ‘işqê da birîndar im
Şeb û rojan bi efġan im di ‘işqê da birîndar im

Meke qetlê di firqê da xweyî rehm î di ‘işqê da
Ji ‘işqa van perî rûyan ġezelxwan im di ‘işqê da

Ji mihra to bi efġan im çi mecnûn im di şewqê da
Ji nav Buhtan ez im riswa çi sultan im di şewqê da

Sebahu’l-xeyri ya xanim were îro bi efġan în
Ji mihra şahê Hewraman wekî bilbil bi efġan în

Vê Muhbetê Dil Hûr Dikir

Vê muhbetê dil hûr dikir vê dilberê ser da dilî
Heyhati ‘aşiq em hebîn bê dilbera baġê dilî

Îro dilî têtin ‘ecîb dil geşteya husna hebîb
Xumxane bû qismet nesîb yara şirîn nûra dilî

Sohtî dil î ey **Seyfedîn** der şewq û ‘işqa hori‘în
‘Işqê kirîn jar û hezîn ey can were dîsa şirîn

Bedr û hilal bûbû xefî ‘alem biye ber min xevî
Perdê bibe ey surşirîn zulfik ji xalan bin çevî

Nûra rûya ‘*eyne’l-yeqîn* xala ji miskê reş weşîn
Lê ke ji nû nûra evîn kakul reşa wer ke çevî

Ey can were halim bibîn dil bû belav j’hicra şirîn
Zulfê vemal ber sethê ‘eyn da ez bibim mecnûn û dîn

Mecnûn ez im Leyla nebî saqî werîn zulf û gulî
Ser me ji taca her weşîn pîrê muġan her bû celî

Pîrê muġan bû şêxê min ‘alem bibin duşmin li min
Dilber biye dost jî li min narê evîn her bû celî

Fewrek ji ‘işqê mewc didin behr û sir in ji ‘işq û mîn
Qulzem ji ‘işqê her em în murşid di ‘işqê wer bibîn

Bade rijand kasa meyê ev saqiyê roja Belê
Remz û sirran bo min dibê hetta ebed j’weqtê Belê

Ji roja Belê muhbetxur în rûz û şeban mihnetkeş în
Ser ta qedem em ateş în mey daye min ji roja Belê

Ev dilbera gerden bilûr mey rihtiye j'cama bilûr
Çîn çîn kirin zulfê di hûr biska ji ser dêmê bi pûr

Zulfa Şirîna Farisî mû mû belav ber cebhetê
Ya rebb 'eceb j'vê qametê hûr kir ceger der hicretê

Hicra ji yaran ateş e firqet ji husna weslet e
Husna hebîb xweş tel'et e xwezya li roja wesletê

Husna hebîb û saqiyan rihtin dilî cama bilûr
Perwan li wan **Se'dî** surûr gîso li ser werdê di cûr

Horî ji burcê derkete 'aşiq ji şewqê sekret e
Hat û digo xweş şerbet e husna hebîba muhbet e

Dê bêt zerî wek muşterî lê ez tenê her muşterî
Ġebġeb ji toqa munteha baġê e' lê her muhbet e

Vê ġebġebê lê zulfê hûr çûm hezretê b'işq û surûr
Xalê li van çendî di cûr wehdet ji baġan pur surûr

Husna Şirîna Farisî birye temîz ji vî 'aşiqî
Hazir revand hoş û finûn xweş tûti ye ew namiqî

Ev şahibaz hat û digot meş'el rijand dil bû guzar
Van gaz û remzê kakulan guft û digot ba 'aşiqî

Innî sukarun hatifun min şewqikum hel min mezîd[133]
Rûhî fidakum nûri 'eyn ey can bigo *maza terîd*[134]

Di Gulzaran Hebîb Dîtim

Di gulzaran hebîb dîtim kulah û tac û mercan e
Siyeh zulfan çi xweşxan e şebîhê bilbil û can e

Dibê remzan li gulzaran bi dengê saz û mercanan
‘Ecîb îro ji yaran e nigar û neqşê zulfan e

Senem dîtim bi vî rengî zeban şekker şepal rengî
Çu şimşadê xeram hatî ketim reqsê bi hezar rengî

Çi tawus bû li vî baġî wekû Yûsif bi zîba’î
Qeseb poş î gulî sor î te sotan dil bi re‘na’î

Bi re‘na çeşmê mestane te kuşt ‘aşiq bi remzane
Ji min rakir bi yekcarî ‘ulûmê dîn bi şekerxanî

Şukur bînim şeker le‘lê revand hoşî bi sihrbazî
Hemî hoşim bi rimbazî girift carek bi şehbazî

Di ġeflet da bi ser hatî bi şîr û şeşper û tîran
Meger Kerrar tu te‘lîm da finûnê herbê êsîran

Bi rimbazî cihandar î bi awazê ney û sazê
Te kuşt ‘aşiq bi ‘işqbazî dikî fethê bi wan tîran

Sebahu’l-xeyri ya Hewramî bi ber şêran şerefdar î
Emîrê ‘işqê Hewramî tu me‘lûm î bi şerefdarî

‘Ecîba min ji Sînayê Felatûn im li xumxanê
Zehîrê xûb were banî kî kilkê ma ġezelxwan î

Te‘eşşuq kin eya ‘aşiq kî xwahî qurbê rehmanî
Kî ber şêran şerefdar in segî dergahê ‘Usmanî

Biya saqî bi nûrê ‘işq veke îro bi nûrê ‘işq
Heqîq ez bûm li baġê ‘işq tu yî mehbûb li baġê ‘işq

‘Ezîza Min Çi Fermayî

‘Ezîza min çi fermayî li fermayê kemerdar în
Kemerdar im li ber canan di ‘işqê da birîndar în

Birîndarê di birha me me can daye ji hicrane
Esîrê hicrê zulfa me *huwe’l-meşhûd fî ed-darîn*

Ne mewhûm û ne me‘dûm e ne mewlûd û ne me‘dûd e
Ne *la eyn* e *we la ‘eyn* e belê wahid çi me‘bûd e

Ne terkîb û ne tewlîd e ne isneyn û ne mecmû‘ e
Ne miqyas û ne meşġûl e belê meşhûd û mehbûb e

Ne mexlûq û ne e‘raz e belê baqî û yek zat e
Huwe’l-meqsûd û metlûb e *huwe’l-baqî* bi burhan e

Se‘îdê ma tu i‘caz ke ji wesfê şahê şahan e
Rumûzê ‘işq û meyxane mego îro ji newban e

Îro Ji Husna Surşirîn

Îro ji husna surşirîn dîsa li min nû bû evîn
'Işqa Şirîna Farisî em xweş kirîn dînê Şirîn

Ber cebhetê lê bûne xal nûra sewad lê bûne mal
Dil sohtiyê 'işq û cemal *fî hubbikum ma te'murîn*

Guft û biro ey **Seyfedîn** seyrê nekin der nûri 'în
Dîsa here ba surşirîn lew murşid e *heqqe'l-yeqîn*

Îro ji dengê hatifî badê dixwin j'vî saġerî
Saqî li ser destan geran nûra tecella saġerî

Saġer mudam pur bade bî lala dilî wek saġerî
Saqî bi çeng û erġenûn gêran tecella saġerî

Min dî li baġê meyxuran medhûş li wê **Se'dê** ciwan
'Işqa şepal çendî ġedar dil kuştiyê Leyla ciwan

Zulfa cebîna enwerî lê hatiye nûra sewad
Xettê muselsel herdu sad *yaqûtuha 'eyne'l-midad*

Tac û lefan bû çîne çîn dil sohtiyê zulfa sewad
Ew şerbeta *Qalûbela* 'aşiq vexwar nûra sewad

Sed bar selam ya Mustefa ber qameta xal û xeta
Gorî bibim zulfa du ta subhan ji qedd û qameta

Dîsa qiyamet rakire zulfa siyaha cebhete
Ey ba seba lê de w bibe da bêt şehê pur muhbete

Bê nûr û qedd û qametê seyrê sulûk tê zehmet e
Badê bixo j'vê cebhete rastî bibe her weslet e

Gorî bibim ya mucteba mexmûr kirim çeşmên siya
Em dûr kirin ji rû û riya *rûhî fidake murteza*[135]

Bes ʻAşiqî Mehcûr Bike

Bes ʻaşiqî mehcûr bike xana firaq rencûr bike
Dêw û reqîb wer kor bike vî ʻaşiqî rencûr neke

Ya saqiyo badê bide mehrem sera wer sor bike
Tayê lefan mexmûr bike vî ʻaşiqî medhûş bike

Hat padişahê pur siyah xana firaq dê kor bike
Gorî bibim wer meyze ke dil ʻenber û ava bike

Insaf ji yaran her tinê ʻaşiq ketin vê muhbetê
Zulmet kete vê firqetê em bilbilê vê sekretê

Tîran ji xalan her nede badê bi naehlan nede
Werdan bi xemxwaran bide xaran j'gulzaran nede

Xemrê ji xemmaran nede werdan bi dil sadan nede
Hicrê bi mexmûran nede bûyê bi ġemmazan nede

Mihrê bi na-ehlan nede şemʻê bi xeffaşan nede
Saġer ji bê xemran nede dîsa were hicran nede

Insaf ji yaran her tinê ʻaşiq ketin vê muhbetê
Hicret li nîva dil kete em bilbilê rûyê butê

Mahê ji nû derxe were şemsê ji xawer metleʻ e
Hezret bi yaran muhbet e îna Sikender metleʻ e

Şemʻa dilan bûbû nihan **Seʻdî** ji hicrê metleʻ e
Leyla ji xeymê derkete kewkeb ji burcê metleʻ e

Herdem li min her hezret e *nisfu'l-nehar* bû metleʻ e
Qudret ji şahê muhbet e insaf ji wî bû metleʻ e

Insaf ji yaran her tinê ʻaşiq ketin vê muhbetê
Zehmet li ma her hicret e em bilbilê rûyê butê

Bê Cemalî Ji Piyalê Çi Ġerez

Bê cemalî ji piyalê çi ġerez
Me ji gerdûnê delalî çi ġerez

Me ji tûrê me ji nûrê çi ġerez
Me ji zulfa ne di hûr bî çi ġerez

Ne ġerez wesl û cemalî çi ġerez
Me nebit ateşê dilsoj çi ġerez

Em ji ‘işqê nebrîn ber her çi ġerez
Dilbera can ne gudaz bî çi ġerez

Ger qisaret nekrîn em çi ġerez
Eşkê xûnbari bibarî çi ġerez

Zulf û gîsoyê şepalî me ġerez
Me çi xûban tu şepal î me ġerez

Me ji şahan ne wisal bî çi ġerez
Her ġerez wesl e delalê çi ġerez

‘Işqê iksîrê wicûdim me ġerez
Meh [û] xawer ne xusûf bin çi ġerez

Ku ġerez **Se‘dî** tu yî her çi ġerez
Cilwe elhazê şepalê çi ġerez

Ger nedî keşf û şuhûdê çi ġerez
Zerî û dêm perî ev me ġerez

Ġerîq im ez ji firaq û ji hicûdê
Senema leb şeker û ‘işwe şihûdê

Dilê Mehpare'ê Hewrem

Dilê mehpare'ê Hewrem ku l'min derd e li min sîne
Dilê xûnbar rewan hatî çi xweş qaf e li min sîne

Se'îd rind e birîndar e ji derdê şoxê ev sîne
Wekû saqî bi xêr bêtin dikit meş'el dil û sîne

Hebîba Hewreman bêtin fidadar im dil û sîne
Li ser çeşman vemalînim ni'al û mehsik û sîne

Li ser çeşman ku balînim rumûz û zulfik û sîne
Ezê xwahim ji Şirînê rumûzê hikmetê sîne

Ji firqa şahê xûban e dikalînim dil û sîne
Birîndarê perî rûyê nekî şerhe dil û sîne

Li kû şerhê bikit nû kim firaqa yara vî sîne
Sehî qeddê li min winda tu kutahek dil û sîne

Şewişîm ez ji firaq û ji hicûdê
Eve min qible û mescid di qiyam û di sucûdê

Enwera Miska Xeten

Enwera miska Xeten me tenê dît û besî
Bes ke bê feyde **Se'îda** ew j'buta her te besî

Nisbeta xal û xeta her te tenê min tu besî
Karekî rabe bike weqt e ku êvar e besî

Ya ji ser ta bi qedem 'enber û ezfer me besî
'Er'era baġê irem her ji butan min tu besî

Ev bes e xûb û şepalê tu hebîb î tu bes î
Belkî nisbet Qureşî[136] şahê buta her tu bes î

Ew ji nisbet Qureşî me tenê ew jê besî
Nisbeta Qurş û 'Elî ev me tenê her me besî

Xalê durrdanê şepalê ku ji kafûrê besî
Cebhet û dêm û enî ev me tenê her me besî

Şewişîm ez ji firaq û ji hicûdê
Qibleta ehlê dilan ew di qiyam û di sucûdê

Dilo Her Seyrê Dildarê

Dilo her seyrê dildarê li baġê wehdeta mutleq
Bixor badê ji wê yarê seraser wehdete mutleq

Li wî baġî dikîn seyran bide mutrib def û sazan
Ji şurbê mey ceger borî **Se'îd** mest e ji dildaran

Sebahu'l-xeyri Hewramî were îro emê xamî
Ji hicrê yar dikim nalan birîz bade li min xamî

Sebahu'l-xeyri ya saqî ji bo Barî bide baqî
Du zulfê 'enberî dane li baġ û beġçeya baqî

Binoş bade ji meyxanê tu serxoşan ji butxanê
Ku şehkasa ku qerqef tê sebahu'l-xeyri ya xanê

Li derdê min ev e cilwe bikit saqî ji rûyê xwe
Du zulfê şêrîn û 'ezrû ev e derman li derdê me

Te'alellah ji feryadî didit fetwa ji dildarî
Çi dildarek qewî şox e dikit nazan ji dildarî

Bi noşa noş dikim awaz ku berqê 'işq e pur awaz
Ji awazê 'ezîzê ma kete reqqasiyê şehbaz

Sebahu'l-xeyri cananê li fermayê kemerbest im
Bike ferman li wê seryê bide xencer ez im bestim

Bide xencer ji zulfê xwe ez im meqtûl ji 'işqê to
Du çeşmê ahuyê mekhûl kirim medhûş ji 'işqê to

Qerar kû bî ji hicranê sebir kû ma ji ber xûnê
Sebirdar e di dest kamî ceger xûn e ji ber xûnê

Sebahu'l-xeyri ya şêrîn du zulfê xwe bike çîn çîn
Zebad û 'enberê lê ke li zulfa esmera pur çîn

Li kû mutrib bidî sazê bibûsim ya bidim awaz
Ji awaza ku bê saqî bikî kasê rûyê pur naz

Li kû saqî bidit baqî bibit kaskê wekû nûrê
Ji şehkasa mudam bade dilim tûr e ji pur nûrê

Sebahu'l-xeyri ya xanim biçîn beġça bi noşa noş
Bixemlîne rû û zulfan bi nesrînan bibîn serxoş

Min Dî Di Yaran Yarê Ma

Min dî di yaran yarê ma zulfa du ta biska girah
Avêt niqab bayê nesîm da dest min û turra girah

Hat padişahê pur supah bazû ji ‘ac qamet elîf
Misrî ku dî rûyê di wî ten xeste bî dil bî ze‘îf

Hat dilbera ebrû keman tîr dane min j’tayê ‘isab
Çitfe weşand ji misk û gulab derdê li min zulfa gulab

Ellah ji nû dîtim di yar heybet me girt j’rûyê temam
Dêm bî gulî bû ‘enberî belkî hebî bedra temam

Min dî li bedrê katibî lê kir nuqet j’xal ‘enberî
Mîm ha û mîmeyn ya **Se‘îd** dalek muqewwes zerkeşî

Min dî li rûyê vî şehî bazî kirin şems û qemer
Mey rihte dil j’subhê Elest ez bendê wî bo me bider[137]

Wer saqiyo j’burca sedef bo min bide cama sedef
Bê şahid û bê saz û def zanim ‘umir dê bî telef

Îro şirîn da min evîn bazû sedef qamet semîn
Dil bû hezîn j’hicra şirîn ez kuştiyê cama zerîn

Ta ta li min kirne belav rû bî xunav şebnem li nav
Her subh û şam dil bû belav derdê dilî rûyê xunav

Zulfê but û şekker leban meqtûl ji wan her ‘aşiq in
Ger sîm ber û şor kember û bînin li ber em ‘aşiq in

Ev saqiyê sîmîni saq mey daye min j'rûyê beraq
Birhên ji qudret lamiʻ in em ʻaşiqê rûyê beraq

ʻÎd e w li ʻalem çun xweş e ʻumr û hecim ew sorgul e
Em bilbilê minqar qedîf şîn bîn ji ʻişqa sorgul e

Mihrab ji Tirka ʻezruwê mescidgeh e l'nav xelwetê
Tac û kulaha seltenet sehhar ji wê ket xelwetê

Tirk û nigara Hewremî guft û kene wek ʻendelîb
Min dî li rûyê dilberê nûr û şuʻaʻ lê bûn selîb

Tali‘ Me Bûye Meymûn

Tali‘ me bûye meymûn yarek me dî qewî şox
Toq ġebġeb û beden şor ten ceste û qewî şox

Ya rebb çi turfe yar e dil bendê wî gudaz e
Ellah bide dewayê can xeste û gudaz e

Ez bûm ‘elîl ji ‘işqê dîsa were şepalê
Derkev ji burcê rewzen canim hela delalê

Şêrîn şeker dida min zulf kirine qişt li ber min
Gerden ‘ebîqê miskê ġebġeb me dî bi dest min

Vê ‘ezruwê nihan got der suhbetê li dêrê
Dêr û kenişt hezê min bextê **Se‘îd** li dêrê

Hişyar û mest diçim ha her bo ji ‘işqa yara
‘Işqê bijand dilê min der bendê zulfê yara

Labud bixwim şerabê bezma tereb li kû hat
Helq û işrab li kû ma bextê me jî ji wî hat

Bextê me bî çi hemrah lew da’ima ez im mest
Rindê şirîn û şah im lew da’ima em în mest

Saqî dida şerabê cana were we billah
Ez dînê rûzê Lest im saqî were we billah

Yara ji gencê gerdûn ferh û fereh mexûnin
Hem mihnet û bela ye ber zulfê yar bixûnin

Îro Ji Min Nalan We Tên

Îro ji min nalan we tên her bo ji rûyê dêm durê
Dilber ji rengê sorgulê rû heykelê zanû durê

Ke'be û herem min bûne xal lew da'ima ez çûm sema
Taca di wê xurrîn ketê ez kuştiyê zulfa sema

Em çûn sema hişyar û mest but hate reqs hişyar û mest
Mest im ji wê *Qalûbela* lew da'ima ez rind û mest

Zulfê şehê bûbû kerî dil bendê wê her bû kerî
Co co ji dil xûn bû rewan canim fida bo 'ezrewî

Ez bûm 'elîl j'hicr û cefa yara neda zulfa du ta
Lê zêde dil bûbû belav *maza eqûl fî hubbiha*[138]

Ev duxtera kember zerîn zulf kirne go ebrû hilal
Der weslê yar ez bûm 'elîl *fî hubbiha* wechim hilal

Maza teqûlî ey şirîn ez kuştiyê cewra evîn
Sohtî dil în perwan sifet ey can bigo *ma te'murîn*

Ber leb bine le'lê şefaf da can bibî saf û beyaz
Meylî ileyha ya **Se'îd** weqtê Bela lew can gudaz

Ev tûtiyê remzan dibî *kuntu* digot ey mesti ma
Billah me pirs esrarê wa badê bixor dêw tûlê ma

Yedê Beyza Yedê Canan

Yedê beyza yedê canan ‘esayê wê qewî enwer
Qewî sahir birin secde ji bo qedda qewî enwer

Ji qedd û bejn û ruxsarî bixûn îro ji bêhoşî
Bixor xwaran ji hicranê here suhbet ji bêhoşî

Şeb û rûzan dixwim xûnê çuwe taqet ji bê xorden
Ke necma min çuwe ava nema tali‘ neke xorden

Ji min gewher qewî saf e ji bo cezbê gelek pak e
Eger tali‘ nedî cezbe çi kit irşad nekit pak e

Eger tûle zeġel nav bit çi seyyadê ji seydê xwe
Divêt gewher bidit lami‘ nedit îza di mehkê xwe

Di mehkê da dibit safî ewê sîmê gelek jengar
Ji mihra to me ger saf e evê neqrê gelek jengar

Eger cazib nebit duxter nedit cezbê ez û çalak
Belê cazib bibit mehbûb diçît derhal ji te idrak

Me go saqî bide baqî **Se‘îd** îro biye rindî
Me kir suhbet li ew taqê Şehê Hewrem sipî zendî

Ji wê camê dinoşim ez me dî ruxsarê wek meş‘el
Sipî zend û zeban şekker kirim mexmûr bi yek meş‘el

Ji ‘Işqa Van Perî Rûyan

Ji ‘işqa van perî rûyan me seyran kir bi lahûtî
Feterqî zumretu’l-‘uşşaqi aratî we alatî

Ji zulfa duxtera Hewrem me nasî yar di mir’atê
Ji zulfê Leylê ez bîme çu Mecnûnek b‘ibaratê

Ji meyxanê me xwar bade teqeddes yar ji nuqsanî
Te‘alellah huwe’l-baqî dinoşim mey bi nasûtî

Me yarek dî di meyxanê li tûrê ma munacat da
Munacat da bi dengê hû me dî saqî di mir’atê

Bide saqî ji rûyê xwe meyê baqî ji zulfê ew
Du zulf û kakulan ker ke me seyran kir di mir’atê

Di seyra berzexa ġeybê me dî canan di seyranê
Ji seyra zulfê Leylayê ez im sehhar b‘ibaratê

Dikim seyrê di tûrê da dibûsim rux di camê da
Huwe’l-baqî di tûrê da teheyyir hat di mir’atê

Me dî canan bi hezar rengî dikir seyran bi etrafê
Bi hezar etraf me dî yarim ‘ecîb im ez ji heyratê

Neke seyran di vî baġî neke behram di vê xanê
Ji xana ‘enkebût derkev bibîn îro tu mir’atê

Bike wek min ji sidqê xwe bibe secde ji bo şîrîn
Qedeh pur ke ji meyxanê bikiş qurbê ji feyzatê

Ne tenha ez qurab kêşan bi emrê yar dinoşim an
Tu noşa xef mexo her an ji pîrê meyfiroş ba tê

Ji çeşm û ebruwê saqî me kir seyran li ewtanî
Bi rûhanî **Se‘îd** îro dikê îro huwiyyatê

Ji Teqwîma Rûyê Leyla

Ji teqwîma rûyê Leyla tecella hat di mir'atê
Ji bada duxtera Hewrem me dî şêrîn di mir'atê

Me dî şêrîn bi vî rengî bi xal û 'enber û zulfan
Ji pergê tac rijand bade were saqî di mi'ratê

Di baġê esmeran girtim tecellayat bi vî rengî
Me dil tûr e ji bada rû binal **Se'dî** di mir'atê

Ji awazê mey û badê li ser dest e qedeh saf e
Ji 'ilmê hatifê ġeybê me girt fetwa di mir'atê

Ji emrê *kun* xeberdar în ji bada le'l ġezelxwan în
Ne tenha pêşberê şahim belê Leyla di mir'atê

Ne tenha pîşe' im bade belê bûsên çi ruxsaran
Weşîn saqî lebê le'lê ji bad û 'enberatê

Weşîn 'ariz ji xwe saqî zebad û 'enber û ezfer
Du zulfê Şirîn û Leyla bibarîne di mir'atê

Niqaba rû hilîn yara di 'işqê da ceger sohte
Di 'işqê da me kir bala tecella hat di mir'atê

Heya bînahiya **Seyfî** li derdê min bide hindî
Ji enwar û tecellata çi tûtî me b'ibaratê

Di seyra babê rûhanî biye hemrah şeh û saqî
Me kir seyran li fewqanî felek winda di mir'atê

Ji Remz û Sirrê Subhanî

Ji remz û sirrê subhanî me dî canan di mir'atê
Çi mir'at bî we Hewrem da me dî şêrîn di mir'atê

Ji ġemzê birhê Leylayê xeberdar în ji Cemşîdî
Nezer da min evî Hewrem me dî qudsî di mir'atê

Ji bada rûyê şêrînan çi tûtî me bi leb ġunçan
Ji 'eynî lutf û ikramê çi meynoş im di mir'atê

Bi goşê ebruwê saqî bi ew husna Xudê dayî
Bi zulfa Şahê Hewramî çi sermest im di mir'atê

Bi pîrê meyperest **Se'dî** çi Sîna yî li meyxanê
Bi hû hû me girt heyret çi heyret bî di mir'atê

Ji her etref me dî heyret bi bangê hû dida heyret
Ji 'eynê remz û esraran me tûrek dî di mir'atê

Ji berqê zulfê şêrînan tecella hat di camê da
Ji tîrêjê lefê şahan me dî ateş di mir'atê

Ji sirra şahê nûranî tecella hat ji vê badê
Surah û şîşe û saqî niho hatin di mir'atê

Ji meyxanê niho hatim qedeh l'dest e bi zulfê yar
Du goşê ebruwê canan digot remzek di mir'atê

Ji goşê ebruwê şêrîn dixwim bada subûhê bezm
Te'alellah ji ihsanî qedeh da min di mir'atê

Ji subha bezmê erwahan hetta axir qedeh l'deste
Te'alellah ji ihsanî me xwar bade di mir'atê

Ji 'işqa duxtera qudsî me go guftar 'ecîb qudsî
Teqeddes sed teqeddes yar ji 'eynê neqs û sûratê

Îro Ji Remza ‘Ezrewî

Îro ji remza ‘ezrewî ez bûm li baġê wehdetê
Der baġê wehdet mutleqa sergeşte im der heyretê

Wehdet ji yara wehdetê ehlê dilan jê nefretê
Lê rind e û ez bilbil im der baġê wê dîm heyretê

Carek nihan got ‘ezrewî medhê bike der wehdetê
Sergeşte bî ew tûtiyan der zulfê yara wehdetê

Ellah di ber *Qalûbela* rihte dilî j’vê şerbetê
Bada ji rûyê Hewremî ez im dam d’baġê wehdetê

Vî ‘ezrewî got *qum* Se‘îd bade bixor j’zulfa diraz
J’vê ‘enberê min bûs dikir bilbil ez im der heyretê

Dîsa were ey nûcuwan badê bide j’cama zelal
Der camê ma hat şehsiwar berda dilî xweş şerbetê

Dîsa here rûhê ‘ezîz seyrê bikin ba rûh û yar
Cilwe bikit ev ‘ezrewî der baġê lala wehdetê

Dîsa were ey qudsî yar bo min şehê yara ciwan
Îro ji cama şerbetê min dî şepal der wehdetê

Muhbet ji yaran pur xweş e şoxa şepala heybet e
Şîwe ji yaran pur weş e ‘ezrû birîn der wehdetê

Îro dixwazim ey perî badê bidî j’rûyê zerî
Zulf û du gîsuwan bin gerî çerx û gerên der wehdetê

Bazî dikîn der ‘işqibaz derdê li min ew naz û raz
Bazî bikîn der rûyê naz gul gul reşa bîn heyretê

Suhbet bi yara min divê badê bixwin j’zulfê şehê
J’vê şerbetê awaz divê bîm lal û heyret wehdetê

Der baġê yara wehdetê kû her nîne kes hoş bitê
Labud nebî ġafil ji wê lala ew e her wehdetê

Saqî bi zulf û xal û perr şerbet geran j’weqtê Elest
Yek cam giham min der ezel girtim *se yar*[139] j’wê suhbetê

Dîsa Li Min Ateş Rija

Dîsa li min ateş rija her bo ji hicr û firqetê
Firqet li min dozex dihat ker bî ceger j'vê firqetê

Vê firqetê buryand kebed saqî biyar bada semed
Saqî werîn nûr û meded dil bûye xûn j'vê firqetê

Co co ji dil xûn bû 'eqîq der firqeta şahê şefîq
Bo min ev e narê cehîm dil dozex e j'vê firqetê

Îro **Se'îd** firqet keşan çeşmê şehî nabin 'eyan
Xaka riya dilber nihan dayî li min j'vê firqetê

Xaka li ber payê şehî kîmya dibî l'derd û meyê
Mey hate dil îro şehî mihnetkeş im j'vê firqetê

Mihnetxur im der ġurbetê firqetkeş im şêrîn butê
Hicra tu kî wesla me tê çendî xweş im j'vê firqetê

Naxweşî û mihnet me dî her bo ji çeşmê eswedî
Çeşmê siyah bûne xefî dil bû hezîn j'vê firqetê

Vê firqetê ez şîn kirim rûh û rewan min ker kirim
Narê ji hicra 'ezrew im îro me dî j'vê firqetê

Firqetkeş în ya rebb şeban sohtim ji hicra Hewreman
Hewrem bi 'ezrû bûn nihan mehcûr e dil j'vê firqetê

Firqet me dî îro şepal mihnetxur im îro cuwan
Selwa cuwan rabe were 'aşiq kuje j'vê firqetê

Ya rebb nede vê firqetê der firqetê dozex me dî
Xarê firaq û hicretê çûne ceger j'vê firqetê

Vê firqetê kuştim şehî ew nûcuwan Dindil siwar
Îro kemend avête dil lew çûne dil j'vê firqetê

Dil bû kerî j'hicra zerî yara cuwan nûkir evîn
Hubb û evîna lûlîyan nayêt hisab j'vê firqetê

Van lûliyan rakir ji dil benda wisal û wesletê
Çahek me dî j'narê evîn dil sohtiye j'vê firqetê

Dil Ateş e Îro Se‘îd

Dil ateş e îro **Se‘îd** feryad ji derdê firqetê
Vê firqetê dil kir kerî feryad ji derdê firqetê

Dil bû kerî ji hicra zerî cerg û kebed wek ateşî
Ateş rija der vî dilî feryad ji derdê firqetê

Narê kelîm l’tûrê me jî der bendê zulfa esmerê
Şîşê di sor tata birê feryad ji derdê firqetê

Vê firqetê wez kor kirim yekser ji dil xûnrîz kirim
Keskî diye ateş dixwim feryad ji derdê firqetê

Narê ji hicra ‘ezrewî dil birye wê ateş berî
Buryand kebed têk sîne wê feryad ji derdê firqetê

Wer dilberê b’zulf û perrê mihnetkeş im rûz û şebê
Nalan ji min nabin berî feryad ji derdê firqetê

Nalî ji kû bêtin berî ez sohtiyê şewqa zerî
Xar û xesan da’im xorî feryad ji derdê firqetê

Mey hate dil j’weqtê Elest hetta ebed dê bîme mest
Mecnûn şebîh ez bûme mest feryad ji derdê firqetê

Çeşmê siyah kirne xefî lew da’ima dil bû çevî
Bikşîn tu mihnet her celî feryad ji derdê firqetê

Îro ji hicra rû ‘eqîq çendî dikim nalan ‘emîq
Der ‘işqê yar ez bûm ġerîq feryad ji derdê firqetê

Nageh me dî ateş li ma ageh nema rûz û şeba
Billah ji dil nalan nima feryad ji derdê firqetê

Billah ji dil ‘eyn ateş im nûrek mucerred bê leş im
Lew da’ima ez bêhiş im feryad ji derdê firqetê

Îro ji dil dozex şehî ji bo ji hicra rû mehê
Maha li xergeh xawerê feryad ji derdê firqetê

Mahên li xergeh bûn ġerîb ev bî li min resmek ‘ecîb
Can û cesed ateş hebîb feryad ji derdê firqetê

Ez qalib im rûhim ‘Elî ez ‘aşiqê vî ‘ezrewî
Nakim hezer ji dêw û reqîb feryad ji derdê firqetê

Bikşîn ji dil nalan û ah şam û seher bel gah û gah
Xûn xwar ceger j’hicra di mah feryad ji derdê firqetê

Firqet ji yaran mihnet e derdê li min her weslet e
Muhbet hebî mihnet nebî feryad ji derdê firqetê

Nezer Da Min Ji Mir'atê

Nezer da min ji mir'atê çi pur dîtim ji tecellatê
Huwe'l-meşhûdu we'l-me'bûdu fî kulli'l-huwiyyatî[140]

Sucûda min gelo yara di babê husnê rûhanî
Fehaza'l-wechu min e'lî delîlate'l-keşûfatî[141]

Me pur enwar qewî dîtin ne şubhê zulfê Leylayê
Feyzihe'l-hubbu min eşha rimuzati'l-keşûfatî[142]

Di qelbê ma me tûr dîte dida şu'le ji 'işqê ma
Dilim tûr e wekû nûr e ji ber 'işqa li kasatê

Hebîb bînim bi vî çavî ez im medhûş ji wî çavî
Wekî sekran ez im mexmûr ji ber narê di mir'atê

Ji teqwîma ruyê Leyla nezer da min li subhanî
Huwe'l-metlûbu we'l-meqsûdu fî kulli'l-'eqîdatî[143]

Ezel da min meya le'lê dinoşim mey ji ferfûrê
Huwe'l-me'bûdu we'l-mewcûdu fî kulli'l-qesîdatî[144]

Me pur dîtin ji van genca sebir xoşî tehemmul ve
Huwe'l-fe'alu la texter ji ġeyrî yarê mir'atê

Me pur dîtin ji wan qurban li der benda te şêrînê
Were bêje li van rindan bidin rûhê di sekratê

Wekî mehbûb bidit badê ez im sermest di mir'atê
Teqeddes yarê Leylayê ji 'eynê neqs û derbatê

Ceger borî di 'işqê da me dî Leyla di keşfê da
Heyîva asiman winda ji ber şu'la 'ibaratê

Di seyra rûh û rûhanî felek hatin bi rûhanî
Selam da min şehê qudsî di bezma yarê mir'atê

Du şehbaz bûn bi perwazan me kir seyran bi awazan
Me seyran kir bi lahûtan ji ber narê huwiyyatê

Sucûda min bi lahûtan di qebz û Lestê erwahan
Bi lahûtan me kir perwaz di gel qudsî bi lahûtê

Çi şêrîn bî digo 'aşiq bixwaz îro ji min meqsûd
Ji meqsûdan gelek da min kirim rindê xerabatê

Ji ber sebrê me weslet girt ji ber hilmê me ni'met girt
Kî genca ni'met û nûrê bi min bexşîd hebîbatê

Du selwa bûn li butxanê li me me'şûq di enzel da
Huwe'l-mehbûbu we'l-memdûhu fî kulli'l-muradatî[145]

Çi xweş 'işqê dinoşim ez çi reqqas im li bezma ez
*Biha fanin qulûb*ê ma[146] tecella yim di mir'atê

Fehubbi yarê subhanî munezzeh bû ji nuqsanê
Denûtu fi'l-fena da'im[147] ji ber narê tecellatê

Werin meyxaneya 'işqê binoşin mey ji ferfûrê
Rumûzatî biha meykû biha te'lû di mir'atê

Tedelleyna bikem narin[148] ji ber 'işqa di mir'atê
Teqerrub qabu qewseyna feya ehsen işaratî[149]

Teqerrub wesleten **Se'dî** ji feyzê Şahê Hewramî
Bigîr zulfê ji Leylayê bibûs yarê bi hûhatê

Xerabat lew li me me'wa heme teqdîr ji subhanî
Ecel baqî li min mehbûb xerabatê bi ser hatî

Evî narî dilim sûze ceger nûr e hemî tûr e
Bila munkir neke inkar cihan tûr e j'fiyûzatê

Meke ‘eybê li min zahid li bo çehrê zehî çehre
Ji bo Barî bike insaf heyata min ji ew latê

Bila hûyan dikim tesbîh ne şubhê şeyx bi tesbîhan
Bi abê çehrê Leylayê hemî tûr im di mir’atê

Bila latan tu teqdîs ke tu tûrê xwe munewwer ke
Bi bada ehmerê şew ke dil û cergî li xerabatê

Eccil[150] badeyan noşim hemî îro neyê hoşim
Işaratî biha tesfu feya husne’l-meqalati

Işarat dîm di mir’atê ez im rindê xerabatê
Fe f’l-’işqi teqerrebtu feya ‘izze’l-meqamati

Were mutrib bi alatan li kû duxter xerabatan
Du zulfê gîsuwan tatan nihan dîtim di mir’atê

Bi leb xendan me suhbet kir wekû Mecnûn bi Leylayê
Teweddi mehbeten[151] îro ez im medhûş bila latê

Fehesbî şahid û saqî niye tirsim ji butxanê
Temeddeh ‘aşiqa wesfen[152] ji bo yarê xerabatê

Esîr bûme di ‘işqê da ez im meczûb di şewqê da
Ji şewqa Leylê ez bûme şehîdê ‘işqê ew latê

Hebîba min dida herdem şeraba le‘lê nûranî
Çi ġemdar im ji hicranê qedeh l’destim bila latê

Merîxa dûn hemî zecr e gelek zahid dixwin recz e
Me mey xware ji meyxane werin meyxaneyê satê

Bi çenga erġenûn noşim meyê le'lê ji wan yaran
Heyata cawidan bînim ji nûr û 'işqê sadatê

Kirin îro evê duxter du zulfê xwe gelek enwer
Me pur mehbûb gelek dîtin ne şubhê rûh û lasûtê

Me Behramî nevê Leyla ji ġeyrî zulfê mexmûrî
Hilo rabe şepala min bibim mexmûr li xerabatê

Me pîrê meyfiroş dîte dida kase ji xoşabê
Şeraba erġenûn xware min ê rindî l'xerabatê

Şerab û erġenûn digrim çi kim îro ji gerdûnê
Du nûnê zulfikan derdim şifadarê d'fiyûzatê

Li derdê 'aşiqan derd e meya le'lê ji meyxanê
Li derdê min ev e derd e werî Leyla di mir'atê

Me feyza erġewan xware ji zulfê rûyê şêrînê
Ji bo 'ummî besaratan çi efyûn e xerabatê

Hewayê Leyl û Şîrîne ji roja Lestê erwahan
Çira zahid dikit lewmê li bo rindê xerabatê

Ki riswayî li min derd e ez im 'aşiq li mehbûban
Ji deftera zahidan mebhes here îro xurafatê

Tu tesbîhê hezar dane bide îro bi yek fincan
Ki lezzet dîm ji vê xemrê *huwe'l-merġûb*[153] di mir'atê

Ene'l-meġmûm[154] ji hicranê dixwim xûnê ji gerdûnê
Tu kî hicretî pur bî me can daye ji mir'atê

Bikin sebrê ji hicranê kî ustadê we remiz anî
Kî murşid bêxeber nîne ji vê xemra helalatê

Me ra menzil çi bî yara heme zecr e ji bê cana
Were pêşber **Se'îd**ê jar ki merhûn e l'xerabatê

Me xerqê zerq kire merhûn li xerabat Şehê Hewram
Kî em bûne qedîm bi'a' tu ba'i' muşterî latê

Em în ba'i' li Leylayê bida'et bo me erzanî
Were cana bi xemlê ve kî can daye l'xerabatê

Me tesbîh da bi yek bûse çi kim îro ji tesbîhan
Hemî efsûn û efsane me tali' bû l'xerabatê

Werin îro bibînin min li hoş çûme li meyxanê
Qedeh l'deste ji vê badê me seyran kir li ew latê

Werin îro li butxanê li wê zehf in ji van şoxan
Butê şengol û re'nayê hemî mehbûb l'xerabatê

Du lat girtim ji şengolan cemaldar in wekû mahan
Gulîsor in li min şah in birin talan me mir'atê

Ji 'işqê nazika şengan nema hoş im subihgahan
Qesem Barî eya **Seyfî** tu yî rindê xerabatê

Dibin talan dil û canan bi şîr û xencer û tîran
Didin remzan bi wan çeşman kirim meqtûl l'xerabatê

Were îro kezî sorê bide badê ji ferfûrê
'Elûna qurbeten canan li van rindê xerabatê

Me dî Yûsif xeraman bû li min dîde çi rewşen bû
Li bûya Yûsifê Misrî diçim îro l'xerabatê

Me dî îro siyah çeşmê li min bada guhê çar[k]ê
Ceger bûye wekû nayê heqîq ez bûm l'xerabatê

Ji hoş û muntezim çûme ku min dîtî hebîba min
Hebîba min bi çev dîtim li hoş çûme l'xerabatê

Bi ilhamê dixwend şêrîn eya rindê xerabatê
Were îro teqerrub be me weslet girt l'xerabatê

Li kû saqî bi xêr bêtin binoşim mey ji rûyê wî
Sipî zendê şeker xendê çi xweş rindim l'xerabatê

Ji mihra to eya saqî ceger nûr e dilim tûr e
Ji can û dil ez ê çûme ji ber 'işqa di mir'atê

Buta şengol û mestane ez im serxoş li meyxane
Weşîn miskê ji zulfê xwe bimeş cana bi hû w hatê

Buta re'na te ez kuştim bi te mexmûr çi xweş geştim
Te birye can li bo qiştim esîr im ez l'xerabatê

Ji defter bûme meyxane çira zahid dikî 'eybe
Ji teqdîr bûme butxane me qismet bû l'xerabatê

'Ecac û nayê mehbûban nesîn tînê ji gulzaran
Li ecli'l-hubbi[155] medhûş im hebîba min bi xêr hatê

Bes Ke Li Min Vê Şîretê

Bes ke li min vê şîretê subhan ji şahê qudretê
Ez dam zemîna muhbetê subhan ji şahê muhbetê

Yara nekin vê şîretê saqî ji bejn û qametê
Mexmûr kirim bi yek şerbetê em sohtiyê vê muhbetê

Sohtî dilê hicrankeş im d'rûz û şebê firqetkeş im
Em serxweşê medhûş dilim subhan ji qedd û qametê

Selwa zirav hat xemmilî çîçek li bejnê ġeyyirî
Qamet ji tayê 'er'erî wesfa neşêm der muhbetê

Wesfê evîn û 'işqehê pursê bikin j'nûra şehê
Ew pur zerî selwa sihê teysî ji nûra muhbetê

Îsand ji min qelb û ceger dêm esmera zerrîn kemer
'Enber li wê bûne teber riswa kirîn vê muhbetê

Saqî ji nûra bade'ê ... ... seccade'ê
Zeraveyê ji wê bade'ê kirme biçûkê muhbetê

Mihra ji rûyê saqiya birye ji min rû û riya
Heqqa dibêm ey **Se'diya** murşid tu yî der muhbetê

Ev saqiyê meh peykerî gîso kirin hûr û girê
Nêrgiz ji nûra peykerê nûrê bigîr j'vê muhbetê

Her dil bi 'işqê zinde bî dê dil ji wî pur bade bî
Sûndê bi Xaliq em dibê pejmurde bîn der muhbetê

Mihra ji rûya saqiya wek ateş e ey horiya
Dê çît ji min rû û riya em keştiya vê muhbetê

Bazî ji burcê derkete mehbûb ji kaxê tel'et e
Suhbet bi yara hezret e mihnet li nîva hezretê

Suhbet bi ya rûha divêm saqî bi zulf û xal divêm
Mutrib bi çeng û def divêm em xwe li wê bîn sekretê

Suhbet bi Leyla enwerî gîso ji xalan bîn celî
Saġer mudam pur bade bî em serxweşê rûyê butê

Esdaġi Hebîbî

Esdaġi hebîbî nûrî we heyatî
Hicra we hebîban zulm we mematî

Mabeynê du sedġan rewze û beha' e
Wesla te hebîbî sewmî we selatî

Ev nûrê di birhan mebsem ji beha' e
Ew nûrê du çeşman heccu'l-'erefatî

Ellahu şehîdun ya murşidê 'işqê
'Elî di herîr rûhî we heyatî

Ferhad şebîhim Şirîn di firaqê
Ya leyte wisalen fî hîni heyatî

Ya sedġe hebîbî Ellahu şehîdun
Luqman di dewa'ê nar î we selat î

Sewm î we selat î hubba di hebîban
Nalani qulûban *naru'l-heseratî*

Zulmet ji firaqê Tîmûr ji 'Ecem hat
Ihraq li fu'adan *yemmu'l-herekatî*

Narî tetelzî ya şahidê qudsî
Muhbet li zemîran *naru'l-hemimatî*

Şebnem li nebatan 'işqa te **Se'îd**
Rêz kir ji sebehan *naru'l-ġezelatî*

Melfûf ji herîr in biska te hebîbê
Tuġra li cebînê *memsek we suqatî*

În 'erweti we seqî la la le ze'îfe
Merza ji hewayê 'erqu'l- hereqatî

PAŞBEND / EKLER



PÊVEK-1: Rûpelê Ewil ê Dîwanê (Nusxeya Ayê)



PÊVEK-2: Rûpelê Ewil ê Dîwanê (Nusxeya Byê)



PÊVEK-3: Malbata Şêx Se'îdê Cizîrî

Me ev tablo bi alîkariya Mehmet Selim DİLAN(Neviyê Se'îdê Cizîrî), Dr. Mesut TÜZÜN û Abdulkadir BİNGÖL; herwiha li gorî çavkaniyên nivîskî amade kir.

Tablo 1: Fêhrista Helbestên Dîwana Şêxê Meczûb

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
1	Newaya mutribê ‘işqê	18	Se'dî	Tesdîs
2	Şukurdar im ji yari xwe	20	Se'îd	Xezel
3	Çi meynoş im di weqtê xwe	10	Se'dî	Xezel
4	Dilo çendî tu bêrehm î	12	Se'dî	Xezel
5	Minnet bi min da saqiya	19	Se'îd	Xezel
6	Bayê nesîm ji yara	15	Se'îd	Xezel
7	Gewherê ‘işq çun zîbeq e	7	Se'îd	Xezel
8	Ji çehrê duxtera zerpoş	12	Se'îd	Xezel
9	Li min murşid di ‘işqê da	16	Se'îd, Ġeramî	Xezel
10	Saqî ji rengê mahê nû	21	Se'îd, Ġeramî	Xezel
11	Îro ji dil ateş rija	16	Se'îd	Xezel
12	Saqî weşîn der cami ma	17	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
13	Dîsa ji derba firqetê	17	Se'îd	Xezel
14	Îro ji nû pur ateş im	19	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
15	Bayê muxalif bê perr in	12	Se'îd	Xezel
16	Ne tenê sîne bi ker hat	14	Se'îd	Xezel
17	Dîsa li min ateş rija	14	Se'îd, Ġeramî	Xezel
18	Ez kû me rind û meyxur im	9	Ġeramî, Se'd	Xezel
19	Sed merheba ya Mustefa	16	Se'îd, Ġeramî	Qesîde
20	Mestan binoşan rindê ma	11	Se'îd, Ġeramî	Xezel
21	Eger de'way Ebûbekrî	12	Se'îd	Xezel
22	Saqî hilîn perda rûya	25	Se'îd	Xezel
23	Kengî bibarî ey nesîm	14	Se'îd	Xezel
24	Weqtê xerîf se'd hat evîn	18	Se'îd, Ġeramî	Xezel
25	Îro şehî sirr dane dil	13	Se'îd, Ġeramî	Xezel
26	Îro ji ‘işqa sorgulê	10	Se'dî	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
27	Di riya dostê Ġeramî	7	Ġeramî	Xezel
28	Dîsa ji dil nû bû evîn	10	Se'îd	Xezel
29	Minnet ji bext û her ji text	15	Se'îd	Xezel
30	Min dî li baġê Mîri Zeyn	10	Se'îd	Xezel
31	Ey şahidê qudsî key vekit	6	Se'îd	Xezel
32	Dîsa ez im l'baġê gulê	10	Se'îd	Xezel
33	'Er'er heja ji bejnê	7	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
34	Îro tu bê 'umr û mizac	9	Se'îd, Ġeramî	Xezel
35	Dîsa dixwazit qelb û dil	7	Se'îd	Xezel
36	Îro ez im rindê Husam	13	Se'îd, Ġeramî	Xezel
37	Ellah di ber subha Elest	21	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
38	'Işqa şepala bê misal	18	Se'îd	Xezel
39	Îro l'me da bêhnek şirîn	20	Se'îd	Xezel
40	Dîsa suwar bî nûcuwan	12	Se'îd	Xezel
41	Îro ji remza nûcuwan	9	Se'îd	Xezel
42	Îro ji derba firqetê	21	Se'îd, Ġeramî	Xezel
43	Dîsa ji bejna 'er'erî	10	Se'îd, Se'd, Ġeramî	Xezel
44	Saqî biyar cama sedef	9	Se'îd	Xezel
45	Ismê yar min diye	37	Se'îd, Ġeramî	Qesîde
46	Îro ji rengê saqiyem	14	Se'îd	Xezel
47	Hat padişahê neyşeker	8	Se'îd	Xezel
48	Îro ji hubba şahê min	12	Se'dî, Se'îd	Xezel
49	Dîsa biyar bayê nesîm	12	Se'îd	Xezel
50	Dîsa ji turra sosinê	15	Se'îd	Xezel
51	Şoxa şirîna b'ġemz û sirr	15	Se'îd	Xezel
52	Dîsa ji hicra dilberê	13	Se'îd, Ġeramî	Xezel
53	Şoxa ji balayê xeram	12	Se'îd, Ġeramî	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
54	Çi xweş xwandim durrê sufte	13	Se'dî, Ġeramî	Xezel
55	Ferraşê zulfê 'er'er	4	Se'îd	Xezel
56	Carek werîn bayê nesîm	15	Se'îd	Xezel
57	Cana biya der camê ma	8	Se'îd	Xezel
58	Ey şahidê gerden bilûr	9	Se'îd	Xezel
59	Carek were bayê nesîm	13	-	Xezel
60	Îro me dî an şahê Şam	10	Se'dî	Xezel
61	Min dî şepala meyperest	18	Se'îd, Ġeramî	Xezel
62	Îro seher xeram bû	31	Se'îd, Ġeramî	Qesîde
63	Ey key feruy di her ji xeyalim şeb û rûz	17	Se'dî, Ġeramî	Xezel
64	Ġema 'işqê bi efġan im	10	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
65	Dîsa li me bûyek lezîz	28	Se'îd	Xezel
66	Îro ji nazê 'er'erê	11	Se'dî, Ġeramî	Xezel
67	Îro ji remza 'er'erê	10	Se'îd	Xezel
68	Se'îd rêkir ji yarê ra	16	Se'îd	Xezel
69	Cana weşîn zulfa di reş	19	Se'd	Xezel
70	Carek were ebrû qemer	18	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
71	Dîsa were ey [nû]cuwan	15	Se'îd, Se'dî	Xezel
72	Ji meczûban û sermestan	10	Se'îd, Ġeramî	Xezel
73	Yara şepala neyşeker	19	Se'îd	Xezel
74	Dîsa were ey nûcuwan	8	Se'îd, Ġeramî	Xezel
75	Îro Se'îd ji noşan	30	Se'îd	Xezel
76	Îro ji dil xûn daye kef	16	Se'îd	Xezel
77	Dîsa li min wer bû evîn	10	Se'îd	Xezel
78	Ne beşer bû melekan guft	7	Se'dî, Ġeramî	Xezel
79	Selwa rewan pîrê muġan	8	Se'îd	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
80	Bejna cuwan xweş xurrem î	13	Se'îd	Xezel
81	Mey nexwarî Se'dê Bohtanî ġelet	50	Se'îd, Se'd, Ġeramî	Qesîde
82	Çeşmê yarê ez kirim şeyda	10	Se'îd, Ġeramî	Xezel
83	Da'im ji 'işqa dilberê	15	Se'îd	Xezel
84	Merheba ya ta'irê bal	6	Se'dî	Xezel
85	Îro li min bayê nesîm	10	Se'îd	Xezel
86	Selwa zirav lê bûne rav	4	Se'îd	Xezel
87	Dîsa ez im mader sedef	13	Se'îd	Xezel
88	Îro ji zulfa duxtera	9	Se'îd, Ġeramî	Xezel
89	Ya şahidê qudsîsti în	13	Se'dî	Xezel
90	Ta'et li min zîr û zeber	10	Se'îd	Xezel
91	Nûra meyê xef hate dil	16	Se'îd	Xezel
92	Îro seher mey hate dil	16	Se'îd	Xezel
93	Îro me dî yek ma'ide	16	Se'îd	Xezel
94	Dil bû qebes ji 'işqê	8	Se'îd	Xezel
95	Ji işaret bi sefawet	16	Se'îd, Ġeramî	Xezel
96	Dîsa ketim hicra di yar	13	Se'îd	Xezel
97	Ji derê badefiroşan	18	Se'îd, Ġeramî	Xezel
98	Îro ji 'işqa sorgulê	25	Se'îd	Xezel
99	Îro ji husna dêm durrê	15	Se'îd	Xezel
100	Suhbeta tê tunebî	9	Se'îd, Se'dî, Ġeramî	Xezel
101	Xemra helal ba zulfê yar	10	Se'îd	Xezel
102	Îro senem mexfe Se'îd	15	Se'îd, Se'd	Xezel
103	Ey saqiyê sîmîni saq	22	Se'îd	Xezel
104	Îro ji dengê hatifan	12	Se'îd	Xezel
105	Îro ji remza nûcuwan	9	Se'îd, Meczûb	Xezel
106	Ji hubbê yar çu Ferhad im	15	Se'dî	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
107	Dîsa ji ġemzê dilberê	8	Se'îd, Se'dî	Xezel
108	Zulfa ji ser dêmê şepal	16	Se'd	Xezel
109	Îro seher mexmûr e dil	6	Se'îd	Xezel
110	Ji bikr û duxtera esmer	12	Se'îd	Xezel
111	Bide canê ji meyxanê	16	Se'dî	Xezel
112	Dîsa werîn ey nûcuwan	16	Se'îd, Ġeramî	Xezel
113	Carek bibar bayê nesîm	13	Se'îd	Xezel
114	Carek were bayê yemîn	10	Se'dî	Xezel
115	Dîsa li min nû bû evîn	4	Se'îd	Xezel
116	Carek ji tayê 'er'erê	15	Se'îd	Xezel
117	Îro ji 'işqa nêrgizê	10	Se'îd	Xezel
118	Îro Se'îd mexmûr e dil	15	Se'îd	Xezel
119	Dîsa bibare ey nesîm	16	Se'îd	Xezel
120	Dîsa l'me da 'işqa Şirîn	14	Se'îd	Xezel
121	Neqşek me kir şubhê Se'îd	16	Se'îd	Xezel
122	Îro ji remza esmerê	14	Se'îd	Xezel
123	Dîsa me dî terha cuwan	15	Se'îd	Xezel
124	Îro ji nû pur ateş în	10	Se'îd	Xezel
125	Dîsa li me rabû evîn	19	Se'îd	Xezel
126	Dîsa werîn ey nûcuwan	13	Se'îd	Xezel
127	Carek veke bayê yemîn	15	Se'îd	Xezel
128	Carek were şoxa şirîn	13	Se'îd	Xezel
129	Rûyê gulê daye dilî	12	Se'îd	Xezel
130	Dilo her seyrê gulzaran	10	-	Xezel
131	Carek were bayê yemîn	21	Se'îd	Xezel
132	Dîsa me dî ew nûcuwan	7	-	Xezel
133	Îro ji 'işqa nêrgizê	12	Se'îd	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
134	Îro ji husnê yarê	12	Se'îd	Xezel
135	Newayê Se'dî we dîtim	10	Se'dî, Se'îd	Xezel
136	Weqtê bihar gul hat xeram	14	Se'îd	Xezel
137	Carek were bayê yemîn	17	-	Xezel
138	Şox û şepala dev bi ken	9	Se'îd	Xezel
139	Îro ji nû firqetkeş im	7	Se'îd	Xezel
140	Carek hilîn bayê yemîn	13	Se'îd	Xezel
141	Te'alellah çi şahîn im	10	Se'îd	Xezel
142	Dilo her seyrê dildaran	15	Se'dî	Xezel
143	Îro ji 'işqa lûliyan	7	Se'îd	Xezel
144	Ela ey yara dêrînî	13	Se'dî	Xezel
145	Weqtê buhar gul hat xeram	9	Se'îd	Xezel
146	Ne tenha ez qedeh l'deste	13	Se'îd, Ġeramî	Xezel
147	Kengî bibarî ey nesîm	9	Se'îd	Xezel
148	Billah ji nû pur ateş în	13	Se'îd, Se'dî	Xezel
149	Billah ji nal û zariyan	16	Se'îd	Xezel
150	Îro ji nû mexmûr e dil	14	Se'îd, Se'dî	Xezel
151	Biya saqî ji gulzaran	43	Se'dî	Qesîde
152	Te'alî saqiya ber xîz ke	1 bend	-	Ruba'î
153	Ya perwerê Şahê Husam	12	Se'dî	Qesîde
154	Dîsa ji husna şahidan	15	Se'îd	Xezel
155	Biya mutrib ji wan baġan	59	Se'îd	Qesîde
156	Ji camê mey xeberdar îm	6	Se'îd	Xezel
157	Îro li min ateş rija	8	Se'îd, Ġeramî	Xezel
158	Feleka etles û sergeşte	27 bend	Se'îd	Teştîr
159	Dilo çendî tu bêrehm î	17	Se'îd	Xezel
160	Ji 'işqa dînê ez bûme	12	Se'dî	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
161	Îro ji nazên dilberan	10	Se'îd	Xezel
162	'Işqa di Leylê kuştime	5	Se'îd	Xezel
163	Ela [ya] yari dêrînî	4	Se'îd	Xezel
164	Şoxa şepala gul-'izar	9	Se'îd	Xezel
165	Dîsa bibare ey nesîm	16	Se'îd	Xezel
166	Ji serayê were der	7	Se'îd	Xezel
167	Hat û me dî terha cuwan	16	Se'îd, Meczûb	Xezel
168	Îro li min ker bî ceger	14	Se'îd	Xezel
169	Dîsa me dî lala cuwan	19	Se'd	Xezel
170	Îro ji husna sorgulê	8	Se'îd	Xezel
171	Îro ji Tirka Hewremî	14	-	Xezel
172	Di gulzara şehê qudsî	6	Se'îd	Xezel
173	Zulfê bestin ji yaran	5	Se'îd	Xezel
174	Îro ji yara pur cemal	11	Se'îd	Xezel
175	Seherê bade bixor	17	Se'îd	Xezela Meselsel
176	Minnet dibînî dem bi dem	16	Se'îd	Xezel
177	Li butxanê me dî îro	15	Se'îd	Xezel
178	Hê ji ber roja ezel	12	Se'îd	Xezel
179	Ey bê hezan ji yaran	16	Se'dî	Xezel
180	Biya wer mey tu 'Usman î	10	Se'dî, Meczûb	Xezel
181	'Ecîb im ez ji vê dehrê	9	Se'dî	Xezel
182	Binal Se'dî	16	Se'dî	Xezel
183	Dîsa ji Tirkê serxweş im	8	Se'îd	Xezel
184	Li min 'ebîran û gulabê	10	Se'dî	Xezel
185	Sebahu'l-xeyri ya saqî	12	Se'dî	Xezel
186	Îro di 'îda min şepal	14	Se'îd	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
187	Bi dil guftim û xweş xwandim	14	Se'îd	Xezel
188	Sebahu'l-xeyri Hewramî	13	Se'dî	Xezel
189	Eya Se'dî bixor badê	14	Se'dî	Xezel
190	Biya cana di mehmel da	12	Se'dî	Xezel
191	Ger dil hebî zuhdek xuşik	13	Se'îd	Xezel
192	În 'er'erê balayê min	9	Se'îd	Xezel
193	Dil da dixwim çi xûnê	12	Se'îd	Xezel
194	Îro ji sewta bilbilî	10	Se'îd	Xezel
195	Îro seher hate dilî	15	Se'îd	Xezel
196	Îro ji çeşmê mestê yar	7	Se'îd	Xezel
197	Îro siwar bî Tirkê ma	6	Se'îd	Xezel
198	Dîsa li min nû bî evîn	13	Se'îd	Xezel
199	Îro Se'îd lê hat evîn	11	Se'îd	Xezel
200	Dil mecmerê rûyê zerî	14	Se'îd	Xezel
201	Tu j'nû bibare ey nesîm	16	Se'îd	Xezel
202	Dilo her seyrê gulzaran	5	Se'dî	Xezel
203	Werin meyxaneya 'işqê	14	Se'îd	Xezel
204	Edir ya eyyuhe's-saqî	7	Se'îd	Xezel
205	Teqeddem Şahê 'Ednanî	5	Se'îd	Xezel
206	Her dema dênê bibînim	11	Se'îd	Xezel
207	Di babê hilm û sebrê da	14	-	Xezel
208	Îro li min lewmê nekin	16	Se'îd	Xezel
209	Vê 'alemê riswa kirîn	14	Se'îd	Xezel
210	Îro ji remza nûcuwan	13	Se'îd	Xezel
211	Sebahu'l-xeyri şahanim	4 bend	Se'dî	Tercî'bend
212	'Aşiqê şîwe'ê nazik	2 bend	Se'd	Tercî'bend
213	Ey şahid û Cemşîd	2 bend	Se'îd	Tercî'bend

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
214	Min dî li selwa hate xwar	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
215	Dîsa li min wer bû evîn	12	Seyfedîn	Xezela Muselsel
216	Merheba ya şahidê ebrû keman	11	Se'îd	Xezela Muselsel
217	Vi bayî ra bi her ah în	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
218	Şahidê baġê risalet medenî	10	Se'dî	Xezela Muselsel
219	Destê lewwam	1 Mısra	-	Mısraê Azade
220	Bê tu ey leb şekker î	1 bend	-	Tercî'bend
221	'Işqa te meger	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
222	Ev peykê qeza'ê	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
223	Selwa ciwan da min şerab	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
224	Sebahu'l-xeyri go Se'dî	8 bend	Se'dî	Tercî'bend
225	Vê muhbetê dil hûr dikir	7 bend	Se'dî, Seyfedîn	Tercî'bend
226	Di gulzaran hebîb dîtim	4 bend	-	Tercî'bend
227	'Ezîza min çi fermayî	2 bend	Se'îd	Tercî'bend
228	Îro ji husna surşirîn	4 bend	Se'd, Seyfedîn	Tercî'bend
229	Bes 'aşiqî mehcûr bike	3 bend	Se'dî	Tercî'bend
230	Bê cemalî ji piyalê çi ġerez	1 bend	Se'dî	Tercî'bend
231	Dilê mehpare'ê Hewrem	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
232	Enwera miska Xeten	1 bend	Se'îd	Tercî'bend
233	Dilo her seyrê dildarê	15	Se'îd	Mesnewî
234	Min dî di yaran yarê ma	14	Se'îd	Mesnewî
235	Tali' me bûye meymûn	10	Se'îd	Mesnewî
236	Îro ji min nalan we tên	9	Se'îd	Mesnewî
237	Yedê beyza yedê canan	9	Se'îd	Mesnewî
238	Ji 'işqa van perî rûyan	12	Se'îd	Xezel

Rêz	Helbest	Jimara Beyt/Bend	Mexles	Teşe
239	Ji teqwîma rûyê Leyla	10	Se'dî, Seyfî	Xezel
240	Ji remz û sirrê subhanî	12	Se'dî	Xezel
241	Îro ji remza 'ezruwê	14	Se'îd	Xezel
242	Dîsa li min ateş rija	14	Se'îd	Xezel
243	Dil ateş e îro Se'îd	17	Se'îd	Xezel
244	Nezer da min ji mir'atê	67	Se'îd, Seyfî	Qesîde
245	Bes ke li min vê şîretê	14	Se'dî	Xezel
246	Esdaġi hebîbî	12	Se'îd	Xezel

Nîşeyan/Notlar

1 Îstisnaya vê tîpa “Ġ-ġ-ɣ” ye ji bo ku ew bi dengê “X-x”ê re tevlihev nebe.

2 Arslan, M. 2021. *Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme)*. Teza Doktorayê, Zanîngeha Dicle.

3 F. Were ey rind.

4 Perridîn: peritîn, agir pêketin, şewitîn.

5 F. dirêj.

6 F. firot.

7 Ev riste ji *Dîwan*a Melayê Cizîrî ye, bnr. (Cizîrî, 2012: 202).

8 F. bide.

9 Bû w sî: bû û sî, bêhn û sih.

10 E. Bi min re were.

11 E. Ev gotin/beyan.

12 E. Tu çi dibêjî?

13 Me’dvê: me divê.

14 E. Min bibîne ji kerema xwe.

15 E. Ji hezkirina te.

16 E. Ji evîna te.

17 F. xweşî, rindî, delalî.

18 K. divê, divêtin.

19 Tavin: diavêjin.

20 E. teqez, bêguman, divê.

21 E. Tu çi dibêjî yara me?

22 E. Hez dikî?

23 E. Di hezkirina te de.

24 E. Hezkirin nebûya çi dikir ji hêstiran çavê me ya Seyfidîn?

25 E. Hezkirin nebûya ey telefkar! Çênedibû aşiq wek min.

26 E. Ma zêdetir nîne ji şewqa me. Hel min mezîd: Sûreya Qaf/Ayeta 30î.

27 Cab: cewab, bersiv.

28 Bihn: bêhn, bîn; wekî bêhna gula.

29 E. li ser hewrîşimê/îpekê.

30 E. Kerem bikin, rûmet bidine me.

31 E. roja hatî we'dkirin ango roja qiyamet û mehşerê.

32 Baġê e'lê: Baġê ez lê

33 Ne-nêzin, nêzîk nînin.

34 F. sê dost.

35 Ma'ide est: E+F. sifre ye, ziyafet e.

36 E. heta roja hatî we'dkirin ango qiyamet û mehşerê.

37 Binger: F. binêr, meyzê ke.

38 Digîn: digihin

39 Meymûn, ji koka yumn, siûd, bext, tişta bi xêr û oxir.

40 Bam: ban

41 F. min got bavo ya birêz.

42 E. rohniya çavan wê bide vexwarin.

43 E. ji me

44 La-heş: bêhiş.

45 E. goştê pîs, bêhnpêketî.

46 Bur/ber/ ږ : E. rastî.

47 F. bibihîse, guhdarî ke. *Mesnewi*ya Mewlana bi vê peyvê dest pê dike.

48 E. Ji me re got/vegot.

49 E. pesin ji me re.

50 E. pesnê me bidin.

51 E. bide vexwarin.

52 Rûy-dên: rûdên, rûdêhn, wech, sîma.

53 Durenk an direnk, dengê naqos û zingilê ye.

54 E. di navbera me de

55 Kupal: kopal

56 E. Ji hezkirina wê rihê min.

57 Dînê me: ji dîtina me, ji pêş çavê me.

58 F. Dilsozî ew e.

59 F. birin.

60 E. Dil di evînê de heliya.

61 E. Dil heliya.

62 F. li wir û (li) vir.

63 E. Ji min re got yara min, helbesteke safî/zelal got.

64 E. helbesta şerabê.

65 E. Li me nihêrî/meyzand.

66 E. hezkirina min wergire.

67 E. Ez ê ji te re bibêjim.

68 E. tu çi emir dikî?

69 E. Erê; T. Evet.

70 F. ez an: ji wî/wê.

71 E. giyanê min fedayî Mihemed Mistefa be.

72 K. çav, çe'v, çehv.

73 E. ebeden, qet, tu car.

74 E. Ew şah bi eşkeretî firrî, dilê min ew bi 'eynelyeqîn dît.

75 Kuhen: kevin.

76 Subha Celal: roja Qalûbelayê, bezma Elest.

77 E. Xoşevîst û hezkirî ew e.

78 E. Yê ku tê perestkirin û tê xwestin ew e.

79 Xar û xes: tiştên wekî stirî ku zû dişewitin

80 E. di eşqa wê de.

81 Xwar û xesî: kêm, qels, rezîl û qesîs

82 E. Ji eşqê bibêje.

83 E. daîm e, berdewam e; heta berdewam be.

84 Bakî: bang bikî.

85 Guvtin: gotin, lefz, bêje. F. goften.

86 E. Şikir ji Xwedê re ya Se'dî ez im şairekî Mecnûn.

87 E. Bi wesîleya hebîb/xoşevîst, helbestvan efsûnkarekî Mecnûn e.

88 E. Behsa hezkirinê bike.

89 E. Hemû mirov xafil in, nezan in.

90 Dimû', pirjimara dem', hêstirê çavan

91 E. erê, belê.

92 F. xwestin, daxwaz kirin.

93 E. wekî, sankî.

94 F. dixwazî, heke dixwazî.

95 E. nizanim.

96 E. Seîd neaxive, ew di meqamê fenayê/tunebûnê de mayînde ye.

97 *Gu'de na'ê*: Guh bide nayê/neyê.

98 F. reng.

99 L'kuwe: li kû ye?

100 F. biçe, here.

101 F. bimre.

102 E. Rabe ya Se'îd.

103 Belah: bela, Qalûbela; subha belah/weqtê belah: roja Qalûbelayê.

104 Kirbûn: kiribûn.

105 Lêdey: lê dî/ lê bidî/ lê bide.

106 F. ew, wî/wê.

107 F. emr û ferman bike.

108 F. ew, wî/wê.

109 Şeste: şikeste.

110 E. niha li vir, vêga.

111 E. vexwarina berdewam.

112 F + E. em hêvî dikin.

113 E. eğniyye, stran.

114 F. xwedî eşq û evîn; dergê: dergeh, derî

115 F. Meya tûj dixwazim.

116 F. Xwedî sê yar im.

117 Binma: ji koka numa, xuya bikira, bihata dîtin.

118 xuşik: xweşik, delal, rind.

119 meḥ (مح) kirin: dagirtin, tije kirin.

120 Xar: stirî; xaraxur: yê ku stiriyan dixwe.

121 Natuwan, natewan, F. bêhal, bêhêz.

122 Qulf/qufl: kilîd, mifte.

123 E. Xwedê te bistirîne ya Se'dî.

124 Sema': bihîstin, guhdêrîn

125 F. kanî, li kû ye?

126 E. Tercîhên me bê bandor/tesîr in.

127 E. Di hezkirina te de tu çi emir dikî?

128 E. sînga yarê/dilê yarê.

129 Destxetê de wiha hatiye nivîsîn. "Vî" an jî "bi" dibe.

130 Ev "misra'ê azade" ye. Di helbesta klasîk de teşeyeke nezmê ye ku bi serê xwe ye û tenê ji risteyekê pêk tê. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de zêde nimûneyê wê nînin loma pir orîjînal e.

131 F. siviktî, sivikayî.

132 E. vaye vediguherîne.

133 E. Ez şerxweş im ji wê bangê ma zêdetir nîne ji wê şewqê?

134 E. Çi dixwazî?

135 E. rihê min feda be ji bo wî yê bijarte.

136 Qurş, Qureşî ango Qureyşî, navê qebîleya Hz. Muhemmed e.

137 Bider: bide der, derkeve.

138 E. Di hezkirina te de ez çi bibêjim?

139 F. sê dost.

140 E. Ew tê dîtin û ew tê perestin di hemû bangan de.

141 E. Ew wech, rû, sûret, yek ji bilindtirîn delîlên keşifkirinê ye.

142 E. Feyza hezkirinê yek ji navdartirîn sembolên keşifkirinê ye.

143 E. Ew tê xwestin û meqsed ew e di hemû baweriyan de.

144 E. Ew tê perestin û ew heye di hemû qesîdeyan de.

145 E. Ew tê hezkirin û pesinandin di hemû miradan de.

146 E. Li gel vê qelbên me hene.

147 E. Nêzîkî tunebûnê dibim her gav.

148 E. Agirê xwe nîşanî me bide.

149 E. Nêzîkbûna bi qasî du seriyên kewanê nîşana xweştir a vê ye.

150 E. Erê, helbet.

151 E. Ji hezkirinê hez dike.

152 E. Pesnê taybetiyên aşiqan bide.

153 E. Ew e yê ku rewac e û rexbet dibîne, tê xwestin.

154 E. Ez im yê xembar.

155 E. Ji ber eşqê/hezkirinê.

Çavkanî/Kaynakça

Arslan, M. 2021. *Şeyh-i Meczûb Divanı (Metin-İnceleme)*. Teza Doktorayê. Zanîngeha Dicle.

Bingöl, A. 2020. *Nasnameya Cizîrê - Cizre Kimliği*. Stenbol: Novel.

BOA, DH.TMIK.M.. 42/35, neql kir: Altan, Bilal. 2018. "Cizre Belediye Reisi ve Miran Mustafa Paşa'nın Damadı Osman Efendi'nin Yaşamı ve Nüfuz Mücadelesi Üzerine Bir Değerlendirme" *Turkish Studies History*, 13/24, 1-15.

Cizîrî, Melayê. 2012. *Dîwan*. Osman Tunç (Wer). Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Doskî, T. Î. 2014. *Dîwana Şêxê Meczûb*. Duhok: Rêveberiya Giştî ya Rojnamevanî û Çap û Belavkirinê.

Şeyh-i Meczûb. 1996. *Gönül Sultanları ve Hak Sohbetleri (İhsan Yolu-Divân-ı İrfân)*. çev. Çelebi Süleyman Kaya, Ankara: Kültür Ofset.

Uludağ, S. 2003. "Meczup", *DİA*, İstanbul: İSAM, c. 28, r. 285-286.

Yaşın, A. 2011. *Tarih, Kültür ve Cizre*. (Çapa 2yem). Stenbol: Kent Işıkları.